


COYS MAYÊR

Ji 3 Mîlîona Zêdetir Mecele Hatine Firotanê

Fikir

Deşta şêr e

Bi altkirina şerê fikira te



Fikir deşta şêr e
Bi altkirina şerê fikira te

Coys Mayêr

“Fikir deŝta ŝêr e”, Coys Mayêr, bi kurmancîya latînî

© 2018 Coys Mayêr

Battlefield of the Mind, by Joyce Meyer, Kurmanji Latin

Copyright © 1995 by Joyce Meyer

Life In The Word, Inc.

P.O. Box 655

Fenton, Missouri 63026

All rights reserved.

Translated in Kurmanji Latin in 2018

Serecem

Beşa 1: Girîngîya fikirê

Naverok	7
1. Fikir deşta şêr e	11
2. Pêwîstîya jîyane	23
3. Teslîm nebe	29
4. Hindik-hindik	35
5. Optîmîst be	41
6. Ruhên ku fikirê dîl hildidin	53
7. Bifikire, ku tu çi difikirî	59

Beşa 2: Qewilên fikirê

Naverok	69
8. Fikir kengê nava halê başdane?	73
9. Fikira lêpîrsîyar, gerok	81
10. Fikira şaşbûyî	89
11. Fikira ku bawar nake û şikber e	99
12. Fikira xemgîn û nerihet	111
13. Fikira ku gunekar dike, rexne dike û şikber e	125
14. Fikira pasîv	141
15. Fikira Mesîh	151

Beşa 3: Fikirdarîyên çolê

Naverok	
16. Pêşeroja min bi paşeroj û roja min, ya îroyînva, birîyar dibe.	181
17. Bila kesek dewsa min yekê bike: xwestina min tune, ku ez cabdarîyê hildime ser xwe.	189

18. Hîvî dikim, ku hemû tişt anegorî mecalên hêsa be:
ez nikarim li ber dijwarîya teyax bikim. 199
19. Ez nikarim bo xwe tu tiştî bikim: ez bûme kutkuto,
aciz bidim û şaşîya digêrim. 207
- 20 . Min nedine hîvîyêsekinandinê: ez layîqî wê
yekê me, ku hemû tiştî carekêra bistînim. 217
21. Diqewime kirina min şaş e, lê ew yek neheqîya min nîne. 227
22. Ez awqasî bêbextim: gunê min li min tê,
çimkî ez bi jîyana feqîr dijîm. 237
23. Ez layîqî duayên Xwedê nînim. 245
24. Bo çi ez nikarim kumreşîyê bikim, yan hevsûdîyê
wextê ku li cem hemûya hemû tişt diha baş e,
ne ku li cem min? 255
25. Ezê wê yekê bi cûrê xwe bikim, yan jî ezê qet nakim 265

BEŞA 1

Girîngîya fikirê

Naverok

Em çawa dikarin girîngîya fikirên xwe bi cûrê tam bidine dîyarkirinê, bo ku kemala rast ya Gotinên Silêman 23:7 bighînin?: “Çimkî ewê [kesek] çawa ku dilê xweda hesaba dike, usa ye...” (AMP).

Ez çiqasî dirêj qulixî Xwedê dikim, awqasî gelekî girîngîya fikira û xebera fem dikim. Min carekêra zelal texmîn kir, ku Ruhê Pîroz çawa nava vê pirsêda, bona lêkolînkirina van goveka, rêberîyê li min dike.

Min her dem gotîye û bi xwe jî bawar dikim, wekî ew tişt rast e, wekî eger em hela hê li ser vê dinîyayêne, her dem jî hewce ye govekên fikira û xebera lêkolîn bikin. Ew yek girîng nîne, ku em derheqa govekekêda çiqasî zanin. Bona hînbûnê her dem jî tiştên nû wê bêne dîtîne. Hinek tişt hene, yên ku em pêşda hîn bûne û hewce ye, ku em wana nû bikin.

Kemala Gotinên Silêmane 23:7, ya rast kîjane? Nava tercima King Cêymse Încîlêda wa tê gotinê: “Ew [meriv] dilê xweda çawa difikire, ew bi xwe jî usa ye”. Nava tercimeke mayînda jî wa tê gotinê: “Meriv dilê xweda çawa difikire, ew dibe yekî usa”.

Nava hemû kirinada fikir rêber û “hîmdar e”. Nava Romayî 8:5-da tê gotinê: “Çimkî ewên ku bi bedena xweva dişuxulin, fikirên wan bi wê yekêva tînen kontrolkirinê, wextê ku fikirên wan xwestinên nepîrozva girêdayîne û wan tiştên dikin, yên ku li bedenê xweş tînen, lê ewên ku bi Ruhva dişuxulin, bi wê yekêva tînen kontrolkirinê, wextê

“Çimkî çekên eskerîya me ne yên merivayî ne [çekên bedenê û xwînê], lê yên qewate ji Xwedê ne, bona wêrankirin û niquyîkirina kelane, [çimkî] em wan rastîya û dirava û ewlehîya, û her tiştêkî kubar, yê ku xwe hindava ulmê Xwedê [rast] bilind digire, betal dikin: û em rêberîya her fikirekê dikin û her meremêkî dil digrin ku gura Mesîhda be”

B Korintî 10:4, 5, AMP

ku fikirên wan xwestinên Ruhva girêdayîne û wan hemû tişta digerin, yê ku li Ruh [Pîroz] xweş tên” (AMP).

Karên me feydayên fikirên me ne. Eger fikira meye ne baş heye, wî çaxî jîyana me jî ya ne baş e. Ji alîkî mayînva, eger em fikira xwe anegorî Xebera Xwedê çê dikin, wî çaxî mînanî nivîsara Romayî 12:2-da, emê bi cêribandina xwe, nava jîyana xweda “Qirara Xwedê ya qenc, xweş û kamil” bidine kivşê.

Min ev kitêba pareveyî li ser sê beşên hîmlî kirine. Beşa ewlinda derheqa girîngîya fikiradane. Ez dixwezim, ku hûn dilê xweda bi cûrê qewîn tiştêkî îzbat bikin, ku hûn gerekê destpê bikin derheqa wê yekêda bifikirin, ku hûn çi difikirin.

Li cem gelek meriva pîrsgirêk hema nava cûrên fikirdarîya wandanin, û ew yek jî nava jîyana wanda pîrsgirêka pêşda tine. Mîrêcin bona her yekî fikirdarîke şaş pêşnîyar dike, lê pêşnîyara wî gerekê qebûl nekin. Hîn bibe, ku fikirdarîya çi cûreyî bona Ruhê Pîroz ya qebûlkirinê ye û fikirdarîya çawa bona Wî ya qebûlkirinê nine.

Kaxeza Korintîyaye dudada, xeberên 10:4,5 zelal didine kifşê, wekî em gerekê Xebera Xwedê usa baş bizanibin, bo ku em bikaribin fikirên xwe û Xwedê himberî hev bikin: “...her fikireke ku dijî Xebera Xwedê kubar dibe, em niqû dikin û dikine hêsîr, ku ew gura Îsa Mesîhda be”.

Ez dua dikim, wekî ev kitêb wê alî te bike bona kirina wê yekê.

Fikir deşta şêr e, bo wê yekê jî pêwîst e ku fikirên me tevî fikirên Xwedê li ser xetekê bîn xweykirinê. Ev yek şuxulkarî ye, ya ku wede û hînbûnê dixweze.

T’u cara teslîm nebî, çimkî tu gerekê hêdî-hêdî bêyî guhartinê. Tu bi çiqwasîva fikira xwe bidî başkirinê, bi awqasîva jîyana te wê baş bibe. Westê ku tu fikira xweda destpê bikî bona xwe xwestina Xwedêye qenc bibînî, tê destpê bikî wî cûreyî bijîyî.

Serê
1-ê

Fikir deşta şêr e

Fikir deşta şêr e

Ev gotina ji Încîlê dide kifşê, wekî em nava şerkarîyêdanin. Bi guhdarî lêkolînkirina vê gotinê em fem dikin, wekî şerkarîya me ne ku dijî merivên başqe ye, lê dijî mîrêcin e. Dijminê me, mîrêcin, dicêribîne stratêjîyayê û fêlbazîyê bide xebitandinê, serbikeve û derewa pêşda baş progiramkirî û fikirmîşbûyî bide xebatê.

“Çimkî em tevî xwîne û bedenê şer nakin [şerê tenê dijî dijminên fîzîkî], lê dijî dîktatorîya, dijî qewata, dijî xudanên vê dinîya tarî, dijî wan ruhên xirab e, nava goveka ezmînda”

Efesî 6:12, AMP.

Mîrêcin derewîn e. Îsa ew çawa “bavê derewê û ew hemû tiştê ku derew e” nav kir (Yûhenna 8:44, AMP). Ew him we û him Min dixapîne. Ew derheqa me, yan jî yên mayînda, tiştê dibêje, yên ku nerastin. Mîrêcin carekêra temamiya derewê nabêje.

Ew destpê dike fikira me, bi rêya fikirên pêşda hazirkirî, şikberîya, tirsê, berjewandîya, melûmetîya, têorîya, bide ber bomba. Ew hêdî û fesal dilive (bi gilîkî, progirama baş hazirkirî wede dixweze). Bîr bînin, wekî stratêjîya mîrêcin bo şerkarîyê hazirkirî ye. Ew wedekî dirêj me lêkolîn dike.

Ew zane, ku em çî hiz dikin û çî hiz nakin. Ew derheqa bêaminîya me, aliyên meye zeyîf û tirsên meda zane. Mîrêcin zane, ku ji hemû tiştî zêdetir çî me xemgîn dike û bona serkeftina xwe ew her deqeke wede dide xebatê. Alîkî mîrêcinî qewat sebira wî ye.

EM KELA XIRAB DIKIN

“Çimkî çekên eskerîya me ne yên merivayî ne [çekên bedenê û xwîne], lê yên qewate ji Xwedê ne, bona wêrankirin û niquyîkirina kelane, [çimkî] em wan rastîya û dirava û ewlehîya, û her tiştêkî kubar, yê ku xwe hindava ulmê Xwedê [rast] bilind digre, betal dikin:

û em rêberîya her fikirekê dikin û her meremekî dîl digrin, ku gura Mesîhda be”.

B Korintî 10:4,5, AMP

Mîrêcin, bi rêya stratêjîya zelal û derewa fêlbaz, dicêribîne fikira meda “kela” çê bike. Feqet fikira meda ew “kela” ew govek e, li kîderê em rûyê fikirdarîya xweda girêdayîne.

Nava van xetên nivîsarda Pawlosê şandî dibêje, wekî ew sîlihên me hene, bi kijana em dikarin kelayên mîrêcin xirab bikin. Derheqa wan sîlihada emê diha dereng xeber bidin, lê niha, ez hîvî dikim, ku guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî em careke mayîn nava şerkarîyê û şerê ruhanîdanin.

Xebera 5-a, ya kaxeza Korintîyaye duda, zelal nîşanî me dide, ku ew şerkarî li kîderê diqewime. Nava tercima Încîlêye wedê nihada vê xeberêda tê gotinê, wekî em wan sîliha hildidin û îzbatîya înkâr dikin. Ev hemû tişt nava fikirêda mîyaser dibin. Fikir deşta şer e.

Werin em serpêhatîkê lê binihêrin, bi alîkarîya kîjanê em dikarin zelal bernama mîrêcin lêkolîn bikin.

FIKIRA MÊRÎYÊ

Mêrî û malxwê wê Con nava jîyana xweye zewacêda bextewar nînin. Ew her dem bi hevra qayîl nabin: her dem hêrsketîne, xeyîdîne û hindava hevda bi talayêva tîjîbûyîne. Du zarokên wan hene, li ser kijana ew tiştên li malêye nebaş hukumên xweye xirab dihêlin. Ew hemû tişt derbazî li ser dersên zaroka û wan dikin. Li cem zarokekî rûyê wî halida, rûyê sistêma nervousêda pîrsgirêkên girêdayî madêra pêşda hatine.

Pîrsgirêka Mêrîyê ew e, wekî ew nizane ku çawa îzinê bide mêrê xwe, Con, ku ew bibe serê mala wan. Mêrî hiz dike serkarîyê bike, ew dixweze bi xwe hemû birîyara qebûl bike, serkarîyê finansî bike û terbyetdarîya zaroka kontrol bike. Ew dixweze bixebite û pêra jî perên wêye “şexsî” hebin. Mêrî serbest e, berk e, hiz dike qalme-qalmê çê bike û menîyên şer bigere.

Diqewime hûn niha vî cûreyî difikirin: “Ez bersiva pirsgirêka wê zanim: hewce ye, ku ew Îsa nas bike”. Mêrîyê pênc sal pêşda Îsa çawa Xilazkir qebûl kirîye, lê piştî sê sala ewê Con stendîye.

Hûn dixwezin bêjin, wekî piştî qebûlkirina Îsa, nava jîyana Mêrîyêda t’u tişt nehatîye guhartinê? Bêguman, hatîye guhartinê. Ew bawar dike, wekî nenihêrî kirinên wêye xirab, yek e, ewê here Ezmîn, lê ew rûyê tabîya xweye xirabda her dem li ser xwe gunehkarîyê texmîn dike. Gumana Mêrîyê niha heye...Heya qebûlkirina Îsa ew bêbext û bêyî guman bûye, lê niha ew tenê bêbext e.

Mêrî zane, wekî kirinên wêye hindava malxwê wê şaşin û ew dixweze bê guhartinê. Geleka şewir dane wê. Ewê her dem guhdar kirîye û ew hemû duakirin qebûl kirine, yên ku hindava hêrsê, şorişê, nebaxşandinê û talayê ser dikevin. Lê gelo ew nava jîyana xweda t’u tiştêkî baş nabîne...?

Bersiva vê pirsê Romayî 12:2-ye: “Nebine mînanî vê dinîyaê [vê qurnê], [mînanî erf û edetên wêye guhartî], lê [bi temami]werine guhartinê, bi çêkirina fikira xwe, [bi îdêlojîya nû û nêzîkbûna wêye nû] usa, wekî hûn bikaribin bidine kivşê [bo xwe], ku qirara Xwedêyê qenc û xweş û kamil kijan e, ew jî pêra, ku qencî, xweşî û kamilî ye [ji alîyê Wîda bo we] (AMP).

Nava fikirên Mêrîyêda kela hene, yên ku bi salên dirêj li wir çêkirî bûne. Ew bi xwe jî fem nake, ku ew çawa pêşda hatine. Mêrî zane, wekî ew gerekê şorişger, emirkir, gazindar nibe, feqet ew zane, ku gavên çawa gerekê biavêje bona ku xeysetê xwe biguhêre. Tê texmînkirinê, wekî hinek cara ew xwe hema bo wê yekê usa xweyî dike, wekî ew nikare kirinên xwe kontrol bike.

Mêrî nikare kirinên xwe kontrol bike, çimkî ew nikare fikirên xwe kontrol bike. Ew nikare fikirên xwe kontrol bike, çimkî ew qet nizane, wekî kontrolkirina fikirê jî bo wê meseleke başqe ye. Fikira wêda kela hene, yên ku mîrêcin zûva çê kirine.

Mîrêcin derewa xweye pêşda hazirkirî û teşkîlkirî hela hê gelekî zû nava jîyana mêrivda bela dike. Nava jîyana Mêrîyêda ew pirsgirêk ji zarotîyê destpê bibûn.

Zarotîya wêda bavê Mêrîyê yekî gelekî bêrehm bûye, yê ku ew gelek cara ceza dikir, lê sedema wê yekê dikaribû beşera bavêye xirab bûya. Bavê Mêrîyê ji hêrsê dikaribû, ji her gaveke şaş, bikira qîrîn. Bi sala ser hev ew mecbûr bûye li ber xeysetê bavêyî wî cûreyî bêrehm, yê hindava wê û dayîka wêda, temûl bike. Bavê t'u cara qedirê jina xwe û keça xwe negirtîye. Birayê Mêrîyê t'u cara nedihate cezakinê. Dihate texmînkirinê, ku tê bêjî ew bo wê yekê dihate hizkîrinê, wekî ew çawa kur hatibû dinîyayê.

Nava salada li cem Mêrîya 16-salî mîrêcin îdî derewa xwe çê kiribû, şikilê kîjanêyî rast tê bêjî vî cûreyî bû: “Mêr difikirin ku ew xwe çawa tiştekî mezin raber dikin. Ew hemû jî yekin û meriv nikare li ser wan guman be. Ew dikarin te biêşînin û bidine xebatê. Eger tu mêrî, wî çaxî jîyîna te îdî çêbûyî ye. Tu dikarî wî hemû tiştî bikî, çi ku tu dixwezî. Tu dikarî emirî li ser merivên dor-berên xwe bikî, serkarîyê bikî û hindava wanda usa bikî, çawa ku tu dixwezî û t'u kes (bi taybetî jin, yan keç) wê nikaribe t'u tiştî bike”.

Nava encamê vê yekêda Mêrî hate li ser fikirekê: “Wextê ku ez ji vir azabim, îdî t'u kesê t'u cara nikaribe gavên wî cûreyî hindava minda biavêje”.

Mîrêcin nava deşta fikira wêye şêrda îdî şer dikir. Bi sala ser hev ev fikir serê teda dizvirin û tê bibînî, ku gelo piştî zewacê tê bikaribî bibî jineke nazik û ya ku hiz dike? Eger tu bi cûrê ecêb jî bixwezî bibî yeke wî cûreyî, çawa jî hebe tê nizanibî ku ew yek wê çawa be. Û roja îroyîn jî Mêrîyê xwe nava halekî wî cûreyî tevlihevîyêda dît, ew çi dikare bike û ji me her kes çi dikare bike, eger bikeve nava halekî wî cûreyî?

ÇEKÊN XEBERÊ

“Eger hûn nava qîrara Minda bimînin [zû hînkîrinên min qebûlkin û anegorî wan bijîn], hûn bi rastî şagirtên Minin.

Û hûnê Rastîyê bizanibin, û Rastî wê we aza berde”

Yûhenna 8:31,32, AMP.

Li vir Îsa dibêje, ku gerekê çi cûreyî hindava derewên mîrêcin serbikevin. Em gerekê bi zanebûna Xwedêye rastva tijî bin, fikirên

me gerekê bi Qirara Wî çê bin û tenê paşê sîlihên li ser kaxeza Korintîyaye duda, ya 10:4,5-da diyardirî, yêna bona xirabkirina kela, bidine xebatê.

Ev sîlih (çek) xeberên stendîne, yêna ku bi saya terfîkirina, hînkirina, kitêba, vîdeoya, konfêransa û hînkirina Încîlêye şexsî hatine stendîne. Feqet em gerekê usa bijîn, nava Qirara Xwedê da bimînin, heya ku ew bibe eyantî, ya ku bi destî Ruhê Pîroz bo me tê dayîne. Li vir faktora girîng berdeyam e. Nava Încîla Marqose 4:24-da Îsa dibêje: "...Çiqasî (fikirê û lêkolînê) hûn didin (bo guhdarkirina rastîyê), awqasî jî (dilsozîyê û zanebûnê) bo we wê bê dayîne" (AMP).

Ez diwekilînim, wekî em gerekê xebitandina sîliha Qirara Xwedê berdeyam bikin.

Pesindayîn û duakirin jî jî sîlihên ruhanîne. Pesindayîn diha lez hindva mîrêcin ser dikeve, lê ne ku xebitandina sîlihekî cûrekî mayîn, feqet ew gerekê bi dil be, lê ne ku çawa stiraneke awqasî jî devê mêriv derketî, yan jî çawa mêtodeke kontrolkirinê, ku gelo ew kar dike, yan na. Bîr bînin, wekî nava pesindayînê û duakirinêda gerekê Qirara Xwedê hebe. Em anegorî Qirara Wî û Rehma Wî pesinê Xwedê didin.

Duakirin pêwendîya meye tevî Alîyê Sisya ye. Bi duakirinê em alîkarîya Xwedê hîvî dikin yan jî Wî ra dora pîrsekê xeber didin, ya ku me xemgîn dike. Ew yek çawa eleqet, hevaltî û mecal tê navkirinê, bi saya kîjanê em dikarin temamîya razîbûna xwe bidine kifşê, ku nava jîyana meda Xwedê Kî ye û Ew bo me çi dike.

Bona heyîna jîyana duayê kardar pêwîst e ku hûn pêwendîya xweye şexsîye tevî Bav Xwedê bidine pêşxistinê. Bizanibe, wekî Ew te hiz dike, Ew bi rehmêva tijî ye û her dem hazir e alî te bike. Îsa nas bike, Ew hevalê te ye û bo te miriye. Ruhê Pîroz nas bike, Ew çawa Alîkarê te, her dem tevî te ye. Îzinê bide Wî ku Ew alî te bike.

Hîn bibe ku duayên te bi Xebera Xwedêva tijî bibin. Zebûr 9:10-da tê gotinê, wekî emê bona navê Xwedê guman bin, çimkî Ew wana hesab hildide, yêna ku jî Wî hîvî dikin.

Bi vî cûreyî sîlihê me Xebera Xwedê ye, kîjanê em bi cûrê cuda-cuda didine xebatê. Bi xeberê em dikarin dua bikin, dikarin xeber bidin, dikarin bistirên û dikarin hîn bibin. Çawa ku Pawlosê Şandî nava kaxeza Korintiyaye dudada dibêje, wekî sîlihên me yên fizîkî nînin, ew yên ruhanîne. Em hewcê sîlihên ruhanîne, çimkî em dijî ruhên serwêrîkir, heya dijî mîrêcin jî, şerkarîyê dikin. Îsa heya li qûmistanê jî sîlihê Xeberê dida xebatê (binihêre Lûqa 4:1-13). Her car, wextê ku mîrêcin li ber Wî derew dikir, Îsa bersiv dida: “Nivîsar e...”, û xeber dida xebatê.

Wextê ku Mêrî hînbe sîlihên xwe bide xebatê, ewê destpê bike wan kela xirab bike, yên ku fikira wêda çêkirî bûne. Ewê rastîyê nas bike, ya ku wê ewê aza berde. Ewê bibîne, wekî ne hemû mêrin ku mînanî bavê wêne. Hinek wî cûreyîne, lê ne ku mêrê wê Con. Ew Mêrîyê gelekî hiz dike.

FIKIRA CON

Li alîyê vê serpehatîyê Con sekinîye. Pirsgirêkên wî jî hene, yên ku çawa faktorên alîkir, nava vî halê malbetê û zewacêyî diwarda hal tevlihev dikin.

Ew çawa malxwê malê, borcdar e tabîya xwe xweyî bike. Xwedê qulixa bona rêberkirina ruhanîye li malê teslîmî wî kirîye. Con jî Mesîhî ye û zane qanûnên malbetê çi cûreyîne. Ew zane, ku gerekê îzinê nede jina xwe, ku ew êkonomîya malê, finansa, zaroka û wî jî kontrol bike. Ew vî hemû tiştî zane, feqet tu gava navêje. Ew binketina xweye tam texmîn dike û dikeve nava temaşekirina têlêvîzyonê û sportê.

Con ji borcdarîyên xwe direve, çimkî ew şera hiz nake. Ew hesab dike, ku diha baş e tabîya pasîvda bimîne û vî cûreyî difikire: “Baş, eger ez evî halî vî cûreyî bihêlim, çawa ku heye, diqewime ev pirsgirêk bi xwe hel bibe”. Yan jî ew neavîtina gavên xwe afû dike û dibêje: “Ezê bo wê yekê dua bikim”. Bêguman, duakirin baş e, lê ew yek xirab e, wekî ew dibe mecala xwedûrxistina ji cabdarîyê.

Îzinê bidin şirove bikim, ku ez çî dixwezim bêjim, wextê ku ez dibêjim, wekî Con gerekê tabîya bo wîye jî Xwedê dayî hilde ser xwe. Fikira min ew nîne, wekî ew gerekê bibe dîktator û derheqa serwêrtîya xweda bike qîrîn. Kaxeza Efesîyaye 5:25-da tê gotinê, wekî mêr gerekê jina xwe usa hiz bike, çawa ku Mesîh civîn hiz kir. Con gerekê cabdarîyê hilde ser xwe, peyî kîjanêra gerekê qedir dest bîne. Ew gerekê bi hizkirin tabîya xweye hindava jina xweda qewîn bigre. Ew gerekê Mêrîyê bîne ser wê fikirê, wekî nenihêrî wê yekê ku zarotîya wê baş nîbûye, niha ewê xwe teslîmî Xwedê kirîye û hindava Wî da aminayê dide kifşê. Bi vê yekêva tevayî, ew gerekê guman be, wekî ne hemû meriv wî cûreyîne, çawa ku bavê wê bûye.

Con gerekê cedandina bide xebatê, feqet Mêrî jî gerekê usa bike, çimkî li cem wê jî bona mîrêcin dergê vekirî heye: “kela”, yên ku wê nava diltîyêda xweyî dikin. Nava fikira Conda jî şer diqewime. Zarotîya wî jî mînanî ya Mêrîyê xirab bûye. Dayîka wîye dîktator gelek cara bi gotinên bêhurmetkirinêva derb gîhandine wî: “Con, tu kêrî t’u tiştî nayêyî...ji te wê t’u tişt dernekeve...”.

Con, mînanî gelek zaroka, gelek cara cêribandîye li dayîka xwe xweş bê, cedandîye rehmbûna wê dest bîne. Feqet, çiqas zêde ewî dicêriband, awqasî zêde ewî şaşî dikirin. Xeysetê wî tê bêjî belavbûyî bû, û dayîka wî her dem derheqa wê yekêda dianî bîra wî. Gelek cara eşiyayên Con jî destên wî diketin, çimkî ewî dîcedand bi cûrekî li dayîka xwe xweş bê û rûyê wê yekêda hêrs diket, çimkî ew nikaribû bighîştî meremê xwe.

Çend cara ew jî alîyê zarokên hevalên xweda hatîye înkarkirinê, tevî kîjana ewî xwestîye hevaltîyê bike. Nava jîyana me gelekada tiştên wî cûreyî diqewimin...Feqet wê yekê Con tune dikir, çimkî ewî texmîn dikir, ku jî alîyê dayka xweda înkarkirî bû.

Nava jîyana Conda usa jî keçek hebûye, ya ku ewî nava salên mektebêye dawîda hiz kirîye, lê wê keçê ew înkâr kirîye û xortekî mayîn bijartiye. Nava wededa ev hemû tişt jîyana Conda berev bûye û mîrêcin jî xebata xwe kirîye, bi sala ser hev nava fikira wîda kela çê kirine. Rûyê zeyîfîya Conda ew bûye tirsonek, şermoke û merivekî tenê.

Con bi xwe merivekî aşîthiz e, yê ku hesab dike ku gerekê pîrsa bi cûrê bêdeng hel bikin. Bi sala ser hev ew li ser van fikira bûye: “Ew yek bêfikir e, ku tu çi difikirî derheqa wê yekêda bêjî meriva, çimkî ewê te guhdar nekin. Eger tu dixwezî meriv te qebûl bikin, wî çaxî pêwîst e tu wî alîda herî, kuda ew diçin. Awqasî hemû tiştî dayne alîkî, çimkî gotina te wê t’u tiştî neguhêre”.

Carekê Con cêribandiye ser gotina xwe bisekine, feqet cêribandinên wî bi binketina wîva ser hevda hatine. Bo wê yekê jî ewî carekêra qîrar kir, ku hewce nîne bona berxwedanê cedandina bide xebatê.

“Çawa jî hebe ezê binkevîm,-ew fikirî,-îdî bona çi gerekê meriv tiştêkî destpê bike?”.

BERSIV KÎJAN E?

“Ruhê Xudan li ser Min e, çimkî Ewî Ez bi rûnkirinê kifş kirime, [Yê Rûnkirî, Mesîh] behsa qenc [mizgîniyê]bo feqîra terîf bikim: Ewî Ez şandime bona elamkirina serbestîya hêsîra û dasekinandina ronahîya çevên kora, usa jî azakirina wana, yên ku ji bindestîyê şikestîne [yên ku bindestin, lêxistîne, hincirandîne rûyê qezîyada şikestîne].

Bo îlankirina ew roja ji aliyê Xudanda qebûlkirî û [sala xweş], wextê ku xilazbûna Xwedê û xweşîya aza bi merdanî bikîşe...”.

Lûqa 4:18,19, AMP

Bi dîtina pîrsgirikên Con û Mêrîyê, ew yek dijwar nîne, ku jîyana wane malbetê bînine ber çavê xwe. Bîr bînin, wekî ew her dem nava hevraqayîlnebûnada bûn. Hevraqayîlnebûn her dem nîne, ku bi şerkarîya eşkereva tê kifşê. Gelek cara ew yek bi hêrsa veşartîva dîyar dibe, derheqa kîjanêda li malê hemû kes zane, feqet, dijî wê yekê t’u kes naxweze t’u tiştî bike. Li mala wan atmosferêke gelekî xirab e: ew usa gelekî xirab e û pêra jî li mîrêcin xweş tê.

Gelo tevî Con, Mêrîyê û zarokên wan wê çi biqewime...? Gelo jîyana malbeta wan wê rast bibe? Ew Mesîhîne û ji hev cihêbûn û undabûna malbetê wê bibe eyb, nenihêrî wê yekê, wekî hemû tişt wanva girêdayî

ye. Xeberên Mizgînîya Yûhennaye 8:31,32-a dikarin bona qirara wan bibine kilît. Eger ew mêr û jin berdewam bikin Xebera Xwedê lêkolîn bikin, ewê bighîjine rastîyê, û paşê, bi şuxulkirina anegorî wê rastîyê, ew yek wê wana aza berde. Feqet, bi fikira Xwedê, ew gerekê bi nihêrandina hişyar rastîya paşerojê û xwe binihêrin.

Rastî her dem jî bi saya Xebera Xwedê eşkere dibe. Feqet, mixabin, meriv her dem wê yekê qebûl nakin. Ew şuxulkarîke bi êş e, ku em şaşîyên xwe dinihêrin û dijî wana şerkarîyê dikin. Bi tomerî hildayî, meriv carna şaşîyên xwe û kirinên xwe afû dikin. Ew îzinê didin, ku paşeroja wan û terbyetdarîya wane stendî hukumê xirab li ser jîyana wane pêşerojê bihêlin.

Paşeroja me dikare şirove bike, ku em bona çî dizêrin, feqet em gerekê wê yekê nedine xebatê, ku xwe bona mayîna nava diltîyêda afû bikin.

T’u kes nikare xwe afû bike, çimkî Îsa her dem hazir e sozê Xwe mîyaser bike, yên dîlketî aza berde. Nava hemû govekada Ewê heya dawîya xeta serkeftinê tevî me be, eger tenê em bixwezin wê dûrayê tevî Wî derbaz bikin.

RÊYA DERKETINÊ

“Cêribandinên mayîn [tu qezîya, ya ku wê we bikişîne berbi gunehê] nehatîye serê we, ya ku bona mêriv ne tiştê sade ye[dêmek t’u cêribandinek yan jî qezîyak nehatîye serê we ya ku ji teyaxê mêriv jortir e, ya ku nayê kontrolkirinê û ya cêribandina merivatîyê nîne: û ya usa, ya ku meriv bikaribe li ser xwe bibe]. Feqet Xwedê amin e [bi Xebera Xwe, bi rehma Xwe], û Ew [dikare amin be]wê îzinê nede ku hûn bêne cêribandinê û kontrolkirinê û ji karebûna we der bêne kontrolkirinê, ji qewatê der hûnê teyax bikin, lê cêribandinêra tevayî Ewê [her dem] bona rêya derketinê bifikire [mecala revêye berbi rastekê], bo ku hûn qewatbin û vî hemû tiştî bi sebir derbaz bikin”.

A Korintî 10:13, AMP

Ez gumanim, wekî we ji vê serpehatîyê karibû fem bikira, ku mîrêcin çawa mecala dide xebatê û nava jîyana meda kela çê dike û

çawa nava deşta fikira meye şêrda şer dike. Feqet şikir ji Xwedê, wekî sîlihên me hene, bi kîjana em dikarin kela xirab bikin. Xwedê wê ji me dûrnekeve û wê me nava wî halîda nehêle. Nava xebera li kaxaza Korintîyaye ewlin, ya 10:13-da, Xwedê soz dide me, wekî wê îzinê nede, ku em ji qewatên xwe jortir bêne cêribandinê û bi wê yekêva tevayî, wextê her cêribandinekê, Ewê rêya derketinê nîşanî me bide.

Ji me her yek dikaribû dewsa Mêrîyê û Con bûya. Ez gumanim, wekî ji me her yek tiştekî tomerî ji vê serpêhatîyê dît. Pirsgirêkên wane hundur hebûn, yên ku fikir û nêzîkbûnên wanva girêdayî bûn. Tabîya wan encamê jîyana wane hundur bû. Mîrêcin baş zane, wekî eger ew bikaribe fikirên me kontrol bike, wî çaxî ewê bikaribe usa jî kirinên me kontrol bike.

Diqewime nava jîyana teda hinek kela hene, kîjana pêwîste xirab bikin. Îzinê bide, ku piştgirîyê bidime te, bêjime te: “Xwedê li rex te ye”. Nava deşta fikira teda şerkarî tê kirinê. Feqet behsa qenc ew e, wekî Xwedê alîyê te ye.

Serê
2-a

Pêwîstîya jîyane

Pêwîstîya jîyane

Tenê ev gotin îzinê dide me, ku em fem bikin, ku çiqasî girîng e, ku em rast bifikirin. Fikir qewatin û bi gotina xudanê kitêba Gotinên Silêman, karebûna efrandinê heye. Eger fikirên me hukumekî li ser heyîna me dikin, wî çaxî pêwîst e, ku fikirên me yên rastbin.

“Çimkî çawa ku ew dilê xweda difikire, usa ye...”

Gotinên Silêman 23:7

Ez dixwezim bidime diyarkirinê, wekî hê pêwîst e, ku fikirên me û fikirên Xwedê anegorî hev bin.

Usa nabe, wekî jîyana meriva baş be û fikirên wan yên xirab bin.

FIKIRA QALIB DIJÎ FIKIRA RUH

“Çimkî ewên ku bi bedena xweva dişuxulin, fikirên wan bi wê yekêva tên kontrolkirinê, wextê ku fikirên wan xwestinên nepîrozva girêdayîne û wan tiştê dikin, yên ku li bedenê xweş tên, lê ewên ku bi Ruhva dişuxulin, bi wê yekêva tên kontrolkirinê, wextê ku fikirên wan xwestinên Ruhva girêdayîne û wan hemû tiştê digerin, yên ku li Ruh [Pîroz] xweş tên”.

Romayî 8:5, ARM

Nava tercima Încîlêye Kîng Cêymsda serê 8-a, ya kaxaza Romaya, me hîn dike, ku eger em derheqa bedenêda (qalibda) difikirin, wî çaxî emê tiştên usa bikin, yên ku li bedenê xweş tên, lê eger em derheqa tiştên Ruhda difikirin, wî çaxî em tiştên usa dikin, yên ku li Ruh xweş tên.

Îzinê bidin ku vê yekê cûrekî mayîn şirove bikim: eger em bi cûrê bedenê derheqa tiştên şaş û xirabda difikirin, wî çaxî em nikarin nava Ruhda bijîn. Nava jîyana Mesîhîtiyêye açixda heyîna fikirdariya çêbûyî û ya xwedêtiyê pêwîstîya jîyane ye.

Carna usa dibe, wekî meriv bi nezanî naxwezin fem bikin, ku guhdariya li ser wê yekê çiqasî girîng e. Feqet, wextê ku ew fem dikin, wekî rûyê hesabihnedana wanda pirsgerêkên mezin pêşda tîn, wî çaxî destpê dikin mecala bigerin.

Mesele, wextê ku ji bankê têtêfon dikin û dibêjin, wekî xercên we bi 850 -î dolara ji hesabê we zêdetirin, hûn carekêra destpê dikin menîya wê bidine zelalkirinê. Diqewime we bîr kirîye ku hûn învêstîsyayê bikin, çimkî hûn fikirîne, ku we îdî kirîye. Wî çaxî hûn carekêra pera hildidin û diçine bankê, bona ku ji wan pirsgerêka azabin.

Minê bixwesta ku we ev pirsî çawa cûrekî çêkirina fikirê lê binihêrîya.

Diqewime nava jîyana weda halê kirîze ye, çimkî bi sala ser hev hûn bi fikirdariya şaş jîyane. Eger usa ye, wî çaxî bona we diha girîng e, ku hûn wê yekê bifikirin, wekî jîyana we wê rast nebe, heya ku fikira we rast nebe. Hûn gerekê derheqa vê pêwîstîya jîyaneda bifikirin û fikira xweda bi cûrê rast nêzikî pirsî xirabkirina wan kelayên ji aliyê mîrêcinda çêkirî bin. Sîlihên xwe bidine xebatê, kîjanin: Xebera Xwedê, pesindayîn û duakirin.

BI RUHÊ XWEDÊ

“...Ne ku bi zorayê û ne jî bi qewatê, lê bi Ruhê Min”, -Xudanê Zor dibêje”

Zakarîya 4:6

Ji rêyên azadiyê yek jî berbirîbûna berbi alîkarîya Xwedê ye.

Ji sîlihên we yek jî duakirin e, hîvîkirin e. Tenê çawa qirarkir tu nikarî nava halên xweda serbikevî. Bêguman, hewce ye tu qirarkir bî, lê ew yek gerekê bi Ruhê Pîrozva be, lê ne ku bi cedandinên bedena weva.

Ruhê Pîroz alîkarê we ye, bo wê yekê jî berbirî alîkarîya wî bin. Gumana xwe bidine ser Wî, çimkî eger hûn tenê bimînin, hûnê nikaribin nava dijwarîyada ser bikevin.

PÊWÎSTÎYA JÎYANE

Bona bawarmend fikirdarîya rast pêwîstîya jîyane ye, bêyî kîjanê meriv nikare bijî. Ew mînanî dil e, yê ku lêdixê, yan jî xwîna damaradane, bêyî kîjana meriv nikare bijî.

Çend sal pêşda, Xwedê ev rastî nîşanî min da ya ku derheqa wê yekêdane, ku bi rêya duakirinê û xeberê çawa pêwendîya xweye şexsî tevî Wî çê bikim. Nava jîyana minda wî alîda hemû tişt nava qeyde-qanûnekî berkda bû, heya ku Xwedê pêwîstîya wanaye jîyane nîşanî min da. Çawa ku tendurustîya min lêxistina dilê min û dereca xwînêva girêdayî ye, usa jî halê minî ruhanî bi wî wedeyîva tê qirarkirinê, kîjanî ez tevî Xwedê, bi qanûnî û kardarî, derbaz dikim.

Wextê ku min fem kir, wekî pêwendîya min, ya tevî Wî, pêwîstîya jîyane ye, wî çaxî nava jîyana xweda min ew yek danî cîyê ewlin. Hema wî cûreyî jî, wextê ku min fem kir, wekî fikirdarîya rast kemala jîyane ye bona jîyana serkeftî, min destpê kir diha bi qewat nêzîkî wan fikira bibim çî ku difikirim, û min destpê kir diha fesal fikirên xwe bibijêrim.

FIKIRÊN WE ÇI CÛREYÎNE, HÛN JÎ USANIN

“Yan darê bikine ya saxlem [qenc] û berê wê jî [qenc], yan darê bikine ya bêkêr [nexweş, xirab] û berê wê jî bêkêr [nexweş, xirab], çimkî dar ji berê xwe tê kifşê, naskirinê û gunehkarkirinê”

Metta 12:33, AMP

Încîlêda tê gotinê, wekî dar ji berê xwe tê naskirinê.

Ew yek usa jî derheqa jîyana medane. Berê fikira jî heye: eger fikirên we başin, jîyana we wê berên baş bide, lê eger fikirên we xirabin, jîyana we wê berên xirab bide.

Çawa mînak (mesele), em dikarin nêzîkbûna mêrîve hindava tiştêkîda lê binihêrin û bibînin, wekî jîyana wîda fikir ser her tiştîranin. Çawa li cem merivê qenc fikirên xirab û heyfhildanê tunene, usa jî li cem merivên xirab fikirên qenc û hizkirinê tunene.

Gotinên Silêmane 23:7 bîr bînin û îzinê bidin, wekî ew nêzîkî jîyana we bibin: hûn ewin, çî ku dilê xweda difikirin. Ez gelek cara vê gotinê diwekilînim: “Fikir dibe kîderê, meriv jî wî alîda diçe”.

Serê
3-a

Teslîm nebe

Teslîm nebe

Ew yek girîng nîne, ku qewilên jîyana we çiqas xirabin, û fikirên we nava halekî çiqas xirabdanin. Çi jî hebe teslîm nebin. Wan cîya dagir bikin, yên ku mîrêcin ji we dizîne. Eger pêwîst e, wî çaxî bi gavên biçûk careke mayîn topraxên xwe dagir bikin, gumana xwe bidine ser kerema Xwedê. Necêribînin ku hûn bi qewata xwe bighîjine feydayên ku hûn dixwezin.

“Û bila dilên me zeyîf nebin û wextê qencîkirinê û rast kirinê aciz nebin, çimkî wextêda û wedê kifşkirîda emê biçinin, eger em zeyîf nebin û bêqewat nebin.”

Galatî 6:9, AMP

Nava Galatî 6:9-da Pawlosê Şandî mera dibêje ku em nesekinin. Nebine yekî usa, yê ku bi hêsanî kar nîvcî dihêle. Ji ew ruhê kevine ku “teslîm dibe” dûrkevin. Xwedê merivên usa digere, yên ku hetanî dawîyê wê tevî wî temamiya rê derbazbin.

HERINE HETANÎ DAWÎYÊ

“Wextê ku tu nava avara derbaz bibî, Ezê tevî te bim, û nava çemara ewê ser te nekevin. Wextê ku nava agirra derbaz bibî, tê neşewitî û ne jî bikizirî”.

Îşaya 43:2, AMP

Nava jîyanêda hûn rastî çî halî jî bèn, ez bangî we dikim, ku hûn hetanî dawîyê herin û teslîm nebin.

Nava pêxembertîya Hebaqûqêye 3:19-da tê gotinê, wekî bona wê yekê nigên mêriv yên mînanî kara xezalê bin, (yên ku dikarin bêyî dijwarîya nava çiyada banzdin) em gerekê “...gava biavêjin [ne ku tirsîyayî rûnên, lê gava biavêjin] û li cîyên xweye bilind bighîjine pêşkeftinê [ya ruhanî], [nava pîrsa cabdarîyê, yan zêrandinêda, yan jî pîrsgirêkada]” (AMP).

Bona gihîştina pêşkeftina ruhanî pêwîst e, ku Xwedê tevî me be, û alî me bike, me qewat bike û piştgirîyê bide me, bo ku demên diyarda em nesekinin.

Teslîmbûn hêsa ye, lê bona çûyîna heya dawîyê bawarî lazîm e.

BIJARTIN YA WE YE

“Ez îro gazî erd û ezmên dikim, çawa şedên dijî we, wekî Min jîyan û mirin danî li ber we, dua û nîfir: dêmek jîyanê bibijêre bo ku tu û nîfşa te bikaribin bijîn”.

Q. Ducarî 30:19, AMP

Em her roj bi hezara fikira qebûl dikin, feqet fikira me hewca çêkirinê ye û ew gerekê bi Ruhê Xwedêva bê çêkirinê. Em awqasî bi fikirên fîzîkîva (yên vê dinîyayê) tijîbûyîne, wekî nava pîrsa fikira bona tiştên şaş em cedandina nadine xebatê.

Ji alîkî mayînva, em gerekê bi cûrê fikirmîşbûyî fikirên rast bibijêrin. Û eger em dixwezîn ku fikira Xwedê li cem me hebe, wî çaxî em gerekê fikirên rast bibijêrin û ew yek gerekê her dem berdewam bibe.

Eger em texmîn dikin, wekî şerkarîya fikirê gelekî dijwar e û em nikarin ser bikevin, wî çaxî pêwîst e fikira wî cûreyî biavêjin û tenê derheqa serkeftinêda bifikirin. Em ne tenê gerekê derheqa serkeftinêda bifikirin, lê usa jî gerekê qirarkin ku teslîm nebin. Eger fikira me bi şikberîya û tirsava tijîbûyî ye, wî çaxî em gerekê qewîn bisekinin û bêjin: “Ezê t’u cara teslîm nebin. Xwedê li rex min e. Ew min hiz dîke û alî min dîke”.

Nava jîyana meda me gelek birîyar (qîrar) qebûl kirine. Nava Q. Ducarî 30:19-da Xwedê dibêje cimeta Xwe, wekî Ewî jîyan û mirin danîye pêşîya wan û temî daye, ku jîyanê bibijêrin. Feqet nava Gotinên Silêman 18:21-da tê gotinê: “Jîyan û mirin bin serwêrîya zimandanin, û ewê ku teslîmî wê be, wê ji berê wê buxwe” (AMP).

Fikirên me dibîne karên me. Bo wê yekê jî bijartina fikirên ku

jîyanê pêşda tînin, pêwîstîya jîyane ye. Eger em usa bikin, ji devê me wê xeberên rast derbikevin.

TESLÎM NEBE

Wextê ku tê texmînkirinê, ku şerkarî bêdawî ye û tu difikirî ku tê binkevî, bîr bîne, wekî tu şuxulkarîya guhartina fikira vê dinîyayêra derbaz dibî, piştî kîjanê tê destpê bikî usa bifikirî, çawa ku Xwedê difikire.

Ew yek çawa tiştê nebûyîne tê texmînkirinê?... Na xêr.

Dijwar e?... Belê.

Feqet qasekê bifikire, wekî Xwedê alîyê te ye. Ez gumanim, wekî Ew “progiramiştê kompyûtêrayî” herî baş e. (Fikira we mînanî kompyûtêrê ye, kîjanêda qutîya înfirmasıyayên kevin heye). Xwedê di nava weda kar dike, û eger hûn Wî dewat (teglîf) bikin, ku Ew fikirên we kontrol bike, Ewê wê yekê bike û wê progirama fikira we bide guhartinê. Hûn gerekê hevkarîya tevî Wî berdewam bikin û teslîm nebin.

Bona derbazbûna vê şuxulkarîyê, bêguman, wê wede lazim bibe, û ewê hêsa nîbe, feqet bi bijartina fikirdarîya Xwedê hûn li ser rîya rast bin. Çawa jî hebe hûnê wedê xwe li ser tiştê xerc bikin, wî çaxî bo çi îşe kardarva mijûl nebin, yê ku dikare heta-hetayê halê jîyana weyî tevlihevbûyî bide helkîrinê.

PAŞDA Vegerin û Tabîya Xwe Bigerin

“Xudan Xwedêyê me li Horêbê mera xeberda, got: “Hûn gelekî dirêj li ser vî çîyayî man. Paşda vegerin û herine welatê çîyayê Emorîya...”

Awa ew welatê ku min daye we: bikevinê û wî welatî hildin, yê ku Xudan kal-bavên we, Biraîm, Îshaq û Aqûbra sond xwer, ku wî erdî bide wan û peyî wanra jî zureta wan””.

Q. Ducarî 1:6-8, AMP

Nava Q. Ducarî 1:2-da, Mûsa dibêje îsrayêliya, wekî heya sînorê Kenanê (welatê Sozdayî) rêya 11 roja ye, lê çûyîna li wir 40 salî kişand. Paşê xebera 6-ada Mûsa dibêje wan: “Xudan Xwedêyê me li ser Horêbê mera xeberda û got: “Hûn gelekî dirêj li ser vî çîyayî man”.

Gelo hûn gelekî dirêj hema li ser wî çîyayî nemane? Gelo we 40 sal derbaz kirine û we cêribandîye, ku nava rêya 11 rojeda ser bikevin?

Nava jîyana minda ez rojekê hişyar bûm û min fem kir, wekî ez t’u cîyekîda nediçûm. Ez mesîhîyî bûm, ya bêyî serkeftin. Mînanî Mêriyê û Con, li cem min jî gelek fikirên şaş û kelayên fikirdariye çêkirî bi sala hebûne. Mîrêcin ez xapandibûm, min jî bawariya xwe li wî anîbû. Dêmek ez bi jîyana xapîyayîva dijîtim.

Ez gelekî dirêj li ser wî çîyayî mabûm û min 40 sal derbaz kiribûn, û ew wede dikaribû diha kurt bûya, eger min rastîya Xebera Xwedê bizanibûya.

Xwedê nîşanî min da, wekî îsraêlî rûyê “fikirdariya çolêda” li qûmistanê man, ya ku fikirdariya şaş bû û ew nava diltîyêda xweyî dikirin. Nava serê kitêbêyî mayînda emê derheqa wê yekêda xeberdin. Lê niha îzinê bidin ez piştgirîyê bidime we, ku hûn qirara rast bona çêkirina fikira xwe qebûl bikin û fikirên rast bibijêrin. Bi îzbatî fikira xweda qirarkin, wekî hûnê t’u tiştî nîvcî nehêlin û teslîm nebin, heya hûn bighîjine serkeftina kamil û wê yekê hildin, çî ku bi qanûnî çawa mîrasa we tê hesabê.

Serê
4-a

Hindik-hindik

Hindik-hindik

Çêbûna fikira we wê hindik-hindik biqewime, usa ye hûn gerekê gumana xwe nebirin, eger pêşdaçûyîna we hêdî bê texmînkirinê.

Pêşîya ketina li “Welatê Sozdayî” Xwedê gote îsraêliya, wekî Ewê dijmina hindik-hindik ji ber wan raqetîne, bo ku “terewilên çolê” li ser wan zêde nebin.

Ez difikirim, wekî ji wan “terewila” yek kubarî ye û ewê li ser me awqasî bimîne, eger em azayê lez dest neynin. Diha baş e nava govekekêda bighîjine azayê, paşê ya mayînda, û usa peyî hev. Wî çaxî emê azaya xwe diha zêde qîmetkin û fem bikin, wekî ew pêşkêşa ji Xwedê ye û ne ku tiştêkî usa ye, ku me bi qewata xwe dest anîye.

“Û Xudan Xwedêye te hêdî-hêdî wê van mileta ji ber te raqetîne. Tu nikarî wana carekêra unda bikî, wekî “terewilên çolê” li ser te zêde nebin”:

Q. Ducarî 7:22

PIŞTÎ ZEHEMETÊ AZAYÎ TÊ

“Lê Xwedêye temamiya keremê [yê ku hemû dua û xweşiyê dide], Yê ku bi Mehsî hûn gazî rûmeta xweye heta-hetayê kirine, piştî hinek cefadîtinêra wê bi Xwe we kamil bike, bişidîne, qewat bike, xweyîbingeh bike”.

A Petrûs 5:10, AMP

Bona çî gerekê em “bi wedê hindik” cefê bibînin? Ez difikirim, wekî ji wî çaxîda destpêkirî, wextê ku em pirsgirêka heyî fem dikin, em mecbûr dibin pêşîya azabûna ji wê pirsgirêkê cefê bibînin. Feqet gelekî şa dibin, wextê ku peyî wî hemû tiştîra ew azayî tê. Wextê ku em dicêribînin bi xwe ser bikevin, em diteribin, û peyî wê yekêra fem dikin, wekî gerekê ji Xwedê hîvîya alîkarîyê bin. Wextê ku em dibînin, ku Îsa wê yekê çawa dike, çî me nikaribû bi qewata xwe bikira, wî çaxî dilê me bi razibûnê û rûmetêva tijî dibe.

DÎWAN NABE

“Dêmek, niha îdî dîwana wan nabe, yên ku tevî Îsa Mesîh bûne yek, yên ku bi gotina bedenê (qalib) najîn, lê bi gotina Ruh dijîn”.

Romayî 8:1, AMP

Eger tu li ber çetinaya û halên dijwar sekinîyî, t’u dîwanekê qebûl neke: rabe xwe dawêşîne û ji nûva destpê bike. Wextê ku zarok detspê dike hînî gerê bibe, ew awqasî dikeve, heya ku destpê dike wê lezeta gerê li ser xwe guman texmîn bike. Feqet derheqa zarokada meriv dikare bêje, wekî eger ew dikevin, peyîra hinekî digrîn, lê çawa jî hebe ew dîsa radibin û dîsa dicêribînin.

Mîrêcin wê qewatê nehêvşîne, ku nava karê teyî çêkirina fikirêda te bide sekinandinê. Ew zane, wekî kontrolkirina te wê wî çaxî ser hevda bê, wextê ku tu destpê bikî fikirên rast bibijêrî û fikirên şaş înkâr bikî. Ewê bicêribîne bi rîya birîna gumanê û dîwanê te bide sekinandinê.

Wextê ku dîwan tê, “sîlihê Xeberê” bide xebatê. Romayî 8:1-ê bîne bîra mîrêcin û xwe, wekî tu ne ku “bi gotina bedenê”, lê bi gotina “Ruh” dijîyî. Wextê ku hûn bi gotina bedenê dijîn, hûn wî çaxî xweva girêdayîne, lê wextê ku hûn bi gotina Ruh hemû tiştî dikin, wî çaxî hûn Xwedêva girêdayîne.

Wedê bêaçixîyê wê bê, çimkî ewê bibe, lê ew yek nade kifşê, wekî hûn neaçixin. Ew yek dide kifşê, wekî hûn nava hemû tiştîda kamil nînin. Em hemû jî gerekê wê yekê qebûlkin, wekî tevî alîyên meye qewat usa jî alîyên meye zeyîf hene. Awqasî îzinê bide Mesîh, ku nava zeyîfîya teda te bide qewatkirinê. Îzinê bide Wî, ku Ew wextê dijwarîya bibe qewata te.

Ez diwekilînim, t’u dîwanekê qebûl neke. Serkevtina teye kamil wê ese bê, lê ewê nava wededa bibe, çimkî ewê “hindik-hindik” bê.

GUMANBIR NEBIN

“Çima nav minda niqo dibî, ruhê min? Çima tu gerekê nav minda bikî nelîn û nerihet bî? Gumana xwe li Xwedê bîne û her dem hîvîya Wî be, çimkî ezê hela hê pesinê Wî bidim, Xilazkirê xwe û Xwedêyê xwe”

Zebûr 42:5, AMP

Gumanbirî gumanê tune dike û bi wê yekêva tevayî mîrêcin her dem dixweze me gumanbir bike, çimkî bêyî gumanê emê teslîm bin. Încîl her dem ber dilê meda tê, ku em gumanbir nebin û netirsîn. Xwedê zane, ku eger em gumana xwe unda bikin, serkevtina me wê tunebe. Bo wê yekê jî Ew her dem piştgirîyê dide me û dibêje: “Gumanbir nebin”. Xwedê dixweze, ku em gumanbir nebin, lê bi gumanêva tijîbin.

Wextê ku te gumana xwe unda kirîye, yan jî ketî bin dîwanê, fikirên xwe guvtugo bike. Binihêre ku fikirên çawa serê teda hene. Gelo ew vî cûreyîne?: “Ezê nikaribim vê yekê bikim, ew gelekî dijwar e. Ez her dem diteribim, hemû tişt dîsa usa ye, û wê t’u cara neyê guhartinê. Ez li ser xwe gumanim, wekî nava jîyîna yên mayînda çêbûna cûrê fikirdarîyê awqasî dijwarîya pêşda nayne. Wê diha baş bibe, ku ez teslîm bibim. Ji cêribandinê ez îdî westîyayî me, ez dua dikim, lê tê texmînkirinê, wekî Xwedê nabihê. Diqewime Ew ji min gelekî aciz bûye, çimkî Ew bersiva duayên min nade”.

Eger serê weda fikirên wî cûreyî hene, wî çaxî tiştê ecêbmayîne nîne, wekî hûn gumanbirîne, yan jî ketine bin dîwanê. Bîr bînin, wekî hûn usanin, çawa ku difikirin. Eger hûn tiştên xirab bifikirin, hûnê gumanbirbin. Eger hûn fikirên gunehkarkirinê qebûlkin, hûnê bêne gunehkarkirinê. Fikirdarîya xwe biguhêrin û azabin. Dewsa fikirên xirab vî cûreyî bifikirin: “Baş, qewimandin hinekî hêdî pêşda diçin, feqet, şikir ji Xwedê, li cem min hinek pêşkeftin heye. Ez gumanim, wekî ez li ser rîya rastim, ya ku berbi azadîyê rêberîyê li min dike. Ez zanim, wekî roja mine duh gelekî xirab bû, çimkî temamîya rojê min fikirên xirab qebûl kirine. Bavo, min bibaxşîne û alî min bike, bona ku ez pêşda bilivim. Min şaşî kirîye, lê ezê îdî t’u cara şaşîyê nekim. Îro

roja nûye. Xwedê, Tu min hiz dikî û rehma Te her roj çê dibe. Ez ji gumanbirîyê û gunekarkirinê paşda disekinim. Bavo, Încîlêda nivîsar e, ku Tu min gunehkar nakî. Te Îsa şandîye ku bona min bimire, ku li cem min hemû tiştê baş be. Îro Tu alî min dikî, ku ez fikirên rast bibijêrim: bona min wê roja baş bê”.

Ez gumanim, wekî hûn ji van fikirên baş û yên ku li Xwedê xweş tîn, hûn serkeftinê texmîn dikin.

Em hiz dikin, ku hemû tiştî carekêra bistînin. Nava meda berê sebirê heye, feqet em gerekê îzinê bidin, ku ew bê kifşê. Carina wedê dirêj tê xwestinê, ku Xwedê berbi azadîyê rêberîyê li me bike. Ew demên diyarda bawariya me dide xebatê, bona ku xebata sebirêye baş nava meda bide mîyaserkirinê û qewînkirinê (binihêre Aqûb 1:4 KJV).

Wedê Xwedê kamil e. Ew t’u cara derengî nakeve.

Awa fikireke mayîne baş, kîjanê meriv dikare bîra xweda xweyke: “Û ez vê yekêda gumanim, Ewê ku dilê weda destbi şuxulê xweyî qenc kirîye, û dike, û firqî tune, ku ez çî texmîn dikim, yan jî hal çî cûreyî ye: Xwedê karekî gelekî baş nava minda despê kirîye û Ewê kamiliya Xwe bihîne sêrî” (binihêre Filîpî 2:13,1:6).

Hema vî cûreyî hûnê bikaribin bi cûrê baş sîlihê Xeberêyî bona we dayî bidine xebatê û kelayên dijmin xirab bikin. Ez şewirê didime we, wekî ne tenê tiştên rast bifikirin, lê tiştên hê zêde bikin û bi dengê bilind bihebînin.

Bîra xweda xweykin, wekî Xwedê hêdî-hêdî azad dike, dêmek wekî şaş dibin, gumanbir nebin û teslîmî gunehkarîyê nebin.

Hindava xweda sebirkir bin.

Serê
5-a

Optîmîst be

Optîmîst be

Fikirên baş jîyana me baş dikin, lê yên xirab xirab dikin. Fikirên baş her dem bi bawariyê û gumanêva tijîne, lê fikirên xirab bi tirsê û şikberiyêva. Hinek ji heyîna gumana tiştêki ditirsin, çimkî nava jîyana xweda gelekî zêriyane. Ew aciz bûne û nefikirîne, wekî wê bikaribin hindava acizbûnekê jî serbikevin. Ew e menî, wekî ew gumanê înkâr dikin bona ku careke mayîn wê aciziyê nebînin.

“...Bo te wê usa be, çawa ku tu bawar dikî.

Metta 8:13, AMP

Xwedûrgirtina ji gumanê cûrekî xweparastina ji êşê ye, lê acizbûn êşê pêşda tîne. Bona ku careke mayîn wê êşê nebînin, gelek meriv gumanê, yan jî bawariyê înkâr dikin, bona wê yekê, wekî nava jîyana wanda wê tiştêki baş bibe. Kirina wî cûreyî nêzîkbûneke xirab pêşda tîne. Nava jîyanêda li ber çevê mêriv hemû tişt xirab kifş dibe, çimkî fikir yên xirabin. Bir bînin, ku nava gotinên Silêman 23:7-da çi tê gotinê: “Çimkî ew çawa dilê xweda difikire, bi xwe jî usa ye...”.

Gelek sal pêşda ez merivekî gelekî xirab bûm. Wî çaxî mejûyê min ji du fikirên baş zêdetir, fikirên başqe qebûl nedikirin. Temamiya filosofiya min ev bû: “Eger tu hîvîya t’u tiştêki baş nînî, wî çaxî tê aciz jî nebî bo ku ew tişt neqewime”.

Ez gelek cara acizbûyî bûme. Nava jîyana minda awqas qezîya qewimîne, rûyê kîjanada ez ditirsîyam bifikirîyama, wekî dikaribû tiştêki baş bibûya. Ez gelekî xirab nêzîkî her govekeke jîyana xwe dibûm. Fikirên min çi cûreyî xirab bûn, wî cûreyî jî gotinên min bûn, lê pêra jî jîyana min usa bû.

Min destpê kir Qirara Xwedê lêkolîn bikim û min bawariya xwe li Xwedê anî. Tiştê ewlin ku min fem kir ew bû, wekî fikirên xirab ji min dûr diketin.

Metta 8:13-da Îsa dibêje me, wekî nava jîyana meda wê wî cûreyî be çawa ku em difikirin. Nava tercima King Cêymse Încilêda tê gotinê:

“...te çawa bawar kirîye, usa jî hatîye pêşîya te”. Min bawarîya xwe li tiştên xirab anîye û rûyê wê yekêda jî gelek tiştên xirab nava jîyana minda qewimîne.

Ew yek nade kifşê, wekî em dikarin tenê bi fikira derheqa wan tiştada hemû tiştî bistînin. Bona her yekî progirama Xwedêye kamil heye û em nikarin bi fikrên xwe, yan jî bi gotinên xwe Xwedê control bikin. Feqet em gerekê anegorî xwestina Wî û progirama bona me bifikirin û xeberdin.

Eger hûn nizanin, wekî nava vî karîda xwestina Xwedê bona we kîjane, wî çaxî vî cûreyî bifikirin: “Baş, ez progirama Xwedê nizamim, lê ez zanim, wekî Ew min hiz dike. Ew çi jî bike, wê bona min qencbe û nava jîyana minda wê duayê Xwe bîne”.

Destpê bike jîyana xwe bi cûrê baş binihêre.

Bixebite nava hemû halîda bi cûrê baş bike. Nava jîyana teda çi tiştê xirab biqewime jî, hîvîya Xwedê be, û Ewê başîyê bike, çawa ku soz daye.

HER TIŞTEKÎ BAŞRA DIBE HEVKAR

“Em gumanin û zanin, wekî [Xwedê, bi bûyîna hevkarê nava xebatêda] her tiştîda dişuxule û [anegorî progiramê] qencîyê bona wana dike hevkar, yên ku Xwedê hiz dikin û anegorî merem û progirama Wî hatine gazîkirinê”.

Romayî 8:28, AMP

Nava vê beşêda nayê gotinê, wekî hemû tişt qenc e û baş e, lê tê gotinê, wekî hemû tişt qencîyêra dibe hevkar.

Werin em bînin ber çavê xwe, wekî hûn hazir dibin hinek tişt bikirin. Hûn dikevî avtomaşîna xwe, lê ew naxebite. Nava vî halîda du cûrên fikirê hene: hûn dikarin bêjin: “Ez zanim, wekî ezê biteribîyama, çimkî li cem min her dem usa dibe. Her car, wextê ku ez dixwezim tiştêkî bikim, hemû tişt tevlihev dibe. Ez difikirim, wekî nava kirîna tiştada jî ezê dîsa biteribim û nava hemû progiramên minda

usa diqewime”. Yan jî hûn dikarin bêjin: “Min dixwest ez biçûma dikanê, lê tê bêjî ez nikarim wê yekê niha bikim. Baş, ezê diha dereng, piştî çêkirina avtomaşînê herim. Ez gumanim, wekî guhartina nava progiramên mînda wê bo min diha baş be. Diqewime menî heye, wekî ez îro li malê bimînim, usa ye ez dikarim wedê xwe derbaz bikim”.

Romayî 12:16-da Pawlosê Şandî bangî me dike, ku bi hêsanî meriva û halên pêşdhatî qebûlkin. Fikira van xebera ew e, wekî em gerekê merivên usa bin, yên ku paşda venakişin, wextê ku nava jîyana wanda progiramên wan mîyaser nabin.

Van axirîya mecaleke baş bon min pêşda hat, ku ez vê prînsîpê pratîkayêda bidime xebatê. Ez û Dêyv li Florîdayê, li Lêyk Wortê bûn. Li wir me sê roja berevbûn derbaz kirin û piştî serhevdaanînê em hazir dibûn eşîyayên xwe berev bikin û paşda vegerin. Min qîrar kiribû şalê cûrê avropî, blûz, xwebikira û solên nimiz pêkirana, bona ku li rê min xwe sivik texmîn bikira.

Min destpê kir kinca xwe bikim, lê min nikaribû şalê xwe bidîta. Em li her cîya digerîyan û paşê me ew li dexila jêrinda dît. Şal ketibû jêrê û gelekî qerçimî bû. Li cem min ûtoya rêwîtiyê hebû û min cêriband ûto bikim û wextê ku min xwe kir, min dît, wekî bedew nîne: ez mecbûr bûm tiştêkî mayîn xwe bikim û solên bilind pêkim.

Rûyê halê pêşdhatîda beşera min xirab bû. Nava jîyana meda usa jî dibê: wextê ku em wê yekê nastînin, çi ku em dixwezin, texmînkirînin me serê xwe bilind dikin û dicêribînin me bikine nava halekî xirab. Min carekêra fem kir, wekî gerekê birîyar bikim: yan ez gerekê hêrs biketama, çimkî ew yek usa nebû, çawa ku min dixwest, yan jî ez gerekê wî halîra qayîl bûma, ew hal hesab hilneda û lezeta rêwîtiya xwe bidîta.

Nava jîyana merivên optîmîstda jî tiştên usa diqewimin, wextê ku hal usa nabe, çawa ku ew dixwezin. Feqet ew dikarin kemala mezin nedine wê yekê û birîyara berdewamkirina jîyanê qebûlkin, nenihêrî wê yekê, ku çi diqewime. Feqet merivê pîsîmîst (yên ku xirab difikirin) usa nakin. Hewaskarîya merivê wî cûreyî nikare hebe. Nava her karekî wîda “awirên reş berev dibin”. Nava wîda texmînkirina “giranîya” hundur heye û ew her dem nerazîye, bin pozê xweda dike

pinte-pint û gunehkar dike. Firqî tune, ku dora wî çiqas tiştên baş dibin, çawa jî hebe merivê pîsîmîst her dem tişteki dibîne û nava wêda pîrsgirêka dibîne.

Wextê ku ez gelekî pîsîmîst bûm, ez dikaribûm biketama malên merivaye tezeçêkirî û dewsa xeberdana derheqa dor-berên başda, min dikaribû li ser dîwara kêmasî bidîtana, yan jî tişteki mayîn. Feqet niha ez awqasî şa me, wekî Îsa ez aza kirime û karebûn daye min, ku ez hemû tiştên başe nava jîyanêda bibînim. Ez gumanim, wekî bi gumanê û bi bawariya hindava Xwedê da, tiştê xirab dikare bibe yê baş, her tişt dikare bibe hevkarê qencîyê.

Eger tu meriveki pîsîmîstî, nekeve nava gunehkarkirinê, çimki gunehkarkirin bi xwe tişteki xirab e. Ev hemû tişt wera gilî dike, bona ku hûn pîrsgirêka xweye nava pîsîmîstîyêda nas bikin û destpê bikin gumana xwe daynine li ser Xwedê, Yê ku dikare we biguhêre: bi cûrê xirab nêzikî pîsîmîstîya xwe nebin.

Rêya azabûnê ji wî çaxîda destpê dibe, wextê ku em pîrsgirêkê bêyî xweafûkirinê qebûl dikin. Ez gumanim, wekî eger hûn meriveki pîsîmîstin, wî çaxî menîya wî hemû tiştî heye, lê ew menî jî her dem heye. Feqet bîr bînin, wekî anegorî Încîlê, çawa mesîhî hûn niha meriveki nûne.

ROJA NÛ

“Awa, eger yek li ser [Mesîh] hatîye çêkirinê, ew meriveki nû ye [bi temami efrînekî nû ye]: tiştên kevin [halê morali û ruhanîyi berê] derbaz bû, çû. Awa, yên nû hatin”.

B Korintî 5:17, AMP

Çawa “merivê nû” tu gerekê îzinê nedî, wekî tiştê berê qewimî hukumê xweyi berêyi xirab nava jîyana weye nûda, ya nava Mesîh da, berdewam bike. Hûn niha meriveki nûne û dikarin fikira xwe anegorî Qirara Xwedê çê bikin. Û nava jîyana wêda tiştên baş wê biqewimin.

Şa bibin, eva rojeke nû ye

XEBATA RUHÊ PÎROZ

“Çawa jî hebe, Ez rastîyê dibêjime we, wekî bona we hê baştir e [baş e, kardar e, dest dide] ku Ez herim. Çimkî eger Ez neçim Piştovan [Şêwirdar, Alîkar, Advokat, Xêrxwez, Qewatkir, Piştgir] wê neyê cem we [bo ku pêwendîya nêzîk saz bike], lê eger Ez herim, Ezê Wî bişînim cem we [ku tevî we pêwendîya nêzîk çê bike]. Gava Ew bê, Ewê gunehên merivên dinîyayê bide rûyê wan, heqîyê-neheqîyê li ber wan veke [paqijaya dil û mafê tevî Xwedê] û dîwana Xwedê wanwa eyan bike”.

Yûhenna 16:7,8, AMP

Azadbûna ji pîsîmîstîyê (fikirdarîya xirab) wî çaxî gelekî dijwar e, wextê ku tu rû bi rû li ber rastîyê disekinî û dibêji: “Ez pîsîmîstim (fikirdarê xirabim), lê ez dixwezim bême guhartinê. Ez bi xwe nikarim bême guhartinê, lê ez bawarim, wekî Xwedê dikare, eger ez gumana xwe bidime li ser Wî. Ez zanim, wekî bona wê yekê wede lazim e, lê çi jî hebe ezê gumanbir nebim. “Xwedê dilê mînda şuxulê qenc destpê kirîye û Ew dikare wî şuxulî bighîne sêrî” (Fîlîpî 1:6).

Ji Ruhê Pîroz hîvî bikin, ku Ew her car we gunehkar bike, wextê ku hûn nêzîkbûna xirab didine kifşê. Ew yek beşeke (pareke xebata Wî ye). Gotinên Mizgîniya Yûhennaye 16:7. 8 me hîn dikin, ku Ruhê Pîroz gunehên me bide kifşê, ku em kirina xweye xirab fem bikin û usa jî bide kifşê, ku bi çiqasîva em heqin. Wextê ku hûn wê yekê ji Ruhê Pîroz bistînin, wî çaxî jî Xwedê hîvî bikin, ku Ew alî we bike. Nefikirin, wekî hûn dikarin bi xwe xwe biguhêrin: hindava Wî da guman bin.

Wextê ku ez gelekî xirab difikirîm (pîsîmîst bûm) Xwedê ez dame femkirinê, ku eger ez gumana xwe bidime li ser Wî, Ewê alî min bike, ku ez bibime optimist (baş bifikirim). Nava jîyana mînda gelek halên dijwar hebûne, wextê ku min cêribandîye tenê fikirên baş qebûl bikim. Feqet min ew yek alt kir û niha ez pîsîmîstîyê qebûl nakim. Ew yek tê bêjî mînanî mesela merivê cigarekêş e. Piştî wedekî dirêj, merivên ku berê cigare kişandine, îdî nikarin cigare qebûl bikin. Ew yek usa jî rastî min hat. Bi salên dirêj min cigare dikişand, lê piştî terkdayîna cigare ez bîna cigare qebûl nakim.

Nêzîkbûna wî cûreyî usa jî hindava pîsîmîstîyê da ye. Ez bi xwe meriveke gelekî pîsîmîst bûme. Niha ez nikarim t'u tiştêkî xirab qebûl bikim: ew yek tê bêjî min bêhurmet dike. Ji wê demêda destpêkirî wextê ku ez ji fikirdariya xirab aza bûme, nava jîyana xweda min gelek guhartinên baş dîtine û hema ev e menî, wekî ez dijî (miqabilî) her tiştêkî xirabim.

Ez bi xwe bi çevên hişyar hemû tiştî dinhêrim û ez wera jî dibêjim, ku hûn wî cûreyî bikin. Eger hûn nexweşin, nebêjin: “Ez nexweşim nînim”, çimkî ew yek nerast e. Hûn dikarin bêjin: “Ez bawarim, wekî Xwedê min qenc dike”. Hûn gerekê nebêjin: “Diqewime ez li nexweşxanê diha xirabtir bim û nexweşxanêda bimirim”. Dewsa wê yekê bêjin: “Qewata Xwedêye qenc hema niha min qenc dike. Ez bawarim, wekî ezê qencbim”.

Eger hûn bi cûrê rast rastîyê binihêrin, hûnê bi cûrê rast bişuxulin. Gelek cara, eger rastîya me li ber çevê me xirab tê kifşê, em dikarin nêzîkbûna baş hindava wê yekêda bidine kifşê. Bona her qewimandinekê fikira xwe her dem xweykin, bi bawarkirina wê yekê, wekî Xwedê wê her tiştî bike hevkar qencîyê.

FIKIRA QAYÎL

“Feqet evana diha zelal û paqij bûn, ne ku ewên ku li Têsalonîkê bûn, wekî xebera Xwedê bi dil û can qebûl kirin û her roj Kitêb lêkolîn dikirin, ka ev tişt usa ye?”.

Karên Şandîya 17:11 KJV

Încîlêda tê gotinê, wekî fikira meye qayîl gerekê hebe. Ew yek dide kifşê, wekî fikira meye usa gerekê hebe, ya ku çî cûreyîbe jî, wê bona xwestina Xwedê vekirîbe.

Îzinê bidin, ez meselekê ji jîyana jineke cahil bînime ber çeva, ya ku min pêşda nas dikir. Nişankirina (mêrkirina) wê açix nîbûye. Ew jina cahil û dergîstîyê wê dua dikirin, ku bizanibûna, ku gelo ew yek xwestina Xwedê ye, ku ew rastî hevdu bîn, yan na, nenihêrî wê yekê, wekî wana hela hê qirar nekiribûn şayî bikirana. Ew jina cahil dixwest, ku pêwendîyên (eleqetên) wana berdewam bûna, gumana wê

hebû û ewê bawar dikir, wekî dergîstîyê wê wê têlêfon bike û bêje, ku ew jî wî cûreyî texmîn dike.

Min şewir da wê, ku “fikira qayîl” gerekê cem wê hebe, çimkî hemû tişt dikaribû cûrekî mayîn bûya. Ewê jî min pirsî: “Lê gelo ewê nebe nêzîkbûna xirab?”.

Na xêr, wê nebe!

Nêzîkbûna xirab wê vî cûreyî bihata kifşê: “Jiyana min îdî ser hevda hatîye û t’u kes wê min begem neke. Ez binketîme û nava temamiya jiyîna xweda ezê feqîrbim”. Feqet nêzîkbûna baş wê vî cûreyî bê kifşê: “Ez gelekî xemgînim, wekî vî cûreyî qewimî, lê ez hazir dibim gumana xwe bidime li ser Xwedê. Ez gumanîm, wekî ez û hizkirîyê min, emê rastî hevdu bîn. Ezê bawarîya xwe li Xwedê binim û ezê hîvî jî Wî bikim, wekî pêwendîya me bê dasekinandinê, lê jî her tiştî zêdetir ez dixwezim, wekî nava jiyana meda xwestina Xwedêye kamil hebe. Eger hal usa jî nebe çawa, ku minê bixwesta, dîsa ez şa me, wekî ezê xilazbim, çimkî Îsa dilê minda dijî. Diqewime hinek wede dijwar be, lê ez bawarîya xwe li Xwedê tînim. Ez bawarim, wekî dawîyê hemû tişt wê bibe hevkarê qencîyê”.

Wextê ku fikira teye qayîl heye û wê yekêva tevayî nêzîkbûna baş tê xweykirinê, ew yek dide kifşê, wekî tu bi çevên rast li qewimandina dinihêrî.

Ez vê yekê hesab dikim çawa nêzîkbûna saxlem û balanskirî.

QEWATA GUMANÊ

“[Bona Biraîm menîya merivatîyê] guman nemabû, wekî ew dikare bibe bavê gelek mileta, çawa ku bona wî hatibû sozdayînê, wekî nîfşên te wê awqasî [bêhesab]bin.

Ew nava bawarîya xweda sist (zeyîf) nebû, ne halê qalibê xweda nihêrî, wekî îdî mîna mirîya bû, çimkî ew îdî nêzîkî sed salî bû, yan jî betîna Serayêye mirî nihêrî [hesab kir].

Ne bêbawarî û ne jî bêgumanî ew hindava sozê Xwedêda dudilî nekirin, lê ew bi bawarîya xwe diha qewat û zor bû, şikirîya xwe Xwedê anî”Romayî

Ez û Dêyv bawar dikin, wekî nava bedena Mesîhda, dêmek qulixa meye nava civînêda wê sal bi sal bighêje. Em her dem dixwezin çiqasî dikarin alî zêde meriva bikin. Feqet bi wê yekêva tevayî em fem dikin, wekî eger progirameke Xwedêye mayîn heye û eger dawîya salê li cem me zêdayî tunebe û hemû tişt mînanî berê bimîne, wî çaxî emê îzinê nedin, wekî ew hal me ji şabûnê miqûf bihêle.

Em bawarîya xwe li gelek tiştta tînin, lê ji hemû tiştî zêdetir em bawarîya xwe li Yekî tînin û ew Yek Îsa ye. Her dem nîne, wekî em pê dihesin, ku wê çi biqewime. Em zanin, wekî bona me hemû tiştê bibe hevkarê qencîyê.

Bi çiqasîva em optimist bin, bi awqasîva emê nêzikî Xwedê bin. Xwedê nava hemû tiştîda optimist e û eger em tevî Wî gava biavêjin, emê bikaribin optîmîst bimînin.

Nenihêrî wê yekê, wekî nava jîyana weda hemû tişt awqasî jî baş nîne û hûn vî cûreyî difikirin: “Coys, eger we halê me bizanibûya, hûnê li ser wê fikirê nîbûna, wekî ez dikarim optîmîst bim”. Meriv dikare gelekî hêsa wî çaxî optimist be, wextê ku hemû tişt baş e. Feqet wextê ku em bi optîmîstî halê xirab dinihêrin, wî çaxî ew yek bawarîya meye kamile hindava Xwedêda û gihîştina meye ruhanî tê kifşê, ya ku li Xwedê xweş tê û Wî rûmet dike. Ez bangî we dikim, ku hûn careke mayîn xeberên Romayî 4:18-20 bixwînin, kîjanada derheqa wê yekêda tê gotinê, ku Birahîm çawa kir, bi zanebûna hal û hesabildana bêqewatbûna qalibê xwe û betinê Seraêyî mirî. Nenihêrî wê yekê, wekî t’u gumaneke merivatîyê îdî tune bû, lê ewî ew guman bi bawarîyê dît.

Nêzîkbûna Birahîme baş hindava halên gelekî xirab hebû.

Îbranî 6:19-da tê gotinê, wekî guman bingeha ruh e. Guman ew qewat e, ya ku me mecbûr dike, ku em wextê cêribandinê sekinî bimînin. T’u cara gumana xwe nebirin, çimkî eger usa nîbe, hûnê jîyana xwe werguhêzî feqîrîyê bikin. Eger hûn rûyê tunebûna gumanêda bi jîyana bêbextva dijîn, wî çaxî destpê bikin gumanbin. Netirsin! Ez nikarim soz bidim, wekî hemû tiştê awqasî kamil be, çawa ku weyê bixwesta. Ez nikarim soz bidim, wekî hûnê t’u cara

aciz nebin. Feqet, hema wan çaxa jî, wextê ku acizî bê, hûn dikarin guman û optîmîzma xwe xweykin: xwe bavêjine nava padişatiya Xwedêye ecêb.

Nava jîyana xweda hîvîya ecêbê bin!

Hîvîya tiştên baş bin!

HÎVÎYÊ BIN, BONA KU BISTÎNIN...

BONA STENDINÊ HÎVÎÊ BIN

“Û bo wê yekê jî Xudan hîvîyê ye[hîvîyê ye, digere û divedîne]ku te bibaxşîne, û ew e menî, ku Ew Xwe bilind dike, bo ku hindava teda rehm be û rehmbûna Xwe nîşanî te bide. Xudan Xwedêyê heqîtîyê ye. Ew meriv duakirîne [bextewar, xwezilîne], yên ku [bi dil] hîvîya Wî ne, yên ku digerin û berbi Wî, berbi serkeftina Wî, hizkirina Wî, aşîtiya Wî û hevkarîya Wîye qewîn divedînin”

Îşaya 30:18, AMP

Ev xebera Încîlê bûye xebereke mine hizkirî. Eger em dora wê bifikirin ewê bibe kanîya gumanêye mezin. Nava vê beşêda Xwedê dibêje, wekî Ew yekî digere, ku bikaribe dilrehmîya Xwe nîşan bide, lê ew yek gerekê hêrsê û nêzîkbûna xirab nîşan nede. Ew gerekê usa be, yê ku hîvîyê ye, digere û divedîne, wekî Xwedê dilrehmîya Xwe nîşan bide.

TEXMÎNKIRINA XIRAB

Texmînkirina xirab çi ye?

Wextê ku min ji nûva destpê kiribû Xebera Xwedê lêkolîn bikim, rojekê, li himamê, wextê ku min porê xwe şe fikir, min texmîn kir, wekî nava atmosferayêda texmînkirineke gelekî xirab heye û tiştêkî xirab gerekê biqewime. Min guhdarî da ser û fem kir, wekî nava jîyana minda wê texmînkirîne gelek cara rêberî li min kirîye.

Min ji Xwedê pirsî: “Eva çi texmînkirin e, ya ku her dem li cem min heye?”.

“Texmînkirina xirab e”,-ev bû bersiv, ya ku Xwedê kire dilê min. Min kemala wê nizanibû û t’u cara derheqa wê yekêda nebihîstibû. Hinek wede şûnda min nava gotinên Silêman 15:15-da ev cumle dît: “Hemû rojên zêrîyayî û gumanbirîyê ji tiştên xirab pêşda tên (fikirên xemgîn û texmînkirina xirab), lê dilê kê şa ye, her dem nava şahîyêda ye, nenihêrî ku çi diqewime” (AMP).

Wî çaxî min fem kir, wekî jîyana min hîmlî rûyê fikir û texmînkirinên xirabda bûye jîyaneke feqîr. Belê, jîyana minda, bi rastî halên dijwar hebûne, feqet wî çaxî jî, wextê ku ew yek usa nîbûye, ez dîsa bêbext bûme, çimkî fikirên min yên xirab bûn û wana jîyan û karebûna dîtina rojên baş ji min didizîn. Hema wî çaxî jî wextê ku t’u tişteki xirab nedibû, min her dem texmîn dikir, wekî tişteki gelekî xirab gerekê biqewime. Hema rûyê wê yekêda min nikaribû jîyana xwe bi cûrê baş bijîta.

ZIMANÊ XWE JI XIRABÎYÊ DÛR BIGHIN

“Bila ew, yê ku dixweze jîyana xwe baş derbaz bike û rojên baş bibîne, [baş, rojên berbiçev bin], gerekê ziman û lêvên xwe ji xirabîyê û xayîntîyê (xayîntîyê, xapandinê)”aza xweyke.

A Petrûs 30:10, AMP

Nava vê xeberêda zelal tê gotinê, wekî jîtina jîyanê, dîtina rojên qenc, fikirdarîya baş û heyîna devê paqij bi hevva girêdayîne.

Firqî tune, ku nêzîkbûna we bi çiqasîva xirab e û çiqas wede ye, ku hûn nava wî halîdanin. Ez zanim, wekî hûn dikarin bêne guhartinê, çimkî ez îdî hatime guhartinê. Wê yekê ji Ruhê Pîroz wede û xebata hûre-hûr xwest, ya ku hêja bû bihata dayîne.

Ew yek wê usa jî ji we bê xwestinê: çi jî biqewime, gumana xwe bidine ser Xwedê û optîmîstîya xwe xweykin. Îzinê nedin ku texmînkirinên xirab li we kontrol bikin. Dewsa wê yekê bi kel û ced li ber wana bi navê Îsa Mesîh ber xwe bidin.

Serê
6-a

*Ruhên ku
fikirê dîl hildidin*

Ruhên ku fikirê dîl hildidin

Carekê, wextê ku ez îdî nava Xwedê da bûm, usa bû, wekî bona min dijarw bû, ku li wî bawar bikim. Min fem nedikir, ku çi diqewime û nava encamên wê yekêda ez bi temami ketime nava şaşîyê. Bi çiqasîva dirêj ew yek diqewimî, bi awqasîva zêde şaşbûna

“Nefikirin, lê bila bi duayê û recakirinê hîvîkirinên we li Xwedê eyanbin. Û aşîtîya Xwedê, ya ku hemû tiştî bilindtîre, gerekê dil û fikirên we bi Îsa Mesîhva xweyke.”

Fîlîpî 4:6, 7, KJV

min zêde dibû. Bêbawariya min lez mezin dibû. Ez îdî hindva navê xwe şikber bûm, dihate texmînkirinê, ku ez navê ji alîyê Xwedêda dayî unda dikim. Ez bêbext bûm [bêbawarî her dem texmînkirina bêbextîyê pêşda tîne]. Fikira min hatibû guhartinê: min texmîn dikir, wekî ez nikarim bawariya xwe li Xwedê binim.

Paşê, du roja ser hev, min dilê xweda ev gotin dibhîst: “Ruhên ku fikirê dîl hildidin...”. Roja ewlin min girîngî neda wê yekê. Feqet, roja duda, çawa ku min destpê kir tiştên baş xeberdim, min careke mayîn ew gotin bihîstin: “Ruhên ku fikirê dîl hildidin”. Neniherî wê yekê, wekî ew gotin nenas bûn, lê wê gotinê ez mecbûr dikirim, ku ez texmînkirina xwe hesab hildim.

Ji wan meriva gelek, tevî kîjana min qulix kirîye, min bihîst, wekî gelek bawarmend nava goveka fikirêda rastî pirsgirêka tîn. Ez fikirîm, wekî bi wî cûreyî Ruhê Pîroz rêberîyê li min dike ku ez bona bedena Mesîh, bona civînê, dijî (miqabilî) ruhên (yên ku fikirê dîl hildidin) dua bikim. Bi wî cûreyî min destpê kir dua bikim û bi navê Îsa dijî wan ruha şerkarîyê bikim. Piştî çend deqa min fikira xweda azaya ecêb texmîn kir. Ew yek gelekî diramatîk bû. Ew fikira derheqa wê yekêda, wekî ruhên xirab dora te veşartîne mêriv ditirsînin, lê ew hene. Îsa bi navên wan gazî wan cina dikir û emir dikir, ku ew dîrkevin.

AZADBÛNA FIKIRÊ JI RUHÊN KU DÎL HILDIDIN

Tê bêjî her car, wextê ku Xwedê ez azad dikirim, ew yek bere-bere, bi rîya bawarîya û hebandina hindava Xebera Xwedêda, diqewimî. Xeberên Yûhenna 8:31,32 û Zebûr 10 7:20 hema şedetîya wê yekê didin. Yûhenna 8:31,32-da Îsa dibêje: "...Eger hûn ser hînkirina Min bimînin, hûnê rast şagirtên Min bin". Zebûr 10 7:20 -da nivîsar e: "Xebera xwe şand û ew qenc kirin, ew jî gorstanê xilaz kirin".

Feqet, wî çaxî min texmîn kir û fem kir, wekî fikira minda tiştê qewimî. Nava deqada min destpê kir careke mayîn li wê yekê bawarîya xwe bînim, çî ku pêşîya vî duayî minra dijwar bibû bawar bikira û min şerkarî kiribû.

Awa meselek. Pêşîya wê yekê, wextê ku fikira min jî alîyê wan ruhada hatibû êrîşkirinê, min bawar dikir, wekî anegorî Xebera Xwedê, ew yek, wekî ez jineke ne eyanim, ya jî bajarê Mîssûrî Fêntonê, wê ne hukumî li ser jîyana min, ne jî li ser qulixa min bike (binihêre Galatî 3:28). Wextê ku wede bê, Xwedê wê derîya veke, kîjana t'û kes wê nikaribe bigire (binihêre Eyantî 3:8), û ezê li temamiya dinîyayê dua bikim û wê xeberê azakim, ya ku Ewî daye min.

Min bawar dikir, wekî nava pîrsa terîfkirina Mizgînîyêye bi radyoyê û têlêvîzyonê, ez pêşkeftî bûm. Min zanibû, wekî anegorî nivîsarên Pîroz, Xwedê yê zeyîf û bêaqil dibijêre, ku yên serwaxt şerm bikin (binihêre A Korintî 1:27). Min bawar dikir, wekî Xwedê wê bona qenckirina nexweşa ez bidama xebatê. Min bawar dikir, wekî zarokên me wê qulixî Xudan bikin. Min bawarîya xwe li hemû tiştên baş dianî, yên ku Xwedê kiribûne dilê min. Ji wana gelek çawa yên bêaqil dihatine texmînkirinê, lê Xwedê ew kiribûne dilê min û bawarîya qewat dabû min, ku min bawarîya xwe li wan hemû tiştî bianîya, çî ku bi rastî tiştê bawarkirinê nîbû.

Feqet, wextê ku ruhên, ku fikirê dîl hildidin dora min girtin, min texmîn dikir, ku ez îdî bawarîya xwe li t'û tiştî naynim. Ez difikirîm: "Baş, diqewime min ev hemû tişt li ber xwe derxistîye. Min bawarîya xwe li wî hemû tiştî dianî, çimkî min dixwest bawar bikira, lê bi

texmîn ewê t'u cara neqewime". Wextê ku ew ruh dûr ketin, karebûna bawariyê carekêra vegehiya. Bi saya vê cêribandinê bona min zelal bû, wekî mirêcin bi çiqasîva diji fikirên min agrêsv e. Ew zane, ku eger ew bikaribe fikirên me kontrol bike, ewê bikaribe jîyanên me ji kontrol bike.

Guhdariyê bidine ser wê yekê, ku fikira we nava halekî çawa da ye: fikira xwe aza, edil û bi bawariêva tiji xweykin.

QIRAR BIKE KU BAWAR BIKÎ

“Bi vî cûreyî ji Ruhe [Pîroz], ku tê alî me bike û me nava zeyîfiya meda pêşda dibe, çimkî em nizanin çî duakin û çawa duakin, lê Ruh bi Xwe pêşîya recakirin û hîvîkirinên meda tê”.

Romayî 8:26, AMP

Çawa mesîhî, em gerekê hînbîn qirar bikin, ku bawar bikin. Xwedê gelek cara bawariyê dide me (berê Ruh) bona wan tişta, wextê ku fikira me her dem nîne ku dikare ruhê mera qayilbe. Fikir her dem dixweze fem bike bona çî, kengê û çawa. Gelek cara, wextê ku ev femdarî ji aliyê Xwedêda nehatiye dayînê, fikir bawariya xwe lê nayne, wê yekê nikare fem bike.

Gelek cara usa diqewime, wextê ku bawarmend dilê xweda tişteki zane, lê fikir diji wê yekê derdikeve.

Min zûva qirar kirîye bawariya xwe li wê yekê bînim, çî ku Xebera Xwedê dibêje, hema wî çaxî jî, wextê ku ez fem nakim bona çî, kengê yan jî çawa ew dikare jîyana minda mîyaser bibe. Çawa lawên Xwedê, tişteki usa li cem me heye, ku em dikarin bawariya xwe li wê yekê bînin, çî ku tiştê nebûyînê ye.

Feqet ew pirs, bona kîjanê min şerkarî mîyaser dikir, cûrekî mayîn bû: ew ji sînoren qebûlkirina birîyarê der bû. Ez wan ruhava girêdayî bûm, yên ku fikirê dil hildidin û min nikaribû xwe mecbûr bikira, ku bawar bikira.

Şikir ji Xwedê, wekî Ew bi destî Ruhê Pîroz nîşanî min da, ku çawa dua bikim û hema wextê duakirinê min hêza (qewata) Wî, ya ku aza dike, texmîn kir.

Ez gumanim, ku hûn vê kitêbê dixwînin, çimkî nava xweda bona avîtina wê gave hûn rêberîyê texmîn dikin. Diqewime li cem we, nava goveka fikirêda jî pirsgirêk hene. Eger hene, wî çaxî bi navê Îsa dua bikin.

Bi qewata xwîna Wî derkevîne (dijî) miqabilî hemû ruhên xirab, yê ku dijwarîya bona fikirên weye qenc pêşda tînin. Eger hûn texmîn dikin, wekî fikira we naxweze bişuxule û îdî nikare bawar bike, dijî wan ruha derkevin, yê ku fikira dîl hildidin. Wî cûreyî ne ku carekê, lê her car dua bikin, wextê ku hûn nava wê govekêda dijwarîyê texmîn bikin.

Mîrêcin t'û cara tîrên xweye bi agir xilaz nake, kîjana ew wî çaxî diavêje ser me, wextê ku em dicêribînin pêşda herin. Mertalê bawarîya xwe bilind bikin û xeberên nava Aqûb 1:2-8-da bîr bînin, yê ku me hîn dikin, ku wextê cêribandina serwaxtîyê ji Xwedê hîvî bikin. Û guman bin, wekî ewê serwaxtîyê bide me û usa jî wê bide kifşê çî bikin.

Ez nava dijwarîke wî cûreyîda bûm, ketibûme bin hukumê tîrên bi agir, yê ku min pêşda texmîn nekiribûn. Feqet Xwedê nîşanî min da, û usa jî dijî çî lazime, dua bikim, û min bi kirina wî cûreyî azayî dest anî.

Ez gumanim, wekî hûnê jî wê azayê bibînin.

Serê
7-a

Bifikire ku tu çi difikirî

Bifikire ku tu çi difikirî

Xebera Xwedê me hîn dike, ku em gerekê dora çi bifikirin û wede bona wê yekê başqe bikin.

Dêmek, nava nivîsarada (Zebûr) tê gotinê, wekî ew dora qanûnên Xwedê difikire. Ew yek dide kifşê, wekî ewî gelek wede bona fikirdarîya dora rêyên Xwedê, nişandayînen Wî û hînkirinên Wî derbaz dikir û difikirî. Zebûr 1:3-da tê gotinê, wekî merivê vî cûreyî mînanî “wê dara devê ava ye, ku wedê xweda berê xwe dide, belgê li ser naçilmise û wê nekeve, û çi jî dike, wê mîyaserbe [wê bighîjel]” (AMP).

“Ezê dora qanûnên te bifikirim û dîna xwe bidime rê-dirbên Te [rêyên jîyanê anegorî qanûna Te hatine kişandinê]”

Zebûr 119:15, AMP

Fikirdarîya dora Xebera Xwedê kardar e. Meriv çiqasî zêde wede bona fikirdarîya derheqa Xeberêda başqe bike, wê awqasî gelek Xeber bidrû.

GUHDAR BIN KU HÛN ÇI DIBIHÊN

“Guhdar bin, ku hûn çi dibihên. Çiqasî [fikir û lêkolîn] hûn didin[bona guhdarkirina rastîyê], awqas [zanistî] wê bona we bê dayîne û wê hê zêde bo we guhdarvana bê dayîne”.

Marqos 4:24, AMP

Gelo çiqas gotineke baş e! Ew dibêje, wekî çiqas wede hûn bidine xwendin û guhdarkirina Xeberê, emê awqas qewat û karebûnê dest bînin bona kirina wê yekê. Dêmek emê ji xwendin û guhdarkirina xwe zêde zanebûnên derheqa eyantîyêda bistînin. Usa dertê, wekî em çiqasî zêde wede datînin bona lêkolîna Xeberê, awqas gelekî jî ji Xeberê distînin.

Guhdarîya mexsûs daynine li ser wê gotinê, wekî bi başqekirina gelek wede û xebitandina gelek cedandina, em zanebûnê û qewatê dest tînin.

Nava “Ferhenga şirovekirina xeberên Încîlê”, ya V. Ê. Vayn, cûrê Kîng Cêymsda, nava vê gotina pîrozda xebera “qewat” xebera yûnanî ye «dunamis»-e, ya ku çawa “qîmet, qewat” hatîye tercimekirinê. Anegorî Strong, xebera yûnanîye «dunamis» dide kivşê “karebûn”. Gelek meriv nava lêkolîna Xebera Xwedêda kûr nabin û paşê zendegirtî dimînin, ku bona çî ew mesîhîyên bi jîyana serkeftî û qewatêva tijîbûyî nînin.

Gilî derheqa wê yekêdane, wekî gelek meriv cedandina nadine xebatê, ku xeberê lêkolîn bikin. Ew diçine berevbûnên civînê û guhdar dikin, ku yên mayîn çawa hîn dikin û Xeberê dannasîn dikin, ew dengnivîsarên hînkirina guhdar dikin, lê carna Încîlê dixwînin, çimkî ew nacedînin xeberê bikine beşa jîyana xweye hîmlî.

Qalibên me naxwezin bixebitin, û hema bo wê yekê jî gelek dixwezin bêyî kirina t’u tiştî (bêyî xebitandina cedandina) bighîjine xwestina xwe, feqet usa nabe. Îzinê bidin, ku ez biwekilînim, merivê jî Xeberê awqasî bistîne, çiqasî ewê nava lêkolînkirina Xeberêda bide xebatê.

DORA XEBERÊ BIFIKIRIN

“Xwezî [bextewar û gulvedayî] li wî bendeyî, yê ku nava şewira nepakada najî û nagere [anegorî bername û fikirdaryîên wana], yê ku xwe [şikestî] li civata berzaqada rûnanî, nava gunekarada nasekine û ne jî nava wanada rûdinî [bêhurmetkirên Xwedê] cîyê ewên ku qerfa dikin. Lê şabûna wî û xwestina wî qanûna Xudan e û mafê Wî ye [nişandayîn, emirkirin û hînkirên Xwedê] û ew dora wana şev û roj difikire [difikire û lêkolîn dike]”.

Zebûr 1:1,2, AMP

Anegorî ferhenga Wêbstêr xebera difikire dide kifşê:

- 1) diyarkirin, fikirandin
- 2) plankirin, progiramkirin, fikira xweda xweykirin... lêkolînevê mijûlbûn. Nava ferhenga Waynda, ya “Ferhenga şirovekirina xeberên Încîlê”, mesela Încîlêye Kîng Cêymsda xebera bifikire dide kifşê:
 - 1) lê nêrîn,
 - 2) guhdarîyê bidine ser,
 - 3) cedandina bidine xebatê, bi fikirê aktîv bişuxulin.

Cûrê diha gelekî belabûyî ev e: xwendin, şewirdarî, anîna ber çeva, fikirmîşbûna pêşda. Nava gotinên Silêman 4:20 -da tê gotinê: “Kurê min, guhdarîyê bide ser Xeberên Min, gotinên Minra qayîl bibe û gura wan da be”. Eger em vê gotinê şirovekirina xebera “bifikirê”-va bidine girêdanê, emê bibînin, wekî em gerekê guhdarîyê bidine ser Xebera Xwedê, dora wê bifikirin, derheqa wêda bifikirin û wê yekê nava fikira xweda bidine xebatê. Fikira wê nava wê yekêdane, ku eger em dixwezîn wê yekê bikin, çî ku Xebera Xwedê dibêje, em gerekê wede bona fikirmîşbûna dora Xeberê wede başqe bikin.

Ev mesela berê tê bîra we?: “Wekilandin dayîka zanistîyê ye”. Bo hemûya jî eyan e, wekî bêyî hînbûnên praktîk û kel û ced t’u kes nikare nava t’u govekekî da bibe pêşekzanekî profesyonel, wî çaxî bona çî Mesîhîti gerekê jî vê fikir dûr be?

FIKIR BERBI AÇIXÎYÊ DIBIN

“Kitêba vê Qanûnê jî devê te dûr nekeve, lê şev û roj li ser wê tu bifikirî, ku nivîsarên nava wêda tu xweykî û mînanî wê bikî, çimkî wî çaxî tê wan rêya bi açixî biqedînî, û wî çaxî tê serwaxt bî”

Hêşû 1:8

Eger hûn dixwezîn bighijîne açixîyê û nava hemû karên xweda pêşbikevin, lazim e ku hûn çawa Încîlêda tê gotinê, şev û roj dora Xebera Xwedê bifikirin.

Hûn çiqas wede başqe dikin bona fikirdarîya dora Xebera Xwedê? Eger nava govekeke jîyana weda hûn rastî pirsgerêka tîn, wî çaxî bi bêqelpî dayîna bersiva vê pirsê, hûn dikarin menîya wan pirsgerêka eşkere bikin.

Nava jîyana minda ez t’u cara nefikirîme, ku ez derheqa çida difikirim. Min her fikirek qebûl dikir, ya ku serê minda pêşda dihat. Eyantîya min tunebû, wekî mîrêcin nava mejûyê minda dikare fikira biçîne. Serê minda hîmlî yan derewa cina bû, yan jî tiştêkî bêfikir bû, li ser kîjana min wedê xweyî giranbiha bêfeyda xerc dikir. Mîrêcin serkarîya jîyana min dikir, çimkî ewî fikirên min kontrol dikirin.

BIFIKIRE KU TU ÇI DIFIKIRÎ

“Nava vî hemû tiştîda, çawa ku we jîtye û himberî xwestinên qalibên xwe me kirîye [anegorî kirinên me, ya ku nîşandayîna texmînkirina ye], me gura qalibê xwe û fikirên mejûyê xwe kirîye [xwestina me ji aliyê texmînkirînên me û xiyalên meye tarîda hatîye pêşdakişandinê]. Em zarokên hêrsê [ya Xwedê] û peyîhatîyên nerazîbûnê [ya Wî] bûne, çawa merivatîya mayîn”.

Efesi 2:3, AMP

Pawlos eşaretîyê dide me, wekî tebyeta meye neheq gerekê li me kontrol neke, me teslîmî xwestinên bedenê û fikirên bedenê neke.

Ez, îdî çawa mesîhî, gelek cara rastî pirsgirêka dihatim, çimkî min nikaribû fikirên xwe kontrol bikirana. Ez hertim dora tiştên başçe difikirîm, yên ku fikira min mijûl dikirin, lê wana feydayên baş nedidan.

Hewcetî hebû, ku ez fikirdarîya xwe biguhêrim.

Wextê ku Xwedê nîşanî min da, wekî fikir deşta şêr e, Ewî tişteki gelekî girîng gote min, ya ku bû werguhastin nava jîyana minda. Ewî got: “Bifikire ku tu çi difikirî”. Wextê ku min destpê kir usa bikim, min zûtirekê fem kir, ku bona çi nava jîyana minda awqas pirsgirêk hebûn.

Fikira minda tevlihevbûneke mezin bû.

Fikirdarîya min şaş bû, û pêra jî fikirên min şaş bûn.

Bi salên dirêj ez diçûme civînê, feqet ez dora wan tişta, çi ku min bihîstibû, nefikiribûm. Ew ji guhekî diketê û ji guhê mayînva derdiket. Her roj min ji Încîlê xeber dixwendin, lê t’u cara ez nefikiribûm ku ez çi dixwînim. Min Xeber lêkolîn nedikir. Rûyê vê yekêda jî min ne qewat, ne jî zanebûn dest dianî.

DERHEQA KARÊN XWEDÊ DA BIFIKIRE

“Em paristgeha Teda ser huba Teye bêhimber difikirin”.

Zebûr 48:9, AMP

Nivîsarên Zebûra didine kifşê, wekî Dawid gelek cara derheqa hemû karên Xudane baş û qewatda difikirî. Ew dibêje, wekî dora navê Xudan, rehma Wî, huba Wî û tiştên mayîne baş difikire.

Hetanî nava gumanbirîyêda jî ewî Zebûr 134:4,5-da nivîsîye: “Ruhê min mînda temirîye û zeyîf e (melûl e), dilê min mînda tevzîye. Wedê berê ez bîr tînim, ser hemû efrandinên Te ez difikirim, ser kirên destê Te ez kûr dibim” (AMP).

Ji vê gotinê em dibînin, wekî nenihêrî halê Dawidî tevlîhevbûyî û gumanbirîya wî, ew naxweze derheqa pirsgirêka xweda bifikire. Dewsa wê yekê ew qîrar dike rojên kevin û baş bîr bîne, derheqa kirên destê Xwedêda bifikire. Bi gilîkî mayîn gotî, ew derheqa tiştêkî başda difikirî, ye ku alî wî dikir, ku tevlîhevbûna xwe alt bike.

T’u cara bîr nekin, wekî fikira we roleke girîng nava karê destanîna serkevtinêda dilîze.

Ez zanim, wekî nava jîyana meda qewata Ruhê Pîroz li ser hîmê Xebera Xwedê serkeftinê tîne. Feqet feydayê tomerî hîmlî fikirdarîya meva girêdayî ye, kîjanê gerekê em bikine bin kontrola fikirdarîya Xwedê û Xebera Wî. Eger hûn naxwezî wê yekê bikin, yan jî her fikireke bêkêr qebûl dikin, wî çaxî hûnê ser nekevin.

BI ÇÊBÛNA FIKIRA XWE WERÎNE GUHARTINÊ

“Û nebîne mînanî vê dinîyayê [vê qurnê], [nûbûyî û anegorî edetên wê], lê [bi temamî] werîne guhartinê [xwe biguhêrin] bi çêbûna fikira xwe [bi destî îdéalên nû û nêzîkbûna wîye nû], dêmek wekî bikaribin nîşanî [xwe], ku kîjane qîrara Xwedêye qenc, xweş û kamil, û hema ew tişt jî, çi ku qencî û xweşî ye [ya qebûkirinê û kamil e] jî alîyê Wîda, bo we”.

Romayî 12:2, AMP

Nava vê beşêda Pawlosê Şandî dibêje, wekî eger em nava jîyana xweda dixwezî mîyaserbûna qîrara Xwedêye qenc û kamil bibînin, wî çaxî em gerekê tenê fikira xwe çê bikin. Meremê çêbûnê kîjan e? Em çê dibin, bona ku usa bifikirin, çawa ku Xwedê difikire. Şuxulkarîya fikirdarîya nû wê me biguhêre, bike merivekî usa, çawa ku Xwedê dixweze me bibîne. Îsa ew guhartin bi saya mirîna Xwe û hilatîna Xwe kire tiştê bûyînê. Û ew yek nava jîyana meda bi rîya çêbûna fikirê mîyaser dibe.

Bona ku hûn nekevîne nava şaşîyê, îzinê bidin bêjim, wekî fikirdarîya rast t'û cûreyî hukumî li ser xilazbûna me nake. Xilazbûn tenê bi saya xwîna Îsa, mirîna Wî û rabûna Wîye ji nava mirîya ye. Gelekê bi saya qebûlkrîna Îsa, çawa Xilazkirê xwe, herine buhuştê, lê ji wana gelek wê nikarbin bi jîyana serkeftîva bijîn, yan jî wê qirara qenc li ser xwe bibînin, ya ku Xwedê bona jîyana wan daye, çimkî wana fikira xwe anegorî Qirara Xwedê çê nekirine.

Bi salên dirêj ez ew şexs bûme, ya ku hema wî cûreyî dijît. Wextê ku ez careke mayîn bûm, min destpê kir herime civînê û dîna xwe bidime edetên ruhanî, lê bi rastî nava jîyana minda qet serkeftinek jî tunebû. Menî ew bû, wekî ez şaş difikirîm.

DERHEQA VANADA BIFIKIRE

“Vir hada, birano, çi ku rastî ye, layîqî qedir e, çi ku bi heqî ye, çi ku bi helalî ye, çi ku bi firasetîyê ye û her tiştên ku esilî û layîqî qengotinê ne li ser van tiştên bifikirin, û bi vî hemû tiştî hesab hildin [fikirên xwe li ser vî hemû tiştî çê bikin]”.

Filîpî 4:8 AMP

Xebera Xwedê bi hûrgilî nîşanî me dide, ku fikira me gerekê fikirên çî cûreyîva mijûl be. Xeberên Încîlêye cûre-cûre şedetîyê didin, wekî em gerekê derheqa wê yekêda bifikirin, çî ku wê çêbûnê bide me û wê ruhê me unda neke.

Fikirên me raste-rast hukumî li ser nêzîkbûn û beşera me dikin. Her gotineke Xudan bona me kar e. Ew zane, ku çî dikare bextewar bike û çî jî nikare wê yekê bike. Wextê ku serê mêrivda tenê fikirên xirab hene, wî çaxî ew bêbext e. Ez jî mesela xweye şexsî hatime li ser wê fikirê, wekî wextê ku meriv bêbext e, ew yên mayîn jî bêbext dike.

Bona we lazîm e, ku hûn nava fikirên xweda hesaba bikin, pirsê bidin: “Ez çî difikirim?”. Bona qîmetkirîna fikirên xwe wede başqe bikin.

Gelekî girîng e bifikirin, ku tu çî difikirî, çimkî mîrêcin hîmlî meriva li vir dixapîne, îzinê nade wana, ku ew kanîya bêbextîyê û pîrsgîrêkên xwe bibînin. Ew me mecbûr dike, ku em bawar bikin, wekî menîyên

bêbextîyên me ji me der in [nava halên başqeda], feqet bêbextîyê gerekê hema bi rastî em nava xweda bigerin [fikirên xweda].

Bi sala ser hev min bi rastî bawar kirîye, wekî ez rûyê kirên merivên mayînda, yan jî rûyê tiştên nekirîda bêbextim. Bona zêrandinên xwe, min malxwê xwe û zarokên xwe gunehkar dikirin. Min texmîn dikir, wekî ewê cûrekî mayîn nêzîkî min bûna, eger guhdariya diha zêde bidana ser hewcetîyên min, eger diha zêde nava karên malêda alî min bikirana, wî çaxî ezê bextewar bûma. Û wê yekê bi sala ser hev kişandîye. Bi kutasî, ez mecbûr bûm rastîyekê qebûl bikim, eger ez bi nêzîkbûneke baş berbirî jîyana xwe bim, wî çaxî t'u tişt wê nikaribe min mecbûr bike, ku ez bêbext bim. Ez rûyê fikirên xweda bêbext bûm.

Îzinê bidin cara dawî bêjim, ku bifikire ku tu çi difikirî. Û tenê piştî wê yekê hûn bikaribin gelekî zû menîyên pirsgirêkên xwe eşkere bikin û azayê bibînin.

BEŞA 2-A

Qewilên fikirê

Naverok

Fikira teda çi diqewime?

Gelo we dîtîye, wekî fikira we tê guhartinê. Carna hûn rihetin, edilin, lê carna jî nerihet û xemgînin. Carna hûn dora pirsekê biryarê qebûl dikin û şikberîya hindva wê rastîyêda tune, lê paşê fikira we tevlîhev dibe, wextê ku hûn destpê dikin derheqa wê yekêda bifikirin, çi ku berê li cem we şikberî pêşda neanîbû.

“Feqet fikira Mesîh serê meda ye, û em fikirên dilê Wî [texmînkirin û meremên Wî] xweyî dikin.”

A Korintî 2,16 AMP

Nava jîyîana minda jî gelek cara qewimîye, wextê ku ez nava vî hemû tiştîra derbaz dibûm. Usa qewimîye, wextê ku min texmîn dikir, wekî ez bi hêsanî dikarim bawarîya xwe li Xwedê bînim, lê usa jî qewimîye, wextê ku şikberîya û bêbawarîyê bi bêisafî ez zêrandime.

Bi dîtina wê yekê, ku fikira min çawa dikare cuda be, min destpê kir guftugo bikim, ku ji wana kîjan e rast û kîjan e şaş. Min dixwest ew yek fem bikira, bona ku bi naskirina fikirdarîya xweye şaş ez ji wê yekê paşda bisekinîyama.

Mesele, fikirên rexnekir, gunehkarkir û şikber bona bawarmend tiştên normal nînin. Feqet, nava piranîya jîyana xweda min ew tişt çawa yên normal hesab kirine, çimkî ez hînî wana bibûm. Û nenihêrî wê yekê, wekî fikirdarîya min ya şaş bû, rûyê kîjanêda nava jîyana minda gelek pirsgerêk pêşda dihatin, min fem nedikir, ku nava fikirên minda şaşîya çi cûreyî hebû.

Min nizanibû, wekî ez dikarim fikirên xwe kontrol bikim. Çawa bawarmenda bi salên dirêj, min qet texmîn nedikir, ku bawarmend gerekê çawa bifikire û fikirên wî gerekê nava halê çi cûreyîda bin.

Fikira me wextê bûyîna ruhê me naxulîqe: ew gerekê rêya çêbûnêra derbaz bibe (binihêre Romayî 12:2). Çawa ku min îdî got bona çêbûna

fikirê wede lazim e. Gumana xwe nebirin, eger hûn serên kitêbêye mayîn bixwînin û bibînin, wekî bona merivê ku Îsa Mesîh çawa Xilazkir elam kirîye, fikira we hîmlî nava halê nenormalda ye. Gava ewlin, ya bona şuxulkarîya dasekinandina fikirê, femkirina pirsgirêkê ye.

Çi ku derheqa minda ne, ez bêjim, wekî çend sal pêşda min destpê kir derheqa heleqetîyên xweye tevî Xudan bifikirin. Û hema wî çaxî Xwedê bona min ew yek vekir, wekî nava bingeha (hîmê) pirsgirêkên minda fikirdarîya şaş e. Mejûyê minda xaoseke tam bû. Ez bi tomerî şikber bûm, wekî mejûyê min wextekê nava halekî başda bûye, lê eger bûye jî, ew nava wedê dirêjda nîbûye.

Wextê ku min fem kir, ku fikirdarîya şaş nava minda koka xwe danîye, ez tirsîyam. Min dicêriband fikirên şaş tune bikim, yên ku diketine nava femdarîya min, lê ew carekêra paşda vedigerîya. Feqet ez hêdî- hêdî ji wana aza bûm.

Mîrêcin bi cûrê agrêsîv dijî (miqabilî) çêbûna fikira te şerkarîyê dike, lê tu sirîya xweda gerekê dijî wî derkevî û dua bikî. Nava vê govekêda tu gerekê awqasî hînî şerkarîyê bibî, hetanî tu bighîjî serkeftinê.

Fikira te kengê nava halê başda ye? Gelo em dikarin îzinê bidine fikirên xwe, ku ew li her cîya bigerin, yan gerekê wana bin kontrolêda xweykin? Em dikarin îzinê bidine xwe, ku em acizbûyî, yan jî şaşbûyî bin, yan gerekê edilyî û aminaya ruh hebe, ku em bizanibin, wekî nava jîyanêda rîya rast bijartîye? Gelo şikberî, bêbawarî, nerihetî û tirs dikarin nava fikira medabin? Yan em, çawa lawên Xwedê, mecalâ meye zêde heye, ku hemû pirsên xwe teslîmî Wî bikin? (binihêre A Petrûs 5:7).

Nava Xebera Xwedêda tê gotinê, wekî fikira Mesîh serê meda heye. Hûn çawa difikirin, ku fikira Îsa çi cûreyî bû, wextê ku Ew li ser dinîyayê dijît û ne tenê çawa Kurê Xwedê, lê usa jî çawa Kurê însên.

Bi duakirinê beşên vê kitêbêye mayîn destpê bikin bixwînin. Ez bawarim, wekî hûnê wê yekê hînbin, ku çawa halê fikira wî mêrivîye normal û ne normal ji hev cuda bikin, yê ku çawa şagirtê Îsa tê hesabê û yê ku biryar kirîye ku bi jîyana serkeftî bijî.

Serê
8-a

*Fikir kengê
nava halê başdane?*

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos dua dike, bona ku em serwaxtîyê bistînin, bi rîya “bi ronahiyê zelalbûna çevên ruh”. Li ser bingeha (hîm) çend nivîsarên Încîlê, min meriv hîn kirine, wekî bi xebitandina gotina “çevên ruhê me” ez dixwezim fikira merivatîyê bidime kifşê.

Gelo fikira mesîhî gerekê nava halê çawada be? Bi gilîkî mayîn gotî, halê fikira bawarmende çi cûreyî çawa ya normal tê hesabê? Bona dayîna bersiva vê pirsê lazim e fûnksîyayên fikirê û ruhe cûre-cûre lê binihêrin.

Anegorî Xebera Xwedê, fikir û ruh tevayî dixebitin: eva ew e, çi ku ez çawa “prînsîpa ku piştgirîyê dide ruh” nav dikim.

Bona femkirina vê prînsîpê werin em binihêrin, ku ew çawa nava jîyana bawarmendda dişuxule.

“[Çimkî ez her dem dua dikim] li Xwedêyê Xudanê me Îsa Mesih, Bavê xweyrûmet, wekî Ew dikare Ruhê serwaxtîyê û Eyantîyê bide we[nava çidanin ew pirs û sur], zanebûna [bi kûrayî û nêzikayî]naskirina Wî. Bila çevên ruhê we bi ronahiyêva zelalbûyî usa vebin, wekî hûn wê gumanê fem bikin û bizanibin, bi kîjanê Wî gazi we kirîye û çi ye ew dewlemendîya rûmeta Wî, ya ku cimeta Wî wê war be [yên ji aliyê Wîda cudakirî]”

Efesî 1:17,18, AMP

PRÎNSÎPA KU PIŞTGRÎYÊ DIDE RUH

“Lê kî haj [fem dike] wê yekê heye, ku fikirên mêrivra çi derbaz dibe, pêştirî wî ruhê nava wîda. Xêncî wê yekê t’u kes haj fikirên Xwedê tune [nikare bizanibe û fem bike], pêştirî Ruhê Xwedê”.

A Korintî 2:11, AMP

Wextê ku meriv Mesîh çawa Xilazkirê xwe qebûl dike, Ruhê Pîroz destpê dike nava wîda bijî. Încîl hîn dike, wekî Ruhê Pîroz haj fikirên

Xwedê heye. Çawa ku nava mêrvida tenê ruh e, yê ku haj fikirên mêriv heye, usa jî Ruhê Xwedê ye, Yê Tek-Tenê, Yê ku haj fikirên Xwedê heye.

Ruhê Pîroz di nava meda dijî û çawa ku Ew haj fikirên Xwedê heye, meremekî Wî ew e, ku serwaxtî û eyantîya Xwedê bona me eşkere bike. Ew serwaxtî û eyantî nava ruhê meda tên danînê, peyî kîjanêra ruhê me “çevên dilê me” dide ronahîkirinê, gîlî derheqa fikira medane. Bi vî cûreyî Ruhê Pîroz alî me dike, ku em nava dereca fîzîkîda fem bikin, ku nava dereca ruhanîda çi li me diqewime.

NORMAL, YAN NE NORMAL?

Çawa bawarmend, çawa merivê ruhanî, em usa jî merivê fîzîkîne, yên ku ji alîyê Xwedêda hatine çêkirinê. Her dem nîne, wekî meriv bi fîzîkî tiştên ruhanî fem dike, bo wê yekê jî gelekî girîng e, ku fikira me ronahîkirî be û bikaribe wê yekê bibîne, çi ku ruhê meda diqewime. Ruhê Pîroz dixweze me ronahî bike, lê gelek cara fikir wê yekê tê berdide, çi ku ruh dicêrbîne eyanke, çimkî mejû bi fikirên mayînva tijîbûyî ye.

Mijûlîya fikirêye mezin normal nîne. Rihetî, lê ne ku valahî, tê hesabê halê fikirêyî normal.

Lazim nîne fikirê bi mitalên zêde, nerihetîya, tirsê û tiştên mayîn bikine bin giranîyê. Ew gerekê nava halê rihet da be û hêsabe. Westê xwendina beşa vê kitêbêye duda hûnê rastî wê şirovekirina derheqa halê fikirê bîn, yê ku tê hesabê çawa halê nenormal û diqewime hûnê mecbûrbin qebûlkin, wekî gelek cara fikira we hema nava halê wî cûreyîdane.

Ew yek girîng e ku meriv fem bike, wekî fikirê gerekê nava halê normalda xweykin, derheqa çida vî serê kitêbêda hatiye şirovekirinê.

Vê yekê himberî halê fikira xwe bikin û wê bona we zelal be, ku bona çi hûn awqas hindik eyantîya ji Ruhê Pîroz distînin, û gelek cara kêmasîya serwaxtîyê texmîn dikin.

Bîra xweda xweykin, wekî Ruhê Pîroz her dem dicêrbîne fikira bawarmend bide ronahîkirinê. Ew înfomasîya ji Xwedê derbazî li

ruhê mêriv dike û eger fikira mêriv alî ruh dike, wî çaxî ewê bikaribe nava serwaxtî û eyantîya xwedêtîyêda bigere. Feqet eger fikira mêriv bi tiştên mayîna mijûl e, wî çaxî ewê wî hemû tiştî tê berde, çî ku Xudan dicêribîne bi ruhê wî li wî eyan bike.

DENGÊ RIHET, NERM

“Û Ewî got: “Here û li ser çîyê li ber Xudan bisekine”. Û awa, Xudan derbaz bû û bayekî mezin û qewat hate çîyê û li ber Xudan Zinar hincirandin. Lê Xudan nava bayêda nîbû, piştî bayê erd hejîya, lê Xudan nava erdhejêda nîbû, û piştî erdhejê agir bû, lê Xudan nava agirda nîbû, piştî êgir dengê edilaya nerm û rihet, dengê nimiz...”

G Padişatî 19:11,12, KJV

Bi sala ser hev min dua û hîvî ji Xwedê dikir, wekî Ruhê Pîrozî, ku di nava minda dijî, eyantîya bide min. Min zanibû, wekî hîvîkirina min anegorî Încîlê ye. Min bawarîya xwe li Xeberê dianî û ez şikber nîbûm, wekî ezê hîvîkirina xwe bistînim. Neniherî wê yekê, wekî gelek cara min xwe çawa “Ruhanîya bêaqil” texmîn dikir, eger meriv dikare vî cûreyî bêje. Paşê min fem kir, wekî dijarîyên stendina eyantîya rûyê fikira minda bûn, ya ku gura minda nîbû û bi fikirên nelazimva tijî bû. Wê yekê îzin nedida min, û min fikirên ku ji Ruh dihatin, tê berdidan.

Bînin ber çevên xwe, wekî li odekê du meriv hene. Yek bi dengê nimiz derheqa surekêda dibêje yê mayîn. Eger li odê qalme-qalm hebe, wî çaxî, neniherî wê yekê, wekî înfomasîya derbazî alîyê mayîn dibe, yê ku guhdar dike, wê nikaribe wê înfomasîyayê bistîne, çimkî qalme-qalmê îzinê nede. Eger ew gelekî guhdarîyê nede ser, wî çaxî ew dikare texmîn neke, wekî dicêribînin tiştêkî bêjine wî.

Hema bi wî cûreyî jî pêwendîya (heleqetîya) di navbera Ruhê Xwedê û ruhê meda dibe. Ruhê Pîroz gelekî nerm dixebite. Gelek cara Ew mera usa xeber dide, çawa Ew Êlyasê pêxemberra, bi dengê rihet û nerm. Awa ew e menî, ku bona çî em gerekê hînbin ku karebûna guhdarîya xwe xweykin.

RUH Û FIKIR

“Dêmek ez bi ruhê xweva [Ruhê Pîrozî ku nava minda dijî] çi dua bikim, lê usa jî bi hişê xwe [bi aqilanî] û bi femdarîyê...”.

A Korintî 14:15, AMP

Carna diha hêsa ye bi mesela duayê “prînsîpa fikirêye ku piştgirîyê dide ruh fem bikin. Nava vê xeberêda Pawlosê şandî dibêje, wekî ew him bi ruhva û him jî bi fikirêva dua dike.

Bona min gotinên Pawlos femdarîne, çimkî ez bi xwe jî hema wî cûreyî dikim. Gelek cara ez bi ruhva dua dikim (bi zimanê Ruhê Pîroz), paşê diqewime fikira minda hewcetîk pêşda tê, bona kîjanê pêwîst (lazim) dibe bi zimanê inglîzî (bi zimanê dayîka xwe) dua bikim. Ez hesab dikim, wekî bi vî cûreyî fikir alî ruh dike. Ew bi hevra hevkarîyê dikin, bona ku zanebûna Xwedê û serwaxtîya Wî bona min eyan û femdarî bin.

Ev yek usa jî cûrekî mayîn dişuxule. Carna usa dibe, wextê ku li cem min xwestina duakirinê pêşda tê û ez îzinê didime Xwedê, ku bi destî min dua bike. Wextê ku t’u alîkî duakirinêyî zelal tune, ez destpê dikim, çi ku tê fikira min dua bikim. Ez bona halên usa dua dikim, yê ku hewcê tevbûna Xwedêne. Carna ew duakirin li ber çevên min gelekî giran tên texmînkirî, çimkî ruhê min alî min nake: tê bêjî ez şerkarîyê dikim. Wî çaxî ez derbazî duakirina bona hewcetîke mayîn dibim, derheqa çida ez zanim.

Ez awqas wede vî cûreyî dikim, hetanî ku Ruhê Pîroz bighîje min. Wextê ku ew yek diqewime, ez fem dikim, wekî hema bona wê yekê Ruhê Pîroz dixweze ku ez dua bikim. Bi vî cûreyî fikira min û ruhê min hevkarîyê dikin û alî hev dikin, ku xwestina Xwedê mîyaserbe.

ZIMAN: TERCIME Û ŞIROVEKIRIN

“Bona vê yekê ewê ku bi zimanê [neeyan] xeber dide, gerekê [bona karebûnê] dua bike, ku wê yekê tercimeke û şirove bike, ku çi dibêje. Eger ez bi zimanê [neeyan] dua dikim, ruhê min [bi Ruhê Pîrozî, ku nava minda dijî] dua dike, lê fikira min bêyî rez e [ew t’u rezekî nayne û karê nade t’u kesî]”

A Korintî 14:13,14, AMP

Meseleke xebata ruh û fikirêye tevayî û alîkirina heve mayîn pêşkêşa duakirina bi zimana û terciya zimana ye. Eger hûn pêşkêşên Ruhê Pîrozra nenasin, wî çaxî ez dibêjime we, ku hûn bi Încîlê wana lêkolîn bikin. Bona hemû pêşkêşên Ruhê Pîroz li Xwedê Dua bikin û hîvî bikin. Ji Wî hîvî bikin, ku Ew berbi wan dua rêberîyê li we bikin, yên ku wê nava karê hînbûnê û baş femkirina wanada alî we bikin. Wê yekê ji serên 12-a, 13-a û 14-a, ya berbirîbûna korintîyaye ewlin destpê bikin.

Wextê ku ez bi zimanên Ruhê Pîroz dua bikim, fikira min bêrez dimîne, hetanî ku Xwedê wê şirovekirinê bide min yan jî yekî mayîn, bona kîjanî ez dua dikim. Tenê wî çaxî fikira min kardar dibe.

Ez hîvî dikim, ku hûn bîra xweda xweykin, wekî xebardan û terciyên bi zimanên mayîn (înglîzî, fransî û yên mayîn) pêşkêş nînin. Terciya ji zimanên bîyanî derbazkirina wan e, lê şirovekirin derbazkirina fikira duaye bi zimanên Ruhê Pîroz têra dibîne, ya ku bi stîla xwe nêzikî wî ye, yê ku şirove dike.

Îzinê bidin ez meselekê bînim. Xwîşka Smît dikare wextê bervbûna civînê li ser pîya bisekine û tiştêkî bi zimanên Ruhê Pîroz bêje. Ew temî ji aliyê Ruhda bona wê tê dayînê û ne ew, ne jî yekî mayîn t'û tiştî ji wê gotinê fem nakin. Xwedê carna dikare fikira wê temiyê tomerî li min bide femkirinê. Ez destpê dikim wê gotinê bi bawarîyê şirove bikim, wê behsê bona hemûya bidime femkirinê. Ew şirovekirin dikare bi cûrê min bê gotinê.

Duakirina bi zimanên Ruhê Pîroz û şirovekirina wê îzinê didine me ku em “prînsîpa fikirêye, ku piştgirîyê dide Ruh”, fem bikin. Ruh tiştêkî dibêje, lê fikir wê yekê dide femkirinê.

Bînin ber çevê xwe, ku eger Smîta xwîşk bi zimanên Ruhê Pîroz xebarda, lê Xwedê yekî mayîn bigerîya, ku ew yek şirove bikira. Ewê mecbûr bûya dora minra derbaz bûya, eger fikira min tiştên lap başqeva mijûl bûya û min nikaribûya guhdar bikira. Eger Xwedê bicêribanda şirovekirin bida min, minê nikaribûya ew yek qebûl bikira.

Wextê ku ez ji nûva nava Xudanda bûm û min dicêriband pêşkêşên Ruh qebûl bikirana, min her dem tenê bi zimana dua dikir.

Piştî hinek wede jîyana duakirina min li ber çevê min çawa acizî hate texmînkirinê. Min derheqa wê yekêda Xudanra got. Ewî minra şirove kir, wekî menîya acizîyê ew e, ku ez fikira duakirinên xwe fem nakim. Neniherî wê yekê, wekî ez fem dikim, ku gerekê her dem duakirinê fem nekim, usa jî hîn bûme, wekî tenê bi duakirina bi zimanên Ruhê Pîroz, ezê nikaribim nava balansêda bimînîm û ezê bêyî rez bim, eger t'û cara şirovekirin tunebe.

FIKIRA EDIL, HIŞYAR

“Tê wî biparêzî û wî nava kamilîyêda xweykî û tê fikirên wîye bi edilayêva îzbatbûyî [xwestina wî û xeysetên wî] nava Xweda xweykî, çimkî ew Teva girêdayî ye, bi Teva min dibe û gumana wîye tek-tenê Tu yî”

Îşaya 26:3, AMP

Ez gumanîm, wekî ev mesele nîşanî we dan, wekî fikir û ruhê we bi hevva hevkarîyê dikin û herdu jî bi hevva girêdayîne. Bo wê yekê jî gelekî girîng e, ku fikira we her dem nava halekî başda bimîne. Eger usa nibe, ewê nikaribe tevî ruhê we hevkarîyê bike û nikaribe alî we bike, ku hûn bi jîyana ruhanîva tijîbûyî bijîn.

Bêguman, mîrêcin derheqa vê yekêda zane û bo wê yekê jî ew êrîşê tîne li ser fikira we û li deşta şêr şerkarîya rast çê dike, û ew jî fikira we ye. Ew dixweze we bide westandinê, serê we bi fikirên şaşê cûre-cûreva tijî dike, bona ku ew her dem mijûlbûyî be û nehêle, ku Ruhê Pîroz bi destî ruhê merivatîyê bişuxule.

Lazim e, ku fikirê nava halê rihetda xweykin. Çawa ku pêxember Îşaya dibêje, wextê ku fikir li ser tiştên rast tê merkezkirinê, wî çaxî edilayî nava wîda wê padişatîyê bike.

Fikir gerekê usa jî hişyar be. Feqet ew yek tiştê bûyîne nîne, wextê ku ew bi fikirên nelazimva tijî ye.

Derheqa wê pirsêda bifikirin, ku çiqas wede ye, ku fikira we nava halê başdane.

Serê
9-a

Fikira lêpirsîyar, gerok

Fikira lêpîrsîyar, gerok

Serê kitêbêyî derbazbûyîda me îzbat dikir, wekî mejûyê ku bi fikirava giran bûye, nikare nava halê normal da be. Hema wî cûreyî jî ew yek bona mejû normal nîne, wextê ku fikir “digere”, yan jî belavbûyî ye. Nekarebûna merkezbûna fikirê dide kifşê, wekî li ser fikirê êrîşa cin heye.

“...Piştî fikira xwe bidine gewînkirinê...”

A Petrûs 1:13, KJV

Gelek meriv îzinê didin, ku fikirên wan bigerin, çimkî ew nava jîyana xweye fikirdarîyêda t’u cara qanûnên terbyetdarîyê nadine xebatê.

Gelek cara merivên ku nikarin fikirên xwe bidine merkezkirinê û xwe hesab dikin çawa yê kêmgihîştî. Feqet nekarebûna wî cûreyî dikare wê yekêva girêdayî be, wekî meriv bi sala ser hev fikira xwe nava bêguhdarîyêda hiştîye. Ew yek usa jî dikare wê yekêva girêdayî be, ku nava organîzmêda kêmasîya vîtamîna hebe. Vîtamîna B karebûnên merkezbûnê dide bilindkirinê û bo wê yekê jî eger nava wê govekêda pîrsgirêkên we hene, wî çaxî gerekê hûn bifikirin, ku hûn xwerina rast û bi kalorîyayên dewlemend didine xebatê, yan na?

Westandina gelekî mezin jî dikare xirab hukumî li ser merkezkirina fikirê bike. Min texmîn kirîye, wekî wextê ku ez gelekî diwestim, mîrêcin dicêribîne êrîşê bîne ser fikira min, çimkî ew zane, wekî hema wî çaxî berxudana min zeyîf dibe. Mîrêcin dixweze, wekî em xwe çawa merivên kêmpêşdaçûyî hesab bikin, çimkî wî çaxî em nikarin t’u tiştî bikin. Mîrêcin dixweze, ku em pasîvîyê bidine kifşê û wan derewa qebûlkin, kîjana dişîne berbi me.

Keçeke me zarotîyêda nava goveka merkezkirina fikirêda rastî dijwarîya dihat. Bona wê dijwar bû bixwîne, çimkî karebûnên merkezbûnê û femkirinê hevva girêdayîne. Gelek zarok û mezin jî çî ku xwendine fem nakin. Çevên wana li ser xeberava derbaz dibin, lê mejûyên wana, çî ku xwendine qebûl nakin.

Gelek cara kêmasîya femdarîyê encamê nekarebûna merkezkirina fikirê ye. Ji cêribandina xwe ez zanim, wekî ez dikarim ji Încîlê yan jî ji kitêbekê tamamîya serîkî kitêbê bixwînim, û nişkêva fem bikim, wekî nayê bîra min, ku min çî dixwend. Wextê ku ez paşda diçim û dîsa wî serê kitêbê dixwînim, tê bêjî ez matêrîyalekî lap başqe dixwînim. Ev hemû tişt wê yekêva girêdaîye, wekî wextê ku çevên min li xebera dinhêrîn, fikira min nizanîm li kîderê digerya, çimkî min guhdarîya xwe nedabû merkezkirinê. Bo wê yekê jî min jî xwendinê t’u tişt fem nekir.

Gelek cara tunebûna femkirinê hema tunebûna guhdarîyêva girêdayî ye û ew yek encamê gera fikirê ye.

Van axirîya, ez, Dêyv û du merivên başqe, tevî kîjana min li Yûtayê hevaltî kirîye, bi avtomaşînê diçûn. Me bi wê yekêva guhdar dikir, ku çawa Dêyv dibêje: “Saxlemî”. Em kenîyan, wextê ku me fem kir, wekî nenihêrî wê yekê, ku Dêyv bilind bihênjî bû, lê ji me t’u kesî guhdar nekiribû, çimkî em hemû bi fikirên xwe çûbûne cîyekî mayîn. Min gotê: “Biborîne (bibaxşîne), min guhdar nekiribû, ez li ofîsa Sên-Lûîyê bûm”. Merivê ku piştêva rûniştîbû, kenîya û got: “Ez bi îşê xweva li Florîdayê bûm”. Jina wî jî kenîya û got: “Lê ez li ofîsa xweye li Dallasê bûm û min kar dikir”.

Nava hinek wededa em her sê jî bi fikirên xweva, çûbûne alîyên cuda-cuda. Wê yekê da kîşê, ku fikir çî cûreyî dikare lez jî wê yekê bixalife, çî ku bi rastî diqewime. Em kenîyan, çimkî Dêyv xwera gotibû “saxlemî”. Ew yek tiştê pêkenînê bû, lê bona femkirinê dide kîşê, ku çawa em dikarin halê fikira xweyî hişyar unda bikin, wextê ku li ser wê yekê merkez nabin, ku niha çî diqewime.

FIKIRA GEROK

“Fesal be [bi fikira xwe li ser wê yekê were merkezkirinê, ku tu çî dikî]”.

Zanebûn 5:1, AMP

Gotina “fesal be” dide kîşê “balansa xwe unda neke û jî rîya xwe nexalife”. Bi vî cûreyî meriv dikare bêje, wekî bona nexalifandina jî rê lazim e bi fikira xwe li ser wê yekê bêne merkezbûnê, çî ku wî çaxî dikin.

Hebû wede, wextê ku fikira min digerîya û ez mecbûr bûm fikira xwe bînime li ser qeyde û qanûnê. Ew yek hêsa nîbû û niha jî carna fikirên min digerin. Wextê ku min dicêriband proêktekê (projeyekê) bigîhanda dawîyê, nişkêva min fem dikir, wekî fikirên min tiştêkî mayîna mijûlin û ew vê proêktê (projeyê) va girêdayî nîne. Ez hela hê negihîştîme xala merkezbûna jorine kamil, lê pêra jî fem dikim, wekî gerekê îzinê nedime fikirên xwe, ku çawa dixwezî û kengê bixwezî wî cûreyî bikin.

Xebera “ger” ferhenga Wêbsterda tê şirovekirinê çawa, 1) bêyî merem bilivin, 2) ji rê der pêşda herin, bi rîya xalifî, bişewişin, 3) kir, yan jî aliyê bêqeyde mîyaserkin, bê merem bigerin, 4) ji tîmayê der bifikirin yan jî xebêrdin.

Eger hûn di navbera min û xweda tiştên tomerî dibînin, wî çaxî cem we jî usa diqewime, wekî wextê berevbûnên civînê, wextê guhdarkirina terîfê hûn nişkêva fem dikin, wekî fikirên we alîkî mayînda çûne. Deqîqe derbaz dibin û hûn nişkêva hişyar dibin û eyan dikin, ku hûn guhdarîya gotinên terîfê nakin. Nenihêrî wê yekê, wekî qalibê we li civînê ye, lê bi fikira hûn îdî li dikanê, malê, we şîv hazir kir û tiştên mayî.

Bizanibin, wekî şer nava fikirêda diqewime. Fikir her dem bin êrîşên mîrêcîdanin. Ew gelekî baş zane, wekî hetanî merivê ku diçe civînê, wê ji terîfê karê nestîne, eger fikirên wî ne ku bi terîfê, lê bi tiştên başqeva mijûlin. Mîrêcin zane, wekî meriv nikare t’u şuxulekî bighîne dawîyê, eger ew mejû û fikira wî li ser wê yekê nayêne merkezkirinê, çî ku ew dike.

Ev yek usa jî wextê qisê diqewime. Carna malxwê min Dêyv minra qise dike û ez hinek wede bi guhdarî wî guhdar dikim.

Feqet ez nişkêva fem dikim, wekî bi rastî min ji gotinên wî t’u xeberek nebihîstîye. Bo çî? Çimkî min îzin da fikirên xwe, ku ez ji tîmayê bixalifim. Qalibê min usa ma û nelivîya û bi wî cûreyî da kifşê, wekî ez guhdar dikim, lê bi rastî fikira min t’u tişt qebûl nekirye.

Wê yekê salên dirêj kişandîye: min bi formalî dida kifşê ku ez zanim, ku Dêyv derheqa çida dibêje. Niha ez navbirîyê didime wî û dibêjim: “Tu dikarî hemû tiştî ji nûva destpê bikî? Ez guhdar nîbûm

û min ji gotinên te t'u tişt nebihîst". Bi vî cûreyî ez dijî vê pirsgerêkê şerkarîyê dikim. Tenê bi bêqelî qebûlkirina kêmasî û şaşîyên xwe û şerkarîya dijî wana, emê bikaribin bighîjine serkeftinê.

Min fem kirîye, wekî eger mîrêcin cedandinên xwe dide xebatê, bona ku guhdarîya min bixalifîne, usa ye tiştêkî girîng dibêjine min, kîjanê ez gerekê guhdar bikim.

Nava vê govekêda cûrekî şerkarîyê ji destanîna dengnivîsarên terîfa ye, yên ku ji alîyê civînên cudada tîn pêşniyarkirinê. Eger hûn hela hê hîn nebûne ku fikira xwe nava terbyetdarîyêda xweykin û wextê berevbûnên civînê guhdarbin, wî çaxî piştî her qulixdarîkê dengnivîsara wê berevbûnê bikin û guhdar bikin, bona ku hûn temamiya terîfê fem bikin.

Mîrêcin wê mecbûr bibe teslîm be, wextê ku bibîne ku nêta we tune, ku hûn teslîm bin.

Bîra xweda xweykin, wekî mîrêcin dixweze, ku hûn xwe çawa bi mejûva paşdamayî hesab bikin û xwe netam texmîn bikin. Feqet rastî ew e, wekî hûn gerekê destpê bikin fikirên xwe kontrol bikin. Îzinê nedine wana, ku ew bigerin û wê yekê bikin, çî ku ew dixwezî. Fikirên xwe li ser wê yekê bidine merkezkirinê, çî ku hûn dikin. Hûnê mecbûr bin hinek wede li ser wê yekê bixebitin. Bona azabûna ji wan xeyseta û pêşxistina yê nû wede lazim e, yê ku xwe bi temami afû dike. Em nava wedekî usada dijîn, yê ku ji alîyê Xwedêda çawa pêşkêşa mezin hatîye dayînê, lê eger em nava wedê nihada nînin, wî çaxî em wî wedeyî unda dikin.

FIKIRA LÊPIRSÎYAR, KOÇEK

“Ez rast wera dibêjim, kî ku vî çiyayîra bêje rabe xwe bavêje behrê û dudilî nebe, bawar bike, ku gotina wî wê biqewime, ewê bona wî bibe. Bo wê yekê jî ez dibêjime we, ku hûn çî nava duada hîvî bikin, bawar bikin [guman bin], wekî ewê bona we bê dayînê û hûnê bistînin [wê bo we hebe]”.

Marqos 11:23,24, AMP

Wextê ku ez rastî halekî dihatim, min destpê dikir gelek cara xwera bêjim: “Hewaskar e...”.

Mesele, “Tiştê hewaskar e, ku gelo hewayê sibê çawa be?”.

“Hewaskar e, ku gelo ezê sibê êvarê çi kincî xwekim?”.

Hewaskar e, ku Dênnî (kurê min) wê qîmetên çawa bistîne?”.

“Hewaskar e, ku çend merivê wextê sêminara min hazirbin?”.

Ferheng xebera “hewaskar” çawa “texmînkirina nava şaşîyêda, yan jî şikberîyêda” şirove dike, lê çawa kirin “bi hewaskarîyêva, yan jî şikberîyêva tijîbûyî” şirove dike.

Ez hatime ser wê fikirê, wekî diha baş e beşera baş bê xweykirinê, lê ne ku her dem wê yekê pêşda texmînkî, çi ku dikare yan jî nikare biqewime. Dewsa wê yekê, ku ez bona qîmetên Dênnî xemgînim, ez gerekê bawar bikim, wekî li cem wî wê hemû tişt baş be. Dewsa fikira derheqa bijartina kinca êvarê, lazime qirarkin, ku çi wê bê xweykirinê. Dewsa fikira derheqa hewayê û tevîbûyên sêminarêda, lazime hemû tiştî teslîmî Xudan bikin û guman bin, ku hemû tiştê bibe, Ewê hemû tiştî rast bike.

Ez wera bêjim, wekî kurê me Dênnî mekteb hiz nedikir û li wî xweş nedihat, ku min her dem derheqa wî û pêşeroja wîda lêpîrsîn dikir. Bi fikira min, hûnê şa bibin, eger pê bihesin, wekî niha ew serokê Qulixdarîyên Coys Mayêre sereke ye. Min badîhewa wede xerc dikir, ku bona wî awqas xemgîn dibûm. Xwedê derheqa pêşeroja wîda zanibû û hemû tişt bin kontrola Xweda xweyî dikir.

Bi tomerî hildayî, hewaskarî tiştêkî normal e. Feqet, eger ew yek ji çapê der zêdetir dibe, wî çaxî meriv dikare bê ser tabîke usa, ku nikaribe qirarê qebûlke û rûyê wê yekêda tevîhevbûn pêşda bê. Hewaskarî, bêqirarî û tevîhevbûn wê îzinê nedine mêriv, ku ew bi bawarîyê, ji Xwedê, bersivên dua yan jî hewcetîya bistîne.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî nava Mizgînîya Marqosda xebera 11:23,24-da Îsa negot: “Eger hûn tiştêkî bi duakirinê hîvî bikin, paşê jî pêşda koçektîyê bikin, ku hûnê bistînin, yan na?”. Ewî got: “Hemû tiştî bi duakirinê hîvî bikin, bawar bikin, wekî hûnê bistînin”.

Çawa mesîhî, çawa bawarmend, em gerekê bawar bikin, lê ne ku şikberbin.

Serê
10-a

Fikira şaşbûyî

Me eşkere kir, wekî dudilîbûn û tevlihevîbûn hevva girêdayîne. Dudilîbûn dikare bibe menîya şikberîya û tevlihevîbûnê.

Gotinên Aqûbe 1:5-8 alî me dikin fem bikin, ku em çawa dikarin dudilîbûnê, şikberîya, tevlihevîbûnê alt bikin û usa jî alî dikin, ku ji Xwedê wê yekê bistînin, hewcê kîjanêne em.”Merivê dudilî bona min şiklekî tevlihevîbûnêyî tomerî raber dike: fikira wîda her dem halê xaosê ye û ew nikare qîrarê qebûlke. Merivê wî cûreyî hema çawa qîrarê qebûl dike, carekêra dudilîbûn pêşda tê: peyî wêra şikberî û tevlihevîbûn tên û tê bêjî wî çaxî ew pareveyî ser du beşa dibe. Merivê wî cûreyî nava t’u pîrsekêda li ser fikira îzbatbûyî nîne.

“Eger serwaxtîya yekî ji we têra wî nake, bila hîvî ji Xwedê bike [Yê ku dide] hemûya bi merdanî, t’u kesî bêqedir nake û wê ji wîra bê dayînê. Lê tenê bila bi bawarîyê bixweze û dudilî nebe [bêyî şikberîyê]. Çimkî yê dudilî mîna pêlên behrê ye [şikber e], ku ji bayê bilind dibin û datînin. Merivê usa bila nefikire, ku wê tiştêkî ji Xudan bistîne [wekî hîvî dike, û wî cûreyî ye], ew merivê dudilî [yê ku ne li ser qîrarê ye, qîrara wî îzbatbûyî nîne] nava hemû tiştîda guman nîne [wekî ew difikire, texmîn dike, qîrar dike].”

Aqûb 1:5-8, AMP

Wedekî dirêj ez vî cûreyî bûme û min fem nekirîye, wekî mîrêcin dijî min derketîye û wekî deşta şêr hema fikira min bû. Ez nava xaoseke tamda dijîtim û min fem nedikir, ku bona çî usa ye.

“FEMDARÎ” BERBI TEVLÎHEVBÛNÊ DIBE

“Kêmbawarno! Hûn çîma nava hevda xeber didin...”.

Metta 16:8

Hetanî niha me derheqa dudilîbûnêda xeber dida, lê serê kitêbêyî mayînda emê bi hûrgilî derheqa şikberîyada xeberdin. Niha ez dixwezim diha zêdetir derheqa tevlihevîbûnêda, şaşbûnêda xeberdim.

Piranîya cimeta Xwedê bi tomerî hildayî, nava şaşbûnêdane. Bo çi? Çawa ku me îdî dit, menîke wê yekê hema dudilîbûn e, lê ya mayîn fikirdarî ye. Ferhengêda xebera “fikirdarî” vî cûreyî tê şirovekirinê: “menîya, yan jî fakta bi lojîkî (lojîkî) bidine şirovekirinê”, lê çawa kirin, vî cûreyî tê şirovekirinê, “lojîkayê bidine xebatê, bi lojîkî bifikirin”.

Meriv dikare vî cûreyî diha hêsa şirove bike: bi rîya fikirdarîyê meriv dicêribîne formê bide her qewimandinekê. Fikirdarî mêriv mecbûr dike, ku bi fikirê her halekî guvtugo bike, her pirsekê, yan qewimandinekê, bicêribîne beşên wane dijwar fem bike. Nava fikira xweda em gotinekê, yan jî hînkirinekê gotûbêj dikin, bona ku birîyarkin, ku ew bi çiqasîva nêzîkî aqila ye.

Mîrêcin gelek cara, me bi rîya fikirdarîyên me, jî mîyaserkirina xwestina Xwedê dixalifîne. Diqewime Xudan bona kirina tiştêkî rêberîyê li me dike, feqet, eger ew yek bona me çawa ne nêzîkî aqila tê texmînkirinê, wî çaxî em dixwezîn wê yekê hesab hilnedin. Xwedê rêberîyê li mêriv dike, ku ew tiştêkî bike, lê her dem nîne, wekî bona mêriv ew yek çawa tiştê nêzîkî aqila bê texmînkirinê. Ruhê wî dikare xwestina Xwedê qebûlke, lê fikira wî dikare înkare bike, bi taybetî wî çaxî, wekî bona mêriv ew yek çawa tiştê nêzîkî aqila nayê texmînkirinê, eger pêwîstî hebe ku ew qurbanîyê bike. Her dem jî baş e, wextê ku ruh û fikir bi hevra qayîlin, lê eger qayîl nînin, em gerekê ruh bibijêrin.

TESLÎMÎ FIKIRA XWE NEBE, AWQASÎ GURA RUHDA BE

“Lê meriv wan tiştên Ruhê Xwedê qebûl nake, bi ya wî ev yekana tiştên bêhişî ne û ew nikare fem bike, çimkî halê wan tiştê bi ruhanî tînenekirinê (guftugokirinê).

A Korintî 2:14

Ez dixwezîm meseleke şexsî bînim ber çeva, û ez gumanim ewê alî we bike, ku hûn firqîya di navbera fikirdarîya bi fikirê û bi gurêdabûna bi ruh fem bikin.

Rojekê ez hazir dibûm biçûma berevbûneke civînêye li bajarê me û ez derheqa jinekêda fikirîm, ya ku alîkareke qulixdarîya meye amin bû. Dilê minda xwestinek pêşda hat, ku ez cûrekî bona wê jinê dua bikim.

“Bavo,-min dua dikir,- nava van hemû salada Hrût bona me duakî gelekî mezin bûye. Ez çi dikarim bikim, bona duakirina li wê?”. Nişkêva berê min kete li ser kincê sorî dardakirî û dilê xweda min fem kir, wekî Xudan dixweze, ku ez wî kincî bidime Hrûtê. Neniherî wê yekê, wekî sê meh pêşda min ew kinc kirîbû û min pêra negîhandibû li xwe bikira. Min gelekî ew kinc begem dikir, lê wextê ku ez derheqa xwekirinêda difikirîm, xwestina min unda dibû.

Niha em bidine kifşê, wekî min got, wextê ku berê min kete li ser wî kincî, wî çaxî min fem kir, wekî ez gerekê wî kincî pêşkêşî Hrûtê bikim. Feqet min nedixwest ew yek bikira. Û, bêguman, ez dîsa fikirîm, wekî bawar nekî ku Xwedê minra bigota ku ez wî kincî pêşkêşî Hrûtê bikim. Xêncî wê yekê ew kinca gelekî giranbiha bû, teze bû û min anegorî wî kincî guharên sor û zîv dest anîbûn.

Eger min îzin neda, ku fikira min tevî wê yekê bûya û ruhê xweda min dengê Xwedê guhdar bikira, wî çaxî hemû tiştê baş bûya. Feqet em bi xwe, bi rîya fikirdariya xwe dikarin xwe bixapînin, wextê ku em naxwezin wê yekê bikin, çi ku Xwedê dibêje me ku em bikin. Piştî çend deqa min pêra gîhandibû wê yekê bîr bikim û ez derbazî karên xwe bibûm. Rastî ew bû, wekî min nedixwest wî kincî bidim, çimkî ew nû bû û gelekî li min xweş dihat. Ez teslîmî fikirên xwe bûm û ez fikirîm, wekî xwestina min ji Xwedê nîbûye û wekî mîrêcin dicêribîne wê yekê bidize, çi ku li min xweş tê.

Piştî çend hevtîya, ez careke mayîn hazir bûm biçûma berevbûnê û dilê minda dîsa navê Hrûtê hate bihîstinê. Min destpê kir bona wê dua bikim û min got: “Bavo, bi sala ser hev Hrût bona me duayê usa mezin bûye. Ez bona wê çi dikarim bikim?”. Û ew hemû tişt dîsa wekilî: min careke mayîn ew kincê sor dît û bi fikira merivatîyê ew yek li min xweş nehat, çimkî ew dem bîr anî (ya ku min gelekî lez dabû bîrkirinê).

Vê carê minra li hev nehat ku ez xilazbim: min yan gerekê ew yek qebûl bikira, wekî Xwedê îdî bersiva duayê min daye û min gerekê gotina Wî bikira, yan jî min gerekê bigota: “Xudan, ez fem dikim, ku Tu ji min çi dixwezî, lê ez hazir nabim wê yekê bikim”. Ez Xudan gelekî hiz dikim û ez nikarim bi zanebûn gura Wî nekim. Min destpê kir derheqa wî kincê sorda Wîra xeberdim.

Bona min çend deqe lazim bûn, ku min fem bikira, wekî cara dawî fikirên min carekêra min ji kirina xwestina Xwedê dûrxistin. Min texmîn dikir, ku Xwedê nikare temîyê bide min, ku ez kincê nû pêşkêş bikim. Min usa jî fem kir, wekî Încîlêda nayê gotinê, ku tenê yên kevin pêşkêş bikin. Bona min paşdasekinandina ji kincê nû wê bibûya qurbanîya rast, lê bona Hrûtê wê bibûya duayê rast.

Wextê ku min dilê xwe li ber Xwedê vekir, Ewî nişanî min da, wekî ew kinc bi rastî min bona Hrûtê kirîbû. Bo wê yekê jî min t'û carekê ew kinc xwe nekiribû. Min fem kir, wekî Xudan têra dîtibû, ku bi destî min li wê dua bike. Feqet fikirên mine derheqa kincên sorda cuda bûn, çimkî ez hela hê hazir nîbûm jî wî kincî paşda bisekinîyama, û min nikaribû bi Ruhê Pîrozva bihatama rêberkirinê.

Bîr bînin, wekî anegorî kaxeza Korintiyaye ewlin, anegorî xebera 2:14-a, merivê fizîkî merivê ruhanî fem nake. Fikira mine fizîkî fem nedikir, ku çawa meriv dikare kincê nû pêşkêş bike, lê ruhê min ew yek baş fem dikir.

Ez gumanim, wekî ev mesele wê alî we bike, ku hûn diha baş pirsên girêdayî vê govekêra fem bikin û wê alî we bike, ku hûn anegorî xwestina Xwedê diha zêdetir bijîn, lê ne ku berê.

Eger bona we hewaskar e, ku gelo Hrûtê ew kincê sor çawa pêşkêş stend, yan na, ez bêjim, wekî belê, ewê stend. Niha ew xebatkareke qulixdarîya me ye û carna ez li cîyê xebatê ewê bi wî kincîva dibînim.

Piştî xwekirina wî kincê sor, piştî çend sala, Hrûtê ew pêşkêşî min kir. Ew niha awqasî jî modêrn nîne, lê ez wî kincê xwekirî, yê bi stîla kevin, bona bîranînê xweyî dikim, bona ku ez bîr nekim ku fikirdarîya xwe teslîmî Xwedê bikim.

BIBE MÎYASERKIRÊ “XEBERÊ”

“Xeberê biqedînin [gura bangê bikin], ne ku tenê bibihên û usa xwe bixapînin [bi xapandinê dijî rastîyê dernekevin]”.

Aqûb 1:22, AMP

Her car, bi femkirina wê yekê, ku Xeber çi dibêje, em wê yekê naqedînin, em îzinê didin, ku fikirdarîyên me me bixapînin û nava

encamên wê yekêda em bawarîya xwe li wê yekê tînin, çî ku rast nîne. Gerekê diha zêde wede bê xerckirinê (bi fikirê) bona femkirina wî hemû tiştî, çî ku nava Xeberêda tê gotinê. Em dikarin pêşda bilivin, eger em nava xweda rêberîyê texmîn dikin.

Min da eşkerekirinê, wekî Xwedê ji min dixweze, ku nava hemû tiştîda ez gurêda bim, nenihêrî wê yekê, ku ez wê yekê dixwezim, yan na, ku ez hiz dikim, yan na, ku ez hesab dikim fikira baş yan na.

Wextê ku Xwedê bi rîya Xebera Xwe yan jî dilê meda xeber dide, em gerekê derheqa wê yekêda bifikirin, guftugo (enene) bikin, yan jî pirsê bidine xwe, ku gotinên Wî bi çiqasîva nêzikî aqilane.

Wextê ku Xwedê tiştêkî dibêje me, em gerekê wê yekê carekêra mîyaser bikin, lê ne ku bifikirin.

GUMANA XWE BIDE LI SER XWEDÊ, LÊ NE LI SER FIKIRDARÎYA MERIVATÎYÊ

“Bawar bike, gumana xwe bide ser û bi dilê xwe, bi tamamîya fikira xweva nava Xudanda qewîn be, û gumana xwe nede ser femdarîya xwe”.

Gotinên Silêman 3:5, AMP

Bi gilîkî mayîn gotî gumana xwe nedine ser femdarîya xwe. Ew yek dergê xapandinê li ber we vedike û we dibe berbi şaşîyê.

Carekê min ji Xudan pirsî: “Gelo bona çî awqas meriv nava şaşbûnêda dijîn”. Ewî bersiv da: “Bêje wana, ku ew dudilî nebin û wî çaxî ewê nekevîne nava şaşbûnê”. Ez hatime ser wê fikirê, wekî ew yek bi tamamî rast e: fikirdarî û şaşbûn hevva girêdayîne.

Em dikarin nava xweda dora tiştêkî bifikirin, dikarin wê yekê bînin ber Xudan û bibînin, wekî ew dixweze wê pirsê bona me usa bêje, ku femdarîbe, yan na? Wextê ku em texmîn dikin, wekî ketine nava halê şaşbûyî, wî çaxî zelal dibe, wekî bi fikirdarîyên xwe em gelekî dûr çûbûn.

Fikirdarîya merivatîyê bi çend menîyava qezîya ye, lê ji wana yek ev e, em dikarin bifikirin û tiştêkî fem bikin, ya ku bi fikira me dikare nêzikî aqila be, lê ew yek dikare bi tamamî şaş be.

Logîka, qeyde û fikirdarîya rast nêzîkî fikira merivatîêne. Li fikirê xweş tê ku tevî tiştên femdarî bişuxule. Bo wê yekê jî em nava fikirên xweda hemû tiştî datînine cîyê wan û vî cûreyî difikirin: “Vê yekê lazîm e vî cûreyî bikin, lê vêya jî vî cûreyî, bona ku hemû tişt anegorî hev bin”. Carna li cem me hemû tişt anegorî hev dibe, lê bi kutasî tamam şaş dibe.

Pawlosê şandî Romayî 9:1-da dibêje: “Ez bi Mesîh, bê xêlif rast dibêjim û îsafa min jî bi saya Ruhê Pîroz minra şedetîyê dide”. Pawlos zanibû, wekî ew karê qenc dike, çimkî derheqa wê yekêda ruhê wî şedetî dida, lê ne ku fikirdarîya wî.

Me çawa îdî dît, fikir carna alî ruh dike. Fikir û ruh hevkarîyê dikin, lê çawa jî hebe, diha gelekî gerekê cîh bidine ruh, lê ne ku fikirê.

Eger ruhê xweda em zanin, wekî tişteke usa nîne, wî çaxî em gerekê îzinê nedin, ku fikirdarîya me wekî mayîn bêje. Usa jî, eger em nava rastîya kirinekêda gumanin, wî çaxî em gerekê îzinê nedin, ku fikirên me dijî wê yekê derkevin.

Xwedê nava gelek pirsada femdarîyê dide me, lê her dem nîne, wekî em fem dikin, ku jîyana tevî Xudan, mayîna nava gura Wî û xwestina Wîda çi dide kifşê. Wedê usa dibe, wextê ku Xwedê li ser rîya jîyana me pirsê dide sekinandinê û bi wî cûreyî mecalê dide me, ku em nava bawarîyêda bighîjin. Ew pirsên bê bersiv jîyana bedenî xaç dikin. Mêrivra gelekî dijwar e ji fikirdarîya paşda bisekine û gumana xwe bide li ser Xwedê, lê wextê, ku ew yek dibe, nava fikirêda rihetî pêşda tê.

Fikirdarî “mijûlîya” nava fikirê da ye, ya ku dijwarîya bona cudakirina tişta ye ji hev û zanebûna eyantîyê pêşda tîne. Di navbera zanebûnên fikirdarîyê û zanebûna eyantîyêda firqîya mezin heye.

Ez nizanim hûn çawa, lê ez dixwezim, wekî Xwedê tiştên ku nabin usa li min eyan bike, wekî ez nava ruhê xweda bizanibim, wekî hemû tiştê nava fikira mînda eşkerebûyî rast e. Ez naxwezim bifikirim, hesab bikim, dîna xwe bidime logîkayê, bêyî sekinandin wan pirsê serê xweda bizvirînim, hetanî ku biwestim û bi tamamî bikevime nava

şaşbûnê. Ez dixwezim wê edilaya fikirê û dil bibînim, ya ku tê, wextê ku em destpê dikin li Xwedê gumanbin, lê ne ku gumana xwe bidine ser femdarîya xweyê merivatîyê.

Em gerekê bighîjin, pêşda herin û bighîjine wê derecê, wekî em Wî naskin, Yê ku hemû tiştî zane.

QIRAR (BIRYAR) BIKIN KU XÊNCÎ MESÎH T'U TIŞTÎ NIZANIBIN

“Ez jî gava hatime cem we xwîşk-birano, ez bi xeber yan serwaxtîya kemale giran nehatim sura Xwedê weva eyankim [derheqa Wî da, çi ku Ewî bi destî Mesîh bona xilazbûna merivatîyê kiribû] bi xeberên filosofîya û serwaxtîya merivatîyêye babax. Çimkî min qirar kirîye t’u tiştî nizanibim [t’u zanebûnekê nîşan nedim], pêştirî Îsa[Mesîh] û Ew jî Yê xaçbûyî”.

A Korintî 2:1,2 AMP

Pawlos vî cûreyî nêzîkî zanebûnê û fikirdarîyê dibû û nêzîkbûna wî bona min femdarî bû û ya qebûlkirinê bû. Gelek wede derbaz bû, wextê ku min fem kir, wekî gelek cara çiqasî hindik ez dizanim, awqasî gelekî ez xwe bextewar texmîn dikim. Carna em awqas gelekî dizanin, wekî em dibine merivên bêbext.

Ez her dem şexseke hewaskar û lêpirsîyar bûme. Bona wê yekê, min gerekê ese, hetanî dawîyê, hemû tişt bizanibûya. Xwedê nîşanî min da, wekî fikirdarîya mine hertimî menîya şaşbûna min bûye û wê yekê dijwarî bona min pêşda anîye, ku ez nikaribim ji Wî wê yekê bistînim, çi ku Ewî dixwest bida min. Ewî got: “Coys fikirdarîyên xweyê merivatîyê înkâr bike, eger tu hela hê dixwezî tiştên ruhanî ji hev cuda bikî”. Niha ez fem dikim, wekî min xwe diha bi guman texmîn dikir, wextê ku hemû tişt bona min femdarî dibû. Min nedixwest nava jîyanêda tişteki unda bikim. Min dixwest hemû tişt bin kontrolêda xweyî bikira û wextê ku min tişteki fem nedikir, min destpê dikir bitirsîyama û xwe unda dikir. Feqet wextê ku hemû tişt zelal û femdarî bû, çawa jî hebe, tişteki hela hê kêmbû: nava fikira minda edilayî tune bû, lê fikirên hertimî ez bi fîzîkî westandibûm.

Aktîvîya fikirdarîyêye vî cûreyîye şaş bi kutasî westandina fîzîkî pêşda tîne. Ew qewatê ji we distîne.

Xwedê dew kir, ku ez ji wê yekê paşda bisekinim û ez jî we hemûyara dibêjim, yên ku fikira minva girêdayîne, bila wî cûreyî bikin. Belê, min got girêdana fikirêva. Meriv dikare aktîvîya fikira şaşva wî cûreyî girêdayî be, çawa ku meriv narkotîka, alkoholê û nîkotînêva tê girêdanê. Ez wî cûreyî bûm û bona min gelekî dijwar bû, ku ji wê yekê azabim. Ez şaşbûyî û tirsyayî bûm, çimkî min nizanibû, ku çi diqewimî. Ez serbara serda aciz dibûm.

Min awqas wede û cedandin li ser fikirdarîyê xerc dikir, wekî wextê ku ez ji wê yekê dûr ketim, ez mecbûr bûm halê fikira xweye edilra bijîm. Hinek wede ew yek bona min çawa acizî dihate texmînkirinê, lê niha ez ji wê yekê lezetê distînim. Belê, min îzin dida fikira xwe, ku ew li her cîya bigere, lê niha ez nikarim wê êşê û wî cefayî qebûl bikim, bi kîjana fikir dihatine rêberkirinê.

Anegorî progirama Xwedê, fikirdarîyên hertimî bona femdarîya me halê normal nîne.

Bizanibin, wekî wextê mejûyê we bi fikirava tijî ye, ew yek normal nîne. Bona wî mesîhîyî normal nîne, yê ku dixweze bi jîyana serkeftîva bijî, û bona wî bawarmendî, yê ku dixweze nava wî şerîda ser bikeve, yê ku nava fikira wîda tê kirinê.

Serê
11-a

*Fikira ku bawar
nake û şikber e*

Gelek cara em derheqa şikberîya nebawarîyêda usa xeber didin, wekî tê bêjî ew yekin. Rast e, wekî nenihêrî wê yekê ku şikberî û nebawarî hevva girêdayîne, lê çi jî hebe, ew du tiştên cudane. Anegorî V. Ê. Wayn “Ferhenga şirovekirina xeberên Încîlên Kevin û Nû” xebera şikberî vî cûreyî tê şirovekirinê, “...sekinandina li ser du rîya û meriv nizane kî alîda here, bawarîya tam tune... xemgînbe, ketina nava halê fikirên undabûyî, ketina nava gumanê û tirsê...”.

“...Kêmbawaro, çima tu dudilî bûyî?”

Metta 14:31

“Û ew ser nebawarîya wan ecêbmayî bû...”

Marqos 6:6

Hema ew ferheng xebera “nebawarî”, ji yûnanî tercimekirî, vî cûreyî şirove dike, “gurênekirin”, bi tercima Kîng Cêyms.

Eger van herdu tiştên em çawa sîlihên dijmine qewat lê binihêrin, emê bibînin, wekî şikberî mêriv mecbûr dike, ku di navbera du fikirada dudilîbe, lê nebawarî jî berbi gurênekirinê dibe.

Bi fikira min, wê bona me kardar be bizanibin, ku mîrêcin konkrêt bi alîkarîya çi dicêribîne êrîşê bîne ser me. Gelo em rastî şikberîyê yan nebawarîyê tên?

ŞIKBERÎ

“...Hûnê hela hê gelekî di navbera du fikirada dudilîbin?...”

G Padişatî 18:21, AMP

Carekê min serhatîk bihîst, ji kîjanê zela bû, ku şikberî çi ye.

Merivek nexweş bû û her dem xeberên Încîlêye derheqa doxtirîyêda elam dikirin, bawar dikir, wekî ewê mîyaserbûna ecêba xwe bibîne. Bi wê yekêva tevayî, carina fikirên şikber êrîş dianîn li ser wî.

Bona wî gelekî dijwar bû, û ew îdî aciz dibû, wextê ku Xwedê nişkêva dinîya ruhanî nişanî wî da. Û awa ewî çî dît: cin her dem guhê wîda dikire piste-pist û derew dikirin, ku gîva ewê qenc nebe û wekî elamkirina Xeberê wê alî wî neke. Feqet ewî usa jî dît, wekî her car, wextê ku Xeber ji devê wî derdiket, ji devê wî tê bêjî ronahiya mînanî şûr derdiket, kijanê cin mecbûr dikir xwe bicivîne ser hev, bikeve.

Bi saya evê dîtinoka Xwedê, vî merivî fem kir, ku berdewamkirina elamkirina Xeberê bona çî girîng e. Ewî usa jî fem kir, wekî rûyê bawarîya wîye heyîda cin her dem fikirên bi şikberîyava tijî wîra dişîne.

Şikberî ji Xwedê nayê. Încîlêda tê gotinê, wekî Xwedê “çapa bawarîyê” dide her kesî (binihêre Romayî 12:3). Xwedê bawarî kirîye dilên me, lê mîrêcin dicêribîne bi rîya şikberîya wê yekê tune bike.

Şikberî bi rîya fikira tê nava jîyana me, yên ku li ber Xebera Xwedê ber xwe didin. Bo wê yekê jî em gerekê Xebera Xwedê baş bizanibin. Xêncî wê yekê, eger em Xeberê baş bizanibin, wî çaxî emê derewa mîrêcin bi hêsanî cudakin. Bizanibin, wekî ew derewîn e û meremê wî ew e, ku me ji wî hemû tiştî miqûf bihêle, çî ku Îsa bi saya mirina Xwe û rabûna ji nava mirîya, bona me dest anî.

ŞIKBERÎ Û NEBAWARÎ

“Birahîm, yê ku gumana wî îdî tune bû, lê gumana xwe dabû ser bawarîyê, wekî bo wî soz hatibû dayînê, ku ewê bibe bavê gelek mileta û nisiletên bêhesab.

Ew bawarîya xweda zeyîf (sist) nebû, wextê ku ewî bêkêrîya qalibê xweye [tam] hesab hilda, yê ku îdî mîna mirîya bû, çimkî ew îdî nêzikî sed salî bû û ne jî betina Seraêye[mirî]nihêrî.

Ne nebawarî û ne jî bêgumanî [pîrsên şikber] ew derheqa sozdayîna Xwedêda dudilî nekirin, lê ew diha qewat bû û bi bawarîyê qewat stend, şikirî û razîbûn da Xwedê. Ew bi temamî hate ser wê qîrarê, wekî Xwedê dikare Xebera Xwe xweyke, bo qedandina sozdayînê”.

Romayî 4:18-21, AMP

Wextê ku ez şerkarîyê dikim û zanim, ku Xwedê çî soz daye min, ez li ber êrişên şikberîya û nebawarîyêye gur ber xwe didim, beşên nivîsarên pîroz dixwînim û difikirim.

Xwedê soz dabû Birahîm, wekî wê zuretê bide wî. Sal derbaz dibûn, lê zarokên Birahîm û Serayê tunebûn. Birahîm mînanî berê dîsa nava bawariya Xweda qewîn bû, ewî zanibû, wekî Xwedê wê ese Sozê Xwe biqedîne. Car-carna ew dikete bin êrişên bi fikirên şikberiyava tijî, lê ruhê nebawariyê usa dikir, ku ew ji gura Xwedê derkeve.

Nava halê vî cûreyîda gurênekirin dide kifşê ku tu teslîm dibî, nenihêrî wê yekê, wekî Xwedê berbi pêşkeftinê dide kifşê. Gurênekirin ne tenê teribandina deh temîya ye, lê ew usa jî hesabhilnedana wê yekê ye, wekî Xudan bi xwe mera xeber dide.

Birahîm nava bawariya xweda qewîn bû. Ewî dîsa pesinê Xwedê dida. Încîl dibêje, wekî bi kirina wî cûreyî ew nava bawariyêda gihîşt.

Wextê ku Xwedê tişteki temî dike, yan jî tişteki hîvî ji me dike, wî çaxî bona kirina wê yekê ew usa jî bawariyê dide, ya ku tevî Xebera Xwedê tê. Ji aliyê Xwedêda wê tişteki valabûyî bûya, eger Ew ji me hîvîya tişteki bûya û karebûna bawariyê neda me, ku em bikaribin gotina Wî mîyaserkin. Mîrêcin zane, ku em bona wî qezîyake çawa raber dikin, wextê ku dilên me bi bawariyêva tijî dibin û bo wê yekê jî ew bi şikberîya û nebawariyê êrişê tîne ser me.

Gilî derheqa wê yekêda nîne, wekî bawariya me tune. Lê ew e, wekî mîrêcin dicêribîne bi derewê bawariya me tune bike.

Îzinê bidin, ku ez meselekê (mînakekê) bînim. Ezê bêjim, ku çawa Xwedê bona qulixê gazî min kir. Ew mînanî rojên hertimî, bêyî t'u tiştî, şebeq bû. Sê hevtîya pêşîya wê rojê, ez bi Ruhê Pîrozva hatibûme nixumandinê. Min dengnivîsara dersa "Derbazî aliyê mayîn bin" bihîst, û ez zendegirtî mam ku çawa ders dikare hewaskar be, wextê ku ew sehetekê, li ser hîmê xebereke pîroz hatibû terîfkirinê.

Wextê ku min nivînên xwe berev dikirin, min nişkêva texmîn kir, wekî dilê minda xwestineke mezin pêşda hat, ku ez Xebera Xwedê bidime hînkirinê. Paşê dengê Xwedê hate bihîstinê: "Tê herî gelek cîya û tê Xebera Min hîn bikî. Qulixdariya te wê bi saya dersên dengnivîsar mezin bibe". Min dengê usa zelal nebihîst, lê dilê xweda derheqa wê yekêda ez pê hesiyam û wê yekê îzin da min, ku ez bawar bikim, wekî ez dikarim wî hemû tiştî bikim, çi ku Xwedê nîşanî min dida.

Bi rastî t'u menîk tunebû, wekî Xwedê bi rastî minra xeber dida, wekî min jî dikaribû ew yek bikira, çî ku Wî digot. Pirsgirêkên min gelek bûn û ez qet mînanî qulixçîya nîbûm, lê Xwedê li vê dinîyayê, yê bêaqil û zeyîf dibijêre, ku ewên zane şerm bikin (binihêre A Korintî 1:28). Ew dilê mêriv, lê ne ku qalibê wî dinihêre (binihêre A Padişatî 16:7). Eger dilê mêriv paqij e, wî çaxî Xwedê dikare qalibê wî biguhêre.

Nenihêrî wê yekê, wekî bingeheke (hîmekî) usa tune bû, ku meriv bawar bikira, wekî Xwedê bi rastî minra xeber dabû, lê wî çaxî, wextê ku min xwestina terîfkirinê texmîn kir, ez bi bawarîêva tijî bûm û min texmîn kir, ku ez dikarim temîya Xudan mîyaser bikim. Wextê Xwedê gazî dike, Ew usa jî xwestinê, bawarîyê û karebûnê dide, bona ku tu Xebera Wî mîyaser bikî. Ez dixwezim serda zêde bikim, wekî nava van salên xwehazirkirinê û hîvîyêsekinandinêda, mîrêcin car-carna bi rîya şikberîya û nebawarîyê êriş dianîne ser min.

Xwedê dilê cimeta Xweda xiyala û progirama bi cûrê toximên biçûk datîne. Çawa ku betinê jinêda toxim qebûl dibe û ew hemle dibe, usa jî em "hemle dibin", wextê ku Xwedê derheqa sozên xweda dibêje û wana nava jîyanên meda elam dike. Wextê "hemlebûnê" mîrêcin bi kel û ced dixebite, ku ew xiyal "ji ber me herin". Çawa sîlih, ew şikberîyê, yan jî nebawarîyê dide xebatê. Her du jî wextê êrişên dijî fikirê tên xebitandinê.

Bawarî berên ruh e û ew tê hesabê çawa qewata ruhanî. Dijmin naxweze, ku fikira me anegorî ruhê me be. Ew zane, wekî eger Xwedê bawarî daye me, ku em xebatekê mîyaser bikin û eger em fikira xwe li ser wê yekê didine merkezîkirinê, wî çaxî em dikarin zyana mezin bidine padişatîya wî.

GERA LI SER AVÊ BERDEWAM BIKE

"Lê qeyîk îdî di navbera behrêda bû, ji kenar gelekî dûr ketibû, rûyê pêlada diçû-dihat, çimkî ba miqabilî wê bû.

Qereberbangê [ji sehta sisîya hetanî şeşa] Îsa li ser avêra digerîya, hate cem wan.

Wextê ku şagirta dît, ku Ew li ser behrêra digerîya, tirsîyan û gotin: "Eva xeyal e". Û wana ji tirsîsa kire qîrîn.

Îsa deng da wan û got: “Ser xwe bin! Ez im! Netirsîn!”. Û Petrûs lê veşerand û gotê: “Xudan, eger Tu yî, emirke, ku ez ser avêra bême cem Te”.

Ewî got: “Were!”. Û Petrûs ji qeyikê peîya bû, ser avêra çû berbi Îsa. Lê çaxê ewî bayê qayîm dît, tirsîya û wextê ku destpêkir niqo be, kire qîrîn: “Xudan, min xilaz ke [ji mirinê]”.

Îsa Xwe pêra gîhand, destê Xwe dirêjî wî kir, girt û gotê: “Kêmbawaro, tu çima dudilî bûyî?”.

Û çaxê ew ketine qeyikê, ba sekinî.”

Metta 14:24-32, AMP

Min xeta dawî daye dîyarkirinê, cudakirînê, xwestîye guhdarîya we teglîfî li ser wê yekê bikim, ku dijmin progiramên çawa hazir dike. Bi guhdarkirina xeberên Îsa, Petrûs ji qeyikê derket bona ku wê yekê bike, çî ku ewî t’u cara nekiribû. Dêmek, xêncî Îsa kesekî mayîn li ser avêra negerîya bû.

Bona wê yekê bawarî lazim e.

Petrûs şaşî kir: ewî gelekî dirêj li bayê nihêrî û tirsîya. Şikberî û nebawarî hukumî li ser wî kirin û ewî destpê kir niqo be. Petrûs gazî Îsa kir, û Ewî alî wî kir. Feqet guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî wextê ku Petrûs careke mayîn kete qeyikê, ba sekinî.

Xeberên Romayî 4:18-21 bîr bînin, li kîderê Biraîm nava bawarîya xweda qewîn e, nenihêrî wê yekê, wekî halê wî yê gumanbirîyê bû. Li wir Biraîmra hemû tişt eyan bû, lê himberî Petrûs, qewilên wî bona bawarîyê ne dijwarî bûn. Diqewime ew derheqa wê yekêda nedifkirî, yan jî xeber nedida. Fikir û qîsa wî tevî Xwedê bûn. Em dikarin halên xwe fem bikin, lê çawa jî hebe em gerekê fikirên xwe li ser wê yekê bidine merkezkirinê, çî ku wê şênbûnê bide me û bawarîya me bide qewînkirinê.

Awa bo wê yekê jî Biraîm dîsa pesinê Xwedê dida. Razîbûna me nava wê yekêda dîyar dibe, wekî em wî çaxî jî rast dikin, wextê ku hêsa nîne. Efesî 6:14-da nivîsar e, wekî wextê kirina şerê ruhanî em gerekê qayîşa xweye rastîyê qewîn girêdin.

Wextê ku nava jîyana meda bobelîsk tîn, em gerekê “qewîn bèn nikandinê”, enîyên xwe bidine qewînkirinê “bi Ruhê Pîrozva tijî

bin û paşda venegerine qeyîkê. Em dikarin bêjin, “derkeve û paşda venegere”. Gelek cara, wextê ku hûn naxwezîna temîyê mîyaser bikin û paşda vedigerine li wir, li kîderê bêqezîya ye, ba disekine.

Mîrêcin nava jîyana weda bobelîska tîne, bi wî meremî ku we bitirsîne. Wextê wî bayî bizanibin, wekî fikir deşta şêr e. Qirara (birîyara) li ser hîmê fikir û texmînkirîna xwe qebûl nekin: bila ruh kirîna we kontrol bike. Bi kirîna wî cûreyî hûnê ruhê xweda careke mayîn wê dîtînekê bibînin, ya ku pêşda we jî Xudan stendibû.

DUDILÎBÛN GEREKÊ TUNEBE

“Eger serwaxtîya yekî jî we têra wî nake, bila hîvî jî Xwedê bike [Yê ku dide] hemûya aza û bêyî dîtîna şaşîya, t’u kesî bêqedir nake û jî wîra wê bê dayîne.

Lê tenê bila bi bawarîyê be, û bêyî şikberî hîvî bike [dudilî nîbe, şikber nîbe]. Çimkî, ewê ku şikber e [dudilî ye], ew mînanî pêlên behrê ye, ku jî bayê bilind dibin û datînin.

Bi rastî merivê wî cûreyî bila nefikire, wekî ewê tiştêkî [ku hîvî dike] jî Xudan bistîne”.

Aqûb 1:5-7, AMP

Serwêrekî gilî dikir, ku çawa, piştî serhevdaanîna kolêca Încîlê, ketibû nava şaşbûnê, wextê ku ewî xwestibû nava pîrsekêda birîyara xwe qebûlke. Xwedê dilê wîda danîbû, ku piştî kolêcê ew vegere Sên-Lûîyê, Mîssûrîyê û li wir civîneke nû çê bike û ew hazir dibû ew yek bikira. Feqet wextê ku wedê çûyîne nêzik dibe, hal usa dibe, wekî berîka wîda tenê pêncî dolar bûne. Xêncî wê yekê ew gerekê tevî zarokê û jîna hemle biçûya. Usa dihate kifşê, wekî ew hal miqabilî wî bû.

Ewî dicêriband birîyara rast qebûl bikira û wî çaxî du qulixdarîyên mezin xebata bi miaşa bilind wîra soz didin. Pêşnîyar ber çevên wî gelekî baş bûn, lê micala qulixkirîna li qulixdarîyên mezin jî kêfa wî dianîn. Ew çiqasî zêde derheqa wê pêşnîyarêda difikirî, awqasî zêde ew dikete nava şaşîyê. (Tê bêjî “birêz şikberî” bi seredan hatibû cem wî, ne usa ye?).

Hebû wede, wekî ewî zanibû, ku çî dixwest, lê niha ew dudilî bû. Ji wî çaxîda, wextê ku halê bona çûyîna Sên-Lûiyê wekî mayîn bibû, xwestina qebûlkirina her du pêşniyarên mayîn diha mezin bibû, lê dilê wîda edîlayî tunebû. Paşê ew berbirî serwêrekî bû, yê ku xebat pêşniyar dîkir, ku şewirê bide wî, yê ku bersiveke zane da wî: “Bi hinek wede başqebe, hêsabe û ji fikirê, ku te dizêrînin, azabe. Li dilê xwe binihêre, ku li wir çî diqewime, lê paşê derbazî ser kar be”. Ewî guhdarîya şewira serwêr kir û zûtirekê hate ser wê fikirê, wekî xwestina dilê wî çêkirina civîna li Sên-Lûiyê bû. Ewî niznibû, ku wê çawa bikaribûya ew program mîyaser bikira, lê ewî gaweke şikestî avît, ya ku feydayê gelekî baş da.

Roja îroyîn ew serwêr-Rîk Şêlton, hîmdar û serwêrê merkeza mesîhîtiyê ye li Sên-Lûiyêye, Missûriyêye, bi navê “Jîyan”-e. Bi sala ser hev, bi saya qulixa wî, bi hezara meriv tèn duakirinê û guhartinê. Pênc sala ser hev, ez çawa alîkara serwêr bûme: wî çaxî qulixa min pêşda hatîye. Bînine ber çevê xwe, wekî bi rîya şikberîya û nebawarîyê mîrêcin çiqas gelek tişt dikaribû bidizîya, eger Şêltonê serwêr peyî fikira xwe biçûya, lê ne ku guhdarîya dilê xwe bikira.

BIRYAR YA ME YE, ŞIKBER BIN, YAN NA?

“Rojtira mayîn, sibe zû, çaxê ew vejerîya bajêr, birçî bû.

Li ser rê dareke hêjîrê dît, nêzikî wê bû, lê pêştirî belga tiştêkî din pêva nedît [belgên hêjîrê û berên wê bi hevra dighîjin]. Û Ewî darêra got ji vir şûnda tu heta-hetayê ber nedî!” Û dar pêra-pêra hişk bû.

Şagirta ev yek dît, zendegirtî man û gotin: “Çawa ev dara hêjîrê pêra-pêra hişk bû?”

Îsa caba wan da û got: “Ez rast wera dibêjim, eger bawarîya we hebe [gumana qewîn] û dudilî nebin, hûnê ne tenê çî ku hate serê vê dara hêjîrê bikin, lê eger hûn vî çayîra bêjin: “Rabe xwe bavêje behrê”, wê bibe.

Hûn çî nava duada bixwezînin, bila bawarîya we hebe û [rast bawar bikin], hûnê bistînin”.

Metta 21:18-22, AMP

Wextê ku şagirtên zendegirtî ji Îsa pirsîn, ku çawa karibû bi rîya Xeberê darê hişk bike, Ewî wanra got: “Eger hûn bawar bikin û dudilî

nîbin, hûnê bikaribin wê yekê bikin, çi ku Min anî serê darê û hela tişteke jî zêde” (binihêre Yûhenna 14:12, AMP).

Me îdî şirove kir, wekî bawarî pêşkêşa Xwedê ye û bo wê yekê jî em zanin, wekî bawarîya me heye (binihêre Romayî 12:3). Feqet şikberî bijartin e: eva stratêgîya (stratêjîya) mîrêcin e, ya ku ew dijî (miqabilî) me dide xebatê.

Hûn gerekê biryar bikin (qirarkin), ku hûn kîjan fikirê dibijêrin, lê wextê şikberî bê, wî çaxî hûn gerekê hînbin ji hev cuda bikin, bêjin: “Na, spas”, û bawarîya xwe berdewam bikin.

Bijartin ya we ye.

NEBAWARÎ GURÊNEKIRIN E

“Çaxê hatine cem elaletê, merivek nêzîkî Wî bû û li ber wî bi çokdayîne digotê: “Xudan, li kurê min were rehmê. Ew hîvê dikeve û gelekî cefê dibîne, çimkî gelek cara dikeve nava agir û gelek cara jî nava avê.

Min ew anî cem şagirtên Te, lê wana nikaribû ew qenc bikira.

Îsa bersiv (cab) da û got: “Nisilê nebawar û xalîfî, hetanî kengê Ezê tevî we bim, heta kengê Ezê we sebirkim? Ewî bînine vir, cem min.

Û Îsa lê hilat, cin jê derket û kurik pêra-pêra qenc bû. Wî çaxî şagirt başqe hatine cem Îsa û gotin: “Me çima nikaribû ew cin derxista?”. Îsa gote wan: “Bona kêmbawarîya we””.

Metta 17:14-20, KJV

Bizanibin, wekî bêgumanî her dem berbi gurênekirinê dibe.

Bi texmîn, Îsa şagirtên Xwera gilî dikir, ku meriv dikare nava halên wî cûreyîda çi bike, feqet kêmbawarîya wan bû menîya gurênekirina Îsa û bo wê yekê jî neaçixî pêşda hat.

Çawa jî hebe, pirs ew e, wekî kêmbawarî, usa jî çawa şikberî, wê me ji wê yekê paşda bigrin, ku em wê yekê nekin, bona çi Xwedê gazî me kirîye û em rûn kirine. Ewê usa jî me ji edilyê miqûf bihêle, ya ku Xwedê dixweze, ku em bibînin, bi dîtina rihetîya nava Wîda (binihêre Metta 11:28,29).

RIHETÎYA ROJA ŞEMÎYÊ

“Awa em bikin, bi xwe bi kel û ced bixebitin, ku bikevine wê rihetîyê [ya Xwedê] bona ku [em bi xwe bizanibin û cêribandî bin], wekî t’u kes hema ji wê nebawarîyê û gurênedabûnê nekeve, yan jî unda nebe [rûyê çida ewana ketine qûmistanê]”.

Îbranî 4:11, AMP

Eger hûn serê Îbranîyaye 4-a bi temamî bixwînin, wî çaxî hûnê bidine eşkerekirinê, wekî li wir derheqa rihetîya roja şemîyêda xebirdan diçe, ya ku nêzikî Cimeta Xwedê bû. Wextê peymanê Kevin, roja şemîyê çawa roja rihetîyê dihate hesabê. Peymana Nûda derheqa vê şemîyêda çawa cîhekî ruhanîyî rihetîyê xebirdan diçe, ya ku bona bawarmend e. Bona her bawarmendekî reva ji nerihetîya rojê cuda ye. Û çawa mesîhî em dikarin bikevinê û nava rihetîya Xwedêda bimînin.

Xebera 4:11 dide kifşê, wekî tenê bi rîya bawarîyê em dikarin bikevine nava wê rihetîyê, lê nebawarî û gurênekirin wê me ji wî mafî (extîyarîyê) miqûf bihêlin, nebawarî wê me li “qûmistanê” xweyke, lê Îsa bona rihetîya me fikirîye, kîjanê emê bikaribin bibînin, eger bi bawarîyê bijîn.

JÎYANA JI BAWARÎYÊ NAVA BAWARÎYÊDA

“Çimkî Mizgînî dide kifşê, ku Xwedê çawa meriva rast hesab dike, dike kirasê xwe, ev yek ji sêrî heta binî bi bawarîyê ye, çawa nivîsar e: “Yê rast wê bijî, çimkî bawar dike”.

Romayî 1:17

Ez qewimandinekê bîr tînim, ya ku dikare vê yekê zelal bike. Rojêkê êvarê, ez li malê digerîyam û min dicêriband bi karên malêva mijûlbim. Min xwe gelekî bêbext texmîn dikir, şabûn tune bû, dilê minda edilyê tune bû. Min her dem pirs dida Xudan: “Gelo ev çi diqewime?”. Ew yek gelek cara diqewimî û min bi rastî dixwest menîya wê yekê pê bihesiyama. Min dicêriband usa bijîm, çawa ku merivê ku peyî Mesîh diçe gerekê bijî, lê min tiştêk tê berdida.

Hema wî çaxî zengilê têlêfonê lêxist. Wextê qisê min destpê kir bûklêtên bi xeberên pîrozî binhêrim, yên ku pêşkêşî min kiribûn. Bi rastî wî çaxî min ew nedixwendin, awqasî wextê qisa bi têlêfonê min belgên wê weldigerandin.

Wextê ku min qisa bi têlêfonê ser hevda anî, min qîrar kir ji wan bûklêta yekê bikişînim û lê binihêrim, ku gelo nivîsara li ser bûklêta wê ber dilê mînda bê yan na.

Min ya Romayî 15:13 kişand: “Bila Xwedêyê gumanê dilê we bi şabûnê û edilaîyêva bikimkimîne, bona wê bawarîya we, wekî gumana we bi Ruhê Pîroz zêde be”.

Û min ew dît...

Temamîya menîya pîrsgirêkên min şikberî û nebawarî bûn. Bi bawarkirina derewên mîrêcin min xwe bêbext dikir. Ez bi cûrekî xirab nêzik dibûm. Li cem min ne şabûn, ne edilaîyê hebûn, çimkî bawarîya min tunebû. Ew yek tiştê bûyînê nîne, ku nava nebawarîyêda bijîyî û pêra jî şabûn û edilaîyê hebin.

Biryarê (qîrarê) qebûlkin, ku bawarîya xwe li Xwedê bînin, lê ne ku mîrêcin.

Hînbîn ji bawarîyê nava bawarîyêda bijîn. Anegorî xebra Romayî 1:17-a, heqîtîya Xwedê hema bi vî cûreyî tê eyankirinê. Xwedê li min eyan kir, wekî dewsa jîyana ji bawarîyê nava bawarîyêda ez gelek cara ji bawarîyê berbi şikberîya û nebawarîyê derbaz dibûm. Paşê bi wedê kurt ez paşda li bawarîyê vedigerîyam, lê careke mayîn diketime nava şikberîya û nebawarîyê. Bi çûyîna pêş û paş, ez diketime yan vî alî yan wî alî. Bo wê yekê jî nava jîyana mînda awqas neaçixî û bêbextî hebûn.

Bîr bînin, wekî anegorî xeberên Aqûb 1:7,8, merivê dudilî nava hemû rêyên xweda qewîn nîne û wê t’u cara ji Xudan wê yekê nestîne, çi ku dixweze. Qîrar (birîyar) bikin, wekî hûnê merivê dudilî nîbin: nava şikberîyêda nejin! Xwedê bona we jîyaneke baş çê kirîye. Îzinê nedine mîrêcin, wekî ew bi rîya derewa xwe, wê yekê ji we bidize. Dewsa wê yekê “Em betal bikin (çimkî em) îzbatîya û têorîya înkâr dikin, û hemû bilindîyên kubarîyêye miqabilî zanebûna Xwedê (yên rast): û hemû fikira dikine hêsîr, êlimî Mesîh dikin”. (B Korintî 10:5, APM).

Serê
12-a

Fikira xemgîn
û nerihet

Fikirên bi nerihetîyê û xemgînîyava “Hêrs nekeve, neqilqile: bînteng
tiji êrîşê tînin ser me bona ku me nebe, ku xirabîyê biki”
ji meremê qulixkirina bona Xudan (Zebûr 37:8, KJV
dûr bixin. Dijmin van herdu cefa dide
xebatê, bona ku bawarîya me tune bike,
çimkî bêyî bawarîyê em nikarin bi jîyana serkeftîva bijîn. Hinek meriv
nava jîyana xweda awqasî xemgîn dibin, wekî tê bêjî îdî bûne dilê
(hêsrê) wan. Eger ew nava jîyana xweda menîya nerihetîyê nabînin,
ew destpê dikin bona jîyana merivên mayîn menîya nerihetîyê bigerin.
Tiştê usa rastî min hatîye û ez dikarim wî halî bi hûrgilî wera gilîkim.

Ez her dem bona tişteki xemgîn dibûm û min nikaribû ew edilayî
bidîta, ya ku bi saya mirina Îsa bona min hatibû dayînê.

Ew yek tiştê bûyînê nîne, wekî meriv xemgînbe û bi wê yekêva
tevayî edilaya ruh xweyke.

Edilayê nikarin bi mecbûrî bidine mêriv, ew berê Ruh e (binihêre
Galatî 5:22), lê ber feydayê mayîna li ser çiqê ye (binihêre Yûhenna 15:4).

Lê mayîn ketina nava “rihetîya Xwedê”va girêdayî ye, derheqa çida
serê Îbranîayî 4-da û parên Încîlêye mayînda tê gotinê. Îsa Edilaya xwe
da me (Yûhenna 14:27) û got, wekî em gerekê bitirsin û nerihetbin. Bi
gilîkî mayîn gotî, edilayî bo me pêşkêş e, lê bijartina meva girêdayî ye, ku
çiqasî bi edilayêva tijîbin: em gerekê derheqa wan tiştada bifikirin, yên ku
alî edilayê dikin, lê ne ku derî bona nerihetîyê û xemgînîyê vekin.

Încîlêda meriv dikare hinek xeber û gotinên derheqa xemgînîyêda
bibîne, girêdayî wê yekêva, ku ew çi tercime ye. Nava Kîng Cêymse
Încîlêda xebera “nerihetî” nayê xebitandinê. Zebûr 37:8-da tê gotinê
“hêrs nekeve” û xêncî wê xeberê gotinên usa tînen xebitandinê, yên
mînanî “xema nekin” (Metta 6:25, Filîpî 4:6), “Hemû xemên xwe
bavêjin...” (A Petrûs 5:7). Ez hîmlî “Tercima Încîlêye Berfirekirî”

didime xebatê, nava kîjanêda tercimên gotinên cûre-cûre hene. Bo ku nava vî serê kitêbêda ez bikaribim xebera xwe bidime zelalkirinê, ezê xeberên “nerihetbûnê” bidime xebatê.

ŞIROVEKIRINA XEBERA “NERIHETÎ”

Wêbstêr xebera “nerihetî” vî cûreyî şirove dike: “dijwarîyê texmîn bikin, yan jî tevlîhev bin”, “nerihetîyê pêşda bînin, xemgîn bin”, “bibine menîya şêr û beşera xirab”. Mîn usa jî şirovekirina wê vî cûreyî bihîstîye: “ji fikirên nerihet cefê bibînin”.

Wextê ku min şirovekirina xeberêye duda dît “nava kîjanêda meriv bi fikirên nerihetva xwe dide cefê, min carekêra qîrar kir, ku ez diha bi aqilanî bişuxulim”. Ez bawar dikim, wekî her mesîhîyek dikare wê yekê bike, çimkî em gerekê ne ku bi xwe cefê bidine xwe, lê bi serwextîyêva diha tijîbin.

Nerihetî karê nade t’u kesî. Bo çi meriv ji wê yekê paşda nesekine?

“Ferhenga nekurtkirî” şirovekirinekê jî dide me: “Bi diranava qirikê bigrin û dawêşînin, yan jî bixeniqînin, çawa ku wê yekê heywan dikin, yan jî bi gesticinê û êrîşê bêqewat bikin”.

Bi fikirmîşbûna derheqa vê şirovekirinêda, min himberîhevkirina vî cûreyî kir, mîrêcin nerihetîyê dijî (miqabilî) me usa dide xebatê, çawa ku li jorê hatîye şirovekirinê. Wextê ku em îzinê didin, wekî nerihetî bi seheta me bizêrîne, wî çaxî, bi rastî, em destpê dikin texmîn bikin, wekî tê bêjî kesek ji qirika me girtîye û awqasî dadîşîne, hetanî ku em bi temamî ji gesticina û êrîşa bêqewatbin. Zivira fikiraye nava mejûda mînanî gesticina û êrîşa ye, ya ku nava şirovekirinêda hatîye dîyarkirinê.

Nerihetî êrîşa mîrêcine li ser mejûyê mêriv e. Serê bawarmendda fikir hene, yê ku dijmin dixweze usa bike, wekî ew t’u cara mîyaser nebin. Bona wê yekê jî, mîrêcin dicêribîne mejûyên mêriv bi fikirên şaşva tijî bike, bona ku mecala mêriv tunebe ku fikira xwe bona wî meremî bide xebatê, ya ku Xwedê têra dîtîye.

Nava serên kitêbêye mayînda emê derheqa wê yekêda xeberdin, ku fikir fûnksîyayên çawa mîyaser dike. Feqet, niha werin em derheqa nerihetîyêda xeberdana xwe berdewam bikin, bona ku em bêkêrîya wê

bi tamamî eşkere bikin. Xeberên Metta 6:25-34, yên Mizgînîyê, kîjana em gerekê her car bixwînin, wextê ku fikira me bin êrîşa nerihetîyêdane, gelekî başin. Werin her xeberekê cuda lêkolîn bikin, bona ku em bibînin, ku Xudan derheqa vê pirsra girîngda çi dixweze bêje.

**NE AXIR JÎYAN ZÊDETIR E,
NE KU HEBÛKA MATÊRÎYALÎ?**

“Lema ez wera dibêjim, bona emirê xwe xema nekin [xemgîn] ku hûnê çi bixun û çi vexun, ne jî bona bedena xwe ku hûnê çi li xwe bikin. Ne emir ji xwerinê zêdetir e [qîmettir] û beden jî ji kinca, [diha gelekî û diha baştir]?”.

Metta 6:25, AMP

Emir bona me çawa qîmetîke mezin hatîye dayînê û em gerekê wî bibînin. Nava Mizgînîyêda, Yûhenna 10:10 -da Îsa got: “Diz tê ku tenê bidize, bikuje û tune bike. Ez hatim, wekî emirê we hebe û bona we zêdetir hebe (usa wekî ji kêlekara birije)” (AMP). Mîrêcin dicêrbîne jîyana me bi cûrên cuda-cuda bidize û ji wan cûra yek jî nerihetî ye.

Xebera Mizgînîyê Metta 6:25 me hîn dike, wekî nava jîyanêda tiştê usa tune, bona kîjanî hewcetî hebe, ku nerihetbin. Jîyana ku ji alîyê Xwedêda bona me hatîye dayînê, gelekî baş e. Nava wêda hebûna matêrîyalîye cûre-cûre heye, lê, eger em destpê dikin bona wana nerihetbin, wî çaxî tevî jîyana ku bo me hatîye dayînê, em wana jî unda dikin.

NE HÛN DIHA QÎMETTIRIN, NE KU TEYREDE?

“Dîna xwe bidine teyredên ezmên. Ewana ne direşînin, ne didrûn û ne jî imbarada dicivînin, lê Bavê weyî Ezmana risqê wan dighîne. Ne hûn ji wan qîmettirin?”.

Metta 6:26

Bona me hemûya wê kardar bûya, ku dîna xwe bidana teyreda: usa gotîye me, Xudanê me. Eger ne her roj, hema carna gerekê wede başqe bikin, ku em bînine bîra xwe, ku ew teyredên “dostên” me çiqasî baş

çareserkirîne. Ew nizanin, ku xwerina wan ji kîderê wê bê. Min t'u cara nedîtye, wekî teyrede li ser çiqîlê rûnê û gelekî bona wê yekê xemgîn be.

Fikira xeberên Xudanê me gelekî zelal e: “Ne hûn ji wan teyreda qîmettirin?”.

Eger fikira weye derheqa weda gelekî bilind nîne, hûn gumanbin, wekî hûn qîmettirin, ne ku teyrede. Dîna xwe bidinê, ku Bavê Ezmana çi cûreyî risqê wan dighîne.

NERIHETÎ ÇI DIDE WE?

“Niha ji we kî dikare bi xema û bi nerihetîyê deqekê ser emirê xweda zêde bike, yan jî emirê xwe bide dirêjkirinê?”.

Metta 6:27, AMP

Xeber zelal dibêje, wekî nerihetbûn bêfikir e. Ew t'u tişteki baş nade. Lê eger ew usa ye, dêmek bo çi meriv gerekê nerihet be û xemgîn be.

BO ÇI NERIHETBIN?

“Û bona kinca hûn çima xem dikin? Dîna xwe bidine sosina û hînbîn, ku çawa şîn dibin: ew ne dixebitin, ne jî dirêsin.

Lê ez wera dibêjim, ku Silêman jî nava wê xêr-xizina xweda [zêdayê, qedir û merîfetê] mîna ji wan yekî xwenekir.

Lê eger Xwedê gîhayê çolê dixemilîne, yê ku îro heye, lê sibê davêjine nava êgir, gelo wê usa jî li we neke?”

Metta 6:28-30, AMP

Çawa mesele (mînak), bi xebitandina efrandineke Xwe, Xudan zelal fikira Xwe dide kifşê, ku eger kulîlka ku tişteki nake, lê ew awqasî bedew û xweykirî ye û ji halê Silêman zêdetir e, wî çaxî em dikarin bi guman bawar bikin, wekî Êwê bona me jî bifikire.

DÊMEK XEM NEKIN Û XEMGÎN NEBIN!

“Dêmek xem nekin û xemgîn nebin, nebêjin, em gerekê çi bixun, yan gerekê çi vexun, yan jî çi li xwekin?”.

Metta 6:31, AMP

Minê bixwesta ev gotin bida berfirehkirinê û nava wêda pirsek zêde bikira: “Em gerekê çi bikin?”.

Ez difikirim, wekî mîrêcin cina dişîne li dinîyayê, teslîmî wan dike, wekî şev û roj guhên bawarmendda wê gotinê bikine piste-pist. Ew nava fikira bawarmendda pirsên dijwar nav hev dixin, lê bawarmend jî wedê xweyî giranbiha li ser wê yekê xerc dike, ku bersivên (cabên) wan bibîne. Mîrêcin her dem li deşta şêr şer dike, fikira mêrivda, û guman e, wekî mesîhî wê bikeve nava wê şerkarîya dirêj û tunekirinê. Bersiva (caba) pirsê mîrêcine bona me “Em gerekê çi bikin?” gerekê gelekî zelal be: “Ez hela hê nizanîm, ku ezê nava vî halîda çi bikim, lê Xwedê zane û ew yek besî min e: Ewê wedê rastda alîyê rast bide min”.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî nava xebera 31-da ew beşa (para) çi dibêje, li kîderê Xudan dibêje, wekî xema nekin, yan jî xemgîn nebin. Bîr bînin, wekî ji merdanîya dil lêv xeber didin (binihêre Metta 12:34). Dijmin zane, wekî eger wîra li hev bê mejûyê me bi fikirên şaşva bide mijûlkirinê, wî çaxî ewê werguhêzî xebera bin. Xeberên me gelekî girîngin, çimkî ew yan heyîna bawarîya me, yan jî tunebûna wê didine kivşê.

XWEDÊ BIGERIN, LÊ NE KU PÊŞKÊŞA

“Pûtparist vî hemû tiştî dixwezin, hîvî dikin û bi cedandin digerin. Çimkî Bavê weyî Ezmana zane, wekî hûn hewcê wan hemû tiştanin. Feqet berî her tiştî padişatîya Wî û heqîtîya Wî [cûrê Wî, yê rast şuxulandinê û rastbûnê] bigerin [bila meremê we hebe û bicedînin], û hemû tiştên mayîn wê bona we bêne dayînê”.

Metta 6:32,33, AMP

Carekêra ber çeva ye, wekî zarokên Xwedê gerekê li dinîyayê cuda bin. Dinîya tiştên matêriyalî digere, lê em gerekê Xudan bigerin. Û eger em wê yekê bikin, Ewî soz daye me, ku wî hemû tiştî bide me, hewcê çine em.

Em gerekê hînbîn sifetê Xwedê bigerin.

Bavê meyî Ezmana wî çaxî pêşkêşa dide zarokên Xwe, wextê ku em wan tiştê ji Xwedê zêdetir nagerin. Xebera “ger” xebereke gelekî qewat

e, ya ku dide kifşê “peyî herin, gelekî bixwezin, bicedînin, reca bikin û bi temamiya qewatê peyî herin”. Xwestina tişteki qedexekirî nîne, lê em gerekê tenê Xwedê bigerin, çimkî bêyî Wî qîmetê t’u tiştî tune.

Xwedê hewcetîyên me zane, û hela pêşda li Wî eyan bûnê. Eger em hewcetî û xwestinên xwe li Wî eyankin (binihêre Fîlîpî 4:6), Ewê wana nava wedê rastda, yê ji aliyê Wida qirarkirî mîyaser bike. Nerihetî wê alî wê yekê neke: ewê tenê dijarîya bona pêşkeftina me pêşda bîne.

BÎ JÎYANA ÎROÎNVA BIJÎN

“Bona roja sibê xema nekin û xemgîn nebin, çimkî roja sibê wê bona xwe xema bike. Xemên her rojekê bona wê nerihetî ye”.

Metta 6:34, AMP

Ez nerihetîyê û xemgînîyê dikarim vî cûreyî şirove bikim, em her rojeke xwe xerc dikin, bona ku roja sibê bînin ber çevê xwe. Werin em hînbîn wedê ji aliyê Xwedêda dayî li ser wê yekê xerc bikin, bona çî Ewî ew yek qirar kirîye.

Jîyanê gerekê bijîn, usa ye werin em wê niha bijîn.

Tiştêki xemgînî ye, lê hindik meriv zanin, ku gerekê çawa rojê diha baş bijîn û diqewime hema hûn jî yekî ji wanane. Îsa got, wekî mîrêcin, dijmin e, tê ku jîyana we bidize (binihêre Yûhenna 10:10). Îzinê nedin, ku ew wê yekê bike. Her rojeke xwe, bi nerihetîyêva, bona roja sibê xerc nekin. Çimkî roja îroyîn gelek karên weye kirinê hene. Xwedê keremê dide we, ku hemû îşên weye roja îroyîn progiramkirî hûnê roja îroyîn mîyaser bikin. Lê kerema bona roja sibê wê sibê bê. Dêmek, her rojeke xwe badîhewa xerc nekin.

XEMGÎN NEBIN

“Bona t’u tiştî xema nekin, lê xwestina we bila bi dua-dirozga, razîbûnêva tevayî, nava her tiştîda û her halekîda [bi hîvîkirinên zelalva], Xwedêva eyan bin”.

Fîlîpî 4:6, AMP

Ev gotin jî gotineke gelekî baş e û hûn gerekê guhdarîyê bidine ser wê yekê, wextê ku xemgînî, nerihetî êrişê tînin li ser we.

Ez ji alîyê xweda wera dibêjim, ku çiqas mecal heye, ku hûn zû-zû Xebera Xwedê elam bikin. Ew gerekê mînanî şûrê herdu alîya tûj be, kîjanî em gerekê wextê şerê miqabilî (dijî) dijmin bidine xebatê (binihêre Îbranî 4:12, Efesî 6:17). Şûrê veşartî wextê şerkarîyê wê alî neke.

Xwedê Xebera Xwe daye me: wê yekê bidine xebatê. Xeberên Încîlêye vî cûreyî ezberî hînbin û wextê dijmin êriş bike, wî çaxî hema bi wî sîlihîva ber xwe bidin, yê ku Îsa dida xebatê, bi Xeberê.

TEXMÎNKIRINÊN XWE BETAL BIKIN

[Çawa ku em] wan hemû şedetîya û melûmetîya û şewira û her tîstekî kubarîyê, yê ku xwe dijî (miqabilî) zanebûna Xwedê [ya rast] bilind dîke: û em her fikirekê û meremekî hêsîr dikin, êlimî Mesîh [Yê Rûnkirî] dikin”.

B Korintî 10:5, AMP

Wextê ku li cem we êrişa fikira dibe, yên ku miqabilî (dijî) Xebera Xwedêne, wî çaxî mecala kerkirinêye here baş elamkirina Xeberê ye.

Xebera ji devê bawarmend derketî sîliha here kardar e, ya ku dikare hindava nerihetîyê û xemgînîyê serbikeve.

HEMÛ XEMÊN XWE BAVÊJINE SER XWEDÊ

“Dêmek bin destê Xwedêyî zor tabin [bi nimizkirina xwe nava qîmetkirina xweda], ku Ew wextêda we bilind bike. Hemû xemên xwe [hemû nerihetîyên xwe, xemgînîyên xwe carekêra] bavêjine ser Wî, çimkî Ew bi fikirmîşbûn bona we xem dîke”.

A Petûrs 5:6,7, AMP

Wextê ku dijmin dicêribîne nava jîyana meda pirsgirêka pêşda bîne, îzina me heye, ku em hemû xemên xwe bavêjine ser Xwedê. Xebera “avîtin” dide kifşê “avîtina carekêra, kewkîkirin”. Em dikarin carekêra hemû pirsgirêkên xwe bavêjine ser Xwedê û li min bawar bikin, Ew dikare wana bigre: Ew zane ku wana çawa bike.

Ev xebera îzinê dide me ku em fem bikin, wekî wextê ku em xwe ta dikin, ew yek nerihetîyê nade kifşê. Merivê ku her dem xemgîn e, hesab dike, wekî ew bi xwe dikare pirsên xwe hel bike û divedîne rê bibîne, ku ji wî halî derbikeve. Merivê kubar guhdarîya xwe dide li ser xwe, lê yê şikestî li ser Xwedê. Merivê kubar nerihet e, lê yê şikestî hîvîyê ye.

Tenê Xwedê dikare me aza bike. Ew dixweze, ku em zelal bizanibin, wekî hal çî cûreyî be jî, em gerekê gumana xwe bidine ser Wî û bikevine nava rihetîya Wî.

RIHETÎYA XWEDÊ

“Xwedêyê me, gelo tê qirara Xwe li ser wana mîyaser nekî? Qewata meye wî cûreyî tune, ku li ber wî eskerê mezin bisekinin, yê ku tê ser me. Em nizanin çî bikin, lê berê me berbi Te ye”.

B Dîrok 20:12, AMP

Ez vê xeberê hiz dikim. Cimetê sê rastîyên girîng fem kiribûn:

1. Qewata wan tunebû, ku ber dijmin ber xwe bidana,
2. Wana nizanibû çî bikira,
3. Hewcetîya wan hebû, ku berê xwe li ser Xwedê bidana merkezkirinê.

Hema nava wî serîda, nava xeberên 15-a û 17-da em dibînin, wekî Xwedê peyî wê yekêra destpê dike xeberde, wextê ku ew bi temamî Xwedêyê xwe fem dikin û qebûl dikin:

“Ji wî eskerê mezin netirsîn, çimkî ev şerkarî ne ya we ye, lê ya Xwedê ye...Nava vî şerîda hûn gerekê şerkarîyê nekin. Li ser tabîyên xwe cîyên xwe bigrin, hîvîyê bin û hûnê nava jîyana xweda xilazbûna Xwedê bibînin” (AMP).

Tabîyên me kîjanin? Ji wana yek hebandin e, mayîna nava Îsada û ketina nava rihetîya Xwedê. Ya mayîn hîvîyêsekinandina Xudan e, berê me her dem li ser Wî tê merkezkirinê, mîyaserkirina hemû temîyên Wî ye û bi heyîna tirsê, nekirina tiştên anegorî xwestinên qalib e.

Derheqa “rihetîya Xwedê”-da minê bixwesta ev yek bigota: bêyî berxudanê “rihetîya Xwedê” tune. Heyîna edilyê hêsa ye, wextê ku berxudan tune. Merivên bêbawar jî wextê halê hêsa nava edilyêdanin. Lê “rihetîya Xwedê” pêşkêş e, ya ku nava halên diwarda bawarmend bi edilyêva tijî dike. Eva pêşkêşa Xwedê ye bona zarokên Wî.

Bona ku gotina min diha berbiçev be, îzinê bidin ez derheqa du şikilkêşada gilî bikim, ji kîjana min hîvî kiribû ku edilyê bînine ber çeva. Yekî goleke rihet, edil, kişandibû, ya ku nava çîyayên bilindda bû. Yê mayîn aveke gur kişandibû, li rex kîjanê darek hebû, lê li ser çiqelê wê jî teyredê hêlînêda rihetîya xwe dîtibû.

Ji van şikila kîjanîda edilyê bi rastî hatibû kişandinê: em dikarin bêjin, ku şikilê dudada ew yek heye, çimkî bêyî berxudanê edilyê tune. Şikilê ewlinda hatibû ber çeva, ku t’u tişt nalive. Merivê bi xwestan herine li wir bona hêsabûnê. Ew şikilê bedew bû, lê ewî “rihetîya Xwedê” nedida kifşê.

Îsa got: “Ez edilyê wera dihêlim. Ez edilya [Xwe] didime we, lê ne ku çawa dinîya dide we...” (Yûhenna 14:27, AMP). Edilya Wî ya ruhanî ye û rihetîya Wî ew rihetî ye, ya ku ne ku li ser hewa milahîm, lê li ser bagerê hukum dike. Îsa nehat, wekî hemû berxudana jî jîyana me bide dîrxistinê, lê hat, ku nêzîkbûna başqe bide bagerên nava jîyana meda. Em gerekê giranîya Wî hildine ser xwe û ji wî hînbin (binihêre Metta 11:29). Ev yek dide kifşê, wekî em gerekê rêyên Wî hînbin û usa li jîyanê binihêrin, çawa ku Îsa dinihêre.

Îsa xemgîn nedibû, usa ye em jî gerekê xemgîn nebin.

Eger hûn hîvîyêne, wekî wedeyê bê, wextê ku îdî menîyên meye xemgînîyê tunebin, wî çaxî ez bêjim, wekî hûnê gelekî dirêj hîvîyê bin, çimkî ew wedeyê t’u cara neyê. Ez xirab nafikirim, lê awqasî wera zelalim. Em nava dinîya bi zêrandinava tijî dijîn. Ew yek li dorberên me heye, lê gerekê nava meda tunebe.

Nava beşa Mizgînîyê 6:34-da nivîsar e, ku em bona roja sibê xemgîn nebin, çimkî her rojek bi giranîya xemên xweva ye. Îsa bi Xwe ev yek gotîye û Ew xirab nedifikirî. Wextê ku em edilya xwe

xweyî dikin û wextê bagerê rihetîya Xwedê dibînin, ew yek Xwedê rûmet dike, çimkî cûrên şuxulkirina Wî kardarin.

NERIHETÎ, NERIHETÎ Û DÎSA NERIHETÎ

Bi salên dirêj ez bona hinek tiştên nerihet bûm, bona guhartina kîjana qewata min tunebû. Minê bixwesta ew sal paşda bianîna û cûrekî mayîn nêzîkî wan bûma. Feqet, wana nikarin paşda bînin û nava wedên ji aliyê Xwedêda dayî biguhêrim, yên ku îdî derbaz bûne.

Malxwê min, t'û cara xemgîn nedibû. Hebû wede, wekî wê yekê hêrsa min gelekî radikir. Ewî minra derheqa xemgîniyên xweda nedigot, pirsên usa xemgîn gotûbêj nedikirin, yên mînanî: çi dikare biqewime, eger Xwedê tev nebe û hewcetiyên me razî neke.

Carekê ez li malê rûniştîbûm û min kitêba meye çêka dinihêrî. Peyî her deqekîra ez diha xemgîn dibûm, çimkî dayîna çapa wan pera ji wan pera zêdetir bû, çi ku li cem me hebû. Wî çaxî Dêyv li oda rexda tevî zaroka dilîst. Zarok ser wîra banz didan, porên wî tevlihev dikirin, lê ewî têtêvîzyon temaşe dikir.

Tê bîra min, ku min wîra çawa sert xeberda: “Diqewime dewsa lîstîkê tu tevî min bicêribînî vê pirsê helkî?”. Ewî got: “Û bi gotina te ez gerekê çi bikim?”. Bersiva (caba) min tunebû: wê yekê hêrsa min gelekî rakir, wekî ew wî çaxî dikaribû şa bibûya, wextê ku em nava halê finansîyî xirabda bûn.

Dêyv cêriband min bide rihetkirinê. Ewî bîr anî, wekî Xwedê her dem hewcetiyên me daye razîkirinê, wekî em bi helalî karê xwe dikin (pêşkêşa didin, dua dikin û bawarîya xwe li Wî tînin), û wekî Xudan paşê wê para Xwe mîyaser bike. (Ez serda zêde bikim, wekî wî çaxî, wextê ku ez xemgîn dibûm, Dêyv gumana xwe dabû ser Xwedê). Ez gihîştîme wî, lê fikirên nerihet careke mayîn serê xwe bilind kirin: “Emê çi bikin? Emê çawa wan hesaba bidin? Lê eger...”.

Bi saya texmînkirinên min, min şikilekî gelekî xirab anî ber çevê xwe: çawa me ji mafê kirîn-frotana krêdît miqûf dihêlin, avtomaşînê ji me distînin, çawa li ber heval û pismamên me em nuxsan dibin, wextê ku

alîkarîya finansî ji wana hîvî dikin û tiştên mayîn. We ew “film” dîtîye? Gelo usa qewimîye, wekî fikirên wî cûreyî we nerihet bikin? Bêguman, usa qewimîye, çimkî eger usa nebûya, weyê ev kitêba nexwenda.

Piştî hinek wede, bi fikirmîşbûnên, ku mîrêcin davîtine li ser min, ez paşda vedigerîyame odê û min dîsa kitêba çêka derdixist û careke mayîn diketime nava wan hesaba. Ez difikirîm, ku çiqasî dirêj ez rûnêm û li wana binihêrim, ezê awqas hêsa bersiva wan bibînim, lê bersiv tenê li cem Xwedê ye. Min çiqasî zêde wan hesaba dinihêrî, ez awqasî zêde xemgîn dibûm. Paşê hemû tişt careke mayîn diwekilî. Min li ser Dêyv û zaroka dikire qîrîn, çimkî ew şa dibûn, lê min jî temamiya “cabdarîyê” hildabû ser xwe.

Bi rastî t’u kesî ji min dew nedikir, min gerekê hemû xemên xwe teslîmî Xwedê bikirana.

Niha, wextê ku ez paşda dinihêrim, fem dikim, wekî min ew êvarên baş badîhewa xerc kirine, yên ku Xwedê salên zewaca meye ewlin dabûne min. Ewên ji aliyê wîda dayî pêşkêşa bêqîmet e. Lê min ew dane mîrêcin. Wedê we yê we ye. Bi aqilanî wî wedeyî bidine xebatê û vê rêyêra derbaz nebin.

Xwedê hemû hewcetîyên me dane razîkirinê. Ewî ew yek bi mecalên cûre-cûreva kirîye. Ewî t’u cara em nehiştine, t’u cara... Xwedê amin e.

XEMGÎN NEBIN, BAWARÎYA XWE LI XWEDÊ BÎNIN

“Bila xeysetê we, yan jî tabîya weye moralî ji perehizîyê aza bimîne [nava wêda timayî, hizkirina hêsayê û malê dinê], û bi heyîna xweye nihava razîbin [qewimandinên jîyanê û çî ku niha heye], çimkî Ewî [Xwedê] bi Xwe got: “Ezê bêyî alîkarî t’u cara ji we neçim û we bernedim. Ezê t’u cara, t’u cara, t’u cara we bêyî alîkarî, yan jî tenê, yan jî ketî nehêlim [rihetbin, Ez we xweyî dikim]”.

Îbranî 13:5, AMP

Ev Xebera Încîlêye baş dikare piştgirîyê bide we, wextê ku hûn dora wê pirsê nerihetin, ku gelo Xwedê wê hemû hewcetîyên we tijî bike?

Bi vê xeberê Xudan dixweze bêje me, wekî em gerekê derheqa perada nefikirin û wê xemê hildine ser xwe, çimkî Ewê wê yekê hilde ser Xwe. Ewî soz daye, wekî wê t'u cara me bernede û ji me neçe.

Hûn beşa xwe biqedînin û necêribînin beşa Xwedê biqedînin. Ew bar bona we gelekî giran e û eger hûn fesal nîbin, ew dikare we niqo bike.

Xemgîn nebin! “Gumana xwe bide ser Xudan û qencîyê bike: li ser dinîyayê bijî û peyî aminaya Wî here, û tê bi rastî têrbûyî bî” (Zebûr 37:3, AMP).

Eva sozê Xwedê ye.

Serê
13-a

*Fikira ku gunekar dike,
rexne dike û şikber e*

Fikira ku gunekar dike, rexne dike û şikber e

*Serê
13-a*

Meriv nava jîyana xweda rûyê wê yekêda gelekî dizêrin, wekî yên mayîn gunehkar dikin û rexne dikin û bi şikberî nêzîkî wana dibin. Eva ew xirabî ye, kîjanê heleqetîyên geleka xirab kirine. Û awa deşta şêr dîsa fikir e.

“Loma neke, ku lome li te nebin...”

Metta 7:1 KJV

“Ez difikirim, wekî...”, fikirên vî cûreyî û yên mînanî vê fikirê dikarin destê mîrêcinda bibine hacet, ya ku mêriv başqebûyî xweyî dike. Bona mêriv ne tiştekî baş e, ku tevî wî merivî nava heleqetîyada be, yê ku fikira xwe hesab dike çawa ya here rast. Carna em diha zêde dixwezin fikira xwe merivara bêjin, lê ne ku bibihên, hînbin û heleqetîyên baş çêkin.

Min jinek nas dikir, malxwê kîjanê bîznêsmênêkî dewletî bû. Bi xeysetê xwe ew merivekî milahîm bû û hindik xeber dida, lê jina wî dixwest ku mêrê wê gelekî xeberde. Ew merivekî gelekî xwendî bû. Jina wî her dem ser mêrê xweda bona wê yekê hêrs diket, wextê ku nava dor-berên wanda yekî destpê dikir dora tiştekî xeberda, derheqa wê yekêda mêrê wê baş zanibû û dikaribû gelek tişt xberda, lê ewî dengê xwe nedikir.

Carekê, piştî êvarîke wî cûreyî, wextê ku ew vedigerîyan malê, jin destpê dike hêrse-hêrs bêje mêrê xwe: “Tu bona çî tevî wê xeberdanê nebûyî û te derheqa wî hemû tiştîda negote wan, derheqa çîda tu zanî, tu rûniştî bûyî û te dida kifşê, ku gîva tu derheqa wê govekêda haj pê tuneyî”.

“Ez wê yekê zanim, çî ku ez zanim”,- “Bo wê yekê jî min dengê xwe nedikir, çimîk min dixwest guhdar bikira, ku yên mayîn derheqa wê yekêda çî zanin”.

Bi fikira min, açixîya wîye nava bîznêseada hema vê yekêda veşartî ye. Ew merivekî serwaxt bû. Hindik meriv dikarin bêyî serwaxtîyê dewletî bin.

Gelek meriv jî hevala dest tînin, eger serwaxtî nava pirsra çêkirina heleqetîyada tune.

Lomekarî, xwehizî, rexnekirin mêtodên xirabkirina hemû heleqetîyanin. Mîrêcin dixweze, ku em tenê bin û ji me dûrketî bin, bo wê yekê jî ew êrîşê tîne li ser wan govekên fikira me. Ez gumanim, wekî ev serê kitêbê wê alî we bike, ku hûn fikirdarîya şaş naskin û hîn şerkarîya dijî (miqabilî) fikirdarîye bike.

ŞIROVEKIRINA XEBERA “LOMEKIRIN”

Anegorî V. Ê. Wayn “Ferhenga şirovekirina xeberên peymanên Kevin û Nûda” xebera “dîwan” yûnanî tercimekirî vî cûreyî tê şirovekirinê: “qirara li ser şaşîyên yên mayîn qebûlkirî”, û pêra jî xebera “lomekarî, lomekirin” şedetîya wê yekê dide. Anegorî wê ferhengê, xebera “dîwan” yûnanî tercimekirî vî cûreyî tê şirovekirinê: “pêşdahatina fikirekê” û ew jî şedetîya “ceza, birîyar” dide.

Xwedê Yê Tek-Tenê ye, Yê ku îzina wî heye gunehkar bike, yan jî qirarekê derheqa merivekîda qebûl bike, û wextê ku em derheqa yekîda loma dikin, wî çaxî em rola Xwedê hildidin ser xwe.

Ez nizamim hûn çawa, lê ez ji wê fikirê bi xofa Xudanva tijî dibim. Bêguman, ez meriveke qewatim, lê hewcetîya min tune, ku ez bibime Xwedê. Ev govek pirsgirêka mine şexsîtiyêye here mezin e. Û ez bawarim, wekî bi parevebûna derheqa vî hemû tiştîda, çi ku Xwedê ez hîn kirim, wê bona we kardar be.

Rexnekirin, nişandayîna fikirên xwe û lomekirin hevva girêdayîne, bo wê yekê jî emê van hersê tiştîda çawa pirsgirêka mezin gotûbêj bikin.

Berê min hiz dikir hemû tişt û hemû kes rexne bikirana. Min ew hemû tişt didîtin, kîjan şaş bûn û min ew yek nedidît, çi ku rast bû. Hinek meriv diha gelekî ji vê “nexweşîyê” dizêrin, ne ku yên mayîn. Hinek jî cûrekî mayîn difikirin, ew bi şabûnêva awqasî tijîbûyîne, wekî naxwezin wê yekê bibînin, çi ku şabûnê pêşkêş dike û beşera xweş pêşda tîne. Dêmek ew guhdarîyê nadine ser wan tiştîda, yên ku dikarin bona şabûna wana dijarîya pêşda bînin. Merivên mêlanxolîk

diha gelekî şaşîyên xwe dibînin: ew hîmlî tevî merivên mayîn bi fikirên xweye xirab pareve dibin.

Em gerekê fem bikin, wekî her merivek cûrekî mayîn li jîyanê dinihêre. Li me xweş tê, ku em yên mayînra gilî bikin, ku em çî difikirin, lê lazim e vê yekê fem bikin: fikira min dikare bona min rast be, lê ne ku bona we û usa jî wekî mayîn. Bêguman, em hemû jî zanin, wekî temîya “Nedize” bona hemûya rast e, lê ez niha derheqa wan tiştada xeber didim, rastî kijana tên em her roj û yên ku bi xwe nebaşin, nexirabin, lê ew pîrsa bijartina her yekîye şexsî ye. Meriv tenê dikare serda zêde bike, wekî îzina mêriv heye bi xwe, bêyî tevîna ji der, qîrara bijartinê qebûl bike.

Derheqa wê yekêda ez û mêrê min li ser nêzîkbûneke başqene. Mesele ji wan hevraqayîlnebûna yek dîzayna male ye. Ez nikarim bêjim, wekî stîlên me ji hev cuda dibin, lê wextê ku em tevayî dixwezîn eşîyakî bona malê bikin, wî çaxî zelal dibe, li Dêyv tiştek xweş te, lê li min jî tiştekî mayîn. Bo çî? Menî ew e, wekî em du merivên cudane, fikira wî ji ya min xirabtir nîne, lê ya min jî ji fikira wî xirabtir nîne. Ew awqasî ji hev cuda dibin.

Bona min salên dirêj lazim bûn, ku min fem bikira, wekî ew yek tiştekî normal e. Wedekî dirêj ez difikirîm, wekî eger Dêyv nava pîrsekêda minra qayîl nîne, wî çaxî li cem wî tiştek normal nîne. Bi rastî pêşda min wîra digot, wekî tiştek li cem wî şaş e, çimkî ew fikira minra qayîl nîne. Tiştek ber çeva bû, wekî nêzîkbûna min, ya hindva pîrsên wî cûreyîda, nava heleqetîyên meda gelek pîrsgîrêk pêşda dianîn.

KUBARÎ: PIRSGIRÊKA “EZ”

“Ez niha bi wê kerema, ku bona min hatîye dayîne eşaretîyê didime we, wekî hûn derheqa xweda bilind qîmet nekin û nefikirin, çawa ku heye [derheqa girîngîya weda fikira mezin tunebe], bila her kes weke wê bawarîya ku Xwedê daye we, bifikire”.

Romayî 12:3 AMP

Lomekirin û rexnekirin berên kubarîyê ne, yên ku çawa pîrsgîrêkên mezin tên hesabê. Wextê ku “ez”-ê me ji çapê zêdetir dibe,

wî çaxî cêrge pirsgirêk pêşda tên, derheqa kîjanada em niha xeber didin. Încîl gelek cara derheqa kubarîya meda eşaretîyê dide.

Eger meriv xweyê hinek karebûna ye, wî çaxî ew e menî wekî Xwedê ew karebûn dane. Merivê kubar, fikira kîjanî derheqa wîda gelekî bilind e, ji jorda meriva dinihêre û wana ji xwe nimiztir hesab dike. Nêzîkbûna wî cûreyî û fikirdarîya wî cûreyî li ber çevên Xudan tiştê qebûlnekirinê ne, û ew nava jîyanên meda bona dijmin derî vedikin.

XOFA PÎROZ

“Birano, eger yek bi şaşîkê yan jî neheqîkê hatîye girtinê, hûn ku ruhanîne [yên ku nazikin û bi Ruhva tên kontrolkirinê] gerekê wî bidine rastkirinê û dasekinandinê, bêyî texmînkirina mezinayê û temamîya nazikayê, bi xwe jî guhdarbin, ku hûn neyêne cêribandinê.

Barên hevdu û şaşîyên moralîye giran hildin û vî awayî qanûna Mesîh biqedînin û xweykin, û bighînine dawîyê wê yekê, çî ku tune [şikestîbûna weye nava vê yekêda].

Eger yek difikire, wekî ew tişteke [yekî gelekî girîng, li ber kîjanî dikarin ta bin], lê ew bi xwe ne t’u tişt e [bi fikira bilindayê, xêncî qîmetkirina xwe], wî çaxî ew xapîyayî û undabûyî ye û ew bi xwe jî yekî xirab e”.

Galatî 6:1-3, AMP

Lêkolînkirina kûre derheqa van xeberada dide kifşê, ku çawa gerekê caba (bersiva) kêmasîyên merivên mayîn bidin, nêzîkbûna çawa gerekê hindava wanda bidine kifşê. Dewsa kubarîyê li cem me gerekê “xofa pîroz” hebe û bi taybetî nava pirsra lomekirin, yan jî rexnekirina merivada gerekê guhdar bin.

KÎNE EM, KU LOMA DIKIN?

“Hûn kîne, ku loma xulamê xelqê dikin? Bila xweyê wî qîrar bike, ku xulam bisekine, yan bikeve. Û xulamê bisekine û bilindbe, çîmkî Xudan qewat e û wê piştgirîyê bide wî, û wî bide sekinandinê”.

Romayî 14:4, AMP

Werin em vê xeberê ji vî alîva lê binihêrin: bînin ber çevê xwe, wekî cînarê we hatîye cem we û dibêje we, ku hûn gerekê kincên

çawa li zarokên xwe bikin, ku ew herine mektebê, û zarok gerekê tevî xwe çî hildin. Caba (bersiva) we wê çî cûreyî bûya? Yan jî bînin ber çevê xwe, wekî cînarê we dibêje we, ku li wî xweş nayê, ku hûn çawa mala xwe paqij dikin. Weyê caba (bersiva) çawa bida cînarê xwe? Ez gumanim, wekî weyê bigota ku ew yek îşê wî nîne.

Ev gotin hema derheqa wê yekêdane. Em hemû jî yên Xwedêne û eger hinek kêmasîyên me hene, Ew dikare me bilind bike û afû bike. Emê li ber Xwedê bersivê bidin, û ne ku li ber hev, bo wê yekê jî em gerekê hev lome-rexne nekin.

Meremê mîrêcin ew e, ku cina bişîne bo ku ew mejûyên meriva bi fikirên lomekirinê û rexnekirinêva tijî bikin: ev e mijûlîya wî. Tê bîra min, ku çiqas li min xweş dihat, ku min dîna xwe bida merivên ku nava parkêda, yan jî dikanêda diçûn-dihatîna û fikira xweda min qîmet dida ji wana her yekî, kincê wan, porê wan, rêberên wan û tiştên mayîn. Her dem nîne, wekî em dikarin xwe zeft bikin, bona ku derheqa merivada fikira xwe çêkin, nenihêrî wê yekê, ku ew tiştê eseyî nîne, ku em wana bidine kifşê. Ez gumanim, wekî em dikarin usa bikin, wekî fikirên me awqasî yên rexnekir nîbin.

Ez gelek cara dibêjime xwe: “Coys, ew îşê te nîne”. Pirsê hîmlî ew e, wekî em gelek cara awqasî dirêj dora tiştêkî difikirin, wekî fikira sade mezin dibe û werguhêzî lomekarîyê dibe. Pirs wî çaxî diha kûr dibe, wextê ku xwestin pêşda tê, ku derheqa fikirên xweda elamî yekî bikî, diqewime hema wî merivî jî, kîjan tu gunekar dikî. Paşê hal diha sert dibe, çimkî ew dikare zyaneke mezin bighîne him heleqetîyên we, him jî goveka ruhanî. Hûn dikarin ji van pirsgerêka aza bin eger hînbîn xwera bêjin: “Ev ne îşê min e”.

Li malbeta min rexnekirin û lomekirin “mêvanên her dema” bûne. Ez dikarim bêjim, wekî ez nava wanda mezin bûme. Çêkirina heleqetîyaye nava qewilên wî cûreyîda mînanî wê yekê ye, çawa ku tu bi nigê şikestî topê bilîzî. Min dicêriband tevî Xwedê “topê bilîzim”. Min dixwest usa bişuxulyama û bifikirîyama, çawa ku ew difikire, lê min nikaribû. Bi salên dirêj ez nava halekî feqîrda bûm û tenê paşê ez pê hesîyam, wekî nava fikira mînda hinek qewînbûn, kela hebûn, kîjan lazim bûn bihatana xirabkirinê, bona ku min bikaribûya nêzîkbûnên xwe biguhartana.

Bizanibin, hûnê nikaribin hetanî wî çaxî nêzîkbûna xwe biguhêrin, hetanî ku fikira we neyê guhartinê.

Xeberên Mizgînîyêye Metta 7:1-6 ji wan xeberên Încîlêye klasîkin, yên ku derheqa lomekarîyê û rexnekirinêdanin. Eger nava xeysetê weda ew yek heye, hûn dikarin yê mayîn rexne bikin, wî çaxî beşên vî cûreyî û usa jî van beşa bixwînin. Wana bixwînin, bi dengê bilind bixwînin, çawa sîlih dijî (miqabilî) mîrêcin bidine xebatê, yê ku dicêribîne mejûyê weda dîwara çê bike. Diqewime îdî bi salên dirêj kelayên nava fikira weda ew çawa dîwar dide xebatê.

Werin em vê xeberê lê binihêrin û şirovekirinê bidine her beşekê.

PRÎNSÎPA LOMEKARÎÊYE “ÇANDINÊ Û DIRÛNÊ”

Li merivên mayîn loma nekin û rexne nekin û gunekar nekin, û tê jî bi xwe lomekirî, rexnekirî û gunekarkirî nîbî.

Çimkî çawa ku hûn merivên mayîn lome dikin, rexne dikin û gunekar dikin, usa jî hûnê lomekirî, rexnekirî û gunekarkirî bin, û hûn bi çî çapê bipîvin [we kirîye] bi wê çapê jî wera wê bê pîvanê”:

Metta 7:1,2, AMP

Ev beşên xeberê, bêyî şikberî, derheqa wê yekêda dibêjin, wekî me çî çandîye, emê wê jî bidrûn (binihêre Galatî 6:7). Prînsîpa “Çandinê û dirûnê” ne tenê nava malhebûna gundîtîyêda, yan jî goveka finansada dişuxule, lê ew usa jî nava fikirêda dixebite. Em dikarin nêzîkbûnekê biçînin û bidrûn.

Serwêrekî ku ez wî nas dikim, gelek cara dibêje: “Wextê ku ez pê dihesim, wekî kesek yan min gunekar dike, yan jî derheqa minda xirab xeber dide, ez ji xwe dipirsim, gelo ew diçîne, yan ez didrûm?”. Gelek cara em nava jîyana xweda wê yekê diçînin, çî ku me berê nava jîyana merivên mayînda çandîye.

DOXTIR, XWE BI XWE QENC BIKE

“Hûn çima qirşîkê çevê birê xweda dibînin, lê kêranê çevê xweda nabînin?

Yan jî çawa hûn dikarin bêjine birê xwe, ku ew bihêle, ku hûn qirşîk ji çevê wî derxin, wextê ku çevê weda kêran heye?

Durû, pêşîyê kêranê çevê xwe derxe, paşê tê bikaribî bibînî, ku çawa qirşik ji çevê birê xwe derxî”.

Metta 7:3-5, AMP

Mîrêcin lezetê distîne, wextê ku ew fikira me nava halê mijûlîyêda xweyî dike, bi fikirê bona kêmasîya yên mayîn gunehkar dike. Bi vî awayî, em kêmasîyên xwe nabînin û t’u tiştî nakin, ku ji wana azabin.

Em nikarin meriva biguhêrin: wê yekê tenê Xwedê dikare bike. Em nikarin xwe biguhêrin, lê em dikarin tevî Ruhê Pîroz hevkarîyê bikin û îzinê bidine Wî ku ew nava meda xebatê bike. Gava ewlin, ya bona azabûna ji kêmasîya, ew e ku bi helalî wê rastîyê qebûl bikin, ya ku Xudan dicêribîne nîşanî me bide.

Wextê ku em derheqa wê yekêda difikirin û xeber didin, ku çawa merivên mayîn şaşîya dikin, em nava pirsê kirinên xweda, xwe dixapînin. Bo wê yekê jî Îsa dibêje me, ku em mejûyên xwe wê yekêva mijûl nekin, ku yên mayîn çî dikin û çawa dikin. Berî her tiştî, îzinê bidine Xwedê, ku Ew pirsên kêmasîyên we hel bike, lê paşê hûnê bikaribin mêtodên alîkirina mesîhîya, yên bona pêşkeftina nava ruhanîyêda hildin, qebûl bikin.

HEV HIZ BIKIN

“Wan tišta nedine sa, çî ku buhurtî ye [pîroz e], û ne jî durên xwe bavêjine ber beraza, bona ku usa nebe, ku ew wana bi nigên xweva pêpeskin û xwe bavêjine we, we bidirînin”.

Metta 7:6, AMP

Ez difikirim, wekî li vir derheqa ewê karebûna hev hizkirinêda xeberdan diçe, ya ku Xwedê daye me.

Eger ew karebûna hev hizkirinê bo me hatiye dayînê, û Xwedê temî daye me, ku em wê yekê bikin, lê em dewsa wê yekê li meriva dikin û wana rexne dikin, wî çaxî em wê yekê hildidin, çî ku buhurtî ye (hizkirin), û davêjine li ber sa û beraza (ruhên xirab). Em li ber wan derî vedikn û îzinê didin ku ew tiştên pîroz pêpeskin û bidirînin.

Em gerekê fem bikin, wekî “jîyana nava hizkirinêda” xweparastina êrîşên ji cina ye. Ez gumanim, wekî mîrêcin nikare zyanê bide wî merivî, yê ku bi rastî nava hizkirinêda dijî.

Wextê ku ez cara çara hemle bûm, ez îdî mesîhî bûm, bi Ruhê Pîrozva hatibûme nixumandinê û bona qulixkirinê hatibûme gazîkirinê. Derheqa qencbûna bi bawarîyê îdî gelek zanebûnên min hebûn. Nava sê mehên hemlebûnêye ewlinda ez nebaş bûm. Ez zeyîf dibûm û min qewata xwe unda dikir. Wedê hîmlî min paldayî derbaz dikir, çimkî medê min li hev diket. Min xwe awqasî westîyayî texmîn dikir, wekî ez bi dijarî dilivyam.

Ev hal gelekî beşera min xirab dikir, çimkî pêşda sê cara jî hemle bûme û wî çaxî ez gelekî baş bûm. Wê demê min Xebera Xwedê hela hê baş nizanibû. Nenihêrî wê yekê ku ez diçûme civînê, lê min nizanibû bawarîyê çawa bidime xebatê, bona ku ji Xwedê tişteki bistînim. Lê niha ez îdî Sozdayînên Xwedêra nasim, lê wextê ku ez ne baş bûm, ne dua, ne jî dijîderketina hindava cinada alî min nedikirin.

Rojekê ez nava cîyada bûm û min dibihîst, ku çawa Dêyv zarokara dilîze. Ez bi tabîke sert berbirî Xwedê bûm: “Ev çi diqewime, ez bo çi usa me? Bo çi ez awqasî xirab im? Bo çi ez qenc nabim?”

Ruhê Pîroz gote min, ku ez beşa Metta 7 bixwînim. Min ji Xudan pîrsî, ku ew beş çawa minva yan jî saxlemîya minva girêdayî ye? Ez difikirîm, wekî ez gerekê wê beşê bixwînim û careke mayîn bixwînim. Paşê Xwedê qewimandinek anî bîra min, ya ku çend sal pêşda qewimî bû.

Min dersên Încîlê li mala xwe derbaz dikirin, û tevî geleka jineke cahil jî dihate dersê, kîjanê emê çawa Cêyn nav bikin. Ew bi helalî wextê qulixa hazir dibû, lê piştî hemlebûnê nikaribû bihata dersê, çimkî ewê her dem xwe zeyîf û westîyayî texmîn dikir.

Wê rojê ez nava cîyada paldayî derheqa jineke mayînda fikirîm, tevî kîjanê me derheqa Cêynêda xeber dabû. Me ew rexne kiribû û gotibû, wekî ew “naxweze xwe topî ser hev bike”. Diha xebathiz be û bê dersa. Fikira mera qet derbaz nebibû ku em awayekî alî wê bikin. Li cem me fikireke usa çê bibû, wekî ew yeke “zeyîf e” û hemlebûnê bona veşartina xweranedîtina xwe û kêmasiyên xwe dide xebatê.

Niha jî ez nava halê wî cûreyîda bûm, çawa ku Cêyn du sal pêşda bû. Xwedê nîşanî min da, wekî nenihêrî wê yekê, ku wextê hersê hemlebûnên ewlinda ez baş bûme, lê paşê hemû tişt hatîye guhartinê, çimkî min bona mîrêcin derî vekiribû, yeke mayîn rexne û gunehkar kiribû. Min durên xwe, tiştên pîroz (karebûna xweye hizkirina Cêynê) hildabûn û ew avîtibûne li ber sa û beraza. Bo wê yekê jî wana destpê kiribû min bidirînin. Ez bêjim, wekî min carekêra tobe kir û peyî wê yekêra saxlemîya min hate dasekinandinê, lê nava mehên hemlebûnêye mayînda ez gelekî baş bûm.

Ev serhatî bona min bû ders. Min fem kir, ku lomekirin û rexnekirina merivên mayîn tişteki bi çiqasê qezîya ye. Minê bi şabûn bixwesta bigota, wekî ev cêribandin bes bû, bona ku min îdî şaşîke wî cûreyî nekira, lê telebextra ew yek usa nîne. Min paşê jî şaşîyên wî cûreyî kirine û her car Xwedê tevî min dixebitî, bona çi ez ji Wî gelekî razîme.

Em hemû jî şaşîya dikin. Li cem me hemûya aliyên zeyîf hene. Nava Încîlêda tê gotinê, wekî em gerekê bi dilê berk, bi rexnekirin, nêzîkî hev nebin, lê gerekê hev bibaxşînin û hindava hevda rehm bin, çawa ku Xwedê bi Mesîh baxşande me (binihêre Efesî 4:32).

LOMEKIRIN DIBE BERBI LOMEKARÎYÊ

“Dêmek t’u afûkirin yan jî parastineke we tune. Evdo, tu kîyî, tu loma xelqê dikî? Çawa loma xelqê dikî û bona xelqê qîrarê qebûl dikî, tu xwe lomekar dikî, çimkî tu ku loma dikî, tu xût wan tiştê dikî [tu gunehkar û neheq dikî]”.

Romayî 2:1, AMP

Bi gilîkî mayîn gotî, çawa ku em loma li merivên mayîn dikin, wî cûreyî jî wê loma li me bikin.

Carekê bona femkirina vê prînsîpê Xudan meseleke baş anî. Ez difikirîm, ku bona çi tiştê, ku me kirîye li ber çevê me baş tê kifşê, lê wextê ku yekî mayîn dîsa wî tiştî dike, em loma li wî dikin. Ewî got: “Coys, hûn xwe bi berçevkên rengîn dinihêrin, lê yên mayîn bi şûşên ku çend cara mezin dikin, dinihêrin”.

Em kirina xwe afû dikin, lê wextê ku yekî mayîn wî cûreyî dike, em carna bêrehm dibin. Nêzîkî merivên mayîn bibe wî cûreyî çawa ku teyê bixwesta ku nêzîkî te bûna (binihêre Metta 7:12). Eva prînsîpa baş e û eger em dîna xwe bidine vê, ewê me ji lomekarîyê û gunehkarîyê dûr bigre.

Fikirdarîya lomekar çiqleke fikirdarîya xirab e, ya ku diha gelekî nêzîkî wê yekê ye, ku nava mêrivda şaşîyê bibînin, lê ne ku rastîyê.

Optîmîst be, lê ne ku pîsîmîst.

Bona merivên mayîn ewê diha baş be, lê bona we ewê kardar be.

BONA DILÊ XWE FESAL BE

“Ji fesalbûna here zêdetir bona dilê xwe fesal be, wekî derketina jîyanê ji Wî ye”.

Gotnên Silêman 4:23

Eger hûn dixwezin, wekî jîyan nava weda bikişê, usa ye dilê xwe xweyî bikin.

Hinek fikir hene, yên ku gerekê bona bawarmend yên “qebûlnekirinê” bin: nava cêrga wandanin fikirên lomekar û gunehkar, rexnekir. Ew hemû tiştên ku Xwedê dixweze li me eyan bike, bona gulvedan û bextewarîya mene. Bi çûyîna peyî rêyên Wî, jîyana me wê bi bereketêva tijî bibe, lê çûyîna peyî rêyên mîrêcin, emê rastî bêbereketîyê bîn.

BI ŞIKBERÎ NÊZÎKÎ ŞIKBERÎYÊ BIBIN

“Hizkirin li ber hemû tiştî teyax dike, wextê ku tê û her dem hazir e bawarîya xwe li her tiştê başî nava weda bîne”.

A Korintî 13:7, AMP

Ez bi bêqelpî xwe mikur tîm, wekî bona min gelekî dijwar bûye, ku ez gura vê xeberê bikim. Ez nava şikberîyêda hatime terbyetkîrinê. Ez hîn kirime, ku ez gumana xwe nedime ser her yekî, bi taybetî

wana, yên ku divedînin baş û qençbin, çimkî diqewime ew bi wê yekê xwestinên xweye başqe vedişêrin.

Xêncî wê yekê, wekî ez hîn kiribûm hindava meriva bona menîyên wan şikberbim, ez ji hinek meriva aciz bibûm. Û ev yek ne tenê pêşîya bûyîna mine mesîhî, lê peyî wê yekêra jî qewimîye. Bi fikirmîşbûna derheqa parçên hizkirinêda û bi femkirina wê yekê, wekî merivê ku hiz dike her dem bawarîya xwe li tiştê herî baş tîne, wê yekê alî min kir, ku ez bi kûrayî fikirdarîke nû bidime pêşxistinê.

Eger fikira we jehrkirî ye, yan jî mîrêcin nava fikira weda kela çê kirine, wî çaxî lazim e anegorî Xebera Xwedê wê yekê çê bikin. Ew yek bi saya xwendina Xeberê û bi fikirmîşbûna derheqa wê yekêda (nava xweda wê yekê diwekilînî û derheqa wê yekêda difikirî) mîyaser dibe.

Di nava meda Ruhê Pîrozî baş dijî, Yê ku eşaretîyê dide me, wextê ku fikirên me dixalifin. Xwedê hindava minda usa dike, çaxê dewsa tijîbûna bi fikirên hizkirinê ez bi şikberîyêva tijî dibim. Meriv vî cûreyî dikarin bifikirin: “Eger ez bawarîya xwe li meriva bînim, ewê min zêde bidine xebatê”. Ew yek dikare bibe, lê ew tiştê kardar, wekî hûn bawarîya xwe li yekî tînin, wê ji hemû fikirên we bilindtir be.

Guman û bawarî jîyanê bi şabûnêva tijî dikin û alî heleqetîya dikin, ku ew bighîjine dereca xweye here bilind.

Şikberî zyanê dide û gelek cara jî heleqetîya dide xirabkirinê.

Mêtodên xwedêtîyê dişuxulin, lê yên merivatîyê naşuxulin. Xwedê gunehkarîyê, rexnekirinê, lomekarîyê, şikberîyê gunehkar dike û em jî gerekê wî cûreyî bikin. Em gerekê wî hemû tiştî hiz bikin, çî ku Xwedê hiz dike û gerekê wî hemû tiştî hiz nekin, çî ku Ew hiz nake, yan jî wê yekê qebûl nakin, çî ku Ew qebûl nake, wê yekê înkâr bikin, çî ku Ew înkâr dike.

Nêzîkbûna balanskirî sîasîya here baş e. Ev yek nade kifşê, wekî wextê karkirina tevî meriva em gerekê serwaxtîya xwe û karebûnê ji hev cudakirinê nedine xebatê. Em gerekê dilê xwe li ber merivê ewlinî ku rastî me hatîye venekin û izinê nedine wî, ku ew tevî jîyana me bibe. Ji alîyê mayînva em gerekê xirab, bi şikberîyê, li meriva nenihêrin.

BI TEMAMÎ GUMANA XWE BIDINE SER XWEDÊ,
LÊ JI MÊRIV FESALBIN

“Feqet gava ku Ew li Orşelîmê bû, girêdayî cejna derbazbûnêra, geleka ew nîşanên ku Wî dikirin, dîtîn, bawarîya xwe li navê Wî anîn [xwe mînanî koma Wî dikirin].

Lê Îsa [sirîya Xweda] bawarîya Xwe t’u kesî nedianî, çimkî Ewî ew [hemû] zanibûn.

Hewcetîya Wî tunebû, ku kesek hebûya, yê ku dikaribû derheqa yekî mayînda şedetî bida [derheqa yekî mayînda raber bikira], çimkî Wî zanibû, ku nava mêrivda çi dibe [Ewî dikaribû dilên meriva bixwenda]”.

Yûhenna 2:23-25, AMP

Carekê ez ketime nava halekî civînêyî xirab û Xwedê guhdariya min bire li ser xeberên Mizgînîyêye Yûhenna 2:23-25-a.

Ev beş derheqa heleqetîyên Îsa û şagirtên Wî da dibêje û çend cara zelal dide dîyarkirinê, wekî Îsa bawarîya xwe li şagirtên Xwe nedianîn. Ev yek nabêje, wekî Ew bi şikberî nêzikî wan dibû, yan jî Ew li wan amin nedibû. Ev yek şirove dike, wekî bi zanebûna mêriv, Ewî bona xweykirina balansê bawarîya xwe li şagirtên xwe nedianî, çimkî dilê hemû meriva wîva eyan bû.

Mîna ji vê yekê derseke baş hilda. Carekê, li civînê qewimandinek qewimî. Çimkî min bawarîya xwe komeke jina anîbû û bi wî cûreyî min balansa xwe unda kiribû. Her car, wextê ku em wê yekê unda dikin, em bona mîrêcin derî vedikin.

Nava kaxeza ewlinda, ya Petrûs 5:8-da, tê gotinê: “Balanskirî bin (serwext bin, hişyar bin), her dem fesal bin, çimkî neyarê we, mîrêcin, mîna şêrekî (birçî) mire-mira wî ye, yekî digere, ku bigre û daqurtîne” (AMP).

Mîna ew kir, wekî min bawarîya xwe ewê koma jina anîye û min gumana xwe danîye ser wan, dewsa wê yekê, wekî gerekê min bawarîya xwe li Xwedê bianîya û gumana xwe bida ser Wî. Nava heleqetîyên tevî meriva gerekê gelekî dûr neçin. Eger em bêyî serwaxtîyê berdewam bikin pêşda herin, pirsgirêkê hebin û paşê emê bêhurmetkirî bin.

Temamîya gumana xwe, her dem, tenê daynine ser Xwedê. Bi vî awayî hûnê derî bona Ruhê Pîroz vekin, Yê ku wê eşaretîyê bide we, wextê ku hûn ewê xeta balansê derbaz bin.

Hinek meriv difikirin, wekî dikarin meriva ji hev cuda bikin, wextê ku şikberî hene. Feqet pêşkêşeke Ruhê Pîroz heye, ya ku çawa pêşkêşa ji hev cudakirina ruha tê navkirinê (binihêre A Korintî 12:10). Ew ne tenê xirabî yê, lê him qencîyê û him jî xirabîyê ji hev cuda dike. Şikberî nava fikira çênebûyîda pêşda tê, lê ji hev cudakirin nava ruhê çêbûyîda. Ruhê xweda bona hebûna pêşkêşa dua bikin. Necêribînin qalib bi pêşkêşên Ruhva bixemilînin. Ji hev cudakirina ruhanîye rast mêriv berbi duakirinê dibe, lê ne ku berbi buxdana. Eger tamamîya pirsgirêkê bi saya pêşkêşa rast tê cudakirinê, wî çaxî ewê himberî Xeberên Pîroz û ne ku qalib bişuxule.

XEBERÊN QENC ŞÎRININ Û KARDARIN

“Dilê merivê serwaxt devê wî dike serwaxt û li ser lêvên wî hînbûnê zêde dike.

Xebera cayîz mînanî şima hingiv e, bona ruh şîrin e û bona hestûya qencî ye”.

Gotinên Silêman 16:23,24

Xeber û fikir mînanî hestû û mejûyê hestû ne: ew usa nêzîkî hevin, wekî cetin e wana ji hev cuda bikin (binihêre Îbranî 4:12).

Fikirên me xeberên bêdengin, yên ku tenê bona me û Xudan tên guhdarkirî. Ew xeber hukumî li ser merivê nava meda, saxlemîyê, şabûnê û nêzîkbûna me dikin. Gelek cara fikirên me bi xeberava tên kifşê û telebextra, carna rûyê wanda em dikevî nava halekî xirab. Lomekarî, gunehkarî û şikberî t’u cara şabûnê naynin.

Îsa got, wekî Ew hatîye ku jîyanê hê zêdetir bide me (binihêre Yûhenna 10:10). Fikira Mesîh bidine xebatê, û ewê we bike nava jîyaneke nû.

Serê
14-a

Fikira pasîv

Ev xeber bi rastî derheqa goveka pasîvîyêdane. Gelek mesîhî vê xeberêra nenasin û pêra jî nizanin çawa menîyên wê naskin. *“Cimeta min rûyê tunebûna zanebûnêda unda bû...”* Hoseya 4:6

Pasîvî antonîma (wekî mayîn) aktîvyîê ye. Eva pîrsgîrêka bi qezîya ye, çimkî Xebera Xwedê zelal me hîn dike, ku em hişyar, fesal û aktîv bin (binihêre A Petrûs 5:8), bona ku em aktîv bin, ku pêşkêşên nava xweda bidine gurkirinê (binihêre B Tîmotêyo 1:6, AMP).

Min şirovekirinên xebera “pasîvî”-ye cûre-cûre xwendine û ezê wê yekê çawa tunebûna xwestinê, bêfirqîya tomerî, sarbûnê û xweranedîtîne şirove bikim. Li piş pasîvîyê ruhên xirab sekinîne. Mîrêcin zane, wekî bi rîya bêkarîyê, tunebûna hewaskarîyê wê bona bawarmend derewa xwe pêşda bikişîne. Bi çiqasîva meriv bi xwestina xwe li ber xirabîyê ber xwe bide, bi aqasîva dijminê nikaribe nava wî şerîda serbikeve. Lê belê, eger ew nava halê pasîvdane, wî çaxî pîrsgîrêka wî heye.

Gelek bawarmend nava halên cûre-cûreda bi texmînkirinên xweva dişuxulin. Eger beşera wan tune bona kirina tiştêkî, wî çaxî ew wê yekê nakin. Ew rûyê texmînkirinên xweda pesinê Xwedê didin, yan jî sozê xwe xweyî dikin. Bi gilîkî mayîn gotî, ewê t’u tiştî nekin, eger t’u tiştî texmîn nekin.

TÊRÎTORÎYA AZA CÎYÊ VALA YE

“Cî nedine mîrêcin”.

Efesî 4:27, KJV

Mîrêcin nava jîyana meda li wêderê cîyê xwe digre, li kîderê valayî heye. Fikira vala û pasîv dikare bi fikirên şaşe cûre-cûreva tijîbûyî be.

Bawarmendê bi fikirdarîya pasîv û yê ku li ber fikirên şaş ber xwe nade, gelek cara mînanî hindava fikirên xweda nêzîkbûnê dide kifşê. Ew fem nake, wekî ruhê xirab bi wan fikirava mejûyê wî tişî dike.

Mecaleke bona ku fikirdarîyê ji fikira şaş dûr bigrin, ew e, ku fikirdarîyê bi fikirên rastva tişî bikin. Hûn dikarin berî mîrêcin bidin, lê ew dîsa digere û cîyên vala dibîne. Wextê ku ew paşda vedigere cîyê xweyî berê û dibîne, ku li wir vala ye, wî çaxî çawa ku xeberên Încîlêye Mizgînîya Lûqaye 11:24-26 dibêjin, ew tevî xwe ruhên xirab tîne û halê mêriv diha xirabtir dibe, ne ku ew pêşda bû.

Ez nabêjim, wekî fikirên xirab li cem kê hene, usa ye ku ew bi ruhê xirabva tişîbûyî ye. Feqet, bi tomerî hildayî, ruhê xirab li piş fikirên xirab sekîniye. Meriv dikare fikirên nava fikira xweda çêbûyî gelek cara bihincirîne, lê ewê careke mayîn paşda vegerin, hetanî ku em hîn nebin, ku cîyên fikira xweye vala bi fikirên rastva tişî bikin. Wextê ku dijmin paşda vedigere, ew gerekê t'û cîyekî aza bona xwe nebîne.

Hene gunehên agrêsîv (wextê ku em wana mîyaser dikin), û gunehên pasîv (wextê ku em wê yekê mîyaser nakin, çi ku gerekê mîyaser bikin). Bi gotinên mayîn gotî, tiştên şaş hene, kîjana em dikin û hene tiştên rast, kîjana em nakin. Mesele (mînak), heleqetî dikarin rûyê xeberên meye nefikirmîşbûyîda bîn xirabkirinê, lê ew dikarin usa jî wî çaxî xirab bibin, wextê ku em van xeberên baş û yên şênkirinê nabêjin, kîjana gerekê bêjine meriva.

Merivê pasîv difikire, wekî bi nekirina t'û tiştî, ew t'û tişteki xirab nake. Wextê ku ew rû bi rû derdikeve ber şaşîya xwe, ew dibêje: "Lê min t'û tişt nekirîye". Şirovekirina wî rast e, lê kirina wî nerast e. Pirsgirêk pêşda hatiye, çimkî ewî t'û tişt nekirîye.

PASÎVÎYÊ ALTKÎN

Bi sala ser hev, pirsgirêkên malxwê min Dêyv girêdayî pasîvîyêra hebûn. Nava hinek tiştada ew gelekî aktîv bû: ew her roj diçû xebatê, rojên şemîya golf dilîst, lê rojên yekşemê fûtbol temaşe dikir. Feqet nava tiştên mayînda gelekî dijwar bû, ku wî mecbûr bikirana, ku ewî

tiştekek bikira. Eger hewcetî hebû, şikilek dîwêrva darda bikira, ew yek dikaribû sê yan çar hevîya bikişanda. Vê yekê nava heleqetîyên meda pirsgirêkên mezin pêşda dianîn. Usa dihate texmînkirinê, wekî ew tenê wî tiştî dike, çi ku ew dixweze û ne tişteki mayîn.

Dêyv Xudan hiz dikir û wextê ku ewî ji Wî hîvî kiribû, ku nava helkirina wê pirsêda alî bike, Xwedê li wî eyan kiribû, ku pasîvî çiqasî bi qezîya ye. Ewî fem kiribû, wekî li piş bêkarîya wî ruhên xirab sekinîbûn. Nava jîyana wîda govek hebûn, li kîderê t'û pirsgirêkeke wî tunebû, çimkî li wir ewî xwestina xwe mîyaser dikir. Lê nava govekên mayînda Dêyv rûyê pasîvîya xweda xwestina xwe teslîmî xwestina dijmin kiribû. Nava wan govekada ew ketibû bin kontrola dijmin û xwestina wî, û ne jî xwestin yan jî menîya wî hebûn ku pirsgirêk hel bikira.

Lêkolînkirina Xebera Xwedê û dua ew her du govek bûn, li kîderê ew dîsa pasîv bû. Bi zanebûna wê yekê, wekî cedandina wîye bona rêberbûna jî alîyê Xwedêda tune, ez nikaribûm gura wîda bûma û ez miqabilî wî derdiketim. Tişteki eyan e, wekî mîrêcin alîyên meye zeyîf dijî (miqabilî) hev dida xebatê. Rûyê vê yekêda gelek mîr û jin jî hev cihê dibin. Ew bi rastî fem nakin ku çi diqewime.

Ez gelekî agrêsv bûm û her dem berbirî Xwedê direvîm, himberî qalib min bi cûrê xwe usa dikir û hîvîyê bûm, wekî Xwedê gerekê dua bike.

Lê Dêyv xêncî hîvîyêsekinandinê, ya jî alîyê Xudanda, tişteki mayîn nedikir, û wê yekê jî gelekî hêrsa min radikir. Niha em dikenin, wextê ku bîr tînin, ku em berê çawa bûn. Lê niha ewê tişteki pêkenînê nîbûya, eger Xwedê wî çaxî guhdarîya me nebira li ser wê yekê, rûyê çida diqewime em niha jî hev cihêbûyî bûna.

Dêyv digote min, wekî ez her dem pêşîya Xwedê diketim, lê min jî digote wî, wekî ew bi deh mîla jî Xwedê paş ketîye. Ez gelekî aktîv bûm, lê Dêyv jî gelekî pasîv bû.

Eger bawarmend nava wê govekêda pasîv e, bo kîjanî karebûn yan jî merîfet hatine dayînê, wî çaxî ew cîh destpê dibin xirab bibin, yan jî zeyîf bin. Bi çiqasî dirêj meriv pasîvîyê dide kifşê, bi awqasî zêde xwestina wîye bona kirina tişteki zeyîf dibe. Nava meselada yeke here baş telîmên fîzîkîne.

Ez programeke fîzkûltûrayêye başva mijûl dibim, û çiqasî zêde pêva mijûl dibim, ew yek bo min diha hêsa dibe. Wextê ku min ji nûva destpê kir, ew yek bona min gelekî dijwar bû: mîyaserkirina bernamê bedena min gelekî diêşand, çimkî pêşîya wê yekê ez gelek wede wê yekêva mijûl nebibûm. Bedena min rûyê halê pasîvda usa bibû, wekî hazirîya mine fîzîkî xirab bibû. Ez zeyîf bibûm, çimkî min tamarên xwe nedabûne xebatê.

Bi kutasî Dêyv pirsgirêka xwe dît. Ew mecbûr bû dijî wan ruhên xirab derbikeve, yên ku bi xebitandina halê wîyî pasîv wedekî dirêj ew kiribûne bin kontrola xwe. Wextê ku Ruhê Pîroz ew rastî li wî eyan kir, ewî qirar kir xweranedîtîne bide sekinandinê û careke mayîn aktîv be.

Nava vê pirsêda qirarkirin (biryarkirin) tiştê herî hêsa ye, lê mîyaserkirin tiştê herî dijwar e. Wî alîda dijwar bû, wekî nava hemû govekada, li kîderê ewî pasîvî dabû kifşê, lazim bû awqasî xwe hîn bikira, hetanî ku ew qewînbûna.

Ewî destpê kir şebeqê seheta pêncê hişyarbe, pêşîya çûyîna ser xebatê, Xeberê bixwîne û dua bike. Şerkarîya rast paşê destpê bû. Mîrêcin naxweze wan cîya paşda bide, yên ku ewî îdî zeff kirine û ew bêyî şer wana paşda nade. Dêyv hişyar dibû, ku wedê xwe tevî Xwedê derbaz bike, lê paşê cîyê rûniştî, yan jî paldayî dîsa xewira diçû. Nenihêrî wê yekê, wekî carna şebeqê ewî xewixî dua dikir, lê çawa jî hebe pêşkeftin kifş bû: ew ji nivîna radibû û dicêriband jîyana xweye duakirinê çê bikira.

Carna ew aciz dibû. Rojên usa hebûn, wextê ku ewî pêşkeftin texmîn nedikir, ji xwendina xwe t'û tişt fem nedikir, tê bêjî duakirin nedigihîşte cîh. Feqet ewî mêrkîmî berdewam dikir, çimkî Ruhê Pîroz qezîya pasîvîyê li wî eyan kiribû.

Min dît, wextê ku hewcetî hebû li malê tiştêk çê bikira, ewî carekêra ew yek dikir. Ew diha gelekî hatibû guhartinê. Gelek cara ewî ji kirinên xwe lezet nedistend, lê ew îdî bi texmînkirîna xwe û xwestinên bedenîva nedihate rêberkirinê. Bi çiqasî zêde ewî fem dikir, wekî ew rast dike, bi awqasî zêde ewî azadîya xwe texmîn dikir.

Ez vekirî bêjim, wekî ew yek bona wî hêsa nehate dayînê. Ewî nava çend rojada yan jî hevtîyada ew azayî dest neanî. Pasîvî halekî

gelekî dijar e, bona altkirina kîjanî, çawa ku min got, meriv gerekê bi texmînkirinên xweva pêşda neçe.

Bi alîkarîya Xwedê Dêyv mêrkîmî pêşda çû û niha t'û nişaneke pasvîyê nava wîda tune. Ew administratîyê qulixdarîya me ye û usa jî cabdarê finansî ye, pêra jî serkarê beşa radyoyê û tîlêvîzîyê ye. Ew her dem tevî min rêwîtiyê dike û hemû rêwîtiyên me program dike. Ew usa jî malbetêda mêrekî gelekî baş e. Gelek cara ew wedê xwe nava xwendina dua û Xebera Xwedêda derbaz dike. Kurt gotî, ew merivekî layîqî qedirgirtinê ye.

Rast e, ew hela hê golfê dilîze û progîrmên sportêye tîlêvîzîyê temaşe dike, lê bi wê yekêva tevayî borcdariyên xwe bîr nake. Niha, wextê ku wî nas dikin û wî hemû tiştî dibînin, ku çî ew dike, t'û kesê nefikire, wekî ew wededa awqas pasîv bûye.

Meriv dikare pasîvîyê alt bike. Feqet gaveke kirina wê yekê ew e, ku nava fikira xweda pasîvîyê alt bikin. Dêyv nikaribû pêş biketa, hetanî ku ewî biryara xwe qebûl nekir û fikirdariya xwe neguhart.

PIŞTÎ FIKIRÊN RAST GAVÊN RAST TÊN

“Û nebîne mînanî vê dinîyayê [vê qurnê], [ya ku guhartîye û anegorî edetên wêye der], lê [bi temamî] werine guhastinê bi çêbûna fikira xwe [bi îdêlên nû û nêzîkbûna nû]”.

Romayî 12:2, AMP

Xebera Xwedê li vir prînsîpeke girîng eşkere dike. T'û kes wê niikaribe bi jîyana serkeftîva bijî, eger vê prînsîpê fem nake û nade xebatê, wekî piştî fikirên rast gavên rast tîn.

Îzinê bidin vê yekê cûrekî mayîn bidime kifşê, hûnê nikaribin xwe biguhêrin, eger hûn fikirên xwe neguhêrin.

Anegorî qeyde û qanûnê Xwedê, pêşda fikirên rast tîn, lê paşê kirinên rast. Ez gumanim, wekî kirinên rast berên fikirdariya rastin... Gelek bawarmend dicêribînin bi şerkarîyê kirinên rast bikin, lê ber feydayê şerkarîyê nîne. Ber feydayê mayîna li ser çiqîlêye (binihêre Yûhenna 15:4). Lê mayîna li ser çiqîlê şikestîbûnê (gurêdabûnê) dixweze (binihêre Yûhenna 15:10).

Wextê ku ez derheqa vê prînsîpêda xeber didim, ez her dem xeberên Efesî 4:22-24 didime xebatê. Nava xebera 22-da tê gotinê: “De hûn xeysetê xweyî berê jî xwe dûrxin, wî merivê kevinî, ku bi havijiyên hilekarva dêrisbûyî ye”.

Xebera 24-a berdewam dike: “Û merivê nû li ser xwe wergirin, ku kirasê Xwedêda bi heqî û helalîya bêqelî xuliqîye”.

Bi vî cûreyî em dibînin, wekî xebera 22-a hîmlî dibêje me, wekî em terka hilekarîyê bidin, lê xebera 24-a temîyê dide me, ku em bi heqî û helalîva bişuxulin.

Xebera 23-a ez çawa “xebera pira” nav dikim. Ew dibêje, ku çawa jî xebera 22-a (hilekarîyê) derbazî xebera 24-a (heqîtîyê) bibin: “...û bi ruh û fikirên xweda nûyejîyîn bin” (dêmek, fikira nû û nêzîkbûna ruhanî dest bînin).

Ew yek tiştê bûyîne nîne, ku jî kirinên şaş derbazî kirinên rastbin, eger pêşda fikirdarîya xwe neguhêrin. Xwestina merivê pasîv dikare hebe, ku ew tiştên rast bike, lê ewê t’u cara nîkaribe wê yekê bike, hetanî ku fikira wî berbi Xebera Xwedê neçe û anegorî xwestina Wî nebe.

Merivek hate bîra min, yê ku wextê sêminareke min hîvî kir, ku ez bona wî dua bikim. Li cem wî pîrsgirêkên girêdayî xwestinên bedenîva hebûn. Ewî bi rastî jîna xwe hiz dikir û nedixwest ku zewaca wan bi cihêbûnêva ser hevda bihata. Eger pîrsgirêk nehata helkirinê, wî çaxî ewî dikaribû malbeta xwe unda bikira.

“Coys, pîrsgirêkên min hene, yên ku xwestinên mine bedenîva girêdayîne,-ewî got,- û ez nîkarim bêyî guhdarî li rex t’u jînekêra derbaz bim. Tu dikarî bona azabûna min dua bikî. Min gelek cara dua kirîye, lê ez t’u guhartinekê nabînim”.

Ruhê Pîroz rêberîya min kir, ku ez vê yekê bêjime wî: “Belê, ezê bona we dua bikim, lê weva girêdayî ye, ku hûnê çî îzinê bidin, ku êkrana fikira we nîşanî we bide. Eger hûn dixwezin azadbûna xwe bibînin, wî çaxî hûn gerekê dîmenên pornografîk nava fikira xweda nebînin, yan jî xwe tevî jinên mayîn nebînin”.

Merivên mayîn jî mînanî vî merivî gerekê fem bikirana, wekî tenê bi xwestinê nikarin pêşda herin, eger ew dixwezin aza bin. Meriv dixwezin kirina xwe biguhêrin, lê ne ku fikirên xwe.

Gelek cara fikir dibe deşt, li kîderê meriv “gunehêra dilîzin”. Îsa nava xeberên Mizgîniya Mettaye 5:27,28-da gotiye: “We bihîstîye, ku hatîye gotinê: “Zinê neke, lê ez wera dibêjim, kî bi temê xirab jinekê binihêre, ewî dilê xweda îdî tevî wê zinêkarî kir”. Guneh ji fikirdarîya gunekar pêşda tê.

Wextê mekteba Încîlêye ewlin, ya ku mala minda derbaz dibû, jinek hazir bû. Ewê jîyana xwe teslîmî Xudan kiribû û dixwest ku mala xwe û malbeta xwe nava Xwedêda bida qewînkirinê. Jîyana wê nava xaosêda bû, mal, zarok, zewac, finans, saxlemî û tiştên mayîn. Ewê eşkere digot, wekî mêrê xwe hiz nake û ew bendî tişteki danedianî. Bi zanebûna wê yekê, wekî ev nêzîkbûn li ber Xwedê şaş e, ewê xwestin elam kir, ku mêrê xwe hiz bike, feqet ewê qet hazirîya wî jî qebûl nedikir.

Me dua dikir, ewê dua dikir, hemûya dua dikirin... me ji Încîlê wêra xeber dida û vîdêoyên terîfkirina didane wê, ku ewê guhdar bikira. Me çî dikaribû kir, nenihêrî wê yekê tê bêjî ewê guhdarîya şêwirên me dikir, lê nava jîyana wêda t’u pêşkeftin nedihate kifşê. Gelo şaşî nava çida bû?Wextê şêwirdarîke me zelal bû, wekî nava temamiya jîyana xweda ew nava xiyalada bûye. Ewê her dem anîye ber çevê xwe, ku çawa nava çirokêda ew qîza padişê ye, lê hizkirîyê wê jî kurê padişakî mayîn bû, yê ku gerekê wextê paşdahatina ji xebatê bi kulîlkava û şîrinayêva pêşda bihata, ber wê çok bida û derheqa xwepêşkêşkirina xweda xwe mikur bihata.

Ewê rojên xwe bi vê fikirdarîyê xerc kiribûn û wextê ku mêrê wêyî qalin, westîyayî, xwîdayî, qirêj (diranekî wî jî ketî) ji xebata giran paşda dihate malê û ewê destpê dikir wî bêhurmet bike.

Qasekê derheqa vî halîda bifikirin. Jîyana vê jinê hela hê nava xaosêda bû. Ewê xwestibû gura Xwedêda be û bona Wî bijî, lê usa jî xwestibû mêrê xwe hiz bike, çimkî zanibû, wekî ew e xwestina Xwedê. Ewê xwestibû ku nava jîyana xweda, usa jî nava zewaca xweda bighîje serkeftinê, lê fikira wê ew alt dikir. Ewê t’u cûrekî nikaribû ew yek alt bikira, çî ku ewê ji alîyê mêrê xweda texmîn dikir, hetanî ku ewê destpê nekir “dengê fikirê” kontrol bike.

Ew bi fikira xweva li dinîyakê dijît, ya ku tunebû û t'u cara jî tune bûye. Bo wê yekê jî ew hazir nîbû li ber rastîye bisekîniya. Fikira wê pasîv bû û çawa ku ewê biryar (qîrar) nekiribû ku fikira xwe Xebera Xwedê ra bida qayîlkinê, ruhên xirab dîsa bi fikirên şaşva ew tijî dikirin.

Ew difikirî, wekî ew fikirên wêye şexsî ne û bo wê yekê jî ew nikaribû nava wê govekêda bighîştta serkeftinê. Ewê fikirdariya xwe guhart û jîyana wê hate guhartinê. Wê yekê nêzîkbûna wêye hindava mêrê wê guhart, lê mêrê wê jî destpê kir bê guhartinê, him hindava jina xweda û him jî ji derva.

DERHEQA YÊN JORINDA BIFIKIRIN

“Awa ku hûn tevî Mesîh ji mirinê rabûne ku usa ye li tiştên jorin bigerin, li wandera, kîderê Mesîh li milê Xwedêyî rastê rûniştîye. Ser tiştên jorin bifikirin, ne ku ser tiştên vê dinîyayê”.

Kolosî 3:1,2

Careke mayîn em wê prînsîpê dibînin: eger dixwezin tevî Îsa bi jîyana wî cûreyî bijîn, usa ye ewê jîyana nû, zor, bigerin, fikira xwe li ser wê yekê bidine merkezkinê, çî ku li jor e.

Pawlosê Şandî dibêje, ku eger em jîyana baş dixwezin, wî çaxî em gerekê fikira xwe li ser tiştên baş bidine merkezkinê.

Gelek bawarmend dixwezin, ku jîyana wan başbe, lê bi pasîvî rûdinên û hîvîyêne, ku kengê nava jîyana wanda wê tiştêkî baş bibe. Gelek cara ew hevsûdiyê li yên mayîn dikin, yên ku bi jîyana serkeftîva dijîn û hêrs dikevin, wekî jîyana wan awqasî dijwar e.

Eger hûn dixwezin pirsgirêkên xwe altkin, eger bi rastî dixwezin bi jîyana jorinva bijîn, wî çaxî gerekê ne tenê xwestina we hebe, lê pêra jî xeysetê qewîn hebe. Hûn gerekê aktîv bin, lê ne ku pasîv. Kirina rast ji fikirdariya rast destpê dibe. Nava fikirên xweda pasîv nebin. Hema îro jî destpê bikin fikirên rast bibijêrin.

Serê
15-a

Fikira Mesîh

Fikira Mesîh

Ez gumanim, wekî we îdî qirara zelal qebûl kirîye, wekî hûnê fikirên rast bibijêrin, usa ye werin em hinek fikirdarîya lê binihêrin, yên ku ji alîyê Xudanda yên qebûlkinênê. Fikirdarîyên cûre-cûre hene, yên ku bi temamî ji alîyê Îsada yên qebûlkinênê nîbûn, wextê ku Ew li ser dinîyayê dijît. Eger em dixwezî bi rêyên Wî va herin, wî çaxî em gerekê destpêkin mînanî Wî bifikirin.

Ez gumanim, wekî hûnê carekêra bifikirin: “Coys, ew yek tiştê bûyîne nîne, çimkî Îsa kamil e. Diqewime ez bikaribim fikira xwe berbi başîyê biguhêrim, lê ezê t’u cara nikaribim mînanî Îsa bifikirim”.

Lê Încîlêda tê gotinê, wekî fikira Îsa li cem me heye, usa jî dilê nû û ruhê nû.

DILÊ NÛ Û RUHÊ NÛ

“Ez gerekê dilê nû bidim û ruhê nû daynime nava we, û gerekê dilê kevir ji bedena we hildim û gerekê dilê bedenî bidime we. Û Ruhê Xwe gerekê daynime nava we, gerekê bikim bona ku hûn nava qanûnên Mînda bişuxulin û dîwanên Min xweykin û wana mîyaser bikin”.

Hezeqêl 36:26,27

Çawa mesîhî heyîna meye nû heye, ya ku hema heyîna Xwedê ye, ku nava meda ji bûyîne hatîye danîne.

Nava xebera Romayî 8:6-da derheqa fikira bedenêda tê gotinê û tê kifşkirinê, wekî encamê çûyîna peyî fikira bedenî mirin e, lê feydayê çûyîna peyî fikira Ruh jîyan e.

Emê bighîjine pêşkeftineke ku nayê bawarkirinê, eger em hînbin jîyanê û mirinê ji hev cuda bikin.

Eger tiştêk we berbi mirinê dibe, wî çaxî wê yekê nekin. Dema ku hinek fikir we bi mirinêva tişî dikin (bi her qezîyakêva), wî çaxî carekêra fem bikin, wekî ew ji fikirên Ruh nînin.

Mesele, bînin ber çevê xwe, ku ez çawa rûyê merivekîda bi neheqî dizêrim. Ew fikir hêrsa min radikin. Ez destpê dikim bifikirim, ku ew meriv çiqasî nebaş e. Eger ez destpê bikim halê xwe gotûbêj (enene) bikim, ezê fem bikim, wekî bi fikirên mirinêva tişî dibim. Ew beşera min xirab dikin, halê sert pêşda tînin û pêra jî nerihetîya fizîkî didin. Feydayên fikirdarîya şaş dikarin êşa sêrî, zikêşê, usa jî westandinê pêşda bînin. Ji alîkî mayîna, eger destpê bikim bifikirm, ku bi çiqasîva ez duakirîme û Xwedê hindava minda çiqasî qenc e, wî çaxî ezê bi fikirê jîyanêva tişî bibim. Bawarmend gerekê hîn bibe mirinê û jîyanê ji hev cuda bike. Îsa hemû tişt bona me hazir kir, ku em bi jîyanêva tişî bibin. Em gerekê birîyarkin (qirarkin) ku bi fikira Mesîhva bijîn.

Nava rûpelên kitêbêye mayînda hûnê bixwînin, ku çawa gerekê anegorî fikira Mesîh bijîn.

Gav 1: Bila fikirên baş cem te hebin

“Gelo her duyê bi hevra herin, eger pêşda bi hevra qayîl nebûne?”.

Amos 3:3

Fikirên wî bawarmendî wê çawa bin, yê ku himberî fikira Mesîh difikire: bêguman (bêfitîya), wê fikirên baş bin. Nava serîkî kitêbêyî pêşinda me îdî derheqa pêwîstîya (lazimatîya) fikirdarîya başda xeberdaye. Eger hûn dixwezin, dikarin paşda veqerine serê kitêbêyî 5-a û bîr bînin, ku fikirên baş çiqas girîngin. Min ew serî careke mayîn xwend û ez careke mayîn hatime duakirinê, nenihêrî wê yekê, wekî min bi xwe ew nivîsîbû.

Meriv nikare qewata nêzîkbûna baş qîmet bike. Xwedê baş e û eger hûn dixwezin tevî Wî “xwe avê bixin”, hûn gerekê li ser bilindaya dîsa wê pêlê bin û destpê bikin baş bifikirin. Ez derheqa

kontrolkirina fikirêda nabêjim, lê dixwezim bêjim gerekê meriv ji hemû alîyava optimist be (baş bifikire).

Bi optîmîstî jîyanê binihêrin û nêzîkî wê bin. Fikirên baş dîsa xweykin û hîvîya tiştên baş bin. Bona qisê tenê têmayên baş bibijêrin.

Îsa optîmîst bû û nêzîkbûna baş hindava jîyana Xweda da kifşê. Ew mecbûr bû gelek dijwarîya li ser xwe bibe, hetanî êrîşa, derewên ku derheqa Wîda bela dibûn, tenêhiştina Wîye ji alîyê şagirtada, wextê ku ew bona Wî lazim bûn, bûyîna nîşangeha qerf-qûçika, tenêbûn, ew yek, wekî ew ji alîyê gelekada nedihate qebûlkirinê û gelek tiştên vî cûreyî. Feqet, nava van hemû tiştên xirabda Îsa optîmîst ma. Ew her dem hazir bû, ku xeberên berdildahatinê û bilindkirinê bêje meriva. Ewî her dem guman dida wana, yê ku dihatine cem Wî.

Fikira Mesîh li cem me heye û bingeha (hîmê) wê heye, usa ye wextê ku her car em bi fikirên xirabva tijî dibin, gerekê fem bikin, wekî em anegorî fikira Mesîh nafikirin. Bi mîlyona meriv nava jîyana xweda ji dêprêsîya heyî, acizîya û bêgumanîyê dizêrin. Û ez gumanim, wekî meriv nikare nava beşera xirabda û bin hukumên xirabda nebe, eger pirs derheqa saxlemîya mêrivdane. Feqet, eger menîya dêprêsîyayê nexweşî ye, wî çaxî fikirdarîya xirab wê ewê nexweşîyê diha sert bike û giran bike. Wextê ku beşera mêriv xirab e, dor-berên wî jî nava beşera xirabdanin. Serî berjêrkirî, li ser sifetê wî t'û tişt dîyar nîne, çevên wî medekirîne, sergirkên milên wî dardabûyîne... Û bi tomerî hildayî, ev hemû tiştê bi wê yekêva serhevda bîn, ku ew bi xwe jî dikeve qulçekî û usa jî dimîne.

Anegorî xebera Zebûr 3:3, Xwedê rûmeta me ye û Ew e, Yê ku serê me bilind dike. Ew dixweze me bilind bike: gumana me, nêzîkbûna me, beşera me, serê me, dest û dilên me. Xwedê dixweze me bilind bike, lê mîrêcin dixweze me biavêje. Mîrêcin qewimandin û halên xirabe nava jîyana meda dide xebatê, ku em berxwekevin û ew hukumî ser me bike. Nava ferhengêda xebera "hukumkirin" ev e: "ketina bi moralî, xemgînî". Anegorî ferhenga Wêbstêr, ew "çi ku hukumkirî ye, "niqobûyî ye".

Hukumkirin dide kifşê "niqobûn, guvaştina li jêr, yan jî xweykirina merivaye li ser erdê". Carna usa dibe, wextê ku em fikirên

xirab qebûl dikin, lê ew jî hukumkirinê diha didine qewatkirinê. Fikirdariya xirab û nêzîkbûna xirab nikarin pirsgerêkên me bidine helkirinê: ewê tenê hal diha bidine girankirinê

DÊPRÊSÎYAÊ ALT BIKIN

Xeberên Zebûr 143:3-10 -da derheqa dêprêsîyayêda tê gotinê û tê kifşkirinê ku çawa dikarin wê yekê alt bikin. Werin em wê parê (beşê) diha bi hûrgilî lê binihêrin, ku em wan gava bibînin, bi destî kîjana emê bikarbin vê êrişa dijmin alt bikin.

1: Menîya pirsgerêkê biryar bikin (qirarkin)

“Dijmin peyî min ket, emirê min pêpes kir, ez avîtime tarîstanê, ez bûme mîna yê zûva mirî”.

Zebûr143:3

Gotina “...Ez avîtime tarîstanê, ez bûme mîna yê zûva mirî” zelal merivekî dide kifşê, yê ku ji dêprêsîyayê dizêre.

Binihêrin, wekî menîya vê dêprêsîyayê, yan jî kanîya wê êrişa mîrêcine ruhanî ye.

2: Fem bikin, wekî dêprêsîya jîyanê û ronahiyê didize

“Ruhê min minda temirî, dil nava minda ricifî”.

Zebûr 143:4

Dêprêsîya azayî û qewata mêrive ruhanî dike bin hukum.

Ruhê me (yê ku ji aliyê Ruhê Xwedêda qewat stendîye û hatîye piştgirtinê) qewat û aza ye. Ew e menî, wekî mîrêcin dicêribîne fikira me bide tarîkirinê, bona ku hukumî li ser qewat û azaya ruhê me bike. Ez hîvî dikim, fem bikin, wekî ew yek gelekî girîng e, ku ji wî çaxîda li ber texmînkirina bi navê “dêprêsîyayê” ber xwe bidin, wextê ku ew detspê dike serê xwe bilind bike. Bi çiqasîva dirêj hûn îzinê bidine xwe, ku nava wêda bimînin, bi awqasîva zêde wê bona we dijwar bibe, ku hûn ber xwe bidin.

3: Demên baş bîr bînin

“Rojên buhurî ez bîr tînim: ser hemû kirinên Te difikirim, ser kirê destê Te ez kûr dibim”.

Zebûr 143:5

Nava vê parêda (beşêda) em dibînin, wekî Zebûr bersivên halên cûre-cûre dide. Bîranîn, fikirmîşbûn çawa fûnksîyayên fikirê tên hesabê. Ew zane, ku fikirên me çawa hukumî li ser texmînkirinên me dikin, bo wê yekê jî ew mejûyê xwe bi fikirên usava dide mijûlkirinê, yên ku dikarin alî bikin, ku êrîşa li ser fikira wî kirî bê paşdadayîne.

4: Pesinê Xudan bidin, wextê ku hûn nava dijarîyêdanin

“Destê xwe dirêjî Te dikim: çawa erdê ziha hîvîya avê ye, nevsa min tîyê Te ye”.

Zebûr 143:6

Zebûr girîngîya pesindayîne zane: ew destên xwe wextê pesindayîne dirêj dike. Ew elam dike, wekî ew bi rastî, tenê hewcê Xwedê ye. Tenê Xudan dikare texmînkirina razîbûnêye rast bide wî.

Gelek cara meriv dikevî bin hukum, çimkî ew hewcê tiştêkî, lê wê yekê li cîyên şaş digerin û ew yek pirsgerêkê wana diha gelekî didine dijarîkirinê. Pêxembertîya Yêremîya 2:13-da Xudan dibêje: “Cimeta min xirabîya dubare kir: ez çawa kanîya jîyanê hiştim, wekî bona xwe bîra bikolin, bîrên qulqulkî, yên ku nikarin avê xweda xweyî bikin”.

Tenê Xwedê dikare tîbûna ruh bişkêne. Xwe nexapînin, nefikirin, wekî xêncî Xwedê hûnê bikaribin bi tîstên mayîna razîbûna kamil bibînin. Ketina peyî tiştên şaş wê her dem we berbi acizîyê bibe, lê ewê jî bona dêprêsiyayê derî veke.

5: Alîkarîya Xwedê hîvî bikin

“Caba min zû bide, Xudano: ruhê min tê serê pozê min, rûyê xwe jî min veneşêre, ku nebime mîna yên dikevî gorê”.

Zebûr 143:7

Zebûr alîkarîyê hîvî dike. Çawa ku tê femkirinê, ew dibêje: “Xwedê, lez keve, çimkî ez nikarim dirêj bêyî Te û alîkarîya Te teyax bikim”.

6: Dengê Xudan guhdar bikin

“Serê sibê huba Xwe min bide bihîstinê, çimkî min gumana xwe danîye li ser Te: rîya ku ezê têda herim, nîşanî min bike, çimkî nevsa xwe berbi Te bilind dikim”.

Zebûr 143:8

Zebûr zane, wekî ew hewcê wê yekê ye, ku guhdarîya Xwedê bike. Ew hewce ye, ku nava hizkirin û qencîya Xwedêda îzbat bibe. Hewcetîya wîye guhadarî û rêberîya Xwedê heye.

7: Bona azadbûnê dua bikin

“Xudano, min ji neyarên min aza bike: ez gumana xwe datînim li ser Te”.

Zebûr 143:9, AMP

Zebûr careke mayîn elam dike, wekî tenê Xwedê dikare alî wî bike.

Ez hîvî dikim, ku hûn hesab hildin, wekî ew her dem fikira xwe li ser Xwedê, lê ne ku li ser pirsgirêka xweyî dike.

8: Serwaxtî, zanebûn û rêberîya Xwedê bigerin

“Min hîn bike, ku emirê Te biqedînim, çimkî tu Xwedêyê minî: bila Ruhê Teyî qenc rêberê min be, min bibe erdê mêrg û çîman”.

Zebûr 143:10

Diqewime Zebûr li vir dide kifşê, wekî ew ji emirê Xwedê xalifîye û bi wî cûreyî bona êrîşên ruhanî derî vekirîye. Ew dixweze nava emirê Xwedêda be, çimkî fem dike, wekî ew e cîyê tek-tenêyî bêqezîya.

Paşê ew ji Xwedê hîvî dike, ku alî wî bike, ku ew îzbatbe. Bi fikira min "... min bibe erdê mêrg û çîman" derheqa texmînkirinên wîye şaşbûyîdane. Ew dixweze li ser xeta rastbe, naxweze ne li aliyê rastê, ne jî li aliyê çepê bixalife.

ÇEKÊN XWE BIDINE XEBATÊ

"Çimkî çekên eskerîya me ne yên merivayî ne [çekên bedenê û xwînê], lê yên qewate ji Xwedê ne, bona wêrankirin û niqoyîkirina kelane, [çimkî] em wan rastîya û dirava û ewlehîya, û her tiştekî kubar, yê ku xwe hindava ulmê Xwedê [rast] bilind digire, betal dikin: û em rêberîya her fikirekê dikin û her meremekî dîl digrin ku gura Mesîhda be".

B Korintî 10:4,5, AMP

Mîrêcin dêprêsîyayê û hemû cûrên "ketinên" mayîn dide xebatê bona ku bi milyona meriva bavêje nava tarîstanê û kûraya gumanbirîyê. Gelek cara dêprêsîya dibe encamê xwekuştinê. Merivê ku hazir e gava xwekuştinê bavêje, dikeve nava fikirdarîya xirabe usa, wekî gumana xweye hindava pêşerojêda unda dike.

Bîr bînin, fikirên xirab texmînkirinên xirab pêşda tînin.

Fikir deşta şêr e. Û ew ew cî ye, li kîderê şer yan ser dikeve, yan jî bin dikeve. Roja îroyîn bibijêrin, optimist bin, merivê fikirên baş bin, hemû xiyalên xirab niqo bikin û hemû fikirên xwe hildin, ku gura Îsa Mesîhda bin (binihêre B Korintî 10:5).

Gav 2: Bila fikirdarîya weye Xwedê hebe

"Tê wî xweykî û tê wî nava kamilîyêda xweykî û fikirên wîye bi aşîfîya îzbatbûyîva [xeyset û xwestinên wî] Xweda xweykî, çimkî ew Teva girêdayî ye, aminaya xwe li Te tîne û gumana wîye tek-tenê Tu yî".

Îşaya 26:3, AMP

Îsa her dem tevî Bavê Xweyî ezmana nava heleqetîyada bû. Usa nabe, ku tevî yekî nava heleqetîyada bî, eger fikirê we berbi wî kesî

nînin. Eger malxwê min û ez avtomaşînêdanin û ew minra xeber dide, lê ez bi fikira xweva cîyekî mayînim, wî çaxî meriv nikare bêje, wekî em nava heleqetîyadanin, çimkî ez temamiya guhdarîya xwe nadime wî. Bo wê yekê jî em dikarin li ser xwe guman bêjin, wekî fikirên merivê ku bi fikira Mesîhva tên rêberkirinê, wê li ser Xwedê û hemû kirên Wî ye qewat bin.

DERHEQA XWEDÊ Û KIRÊN WÎDA BIFIKIRIN

“Jîyana min wê bi sivira tijîva têr be û devê min wê bi lêvên şa Te dua bike.

Wextê ku ez şev Te bîr tînim, ez derheqa Teda difikirim”.

Zebûr 63:5,7

“Ez nava hemû kirên Te da kûr dibim û derheqa hemû kirinên Te da difikirim”.

Zebûr 77:12

“Ezê ser qanûnên Te kûr bifikirim û dîna xwe bidime rê-dirbên Te [rêyên jîyanê anegorî qanûna Te hatine kişandinê]”.

Zebûr 119:15 (AMP).

“Rojên buhurî ez bîr tînim, ser hemû kirinên Te difikirim, ser kirên destê Te ez kûr dibim”.

Zebûr 143:5

Xudanê Zebûra, Dawid, her dem derheqa Xwedêda digot, derheqa qencîya Wî, û kirên destê Wî û rêyên Wî da. Fikirmîşbûna derheqa qencîya Xwedê û efrandinên destên Wî da carekêra piştgirîyê dide mêriv û mêriv ruhdar dike.

Ez progiramên têlêvîzyonêye derheqa tebyetê, dinîya terewila û jîyana okêanê hiz dikim temaşe bikim, çimkî ew program mezinayî û bilindaya Xwedê didine kifşê, mecalên Wî ye efrandarîyêye bêsinor û didine kifşê, ku çawa Ew hemû tiştî bi qewata karebûna Xwe xweyî dike (binihêre Îbranî 1:3). Eger tu dixwezî bi jîyana serkeftîva bijîyî,

wî çaxî fikirmîşbûna derheqa Xwedê, rêyên Wî û kirên Wî da, gerekê bibe pareke (beşeke) jîyana teye fikirdariyê.

Xeberên Încîlêye ji aliyê minda hizkirî yek jî Zebûr 17:15-ye, li kîderê Zebûr dibêje Xudan: “Ezê razîbûna kamil bistînim, wextê ku hişyarbim [ezê xwe bibînim] mînanî Te bim [û tevî Te nava eleqetên sixda bim] (AMP).

Min rojên gelek xirab derbaz kirine, çimkî her sibe, piştî hişyarbûnê, ez derheqa tiştên xirabe cûre-cûreda difikirîm. Feqet, wextê ku Ruhê Pîroz destpê kir min hîn bike, ku ez çawa fikira Mesîh (fikira Ruh) bidime xebatê, jîyana min carekêra bi razîbûna hundurva tijî bû. Eleqeta tevî Xwedêye sibe zû ew cûrekî rast e, yê ku alî dike, ku ji jîyanê lezetê bistîni û her rojêke xwe rast bijîyî.

ELEQETA TEVÎ XUDAN

“Lê belê, ez rastîyê wera dibêjim, wekî bona we hê kardar e [baş e, dest dide] ku Ez herim. Çimkî eger Ez neçim piştovan [Şewirdar, Alîkar, Advokat, Qewatdar, Piştgir] wê neyê cem we [bona çêkirina eleqeta tevî we], lê Ezê herim, Ezê Wî bişînim [bona çêkirina eleqeta tevî we]”.

Yûhenna 16:7, AMP

Îsa pêşîya çuyîna li ezmana ev xeber gotin. Ji vê xeberê tê kifşê, wekî xwestina Xwedê ew e, wekî em tevî Wî nava heleqetîya sixdabin.

Fikirên me ji hemû tiştî zêdetir nêzikî mene. Bo wê yekê jî, eger em fikirên xwe bi Xudanva tijî bikin, wî çaxî fikirdariya me jî wê bi Wîva tijî bibe û emê destpê bikin eleqeta xweye tevî Wî bibînin, ya ku sirîya xweda wê jîyana meye herroje bi şabûnê, aştîyê û serkeftinêva tijî bike.

Ew her dem tevî me ye, çawa ku soz dabû me, ku her dem wê tevî me be (binihêre Metta 28:20, Îbranî 13:5).

Emê bi hazîriya Wî va tijîbûyî nîbin, eger em derheqa Wî da nefikirin. Ez dikarim tevî kesekî li odekêda bim, lê fikira min dikare bi hezar tiştîva

mijûlbûyî be, û wî cûreyî ezê wî merivî texmîn nekim. Ev yek usa jî derheqa eleqeta meye tevî Xudane. Ew her dem tevî me ye, lê em gerekê derheqa Wî da bifikirin û her dem nava hazirîya Wî da bimînin.

Gav 3: *Bifikirin, wekî Xwedê we hiz dike*

“Û em zanin [fem dikin, nas dikin, bi rîya cêribandina û lênihêrandina fem dikin] û li wê hizkirinê bawar dikin [aminin, bawar û gumanin], ya ku Xwedê hindava meda dide kifşê. Xwedê hizkirin e, û ewê ku di nava wê hizkirinêda dimîne û diji, nava Xwedêda dimîne û Xwedê jî nava wîda”.

A Yûhenna 4:16, AMP

Min tişteki girîng fem kirîye: ew çi ku derheqa hizkirina Xwedêda rast e, usa jî derheqa hazirîya Xwedêda rast e. Eger em derheqa hizkirina Xwedêye hindava xweda nafikirin, emê wê yekê t’u cara texmîn nekin.

Nava beşa (para) Efesî 3-da Pawlosê şandî dua dike, wekî meriv hizkirina Xwedê li ser xwe texmîn bikin. Încîlêda tê gotinê, wekî Xwedê me hiz dike. Feqet, gelo ji zarokên Xwedê çend meriv hela hê derheqa vê eyantîya hizkirina Xwedêda nizanin?

Tê bîra min, wextê min qulixa xwe destpê kir. Hema wextê berevbûna hevtêye ewlin, min ji Xudan hîvî kir, ku bêje min, ku ez gerekê meriva hînî çi bikim. Û Ewî bersiv (cab) da: “Bêje cimeta Min, wekî Ez wana hiz dikim”.

“Bi texmîn, ew wê yekê zanin,- min gotê,- û ez dixwezim wana hînî tişteki qewat bikim, lê ne ku dersa mekteba yekşemê, ya Mizgînîya Yûhennaye 3:16-da, bidim”.

Xudan gote min: “Ji cimeta min gelek hindik meriv bi rastî zanin, wekî ez çiqasî wana hiz dikim. Eger wana derheqa wê yekêda bizanibûya, ewê cûrekî mayîn bikirana”.

Wextê ku min destpê kir lêkolîn bikim, ku meriv çawa dikare hizkirina Xwedê bistîne, min fem kir, wekî ez bi xwe hewca hizkirina Wî me.

Wextê wan lêkolînkirina, Xudan Yûhenna 4:16 nîşanî min da, ya ku dibêje, wekî em gerekê hizkirina Xwedê fem bikin. Ew yek dide kifşê, wekî em gerekê her dem nava hizkirina Xwedêda bimînin.

Min hindik derheqa wê yekêda zanibû, wekî Xwedê min hiz dike. Feqet usa nîne, wekî hizkirina Xwedê nava jîyana meda gerekê bibe ew qewata mezin, ya ku wê me cêribandinên diha dijarra berbi serkeftinê bibe?

Nava banga Romayî 8:35-da Pawlosê şandî ber dilê meda tê: “Çi wê bikaribe me ji wê hizkirina Mesîh biqetîne? Derd-kul, telî-tengî, zêrandin, xelayî-celayî, bêsitari, qeda-bela, yan şûr?”. Paşê nava xebera 37-da ew dibêje: “Lê em nava van hemû tiştada hê zêde ser dikevin, bi saya Ewî ku em hiz kirin”.

Min wedekî gelekî dirêj ev beş (par) lêkolîn kirîye, nava feydayên kîjanada ez hatime li ser femkirina hizkirina Xwedê, bi fikirdarîya derheqa hizkirina Wî da û bi dengê bilind elamkirina wê yekê. Dora xeberên derheqa hizkirina Xwedê da ez difikirîm, min ew bi dengê bilind dixwendin û paşê ezberî dikir. Min bi meha ser hev ew diwekilandin û eyantîya derheqa wê hizkirina Xwedê da bona min vedibû û diha zêde dibû rastî.

Niha hizkirina Wî bona min awqas rast e, wekî demên dijarwarda ez bi xwe ber dilê xweda tîm û dibêjim, wekî Ew min hiz dike û ez gerekê nava tirsêda nejim

NETIRSE

“Nava hizkirinêda tirs tune: hizkirina kamil tirsê dûr dixê”.

A Yûhenna 4:18, KJV

Hizkirina Xwedê nava meda kamil e, çawa ku em nava Wî da kamilin. Nava xebera Romayî 5:8-da tê gotinê: “Lê belê, Xwedê hizkirina xwe hindava meda hingê da kifşê, gava eme hê gunekar bûn, Mesîh bona me mir”. Bawarmendên ku anegorî fikira Mesîh rêber dibin, nafikirin, wekî ew merivine çiqas xirabin. Fikirên wan li ser heqîtiyê hatine hîmdanînê. Fikirên weye ku heqîtiyê fem dikin gerekê hebin û her dem bifikirin, ku hûn nava Mesîhda kîne. Mafê me tunebû ku em li ber Xwedê çawa yên heq bisekinîyana, li ser hîmê wê yekê, wekî em bi xwe nikarin heq bin. Feqet Xwedê mafê afûbûnê û sekinandina nava

kerema Wîda da me. Pêşkêşa heqîtîyê bi kirinên meva wê diha zêde û zêde bê kifşê, wextê ku em ewê bi bawarîyê qebûl bikin.

BIBINE FEMDARÊN HEQÎTÎYÊ, LÊ NE KU YÊN GUNEH

“Bona me Ewî Mesîh [bi rastî] gunehkar kir, Yê ku guneh nizanibû bona ku bi Wî û bi destî Wî em bikaribin bibine [mesele, mînak] heqîtîya Xwedê [em gerekê nava heleqetîyên tevî Wî da îzbatbûyî û qebûlkirî bin, bi saya qencîya Wî]”.

B Korintî 5:21, AMP

Gelek bawarmend hema xût rûyê fikirên xweye xirabda dizêrin. Ew difikirin, wekî Xwedê gerekê rûyê kêmasîyên wan û teribandinên wanda nerazî be.

Hûn çiqas wede xerc dikin, wextê ku hûn bin giraniya gunehê û gunekarîyêda dijîn. Guhdarîyê bidine ser, wekî min got xerc dikin, çimkî fikirdarîya wî cûreyî hema xerckirina wede ye. Nefikirin ku hûn pêşîya qebûlkirina Mesîh merivne çiqas xirab bûne. Diha baş e derheqa heqîtîya Xwedêda bifikirin, ya ku bi saya Mesîh usa jî bû ya we. Bîra xweda xweykin, wekî fikir werguhêzî kirinê dibin. Eger hûn dixwezin kirên xwe bidine milahîmkirinê, berê ewlin fikirdarîya xwe biguhêrin. Eger hûn dîsa bifikirin, wekî hûn merivekî çiqasî xirabin, kirên we wê tenê xirab bin. Her car, wextê ku hûn destpê dikin fikirên xirab, yên ku gunehkar dikin, bistînin, bînine bîra xwe, wekî Xwedê we hiz dike û we nava Mesîhda heqîtîya Xwedê dest anîye.

Nava Xwedêda hûnê berbi başîyê bêne guhartinê. Her roj hûnê nava goveka ruhanîda bighîjin. Bona jîyana we progirama Xwedêye mezin heye. Evana ew rastîne, derheqa kîjnada hûn gerekê bifikirin.

Eva ew e, çi ku gerekê hûn bona fikira xwe bikin.

Anegorî xebera Xwedê bifikirin, lê ne ku her fikireke serê xweda çawa fikira xweye şexsî qebûl bikin.

Berî mîrêcin bidin û destpê bikin pêşda herin, tenê derheqa tiştên mayînda bifikirin.

Gav 4: *Bila fikira weye ku dil dide hebe*

“Eger kesek dil dide mêriv, bila peyî wê yekê be...”.

Romayî 12:8

Merivê ku fikira wî ya Mesîh e, dicêribîne derheqa halên jîyana xwe û yên mayînda li cem wî fikirên baş, yên ku bilind dikin, yên ku şên dikin, hebin.

Roja îroyîn meriv gelekî hewcê wê yekêne, ku dil bidine wan û piştgirîyê li wan bikin. Xeberên we wê piştgirîyê nedine mêriv, eger, berê ewlin, fikirên weye baş derheqa wî merivîda tunene. Bîra xweda xweykin, dilê weda çi heye, wê ese ji devê we derkeve. Bila nêt-meremên we “ji fikirên hizkirinê” pêşda bîn.

Bila fikirên weye bi hizkirinê hindava merivada hebin. Nava jîyana wanda xeberên ku dil didin û piştgirîyê didin elamkin.

Anegorî “ferhenga şirovekirina xeberên peymanên Kevin û Nû”, ya V. Ê. Wayn, xebera yûnanîye “parakalêo” çawa dildayîn tê tercimekirinê, dide kifşê “bangî kesekî bikin (para-li rex, kalêo-gazîkin, bangkin)... şîretkin, ber dilê kesekîda bêyî ku ew kirê xwe rastke”. Ez vê şirovekirinê vî cûreyî şirove dikim: li rex kesekî bisekinim û bangî wî bikim, ku ew gavên anegor bavêje.

Romayî 12:8-da, wextê xeberdana derheqa pêşkêşa “dildayînêda” tê gotinê, wekî ew yek li cem wan kifş e, pêşkêşa kîjana heye. Merivên wî cûreyî her dem xeberên dildayînê, yan jî bilindkirinê dibêjine hemûya, bo çi jî ew xwe diha baş û ruhdarbûyî texmîn dikin.

Pêşkêşa dildayînê hemû kesîra nehatîye dayînê, lê hemû kes dikarin hînbîn piştgirîyê bidine meriva. Bona wê yekê qanûneke zelal heye: eger hûn tiştêkî xirab dibînin, wî çaxî derheqa wê yekêda ne bifikirin ne jî xeberdin.

Bêyî wê yekê jî jîyana meriva bi dijwarîyava tijî ye û nelazime ku hûn bi xeberên xweva wana diha bitirsînin. Em gerekê hevdu bi hizkirinêva bilindkin (binihêre Efesî 4:29). Bîr nekin, wekî hizkirin bawarîya xwe li hemû tiştên başe ku nava her kesekîda heye, tîne (binihêre A Korintî 13:7).

Destpê bikin derheqa merivada baş bifikirin û tiştên baş bibînin, wekî kirên wan berbi başîyê tên guhartinê. Fikir û xeber sîliha raber dikin, yên ku bi qewata çêkirinê, yan jî xirabkirinêne. Hûn dikarin yan dijî (miqabilî) mîrêncin û kirên wî bêne xebitandinê, yan jî hûn dikarin karê bidine mîyaserkirina progiramên wîye xirabkirinê.

Em bêjin, wekî zarokeke we heye û kirên wîva girêdayî pirsgirêk hene û hewce ye ku ew bê guhartinê. Hûn bona wî dua dikin, hîvî ji Xwedê dikin, ku Ew jîyana wîra bixebite û wê jîyana wî biguhêre. Niha fikir û xeberên derheqa wîda nava wî wedeyîda wê çi cûreyîbin? Gelek meriv bersivên (cabên) duakirinên xwe nabînin, çimkî ew bi fikir û xeberên xweva destpê dikin duayên xwe înkâr bikin, pêşîya wê yekê, wekî Xwedê wê nava jîyana wanda wê tiştek bikira.

Diqewime hûn bona zaroka xwe dua dikin, lê bi wê yekêva tevayî hûn xirab difikirin. Yan jî diqewime hûn dua dikin ku Xwedê zarokê biguhêre, lê bi wê yekêva tevayî dibêjine yên mayîn: “Ev zarok wê t’u cara neyê guhartinê”. Bona jîyîna bi serkeftinê hûn gerekê li ser fikirdarîya xwe bixebitin û anegorî xebera Xwedê bifikirin.

Eger fikirên me ne anegorî wê yekêne, çi ku Xeber dibêje, wî çaxî em anegorî Xeberê najîn.

Wextê ku hûn bona kesekî dua dikin, wî çaxî fikirên xwe û xeberên xwe anegorî duayên xwe bikin û wî çaxî guhartin wê hebe.

Ez pêşnîyar nakim, ku hûn ji balansê derkevin û femkirina heyîna pirsgirêkê înkarkin. Eger zaroka we li mektebê kirên baş nake û hevalên we derheqa wîda dipirsin, wî çaxî hûn gerekê çi bikin, eger bi rastî nava kirên wîda hûn t’u guhartinekê nabînin? Hûn dikarin bêjin: “Telebextra (mixabin), hela hê t’u tiştek nehatîye guhartinê, lê ez bawarim, wekî Xwedê xebatê tevî wî dike, kîjanê emê zûtirekê bibînin”.

Gav 5: Fikira razîkir bidine pêşxistinê

“Bi şikirdarîyê bikevine dergêhen Wî û bi pesindayîne hewşên Wî: razîbûnê bidine Xudan û pesinê navê Wî bidin”.

Zebûr 100:4, AMP

Fikirên merivê ku fikira wî ya Mesîhe her dem bi pesindayîne û razîbûnêva tijîbûyî ne. Gazin û nerazîbûn gelek cara li ber dijmin derî vedikin. Hinek meriv bi fizîkî nexweşin û zeyîf dijîn, rûyê nerazîbûna ji jîyana bêqewat, ya ku hukumî li ser fikir û xeberên wan dike.

Jîyana me nikare bi temami têrbûyî be, eger em nerazîne. Încil dîsa prînsîpên razîbûnê li me hîn dike. Bi saya gazinên bi rîya xebera û fikirêda pêşdhatî, prînsîpa mirinê pêşda tê, lê razîbûna bi rîya xebera kifşkirî prînsîpa jîyanê ye.

Eger dilê (fikira) mêrivî razî tune, wî çaxî ji devê wî wê xeberên razîbûnê dernekevin. Texmînkirina razîbûnê lazim e bi xebera bidine kifşê.

HER DEM RAZÎ BIN

“Dêmek, bi saya Wî timê qurbana razîbûnê bidine Xwedê, ya ku berê lêvên me ye, femkirin û xwemikurhatina razîbûnê û pesindayîna navê Wî ye”.

Îbranî 13:15, AMP

Gelo çiqasî zû-zû gerekê em razîbûnê elamkin? Her dem, nava her halekîda û bona hemû tiştî. Bi kirina vî cûreyî emê bikevine nava jîyana serkeftî, ya ku ji kontrola mîrêcin der e.

Mîrêcin çawa dikare me kontrol bike, eger em nenihêrî halên xwe, bi şabûnê û razîbûnêva tijîbûyî bin. Bêyî şikberî, jîyana wî cûreyî têra dibîne, wekî pesindayîn û razîbûn dikarin bibine qurbana me. Lê ez dibêjim, wekî qurbana razîbûna xwe gerekê em bidine Xwedê, lê ne ku şabûna xwe bikine qurbana mîrêcin. Min bi dijwarî fem kir, wekî bi nexwestin qurbankirina razîbûnê, ewê bêyî şikberî min ji şabûnê miqûf bihêle. Bi gîlîkî mayîn gotî ezê rûyê ruhê gazinêda wê yekê unda bikim. Nava Zebûr 33:1-da tê gotinê: “Ezê her sehet pesinê Xudan bidim, duayê Wî wê her sehet ji devê min derkeve (AMP). Em çawa dikarin li Xudan dua bikin? Her dem em gerekê nava fikir û xeberên xweda li Wî dua bikin.

Razîbin, bi razîbûnêva tijî ne tenê hindava Xwedê da, lê usa jî hindava merivada bin. Eger kesek tiştêkî baş bona we dike, bîr nekin, razîbûna xwe elamî wî bikin.

Razîbûna xwe usa jî elamî endamên malbeta xwe bikin. Gelek cara duayên Xwedê bona me dibine tiştên sade. Emê hemû tiştî unda bikin, wextê ku em terka razîbûnê bidin.

Ez ji malxwê xwe razî me. Wedekî dirêj e, ku em zewicîne, lê ew yek dijwarîya pêşda nayne, ku ez gelek cara razîbûnê elamî wî bikim. Ew merivekî bi sebire û alîyên wîye baş hene. Ez zanim, wekî razîbûna ku em elamî meriva dikin, alî dike ku em heleqetîyên baş çekin û xweykin, bi taybetî bi girîng hesabkirina wan dema, bona kîjana em jî wana razîne. Ez tevî gelek meriva dixebitim û zendegirtî dimînim, ku çiqas meriv hene, yên ku bona her tişteki hûr, yên hindava wanda nîşandayî razî dibin, û hene merivên usa, yên ku t'u cara wê yekêva razî nabin, çî ku meriv bona wana dikin. Ez gumanim, wekî nava vê pirsêda parek (beşek) jî ya kubarîyê ye. Hinek awqasî derheqa xweda difikirin, wekî qet nabînin jî ku meriv bona wana çî dikin. Ew difikirin, wekî ew layîqî tiştên hê zêdene, ne ku bona wana çî tê kirinê. Merivên wî cûreyî gelekî hindik cara razîbûna xwe elamî dikin. Lazim e, ku razîbûnê ne tenê elamî merivên başqe bikin, lê usa jî razîbûnê elamî xwe bikin, çimkî ew yek şabûna nava meda zêde dike.

Her roj derheqa wan tiştada bifikirin, bona kîjana hûn dikarin razîbûnê elamî xwe bikin. Wê yekê nava duayên xweda bêjine Xwedê, û wextê ku hûn wê yekê bikin, dilê we wê bi jîyanê û ronahîyêva tijî bibe.

HER DEM BONA HEMÛ TIŞTÎ RAZÎ BIN

“Û bi şeravê serxweş nebin, nava wêda razîbûnên bedenî [bêesilî] hene: lê bi taybetî bi Ruhva [Pîroz] tijî bin.

Bona ku bi hevra xeberdin, bi zebûra, dua-dirozga, stiranên ruhanî hevdura bêjin [anegorî cûrê Kîng Cêyms “bi xwera xeberdin”], bi stiran û dilê xweda bi razîbûn Xudanra bilovînin, dengê xwe bi razîbûn bilindkin û [bi înrûmêntên sazbandîyê] dilên xweda stirana bêjin.

Her gav, bona her tiştî razîbûnê bidine Bav Xwedê, bi navê Xudanê me Îsa Mesîh”.

Efesî 5:18-20, AMP

Xebereke çiqas qewat e...!

Em çawa dikarin bi Ruhê Pîrozva tijîbûyî bimînin: bi xwe (fikirên xweda) xwera, yan jî yên mayîna (bi xeberên xwe) Zebûra û dirozga û stiranên ruhanî bêjin? Ez nafikirim, wekî ev yek dide kifşê, wekî em gerekê tenê bi Xeberên Xwedêva hevra xeberdin û bi stiranava hevra bêjin, na xêr, em gerekê fikir û xeberên xwe bi Xebera Xwedêva tijî bikin, her dem pesinê Wî bidin û bona hemû tiştî razîbûnê elam bikin.

Gav 6: *Derheqa Xebera Xwedêda bifikirin*

“Û Xebera Wî dilên weda najî [fikirên Wî], çimkî hûn Ewî ku Wî şandîye, bawar nakin, gumanê nadine ser Wî. [Rûyê wê yekêda jî hûn nava xweda banga Wî sax xweyî nakin, çimkî hûn Wî mizgîndarî bawar nakin, ku Wî Ew şandîye].”

Yûhenna 5:38, AMP

Xebera Xwedê fikirên Wî ne, yên ku teslîmî kaxezê kirine, ku em bikaribin lêkolîn bikin û fem bikin. Xebera Wî derheqa wê yekêdane, ku Ew dora her halekî yan jî pirsekê çi difikire.

Nava xebera Mizgîniyêye Yûhenna 5:38-da em dixwînin, ku çawa Îsa li hinek bêbawara hilat. Ev xeber dide kifşê, wekî Xebera Xwedê kifşbûna fikirên wî ye li ser kaxez in û ew merivên ku dixwezî bawar bikin û lezeta hemû berên bawariyêye qenc bibînin, gerekê îzinê bidin, ku Xebera Wî dilên wanda bibe banga sax. Ew yek tenê wî çaxî diqewime, wextê ku em derheqa Xebera Xwedêda difikirin. Tenê wî cûreyî fikirên Wî dikarin bibine yên me. Ew e rîya tek-tenê, bona ku em nava xweda fikira Mesîh bidine pêşxistinê.

Nava xebera Mizgîniyêye Yûhenna 1:14-da tê gotinê, wekî ew Xeber Îsa bû, ku bi bedena xweva eyan bû. Ew yek wê tiştê bûyîne nîbûya, eger fikira Wî bi Xebera Xwedêva tijîbûyî nîbûya.

Fikirmîşbûna dora Xebera Xwedê prînsîpeke jîyanêye girîng e, kîjanê gerekê em hîn bin. Anegorî “Ferhenga şirovekirina xeberên peymanên Kevin û Nû” ya V. Ê. Wayn, xebera “fikirmîşbûn” vî cûreyî tê şirovekirinê: “bifikirin” “guhdarîyê bidine ser, bi praktîkî

bidine xebatê”, “bicedînin”, “bi fikira xeberêye berfireh bidine xebatê”, “bînine ber çeva”. Lê li cîyekî mayîn jî ew xeber dide kifşê “bin pozê xweda xeberdin”, yan jî “bikine piste-pist”.

Ez dixwezim girîngîya vê prînsîpê bidime kifşê. Ez wê yekê çawa prînsîpa jîyanê nav dikim, çimkî fikirmîşbûna dora Xebera Xwedê we û merivên dor-berên we bi jîyanêva tijî dike.

Gelek mesîhî destpê kirine ji xebera “fikirmîşbûn” bitirsîn, çimkî nava hinek dînen pûtparistda û nava okûltîzmêda ew têrmîn tê xebtandinê. Feqet ez dixwezim bîr bînim, wekî mîrêcin t’u cara nikare tişteki nû li ber xwe derxe. Ew hîmlî wê yekê hildide, çî ku ya padişatîya Ronahîyê ye, û bi qîrîn bona padişatîya xweye tarî dide xebatê. Em gerekê gelekî serwext bin, ku fem bikin, wekî eger fikirmîşbûn dikare bi qewata wî cûreyî tarîstanê tijî bike, ewê usa jî zarokên ronahîyê qewat bike. Prînsîpa fikirê hema ji Xebera Xwedê destpê dibe: werin binihêrin, ku Încîl derheqa wê yekêda çî dibêje.

BIFIKIRIN Û PÊŞBIKEVIN

“Bila ev kitêba Qanûnê ji devê te dûr nekeve, lê şev û roj tu li ser Wê bifikirî, wekî tu mînanî nivîsarên nava wêda xweykî û mîyaser bikî, çimkî wî çaxî tê rêyên xwe bi açixî biqedînî û wî çaxî tê serwext bî”.

Yêşû 1:8

Nava vê xeberêda Xwedê zelal dibêje, wekî emê nikaribin Xeberê mîyaser bikin, eger bi fikirdarîya xwe em fikira xwe hîn nekin.

Zebûr 1:2,3-da derheqa merivê qencda tê gotinê: “Lê qanûna Xudan û îzina Wî (hînkirin û emirên Xwedê) şabûn û xwestina wî ye. Û Ew dora wana şev û roj difikire (difikire û lêkolîn dike). Û ew mînanî darekê ye, ya ku devê avên çemda nikandîye, ya ku wê berê xwe wededa bide, belgên li ser wê naçilmisin û ew çî jî bike, wê mîyaser be” (AMP).

BIFIKIRIN Û HÛNÊ QENCBÛYÎ BIN

“Kurê min, guhadriyê bide xeberên Min, gotinên Minra qayîl be û wana qebûl bike: bila ew ji ber çevê te dûr nekevin, wana dilê xweda

xweyke. Çimkî ew jîyanê didine wana, kîjana ew dîtine û qencbûnê, saxlemîyê didine bedenên wana”.

Gotinên Silêman 4:20-22, AMP

Eger em şirovekirinên fikira xebera “bifîkirin” bîr bînin, yek ji wana dide kifşê “guhdarîyê bidine ser”. Wî çaxî wê lazim be, ku guhdarîyê bidine ser vê xeberê, ya ku dibêje, wekî Xeberên Xudan qencbûnê û saxlemîyê didine bedenên me.

Fikirandina li ser Xebera Xwedê, bêfitîya, wê hukumekî qenc li ser bedena fîzîkî bihêle. Nava van salada, bi bûyîna nava heleqetîyên tevî Xwedê, ez ji derva jî hatime guhartinê. Şikilê minî niha diha baş e, çimkî ez niha hindik xemgîn dibim û bêbext nînim. Bêbextî nîşana xwe li ser sifetê me dihêle. Ew usa jî wextê şabûnê dibe. Çiqasî em bextewarin, em awqasî cahil tên kifşê, lê nenihêrî wê yekê ez sal bi sal mezin dibim, feqet roj bi roj ez nû dibim û çê dibim, û ew yek ji derva tê kifşê.

GUHDAR BIKIN Ê BIDRÛN

“Çiqasî hûn [fikir û lêkolînê didin] [bona guhdarkirina rastîyê], awqasî jî [paqijayî û zanebûn] wê wera bê dayîne”.

Marqos 4:24, AMP

Eva mînanî çandinê û dirûnê ye, çiqasî gelekî em biçînin, awqasî gelekî emê wextê dirûnê bidrûn. Xudan nava xebera Mizgînîya Marqose 4:24-da dibêje, wekî em çiqas wede dora fikirdarî û lêkolînkirina Xebera meye guhdarkirî başqe bikin, awqas gelekî emê ji Xeberê “bidrûn”.

BIXWÎNIN Ê BIDRÛN

“[Tişt çawa mecalên eyantîyê tenê wedelû veşartîne]. T’u tiştêkî veşartî tune, wekî eyan nîbe, û ne jî tiştêk, wekî veşartî bimîne û neyê mîyaserkirinê”.

Marqos 4:22, AMP

Ev herdu xeber dibêjin, wekî nava Xeberêda dewlemendîyên bêqîmet, surên ku jîyana qewat pêşkêş dikin, veşartîne, kijana Xwedê dixweze li me eyan bike. Ew nava jîyana wanada eyan dibin, yên ku her dem bi Xebera Xwedê difikirin, lêkolîn dikin, bi fikira xwe didine xebatê û bin pozê xweda dibêjin.

Çawa dersdara Xebera Xwedê ez rastîya vê prînsîpê bi xwe zanim. Tê bêjî xilazbûna van xizna tune, kijana Xwedê nava her xebereke nivîsarên pîrozda eşkere dike. Bi lêkolînkirina hema wê xeberê, nava wedên cuda-cudada, ez dikarim eyantîyên nûye cuda-cuda bistînim, yên ku min berê neditibûn.

Xudan surên Xwe dîsa li wana eyan dike, yên ku bi kel û ced Xebera Wî lêkolîn dikin. Wî cûreyî nîbin, yên ku her dem dixwezin bi eyantîyên ji aliyê merivên mayînda stendî bijîn. Xeberê bi xwe lêkolîn bikin û izinê bidine Ruhê Pîroz, ku ew jîyana we bi rastîyê dua bike.

Ez hela hê gelekî dirêj dikarim derheqa têma fikirandina dora Xebera Xwedê xebardim. Çawa ku min îdî gotîye, ew ji wan tiştên girîng e, kijanê em gerekê hîn bin bikin. Bi mijûlbûna bi karên xweye herrojê, hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew pareke Încîlê bine bîra we, dora kîjanê hûnê destpêkin bifikirin. Hûnê zendegirtî bimînin, ku bi saya xebitandina wê prînsîpê jîyana we wê qewateke çawava tijî bibe. Çiqasî zêde hûn derheqa Xebera Xwedêda bifikirin, awqasî zêde hûnê bi hêsanî demên jîyanêye dijarra derbazbin. Bizanibin, wekî fikirdarîya derheqa Xebera Xwedêda wê qewatê û karebûnê bide, bona mîyaserkirina wê.

BI QEWATÊ XEBERÊ QEBÛL BIKIN

“...Hemû mirdarîya û her xirabîyê ji xwe dûrxin, bi milûktîyê (şikestî) wê Xebera nava wêda çandî qebûl bikin (dilê xweda), ya ku dikare ruhên we xilaz bike”

Aqûb 1:21

Nava vê xeberêda em dibînin, wekî qewata xeberê heye, ku me ji jîyana gunehkar xilazke, lê tenê wî çaxî, eger em bi milûktîyê wê

qebûl dikin û dilên (fikirên) xweda diçînin. Çandin wî çaxî diqewime, wextê ku hindava Xebera Xwedêda guhdarî tê nîşandayînê, zelal gofî, wextê ku ew diha zêde cîh nava fikirên meda digire, lê ne ku tiştêkî mayîn.

Eger em her dem derheqa pirsgirêkên xweda bifikirin, emê diha zêde nava wanda bên çandinê. Eger em bifikirin, ku çiqas tiştên şaş nava jîyana me, yan jî yên mayînda dibin, emê diha zêde bikevine bin gunehkarkirina wan pirsgirêka û emê t’u cara helkirinên wana nebînin. Eva mînanî okêaneke bi jîyanêva tijî ye, lê mera ew tişt hatîye dayînê, bi kîjdanê em gerekê bi kel û ced bixebitin, dora Xebera Xwedê bifikirin û lêkolîn bikin.

Qulixdarîya me tê navkirinê “Jîyana herroje bijîn”, û bi hesabildana cêribandina xwe, ez dikarim bêjim, wekî bi hizkirina Xebera Xwedê û gurêkirina wê, em bi rastî dikarin lezetê ji jîyanê bibînin.

JÎYANÊ BIBIJÊRIN

“Fikira bedenê [ya ku bêyî Ruhê Pîroz texmîn dike û fem dike] mirin e. [Mirin, ya ku hemû qezîyayên cûre-cûre ji alîyê gunehda pêşda tîn, têra dibîne niha û heta-hetayê]. Lê fikira Ruh [Pîroz] jîyane û edilaye [niha û heta-hetayê]”.

Romayî 8:6, AMP

Bona tomerîkirina vî serê kitêbê, ez difikirim, wekî wê diha baş bibe, ku guhdarîya xwe careke mayîn teglîfî li ser xebera Fîlîpî 4:8 bikin. “Heyneser xwîşk û birano, çi ku bi rastîyê ye, çi ku layîqî maqûltîyê yê û heqîtîyê ye, çi ku bi helalîyê ye, çi ku bi xweşîyê ye, çi ku bi firasetîyê ye û her tiştên ku eslîne û layîqî qengcotinêne, eger tiştêkî layîqî pesindayînê heye, d erheqa wê yekêda bifikire û vî hemû tiştî hesab hilde [fikirên xwe bi vî hemû tiştîva çê bike]” (AMP).

Ev xeber halê fikira we tîne ber çeva. Fikira Mesîh li cem we heye û destpê bikin wê bidine xebatê. Eger Ew îzina t’u fikirekê nade, wî çaxî hûn jî gerekê ji fikirê paşda bisekinin.

Eger hûn destpê bikin fikirên xwe her dem kontrol bikin, wî çaxî hûnê destpê bikin hemû fikirên xwe dîl hildin û wana bikine bin kontrola Mesîh (binihêre B Korintî 10:5).

Ruhê Pîroz wê nîşanê bide we, wextê ku fikira we alîyê şaşda here, lê wî çaxî qîrarê ya we be, ku hûnê dîna xwe bidine wê nîşanê, yan jî hûnê wê nîşanê hesab hilnedin. Hûnê anegorî fikira bedenê bikin, yan anegorî fikira ruh? Ji wana yek berbi mirinê dibe, lê ya mayîn berbi jîyanê. Bijartin ya we ye.

Jîyanê bibijêrin...

BEŞA 3-A

Fikirdarîyên çolê

Naverok

Cimeta Îsraêlê li qûmistanê 40 sala digerîya, nenihêrî wê yekê, wekî ew dûrayî meriv dikaribû nava 11 rojada derbaz bûya. Bo çi? Li ser rîya wan çi dijwarî hebûn?: dijmin, menî, cêribandin, yan tişteki mayîn?

“Li ser çîyayê Sêhîrêra [bi tomerî hildayî] ji Horêbê berbi Qadêş-Barnêayê rîya 11 roja ye [sînore Kenanê, lê îsraêlîyara 40 sal lazim hatin ku ew hildana].”

Wextê ku ez dora vî halî difikirîm, Qanûna Ducarî 1:2, AMP Xwedê eyantike mezin da min, kîjanê çawa alî min kir, usa jî alî bi hezara meriva kir. Xudan got: “Zarokên Îsraêlê dewsa 11 roja 40 sal nava qûmistanêda xerc kirin, çimkî fikirdarîya wan “fikirdarîya çolê” bû.

HÛN GELEKÎ DIRÊJ MAN...

“Xudan Xwedêyê me li Horêbê mera xeberda got: “Bes e, hûn gelekî dirêj li ser vî çîyayî man”.

Qanûna Ducarî 1:6, AMP

Bi rastî îsraêlî gerekê nava meda me zendegirtî nehêlin, çimkî ji me gelek hema wî cûreyî dikin. Em dewsa pêşdaçûyîne dora wî çîyayî dizvirin. Nava encamên wê yekêda jî me sal tên xwestinê, hetanî ku em nava wan pirsada dighîjine serkeftinê, kîjan dikaribûn û lazim bûn lez hel bikirana.

Ez difikirim, wekî Xwedê çi digote cimeta Îsraêlê, niha jî dibêje me: “Hûn gelekî dirêj li ser vî çîyayî man... Wede ye, ku hûn pêşda bilivin”.

DERHEQA YÊN JORINDA BIFIKIRIN

“Ser tiştên jorin bifikirin, ne ku ser tiştên vê dinyayê”.

Kolosî 3:2

Xwedê deh “fikirdarîyên çolê” nîşanî min dan, rûyê çida îsraêlî li qûmistanê man. Fikirdarîya wî cûreyî cûrê fikirdarîya şaş e.

Fikirdarîya me dikare çawa ya rast, usa jî ya şaş be. Ya ewlin dikare karê bo me bîne, lê ya duda dikare êşê û dijwarîya bona pêşkeftina me bîne.

Xebera banga kolosîyaye 3:2-da me hîn dike, ku em fikirên xwe bidine wî alî, ku derheqa tiştên jorinda bifikirin. Em gerekê fikirên xwe li ser tiştên rast bidine merkezîkirinê. Fikirdarîya usa hukumê xweyî xirab ne tenê li ser qewimandina dihêle, lê usa jî li ser jîyana meye hundur dihêle.

Jîyana hinek meriva ya qûmistanîyê ye, çimkî ew bi xwe “qûmistanê” raber dikan.

Hebû wede, wextê ku halê min awqasî jî xirab nîbû, lê min nikaribû ji jîyana xwe lezet bidîta, çimkî di hundurê mînda “qûmistan” bû. Mala meye bedew hebû, çar zarokên baş, xebata baş û perên baş hebûn ku jîyana baş me derbaz bikira. Min nikaribû bi duakirinên xwe bijîta, çimkî fikirdarîya mine derheqa hinek pirsada ya qûmistanîyê (çolê) bû. Tê bêjî jîyana min ya qûmistanê bû, çimkî min her dera qûmistan didît.

Hinek meriv hemû tiştî reş dibînin, çimkî nava temamiya jîyana xweda ew bêbext bûne û t’u cara neanîne ber çevê xwe, wekî nava jîyana wanda wê tiştekê berbi başîyê bê guhartinê. Hene meriv, yên ku hemû tiştên xirab dibînin, çimkî ew bi xwe jî wî cûreyîne. Menîya vê yekê çawabe jî, yek e, nêzîkbûna xirab mêriv mecbûr dike, ku bikeve nava qezîyayê û bêaçixîyê, îzinê nede, ku pêşkeftin hebe û bighîje welatê Buhuşî.

Xwedê zarokên Îsraêlê ji koletîya Misirê derxistin û bang kir, ku ew herine welatê Sozdayî, yê ku Ewî soz dabû çawa mîrat bide. Ew welatekî usa bû, li kîderê şîr û hingiv dikişîyan (binihêre Derketin 3:8), yê ku bi hemû tiştîva dewlemend bû û ew yek tenê meriv dikaribû bianîya ber çevên xwe. Ew welatek bû, li kîderê hewcetîyên meriva razîkirî bûn û ew nava hemû govekên jîyana xweda pêşda diçûn.

Piranîya îsraêlîyên ji Misirê derketî neketine welatê Sozdayî. Ew li qûmistanê man. Eva qewimandineke gelekî xemgîn e, ya ku dikare

nava jîyana zaroka Xwedêda biqewime, wextê ku awqas mecal hene û ji wana t'u yek nayê xebitandinê.

Bi sala ser hev nava jîyana mine mesihîtiyêda ez meriveke ji wan meriva bûme. Ez ketibûme li ser rîya welatê Buhuştî (Ezman), lê wê rêwîtiyê şabûn pêşkêşî min nedikir. Nava qûmistanêda ez bêbext bûm. Feqet, şikir ji Xwedê bona rehma Wî, ku nava jîyana mine tarîda îşiq vexist û ez ji wir deranîm.

Ez dua dikim, wekî serên kitêbêye mayîn jîyana ronahî bikin û we hazir bikin, bona ku hûn ji qûmistanê derkevin û bikevine nava ronayihya padişatiya Xwedêye bi rûmet.

Serê
16-a

*Pêşeroja min bi paşeroj û roja
min, ya îroyînva, birîyar dibe.*

Fikirdarîya çolê: hejmar 1

***Pêşeroja min bi paşeroj û roja
min, ya îroyînva, birîyar dibe.***

*Serê
16-a*

Fikirdariya çolê: hejmar 1

Li cem îsraêliya bona jîyana wan ne eyantîke baş, ne jî xiyal hebûn. Wana zanibû, ku ji kîderê hatine, lê nizanibûn kuda diçin. Hemû tişt li ser wî hemû tiştî hatibû hîmdanînê, çî ku wana dîtîbû û didîtin. Wana nizanibû, ku çawa “bi çevên bawariyê” hal binihêriyana.

“Li kîderê eyantî tune, li wir cimet tê cezakirinê...”

Gotinên Silêman 29:18, KJV

BONA ANÎNA AZADBÛNA RÛNKIRÎ

“Ruhê Xudan li ser min e, çimkî Ewî Ez bi rûnkirinê kifşkirim, wekî Mizgîniyê bidime feqîra, û Ez şandim, ku boy qenckirina yên bi dil şikestî, hêsîrara boy serbestiyê û korara boy dîtinê dannasîn bikim, azayê bidime bindesta û sala Xudane rehmê jî bidime naskirinê”.

Lûqa 4:18,19, AMP

Ez ji zarotiyêda layîqî nêzîkbûna bêrehm bûme, çimkî ez nava qewilên bona hizkirina malbetîye nemilahîmda mezin bûme. Zarotîya min bi tirsê û zêrandinêva tijî bû. Pêşekzan dibêjin, wekî şexsîtiya zarokê nava pênc salên mezinbûnêye ewlinda çê dibe. Nava dinîya mine hundurda kaos pêşda hatibû. Ez li piş wan dîwara bûm, yên ku min çêkiribûn û bi wê yekê min xwe ji meriva vedişart û diparast, bona ku ez careke mayîn ji aliyê wanda nehatama bêhurmetkirinê. Li ber meriva min xwe vedişart, lê bi wê yekê ez tenê dimam. Min hemû tişt kontrol dikir, ez ditirsîyam û difikirîm, wekî jîyana min tenê wî çaxî wê bêqezîya be, wextê ku hemû tişt bin kontrola minda be, Ez difikirîm, wekî tenê wî cûreyî t’u kesê nikaribe min biêşîne.

Ez mezin dibûm û min dicêriband ez bona Mesîh bijîm û ez peyî jîyîna mesîhîtiyê diçûm, û wî çaxî ez pê hesîyam, ku ez ji kîderê

hatime, lê min nizanibû, ku ez kuda diçim. Ez difikirîm, wekî pêşeroja min wê rûyê paşeroja minda heramkirîbe. Ez dfikirîm: “Gelo çawa nava jîyîna merivekîda, yê ku xweyê paşeroja wî cûreyî bûye, çawa ku ya min bûye, hemû tişt baş be. Ew yek tiştê bûyînê nîne”. Feqet Îsa got, wekî Ew hat, ku rihetîyê bide wana, yên ku nexweşin, dilê kîjana şikestî ye, yên bêhurmetkirî û bi ruhê xweva şikestîne.

Îsa hat ku hêsîra aza berde. Nava jîyana minda pêşkeftin tunebû, hetanî ku min bawar nekir, wekî ez dikarim azad bim. Bona jîyana xwe ez hewca stendina dîtinoka baş bûm, û usa jî hewca wê yekê bûm, ku min bawar bikira, wekî pêşeroja min bi paşeroja minva nayê qirarkirinê.

Diqewime paşeroja we ya xirab bûye, yan jî hûn nava halên gelekî xirabda bûne. Diqewime niha jî hûn nava halekî nebaşdanin û li we tê texmînkirinê, wekî guman tune. Lê ez we bidime bawarkirinê, wekî pêşeroja we ne bi wedê niha ne jî bi paşerojêva tê qirarkirinê.

Fikirdariya xwe biguhêrin. Bawar bikin, wekî tevî Xwedê hemû tişt yê bûyînê ye (binihêre Lûqa 18:27).

Hemû tişt nîne, ku meriv dikare bike, lê em qulixî wî Xwedêyî dikin, Yê ku ji t’u tiştî ew hemû tişt çê kirîye, çi ku niha li ber çeva ye (binihêre Îbranî 11:3). Wî “t’u tiştî” bidine Wî û hûnê bibînin, ku Ewê çi bike. Ew tenê hewcê bawariya weye. Ew jî we tenê hîvîya bawariye, lê tiştên mayîn Ew hildide ser Xwe.

ÇEVÊ BONA DÎTINÊ, GUHÊ BONA GUHDARKIRINÊ

“Ji dara Yêşa tûrekê derê û ji rawê wî çiqlekê şîn be.

Ruhê Xudan wê ser wî bimîne, Ruhê Serwaxtîyê û Femdarîyê,
Ruhê Zanistîyê û Xofa Xudan.

Şabûna Wîyê xofa Xudan be, wê bi dîtina çeva Dîwanê neke, wê bi bi-îstina guha Qirarê nede”.

Îşaya 11:1-3, AMP

Em gerekê meriva bi dîtina çevê xwe gunehkar nekin. Bona rast dîtînê mera “çevên ruhanî” pêwîstin, lê bona rast guhdarkirinê “guhên ruhanî” lazimin. Em hewcene guhdar bikin, ku Ruh çî dibêje, û ne ku

ev dinîya çi dibêje. Tenê îzinê bide Xwedê ku tevî te derheqa pêşeroja teda xeberde.

Îsraêlîya her dem li piş xwe dinihêrîn û derheqa jîyana xweye derbazbûyîda xeber didan. Xwedê bi destî Mûsa ew ji Misirê der anîn û wanra derheqa welatê Sozdayîda xeber dida. Ewî dixwest, wekî meriv berên xwe bidana berbi wî cîyî, kuda ew diçûn, lê ne ku berbi wî cîyê, ku ji wir hatibûn. Werin em çend parên (beşên) Încîlê binihêrin, li kîderê êşkere derheqa şaşîyên wanda tê gotinê.

PIRSGIRÊK NAVA ÇIDA BÛ?

“Hemû îsraêlîya rûyê halê xweda bîna xwe teng kirin, cimetê Mûsa û Harûnra got: “Wê diha baş bûya ku li welatê misirîya em bimirana, yan jî li vê qûmistanê em bimirana. Gelo bona çi Xudan me dibe wî welatî, bona ku em ji şûr bikevin? Jin û zarên me wê talan herin? Diha baş nîne em vegerine Misirê?”.

Jimar 14:2,3, AMP

Ez dibêjime we, ku hûn guhdarîyê bidine li ser vê xeberê. Dîna xwe bidinê, ku ev meriv çiqasî xirab bûn: wana bîna xwe teng kiribûn û hazir bûn bi hêsanî teslîm bûna, yên ku difikirîn ku diha baş bû vegerîyana nava hêsîrîyê, lê ne ku wê qûmistanêra derbazbûna û bighîştana welatê Sozdayî.

Bi rastî, pirsgirêka wan tune, lê ew bi xwe pirsgirêk bûn.

FIKIRÊN XIRAB NÊZÎKBÛNA XIRAB PÊŞDA TÎNIN

“Ava cimetêye vexwerinê tune bû, bo wê yekê jî ew miqabîlî Mûsa û Harûn civîyan. Cimetê bîna xwe li Mûsa teng dikir û got: “Wê diha baş bûya, ku eger em bimirana, gava ku birayên me li ber Xudan mirin. Bo çi we cimeta Xudan anî li vê qûmistanê, bona ku em û heywanên me qirbin?”.

Jimar 20:2-4, AMP

Ji gotinên îsraêlîya meriv dikare bi hêsanî fem bike, wekî wana gumana xwe danedanî li ser Xwedê. Fikirdarîya wan ya xirab bû, ya

ku hîmlî li cem wan meriva pêşda tê, yên ku bin dikevin. Wana îdî qîrar kiribû, wekî çi ku wana destpê kiribû, wê bi neaçixîyê û mirinêva ser hevda bihata. Nêzîkbûna wana fikirdarîya wane şaş dida kifşê.

Nêzîkbûna xirab encamê fikirên xirab e.

TUNEBÛNA NÊZÎKBÛNÊ Û BÊŞÊKIRÎ

“Ew ji çiyayê Horê rêketin, berbi rîya behra Sor, dora Edomra çûn. Meriva sebira xwe rûyê [cêribandinên] li rê unda kirin [gumanbir bûn]. Û cimeté destpê kir miqabilî (dijî) Xwedê û Mûsa xeberde: “Bona çi we em ji Misirê derxistin, ku em nava vê qûmistanêda bimirin? Çimkî ne nan heye, ne jî av. Medê me ji vê xwerina hane pûç li hev dikeve”.

Jimar 21:4,5, APM

Nava vê xeberêda nêzîkbûna îsrayêliyaye şaş tê kifşê, wekî ew ji texmînkirina razîbûnê dûr bûn. Lawên Îsrayêlê dewsa wê yekê, ku rîya xwe berdewam bikirana, ew difikirîn ku ji kîderê hatine û wedekî dirêj li kîderêne.

Ewana dikaribûn bavê xwe Birahîm bîr bianîyana. Ew jî nava jîyana xweda cêribandinên wî cûreyîra derbaz bûbû, lê îzin nedabû, ku ew hukumê xweyî xirab li ser pêşeroja wî bihiştana.

JÎYANA BÊYÎ HEVRAQAYÎLNEBÛNA

“Wî çaxî di navbera şivanên heywanên Abram û şivanên heywanên Lûtîda şer çê bû. Wê hingê kenanî û pirîzzî li wî welatî diman [çi jî destxistina debira heywên dida dijwarkirî].

Abram gote Lût: “Ez hîvî ji te dikim, ku di navbera meda şer çê nebe, yan jî di navbera şivanên te û şivanên minda, çimkî em xêrxwezên hevîn.

Va ye, tamamîya welat li ber te ye. Ez hîvî dikim, ji min biqete. Eger tu herî aliyê çepê, ezê herime aliyê rastê, yan jî eger tu aliyê rastê bibijêrî, wî çaxî ezê herime aliyê çepê.

Lût dîna xwe dayê û dît, wekî tamamîya deşta Êrdunê dihate avdanê. Wê hingê hê Xudan Sodom û Gomora wêran nekiribûn, heta Sohârê ew mîna baxçê Xudan bû û mîna welatê Misirê.

Lût temamiya deşta Ûrdunê xwera bijart û berbi rohilatê çû. Bi vî cûreyî ew ji hev qetîyan”.

Jimar 13:7-11, AMP

Abram derheqa qezîya hevraqayîlnebûnada zanibû û bo wê yekê jî ewî pêşnîyarî Lût kir, ku ji hev biqetin. Bona ku nava hizkirinêda bijîn û paşê ji hevraqayîlnebûna dûr bimînin, Abram îzin da birazîyê xwe, ku ew wê deştê bibijêre, li kîderê ewî dixwest bijîta. Lût tiştê herî baş bijart, deşta Ûrdunê, û ew ji hev qetîyan.

Gerekê bîr bînin, wekî pêşda tiştêkî Lût tunebû, û ew bi saya Abram dihate duakirinê. Abram dikaribû nêzîkbûna başqe hindava Lûtêda nîşan bida, lê ewî usa nekir. Abram zanibû, wekî eger ewî anegorî xwestina Xwedê bikira, wî çaxî Ewê bona wî bifikirîya.

ÇEVÊN XWE BILIND BIKE Û BINIHÊRE

“Piştî wê yekê, wextê ku Lût dûr ket, Xwedê gote Abram: “Niha ji cîyê sekinî çevên xwe bilind bike û berbi bakûr û başûr, berbi rohilatê û roavayê binihêre.

Temamiya welatê, ku çevê te dibîne, Ezê heta-hetayê bidime te û zureta te”.

Destpêbûn 13:14,15, AMP

Ev beşa wê yekê zelal dide kifşê, wekî nenihêrî wê yekê, wekî Abram piştî dûrketina Lût nava halê bêgumanîyêda bû, Xwedê xwest, ku ew ji cîyê xweyî sekinî jor berbi wî welatî binihêre, yê ku Xwedê dixwest bida wî.

Nava vî halêda Abram nêzîkbûna baş da kifşê, û nava vî encamêda mîrêcin nikaribû ji jîyîna wî duayên Xwedê dûr xweyî bikirana. Xwedê hebûna diha mezin da wî, ji wê hebûnê zêdetir, ya ku pêşîya dûrketina Lût bû: Ewî Abram bi hemû tiştîva, bi merdanî, dua kir.

Ez şêwirê didime we ku hûn ji aliyê başîyêda li pêşeroja xwe binihêrin û tiştên ku tunene, çawa yên heyî gazîkin (binihêre Romayî 4:17). Derheqa pêşeroja xweda bifikirin û ne ku himberî paşeroj û wedê niha xebêrdin, lê derheqa wî hemû tiştîda, çi ku Xwedê kirîye dilê we.

Serê
17-a

*Bila kesek dewsa min wê yekê
bike: xwestina min tune, ku ez
cabadrîyê hildime ser xwe.*

Fikirdariya çolê hejmar 2

***Bila kesek dewsa min wê yekê bike: Serê
xwestina min tune, ku ez cabdarîyê 17-a
hildime ser xwe.***

Fikirdarîya çolê hejmar 2

Femdariya cabdarîyê carina bi wê yekêva tê şirovekirinê, ku meriv çawa caba karebûnên ji aliyê Xwedêda dayî dide. Çawa şexsê cabdar ew yek tê kifşê, wekî meriv gerekê wan hemû mecalâ bide xebatê, kîjana Xwdê datîne li ber me.

Xwedê cabdarî da ser bavê Abram, ku cîguhastî berbi Kenanê be. Feqet dewsa wê yekê, ku temamiya rê tevî Xudan derbaz bike, ewî qirar kir bisekine û li Haranê bimîne.

Gelo em bi şabûneke çawava tijî dibin, wextê ku Xwedê mera xeber dide û mecalê dide me, ku em tiştêkî bikin. Lê, mînanî Têrah, gelek cara em jî wê yekê ser hevda naynin, çî ku destpê dikin, çimkî wextê ku dikevî nava wê şuxulkariyê, jî nişkêva fem dikin, wekî ewê jî me gelek cedandin û xebatê bixweze.

Her înisîyatîveke nû bi cabûna mezinva despê dibe, lê tenê rûyê wê yekêda, wekî ew tiştêkî nû ye. Şabûn dikare mêriv hinek wede pêşda bibe, lê ewê nikaribe xeta dawîyêra bide derbazkirinê.

Gelek bawarmend usa dikin, çawa ku Têrah kir. Ew rîya xwe cîyekî destpê dikin û li cîyekî mayîn îzbat dibin. Ew diwestin, zeyîf dibin, dixwezî şuxulê destpêkirî bighînine dawîyê, lê bi rastî, naxwezî bona mîyaserkirina wî hemû tiştî cabdarîyê hildine ser xwe. Eger dewsa wana wê yekê yekî mayîn bike, wî çaxî ewê bi razîbûn qayîl bin kara wê “bidrûn”, lê ew yek usa nabe.

*“Têrah kurê xwe Abram,
nevîyê xwe Lûtê kurê Haran û
bûka xwe Saraya jina kurê xwe
Abram hildan, rabûn ji bajarê
Ûra kildaniya çûne berbi
welatê kenaniya, ew gihîştine
Hranê û li wir cî-war bûn.”*

Destpêbûn 11:31.

ÎZIN TUNE CABDARÎYA XWEYE
ŞEXSÎ TESLÎMÎ YEKÎ MAYÎN BIKÎN

“Û rojtira mayîn Mûsa gote cimetê: “We gunehêkî mezin kirîye. Va ye, ezê hilkişime cem Xudan, belkî bikaribim kêwandinê ji ber gunehên meva bidime kirinê”. Mûsa vegerîya cem Xudan û gotê: “Belê! Evê cimetê gunehêkî mezin kir, xwera xwedêkî zêrîn çê kir. Niha ez reca dikim, gunehên wan bibaxşîne! Lê eger na, hîvî dikim, navê min ji kitêba Xweye nivîsar resît bike””.

Derketin 32:30-32

Bi xwendin û lêkolînkirina van beşên derheqa îsraêliyada min dît, wekî wana ne dixwest cabdarîya hildine ser xwe. Bona wana Mûsa dua dikir, dewsa wana Xwedê Mûsa digerîya, û serbara serda jî dewsa wana Mûsa tobe dikir, wextê ku ew diketine nava pirsgirêka (binihêre derketin 32:1-14).

Hetanî ku zarok biçûk e, ew nikare bona t’u tiştî cabdarîyê hilde ser xwe, lê wextê ku ew mezin dibe, wî çaxî texmînkirina cabdarîyê jî gerekê mezin bibe. Pirsgirêkeke dê û bava ew e, ku zarokê hîn bike, ku cabdarîyê hilde ser xwe. Xwedê dixweze nava vê yekêda zarokên Xwe hîn bike.

Xudan mecal daye min, ku ez nava temamiya wededa nava qulixêda bim, Xebera Wî bi radiyo û têlêvîzîona navnetewî bidime hînkirinê, usa jî Mizgînîyê li temamiya Ştatên Yekbûyî û welatên mayîn dannasîn bikim. Feqet ez dikarim we bidime bawarkirinê, wekî wî navî tevî xwe cabdarî anîye, kûraya kîjanê gelek meriv fem nakin. Gelek meriv dibêjin, wekî wê bixwestana nava qulixêda bûna, çimkî ew texmîn dikin, ku ew awqasî mijûlbûna ruhanî ye.

Gelek meriv bi xwestina xebatê tên cem me. Ew difikirin, wekî tiştêkî baştir tune, çawa ku bûyîna endamê qulixdarîya mesîhîyê ye. Feqet, diha dereng ew dibînin, wekî ew gerekê usa bixebitin, çawa ku ew gerekê li cîyên mayîn bixebitin. Ew gerekê şebeqê zû hişyar bin û wededa li cîyê xebatê bin, gerekê gura seroketîyê bikin, dîna xwe bidine rojeva xebatê û tiştên mayîn. Wextê ku meriv xwestina bona xebata li cem me elam dikin, em dibêjine wana, wekî em nava

temamîya rojêda nava ewirada nagerin û stirana “Alêlûyîya” nastirên, lê em dixebitin û ew jî bi kel û ced. Nava yekîtiyêda digerin û divedînin karê xwe baş biqedînin.

Bi rastî xebata nava qulixdarîya mesîhîtiyêda tişteki cuda ye. Feqet em dicêribînin bona wan hemû meriva bidine zelalkirinê, yên ku dixwezî li cem me bixebitin, wekî nava wedê pêşînda, wextê ku şabûna li cem wan pêşdaxatî îdî hukumê xwe unda dike, peyîra wê jî wana cabdarîya li ser dereca bilind bê xwestinê.

HERE CEM MÛRÎSTANGÊ

“Yê xweranedîtî, here cem mûrîstangê, rêyên wî bibîne û serwaxt be.

Wekî xweyê wî, polîsê wî û li ser serê wî t’u kes tune, lê xurekê xwe havînê hazîr dike û wî xurekê wextê dirûnê berev dike.

Tê hetanî kengê paldî, yê xweranedîtî, tê kengê jî xewa xwe hişyar bibî? Hinek xew, hinekî bihênîjî, hinekî jî paldî: Wî çaxî feqîrîya te wê mînanî rêwîkî bê û wê hisretîya te mînanî merivekî sîlihkirî [te bike bê alîkar]”.

Gotinên Silêman 6:6-11, AMP

Rîya îsrayêliyaye li qûmistanê ya 11 roja bû, lê menîke wê yekê ew bû, wekî ew rê nava 40 salada derbaz bûn, fikira wan ya xweranedîtîyê bû.

Ez hiz dikim vê beşa Gotinên Silêman bixwînim: wê yekê, wekî guhdarîya me diçe ser mûrîstangê, ya ku bêyî kontrol, yan jî serkar xwe û malbeta xwe dide çareserkirinê.

Nava jîyanêda ew merivên ku her dem gerekê wana pêşda bikişînin, wê t’u tişteki mezin nikaribin bikin. Û ew merivên ku şuxulê xwe rast tenê wî çaxî diqedînin, wextê ku kesek kontrolê li wana dike, ewê jî dûr neçin. Cedandin gerekê jî hundurê mêriv hebe, lê ne ku jî der. Em gerekê jîyana xwe li ber Xwedê bijîn, bizanibin, wekî Ew hemû tiştî dibîne û wekî Ewê dewsa hemû tiştî bide, eger em bi rastî wê yekê bikin, çi ku ew teslîmî me dike.

GELEK HATINE GAZÎKIRINÊ,
LÊ HINDIK HATINE BIJARTINÊ

“... Çimkî gelek hatin gazîkirinê, lê hindik hatine bijartinê”.

Metta 20:16

Carekê min guhdariya dersdarekî Încilê kir, yê ku xeber vî cûreyî şirove dikir, wekî gelek hatine gazîkirinê, yan jî gelekara mecala bona Xudan kirina tiştêkî hatîye dayînê, lê hindik meriv dixwezin navê wê borcdariyê hildine ser xwe.

Çawa ku min serê kitêbêyî derbazbûyîda got, li cem geleka xwestin heye, lê qewata wane xwestinêye anegor tune. Merivên “Bi fikirdariya çolê” dixwezin ku hemû tiştên wan hebin, lê bona hebûna wî hemû tiştî naxwezin t’u tiştî bikin.

RABE Û DERBAZ BIBE

“Û usa bû, wekî piştî mirina xulamê Xudan Mûsa, Xudan kurê xulamê Mûsa Yêşûra xeberda û got: “Xulamê min Mûsa mir: û niha rabe û wê Êrdunêva tu û ev temamiya cimetê derbazî wî welatî bin, kîjanî Ez didime zarokên Îsrayêlê. Ew hemû cih, li kîderê wê nigên we pêlkin, gerekê bidime we, çawa ku min Mûsara gotîye...””.

Yêşû 1:1-3

Wextê ku Xwedê mirina Mûsa li Yêşû eyan kir û got, wekî niha ewê cîyê wî bigre û cimetê Êrdunêva derbazî welatê Sozdayî bike, wê yekê da kifşê, wekî borcdarî û cabdariya nû li ser Yêşû hate danînê.

Usa jî ji aliyê meda gerekê bibe, wextê ku em dikevî nava mîrata xweye ruhanî. Li cem me pêşdaçûyîna qulixkirina bona Xwedê wê tunebe, eger em naxwezin borcdariya li ser me danî bi temami biqedînin.

NIHA WEDÊ KARDAR E

“Ewê ku dîna xwe dide bayê (hîvîya wan hemû qewilên kardar e), wê neçîne, û ewê ku dîna xwe dide ewira, wê nederû”.

Zanebûn 11:4, AMP

Wextê ku sala 1993-a Xwedê temî da min û malxwê min, ku em bi têlêvîzyonê bernamên (progiramên) xwe bidine weşandinê, Ewî got: “Ez mecalê didim, ku hûn bikevine têlêvîzîonê, lê eger hûn niha wê mecalê nedine xebatê, ewê îdî t’u cara neyê dayîne”. Eger Xwedê eşaretî neda me, wekî em gerekê wê mecalê wî çaxî bidine xebatê, diqewime em lez neketana ku gava biavêjin. Em bi jîyaneke gelekî milahîm dijîtin. Eger em wî çaxî carekêra derbazî şuxul nebûna, diqewime Xwedê yekî mayîn bidîta, yê ku wê ew mecal bida xebatê.

Neh sala ser hev em nava şuxulkarîya qulixdarîya xweda bûn. Lê paşê, nişkêva, Xwedê mecalê dide me, ku em bighîjine diha zêde meriva, bona çî jî me bi temamiya dilê xwe divedand. Bona mîyaserkirina vî hemû tiştî, em mecbûr bûn, jî wê jîyana milahîm derkevin û cabdarîya nû hildine ser xwe.

Wextê ku Xudan bangî cimeta Xwe dike, ku tişteki bikin, peyî wê yekêra hîvîyêsekinandina “wedê kardar” tê (binihêre Karên Şandîya 24:25).

Meriv usa ye, wekî awqasî hîvîya wî wedeyî be, çimkî ew yek jî wana ne xercê mezin, ne jî cedandina dixweze.

Ez bangî we dikim, ku hûn merivekî usa bin, yê ku natirse cabdarîyê hilde ser xwe. Wextê hûn rastî berxudanê bèn, bi wê çî ku hêsa ye, hûnê her dem zeyîf û sist bimînin.

Xwedê dixweze, wekî em bona wî hemû tiştî cabdar bin, çî ku Ew dide me ku em bikin. Eger em wan pêşkêşa û telanta nadine xebatê, yên ku Xwedê dane me, usa ye, em bona wî hemû tiştî cabdarîyê hilmadine ser xwe, çî ku Ewî pêşkêşî me kirine.

HAZIR BIN

“Dêmek, binihêrin [gelekî guhdar bin, fesal û aktîv bin], çimkî hûn ne roja hatina Kurê Mêriv zanin, ne jî sehetê”.

Metta 25:13, AMP

Nava Mizgînîya Mettaye serê 25-da nivîsar e ku gerekê çawa bikin, hîvîya vegera Xudanê xwe bibin.

Nava 12 xeberên pêşinda em derheqa wan deh keçên azepda dixwînin, ji kîjana pênc bêaqil bûn, lê pênc jî serwaxt bûn. Her pêncên bêaqil nedixwestin bona gumanbûnê t'û tiştêkî zêde bikin, wekî ew bona vegera Xudanê xwe hazirin. Wana nedixwest gaveke zêde biavîta, ku lempên wanda gelek rûn hebûya. Lê azepên serwaxt ji wê yekê, çî ku ji wana dihate xwestinê, diha zêdetir kirin. Wana diha gelek rûn hildan û li ser xwe guman bûn, wekî ew hazir bûn wedekî dirêj hîvîyê bisekinin.

Wextê ku zeva hat, azepên bêaqil dîtin, wekî lempên wan îdî ditemirin û wana hîvî ji yên serwaxt kirin ku rûn bidine wana. Hîmlî usa jî dibe. Merivên xweranedîtî, û yên ku hêdî dilivin, her dem ji merivên xebathiz dixwezînin û bona wana cabdarin, yên ku gerekê bi xwe karên wan bikin.

WÎ TIŞTÎ BIDINE XEBATÊ, ÇI KU WERA HATÎYE DAYÎNÊ

“... Tu xulamê xirab û xweranedîtî...”.

Metta 25:26, AMP

Serê 25-da, yê Mizgînîya Metta, Îsa metelokekê derheqa sê xulamada gilî dike. Axayê wana telant pareveyî li ser wana kirine û çûye welatekî mayîn, bi wê hêvîyê, wekî xulamên wî wextê nehazirîya wîye li wir wê derheqa hebûna wîda bifikirin û hemû tiştî bikin.

Ew merivê ku pênc telant bona wî hatibûne dayîne, ew kirine nava şuxul û dîsa pênc telantê mayîn dest anîbûn. Ew merivê ku du telant stendibû, ewî jî ew dubare kiribûn. Feqet ew merivê ku telantek stendibû, ji axayê xwe tirsîya bû û ew telant erdêda çel kiribû. Ew tirsîya bû gavekê biavêje û tiştêkî bike, bi gilîkî ji cabdarîyê tirsîya bû.

Wextê ku axa paşda vegerîya, ewî pesinê herdu xulamên ewlin da, yên ku telantên li cem xwe dubare kiribûn. Lê ew xulamê ku telantek hildabû û erdêda çel kiribû, nedabû xebatê, axa gote wî: “... Tu xulamê xirab û xweranedîtî...”. Paşê axa emir kir, wekî wî telantî ji wî merivî hildin û bidine xulamê ewlin, lê pêra jî emir kir, ku xulamê xweranedîtî ceza bikin.

Ez bangî we dikim, ku wan hemû mecala bidine xebatê, yên ku Xwedê danîne nava we, wekî wî hemû tiştî bikin, çî ku hûn dikarin bikin, bo ku dema ku Xudan vegere, hûn ne tenê wî tiştî bidine Wî, çî ku Ewî dabû we, lê serbara serda zêde bidine Wî.

Încil zelal nîşanî me dide, wekî xwestina Xwedêye bona me, anîna berê qenc e (binihêre Yûhenna 15:16).

XEMÊN XWE TESLÎMKIN, LÊ NE KU CABDARÎYÊ

“Bin destê Xwedêyî zor ta bin, ku Ew wextêda we bilind bike. Hemû xemên xwe biavêjine ser Wî, çimkî Ew bona we xem dike”.

A Petrûs 5:6,7

Ji hildana cabdarîyê netirsin. Hînbin, ku xemê xwe teslîmî Xudan bikin, lê ne ku cabdarîyê. Li cem hinek meriva gelekî baş tê stendinê, ku bona t’u tiştî nerihet nîbin. Ew tê bêjî nava karê “avîtina xemê xwe”da bûne pêşekzan. Ew gelekî baş xwe texmîn dikin, wextê ku xemên xwera tevayî usa jî cabdarîya xwe teslîm dikin.

Fikira xwe bibine berbi wî karî, çî ku li ber we hatîye danînê û ji t’u tiştî rûyê wê yekêda nerevin, wekî ew yek bo we dijwar e.

Her dem bîr bînin, wekî hûn çî jî ji Xwedê hîvî bikin, tevî dua wê usa jî cabdarî bê dayîne. Eger mala we, yan jî avtomaşîna we heye, Xwedê hîvîyê ye, wekî hûnê bona wî hemû tiştî xem bikin. Xweranedîtî dikare êrişê bîne ser fikir û texmînkirinên we, lê li cem we fikira Mesîh heye. Hûn dikarin xapandina mîrêcin naskin û wî hukumî jî naskin, yê ku wê bîne li ser texmînkirinên we û wê dijwarîya bona we çêke, ku hûn wê yekê nekin, çî ku hûn zanin, wekî raste. Hîvîkirina tiştêkî hêsaye... lê hildana cabdarîya bona wê hîvîkirinê îdî pirsra pêşkeftina xeyset e.

Tê bîra min, wextê ku min dicêriband malxwê xwe bînim li ser wê fikirê, ku li ser kenarê golê malê bikire, li kîderê meyê bikaribûya hêsbûna, dua bikira û Xeber lêkolîn bikirana. Min dixwest cîyek hebûya, ku bikaribûma ji hemû tiştî “birevîyama”. Min gote wî, wekî ewê bona me, zarok û nebîyên me gelekî baş bûya, usa jî meyê

bikaribûya li wir civînên serwêrên xwe derbaz bikirana, rasthatinên praktîk û duakirnên yekbûyî derbaz bikirana.

Ew hemû tişt awqasî baş dihate texmînkirî, wekî ez bi şabûnêva tijî dibûm. Feqet Dêyv gote min, wekî me gerekê bona wî hemû tiştî xem bikira. Ewî anî bîra min, wekî em îdî gelekî mijûlin û wedê me wê tunebe, ku em maleke mayîn jî xweykin. Ewî destpê kir derheqa paqijaya dor-bera, şîneya dor-bera, perên komûnala û pirsên wî cûreyîye mayînda xeberde û got, wekî wê diha hêsabe, ku bona rihetîye malekê kirê bikin û bona wê malê cabadrîyê hilnedine ser xwe.

Ez tenê bi êmosiyonali nêzikî wê pirsê dibûm, lê Dêyv ew yek bi praktîkî da kifşê. Her car, wextê birîyarkirinê (qîrar qebûlkirinê), em gerekê bîr nekin, ku pirsê jî du alîvaya binihêrin. Mala li ber kenarê golê bona wan meriva tişteki baş e, yê ku dikarin bona xweyîkirina wê wede başqe bikin, lê meyê nikaribûya ew yek bikira. Dilê xweda min ew yek zanibû, feqet temamiya salê min dicêriband Dêyv bianîya ser wê fikirê, ku wê malê bikire.

Ez şa me, wekî ew nava gotinên xweda qewîn bû. Eger usa nîbûya, me gerekê niha ew mal kirîbûya, paşê meyê ew hinek wede bida xebatê, paşê bi texmîn, meyê ew mal derxista frotanê, çimkî xweykirina wê gelek wede û xebat jî me bixwesta. Paşê eyan bû, wekî hevalên meye baş li ber golê mal kirîbûn û îzin dane me, ku em çiqasî bixwezin, awqasî jî bidine xebatê. Piştî çend sala mala me îdî hebû û bona destanîna wê malê, hema ew bû wedê rast. Feqet, wextê ku min dixwest, ku ew mal pêşda hebûya, ez bêjim, wekî ew wedê here şaş bû. Xwestina tişteki tenê bes nîne. Em gerekê bi temami hazir bin ku cabdarîyê hildine ser xwe.

Eger hûn bi serwaxtî bişuxulin, hûnê bibînin, wekî Xwedê bona hewcetîyên we xem dike. Her kesê ku anegorî fikira Mesîh rêber dibe, wê bi serwextîyêva bişuxule, lê ne ku bi texmînkirinava.

Şexsê cabdar bin!

Serê
18-a

*Hîvî dikim, ku hemû tişt
anegorî mecalên hêsa be:
ez nikarim li ber dijwarîya
teyax bikim.*

Fikirdarîya çolê: hejmar 3

***Hîvî dikim, ku hemû tişt anegorî
mecalên hêsa be: ez nikarim
li ber dijwarîya teyax bikim.***

*Serê
18-a*

Fikirdarîya çolê: hejmar 3

Ev fikirdarîya şaş mînanî wê yekê ye, çî ku me serê kitêbêyî derbazbûyîda gotûbêj (enene) kir, û mixabin (telebextra), li cem zarokên Xwedê ev yek awqas gelek cara tê dîtîne, wekî gerekê serîkî kitêbêyî tam bona wê yekê başqe bikin.

“Çimkî ev temîya ku Ez îro didime te, bona te bi nezanî ne dûrî te ye û ne jî [dijwar e].”

Qanûna Ducarî 30:11, AMP

Ez gelek cara jî wan meriva xweafûkirina dibihêm, yên ku bi hîvîkirina dua nêzîkî min dibin. Wextê ku ez wanra wê yekê dibêjim, ku Xebera Xwedê, yan jî Ruhê Pîroz bona halê wan çî dibêje, ew dibêjin: “Ez zanim, wekî ew yek rast e. Xwedê hema ew yek nîşanî min dabû. Feqet, Coys, ew yek gelekî dijwar e (cetin e)”.

Xwedê li min eyan kir, wekî dijmin hemû cedandina dide xebatê, ku wê gotîne nava fikirên meda bide îzbatkirinê û me mecbûr bike, ku em teslîm bin. Çend sal pêşda, wextê ku Xwedê ev rastî nîşanî min da, Ewî îzin neda min, ku ez derheqa wan dijwarîyada xebardim û da bawarkirinê, wekî hemû tiştê diha hêsa pêşda here, eger ez îdî jî wana gazina nekim. Hema wî çaxî jî, wextê ku me qîrar kirîye, ku em şuxulkarîya xwe berdewam bikin û tiştêkî bikin, lê gelek wede em li ser fikirmîşbûnê û xeberdanê xerc dikin, ku çiqas giran e û dijwar e wê yekê bikin, wî çaxî şuxulkarî bi rastî wê diha dijwar bê texmînkirinê, ne ku bi rastî çawa ew heye. Dewsa nîşandayîna nêzîkbûna xirab optîmîzma xwe xweykin.

Wextê ku min destpê kir bibînim, ku anegorî Xebera Xwedê jîyan û kirinên min gerekê çî cûreyî bin, min destpê kir wana himberî wê bikim, çawa ku bi rastî ez hebûm, min destpê kir gelek cara biwekilînim: “Xwedê, ez dixwezim nava hemû tîfîda mînanî Te bikim,

lê ew yek gelekî dijwar e”. Xudan rêberî li min kir, ku ez xebera Qanûna Ducarî 30:11 bixwînim, li kîderê ew dibêje, wekî temîyên Wî dijwarin û ji me dûr nînin. Temîyên Xudan bona me dijwar nînin, çimkî Ew Ruhê Xwe dide me, Yê ku di nava meda bi cûrê qewat dixebite û alî me dike, ku em hemû temîyên Xwedê mîyaser bikin.

PIŞTOVAN

“Ezê jî ji Bavê hîvî bikim, û Ewê Gumandarekî mayîn bide we [Şêwirdar, Piştovan, Advokat, Qewatdar], wekî Ew tevî we hetahetayê bimîne”.

Yûhenna 14:16, AMP

Her dem jî cetin (dijwar) dibe, wextê ku em dicêribînin tişteki bi xwe bikin, bêyî gumana li ser kerema Xwedê. Eger nava jîyanêda hemû tişt hêsa bûya, emê hewcê qewata Ruhê Pîroz nîbûna, bona ku alî me bikira. Încîl Wî çawa “Piştovan” raber dike. Ew nava meda ye û her dem tevî me ye. Ew hazir e her dem alî me bike û karebûnê bide, bona ku em wî hemû tiştî mîyaser bikin, çî ku bona me dijwar (çetin) tê texmînkirinê.

RÊYÊN HÊSA Û DIJWAR

“Û bû, gava firewin cimet berda, Xwedê ew li rîya welatê Fîlistînîyara nebirin, lê belê ew hê nêzik bûn, Xwedê got: “Ku nebe cimet çev şêr bikeve, poşman be, paşda vegere Misirê”.

Derketin 13:17

Hûn dikarin li ser xwe gumanbin, wekî Xwedê we kuda jî bibe, Ew dikare we xweyî bike. Nava jîyana meda Ew îzinê nade, ku em jî qewata xwe der tiştî bikin (binihêre A Korintî 10:13). Ew bona wî hemû tiştî heq dide, çî ku ew temî dike. Em gerekê nava şerkarîyên bê dawîda nejin, eger em hîn bibin nava pîrsa qewatkîrîna meda gumana xwe bidine ser Wî.

Eger Xwedê gotîye te, ku tu tişteki bikî, wî çaxî rûyê wê yekêda, wekî ew yek dijwar e, nereve. Hema demên dijwarda gerekê diha

zêde tevî Xudan wede derbaz bikin, diha zêde li Wî guman bin û diha zêde keremê ji Wî qebûl bikin (binihêre Îbranî 4:16).

Kerem qewata Xwedê ye, ya ku Ew bi temamî belaş (bê heq) dide me. Bi alîkarîya keremê em wê yekê dikin, çî ku em bi xwe nikarin bikin. Ji van fikira fesal bin: “Ez nikarim vê yekê bikim, çimkî ew gelekî dijwar e”.

Carna Xwedê me rêyên dijwarva dibe, çimkî Ew di nava meda xebatê dike. Emê çawa hîn bin gumana xwe bidine ser Wî, eger nava jîyanêda hemû tişt bi hêsanî bê dayînê, û eger em bikaribin dijwarîya bi xwe alt bikin.

Xwedê rêberîya zarokên Îsraêlê kir, ku ew bi rîya dirêj û dijwarva derbazbin, çimkî ew tirsonek bûn û Ewî hela hê dilê wanda xebat dikir, ew bona wan şera hazir dikin, yên ku li welatê Sozdayî hîvîya wan bûn. Neniherî wê yekê, ku Ewî rîya dijwarra bir, lê ew awqasî jî bona wan dijwar nibû. Xwedê ji qewata me der temîya nade. Nava jîyana meda rê wî çaxî dijwar dibin, dema ku em destpê dikin bifikirin ku ew dijwarin.

Gelek meriv difikirin, wekî ketina li welatê Sozdayî dide kifşê, wekî hemû şerkarî îdî xilaz bûne, lê ew yek usa nîne. Eger hûn bixwînin, ku çî qewimî, wextê ku îsraêlî Êrdunêva derbaz bûn û despê kirin erdên sozdayî zefkin, hûnê bibînin, wekî peyî şerekîra şerê mayîn dihat. Feqet, bi qewata Xwedê û rêberîya Wî ew nava wan şerada ser ketin.

Xwedê bi rîya dirêj û dijwar rêberî li wan kir, neniherî wê yekê, wekî rêke diha kurt û hêsa hebû, çimkî Ewî zanibû, wekî cimet hela hê hazir nîne, ku nava wan şerada şerkarîyê bike, yên ku wextê ketina li welatê Sozdayî hîvîya wan bûn. Xwedê têra didît, wekî çawa ku wana dijmin bidîta, ewê berbi Misirê birevîyana. Bo wê yekê jî Ewî rîya dijwar bijart, bona ku bida kifşê, ku Ew kî ye û hîn bike, wekî ew gerekê gumana xwe nedine ser xwe.

Wextê ku meriv nava halê jîyanêye dijwarra derbaz dibe, fikira wî dixweze teslîm be. Mîrêcin zane, ku eger ew bikaribe nava fikira meda me alt bike, wî çaxî ew binketin wê nava hemû govekên jîyana meda belav bibe. Awa bona çî awqasî girîng e, wekî em ber xwe nekevin, zeyîf nebin û teslîm nebin.

TEYAX BIKIN

“Û bila em ji kirina karên helal û rast aciz nebin, zeyîf nebin û teslîm nebin, nava wedê rastda û kivşkirîda emê bidrûn, eger em zeyîf nebin û serxwebûna xwe unda nekin”.

Galatî 6:9 AMP

Acizbûn û zeyîfbûn ji fikirên binketî destpê dibin. Ruhê Pîroz ber dilê meda tê, ku em qewîn bin û fikira xweda teslîm nebin, çimkî eger em teyax bikin, emê ese bidrûn.

Derheqa Îsada bifikirin. Hema piştî nixumandina bi avê û tijîbûna bi Ruhê Pîrozva, Ew bi Ruhê Pîrozva birine qûmistanê, ku ji aliyê mîrêcinda bê cêribandinê. Ew aciz nebû, zeyîf nebû û derheqa tiştên xirabda nefikirî û xeber neda. Ew şaş nebû û necêriband fem bike, wekî ew yek bo çi rastî Wî hat. Ew nava hemû cêribandinara bi serkeftin derbaz bû.

Bi derbazbûna nava wan cêribandinara, Xudanê me 40 şev û rojî nedigerîya û nedigot, ku bo Wî çiqas dijwar e. Bi wî cûreyî, Ew diha nêzîkî Bavê Xweyî ezmana bû û ji wir bi serkeftin derket (binihêre Lûqa 4:1-13).

Hûn dikarin bînin ber çevê xwe, ku Îsa çawa tevî şagirtên xwe ji bajarekî diçû barjarê mayîn û digot, ku çawa hemû tişt dijwar e? Hûn tînin ber çevê xwe, ku ew xeber dide û dibêje, ku Xaçê bona Wî çiqasî giran e... yan jî, ku çawa Ew ji hemû tiştî ditirse, çi ku pêşîya Wî ye... û çiqasî dijwar e bi jîyana gerêva bijî, wextê kîjanê t’u qewilekî baş tune: ne qulixdarîya têlêfonê heye, ku malêra têlêfon bike... ne banê avayî li jora serê wî heye... ne jî nivînên nerm hene... Ez jî ji cîyekî rêwîtiyê destpê dikim, hetanî li cîyê mayîn, ji welatekî diçime welatê mayîn ku Mizgîniyê dannasîn bikim û ez gerekê bona wan dijwarîya gazinê xwe nekim, bi kîjana qulixa min tê rêberkirinê. Ez hîn bûme aciz nebin, wextê ku dibînim çiqas girane li hotêlên cûre-cûre bijîm, gelek cara li derva nan bixum, her şemikê û yekşemê nava nivînên cûre-cûreda razêm, wedekî dirêj li malê nemînim, nasîya xwe bidime merivên baş û paşê ji wana biqetim, tevî kîjana îdî nêzîk bibûm. Eger mecala min heye wê yekê bikim, çi ku niha dikim, wî çaxî gerekê nêzîkbûna baş hindava hemû dijwarîya bidime kifşê.

Fikira Mesîh li cem me heye û em dikarin usa besrivên (cabên) wan hala bidin, çawa ku Ewî kir: em gerekê bi alîkarîya fikirdarîya serkeftî bi fikira xwe bona serkeftinê hazir bin, lê ne ku bona binketinê.

PIŞTÎ ZÊRANDINÊ AÇIXÎ TÊ

“Çawa ku Mesîh bona me bi bedenî cefa kişand, hûn jî bi nêt û fikira wî cûreyî xwe qewîn bikin [bona razîkirina Xwedê bi sebir bizêrin, lê ne ku teslîmbin]. Çimkî yê ku bi bedenî cefê dikişîne [fikira wî ya Mesîh e], bi cûrê [bi zanebûn] jî gunehkirinê sekinî [razîkirina xwe û ya dinîyayê da sekinandinê û destpê kir Xwedê bide razîkirinê].

Dêmek ew îdî nikare jîyana xweye mayî mînanî xwestinên xweye merivatîyê bijî, lê li gora qirara Xwedê [dijî].”

A Petrûs 4:1,2, AMP

Ev beşa xeberê nîşanî me dide, ku em çawa gerekê nava halên giranda bijîn û dijwarîya altkin. Îzinê bidin, ku ez van herdu xebera şirove bikim.

Derheqa wî hemû tiştîda bifikirin, ku Îsa nava çî ra derbaz bû û Ew çawa bi bedenî cefa kişand. Ewê alî we bike, ku hûn nava dijwarîyara derbaz bin. Bona şêr xwe qewîn bikin, fikirên xwe hazir bikin, ku hûn usa ser bikevin, çawa ku Îsa difikirî û ser diket. “Bona razîkirina Xwedê ezê bi sebir cefê bikişînim, lê ne ku teslîmbim”. Eger fikira Mesîh li cem me heye û hûn dizêrin û mînanî Mesîh nêzîkî hemû tiştî dibin, wî çaxî hûnê t’u cara bona razîkirina xwe nejîn, bi reva jî hemû dijwarîya û hêsakirina jîyana xwe. Lê hûnê destpê bikin bi qirara Xwedêva bèn rêberkirinê û bijîn, lê ne ku bi texmînkirîna xwe û fikirên bedenî.

“Cefên bi bedenî” dibin, kîjana em gerekê bona mîyaserkirina qirara Xwedê li ser xwe bibin.

Her dem nîne, wekî rêwîtiyên mine qulixê li bedena min xweş tîn, lê ez zanim, wekî ew bona min qirara Xwedêne. Bo wê yekê jî ez bi fikirên rastva dil didime ber xwe, çimkî eger usa nekim, wî çaxî ezê îşê ku teslîmî min kirine, hela hê pêşîya destpêkirinê bidime binxistinê.

Diqewime nava jîyana weda kesek heye, kîjanîra hûn çetin ziman dibînin, lê hûn usa jî fem dikin, wekî Xwedê dixweze, ku hûn

heleqetîyên xwe tevî wî xweykin û ji wî nerevin. Bedena we ji wê yekê dizêre, çimkî tevî wî merivî awqasî jî hêsa nîne xwe hazirkin, bifikirin û bin ronahiya rastda li wî halî binihêrin. Nava qirara Xwedêda carna halên dijwar pêşda tên, lê derketina ji qirara Xwedê tiştêkî hê dijwar e.

ZÊDAYA MIN NAVA MESÎHDA YE

“Ez zanim, çawa nuxsankirîme û bi cûrê şikestî bijîm, nava qewilên tengda bijîm, lê usa jî zanim, ku çawa gelekî şa bim û nava zêdayêda bijîm. Ez qebûlkirina sura her qewilekî jîyanê û her halekî zanim, eger têr bim, yan jî birçî, yan hebûnêda bim, yan jî tunebûnêda, bi heyîna zêdayê. Ez nava hemû tiştîda nava Mesîhda qewatim, Yê ku qewatê dide min [ez bona her tiştî hazirim û bi saya Wî nava her tiştîda qewata min dîsa ew e, Yê ku min bi qewatêva tijî dike: zêdaya min nava Mesîhda ye]”.

Filîpî 4:12,13, AMP

Fikirdariya rast nava şerê meda me dide qewatkirinê. Şerkirina bi fikirdariya şaş mînanî wê yekê ye, ku bê sîlih herî nava şer. Eger em usa bikin, emê dirêj teyax nekin.

Îsraêlî “dikirine nive-niv” û ew bû menîke wan, wekî wana rîya 11 rojêye nava qûmistanêra 40 salî derbaz bûn. Wana bona her dijwarîkê gazinê xwe dikirin û bona her çetinayîkê aciz dibûn. Wana her dem digotin, ku bona wan çiqas dijwar e. Ew hîmlî vî cûreyî difikirîn: “Ez hîvî dikim, ku bila hemû tişt hêsa be: ez nikarim li van dijwarîya teyax bikim”.

Gelek bawarmend rojên yekşemê dibine leşker, lê rojên duşemê “dikine nive-niv”. Rojên yekşemê, li civînê, ew li ber hevalên xwe xeberdanên baş dikin, lê rojên duşemê wextê ku lazim e paşda vegerine li jîyîna herroje û li dor-berên wan kesekî usa tune, ku li ber wan xwe bidine kifşê, ew ji cêribandina here biçûk jî zeyîf dibin.

Eger hûn nive-nivê û acizîyê hiz dikin, wî çaxî fikirdariya xwe biguhêrin. Bila fikira we vî cûreyî be: “Ez dikarim hemû tiştî bi saya Îsa Mesîhê qewatdar bikim”. (Filîpî 4:13).

Serê
19-a

*Ez nikarim bo xwe tu
tiştî bikim: ez bûme kutkuto,
aciz dibim û şaşîya digirim.*

Fikirdarîya çolê: hejmar 4

***Ez nikarim bo xwe t’u tiştî bikim:
ez bûme kutkuto, aciz dibim û
şaşıya digerim.***

***Serê
19-a***

Fikirdarîya çolê: hejmar 4

Hetanî ku em hîn nebin halê dijwar bi nêzîkbûna xweye rastva rûmetê Xwedêra neynin, emê ji dijwarîya azad nebin. Zêrandin nîne ku Xwedê dide rûmetkirinê, lê nêzîkbûna meye raste nîşandayîye wextê zêrandinaye ku Wî dide razîkirinê û rûmetkirinê.

Eger hûn dixwezin fem bikin, ku Xwedê çi dixweze ku li cem me hebe, wî çaxî hûn gerekê wê xeberê hêdî- hêdî, cumle bi culme careke mayîn bixwînin. Ez xwe mikur têm, wekî îdî nava salên dirêjda ez dicêribînim fem bikim, ku bona çi zêrandina me li Xwedê xweş tê. Încil zelal dide kifşê, wekî Îsa êşa me, zêrandin û cezayê me hilda ser Xwe (binihêre Îşaya 53:3-6).

Gelek sal pêşda min fem kir, wekî nava kaxaza Petrûse ewlinda fikira van xeberaye hîmlî ne ku nava zêrandinadane, lê nava nêzîkbûna meye hindava wan zêrandinada ye.

Guhdarîyê bidine ser wê xeberê, kîjanêda xebera “sebirkir” tê xebitandinê. Li vir derheqa wê yekêda tê gotinê, ku eger kesek hindava meda tiştên neheq dike û em bi sebir wê yekê li ser xwe dibin, wî çaxî ew yek li Xwedê xweş tê. Nêzîkbûna meye bi sebirê li Xwedê xweş tê, lê ne ku zêrandina me. Nava zêrandinên xweda em gerekê li Îsa binihêrin, ku Ew çawa nêzîkî êrişên neheqe hindava Wîda dibû.

“Çimkî eva kerem e [tiştê qebûlkirinê ye, layîqî begemîyê û razîbûnê ye], eger kesek çevên Xwedêda cîyê heqî-neheq zelûliyê dikişîne.

[Heyneser] rûmeta çawa [nava wêda heyê], eger hûn tişteki şaş dikin û bona wê yekê tèn cezakirinê û wê yekê bi sebir dikişînin. Feqet eger hûn bi sebir tişteki baş dikin û bi cûrê nelayîq zelûliyê dikişînin, ew yek ji aliyê Xwedêda tê qebûlkirinê û li Wî xweş tê.”

A Petrûs 2:19,20, AMP

ÎSA MESELA ME YE

“Çimkî hûn vê yekêra hatine gazîkirinê [çi ku ji navê we nayê qetandinê], wekî Mesîh cefa kişand û hûn çawa mesele [ya Xweye şexsî] hişt, ku hûn pêgeha Wîda herin.

Ewî guneş nekir û zarê wîda hilekarî (mixenetî) nehate dîtînê.

Gava dihate rezîlîkirinê û bêhurmetîkirinê, dewsa wê yekê rezîl nedikir û bêhurmet nedikir, gava dihate nuksankirinê û zêrandînê, gef li kesekî nedixwerin [heyf hilnedida], lê Ewî [Xwe û hemû tişt] spartibû hakimê ser rastîyê”.

A Petrûs 2:21-23 AMP

Îsa bi cûrê rûmet zêrîya. Nenihêrî wî halî, Ewî bi bêdengî, bêyî gazina, nava hemû tiştîda xwe sparte Xwedê.

Ev xebera li jorê kifşkirî îzinê dide me ku em fem bikin, wekî Îsa bona me mesele ye: Ew hat nîşanî me bide ku em gerekê çawa bijîn. Bi cûrê jîyana xwe em gerekê bona yên mayîn bibine mesele (mînak). Em zarokên xwe diha gelekî bi mesela xweva hîn dikin, lê ne ku bi xeberên xwe. Bona meriva em gerekê bibine nama vekirî, bona ku bikaribin me “bixwînin” (binihêre B Korintî 3:2,3), usa jî gerekê li vê dinîya tarî bibine ronahî (binihêre Filîpî 2:15).

EM BONA SEBIRKIRINÊ, ŞIKESTÎBÛNÊ Û GURÊDABÛNÊ HATINE GAZÎKIRINÊ

“Awa ezî girtîyê bona navê Xudan recaîyî we dikim, wekî hûn usa bigerin [bijîn] çawa layîqî wê gazîyê ye, kîjanêra hatine gazîkirinê [bi wê kirinê, ya ku we layîqî navê qulixkirina Xwedê dike bi jîyînê, çawa ku dighîje we] bi şikestîbûnê û gurêdabûnê [bêyî xwehizîyê, bi nazikayê, bi nermayê], bi sebirê [bi ûreka fire], bi teyaxkirina hindava hevda û bi îzîndayîna hev, çimkî hûn hev hiz dikin”.

Efesî 4:1,2, AMP

Hinek wede pêşda, malbeta meda tişteş qewimî, kîjan dikare bona şikestîbûnê, gurêdabûnê û sebirê çawa mesele qulix bike.

Kurê me Daniêl, yê ku bona mîsîonêrîyê çûbû Komara Domînikê, teze paşda vegeşîya bû. Li ser milên wî cî-cîna sor bibûn û çend birîn

dihatine kifşê. Li Komara Domînikê gotibûne wî, wekî li cem wan tiştên usa diqewimin, wextê ku meriv şînayîke bi jehrê dikevin. Halê wî bona me tevlihevbûn pêşda anî. Me doxtirê malbeta xwera têtêfon kir, lê ew wê rojê ne li ser xebatê bû û usa bû, wekî rашtatin tevî alîkarê wî hate kifşkirinê.

Keça me Sandrayê doxtirra têtêfon kir û rашtatin da îzbatkirinê. Ewê salên Daniêl (ku çend salîye) gote wî û gotê, wekî ew xwîşka Daniêl e û ewê wî bine cem doxtir. Wê rojê em hemû jî betal nîbûn, usa jî Sandra mijûl bû. Piştî 45 deqa ajotina avtomaşînê, ew gihîştibû li cîyê doxtir û ev tişt bihîstibûn: “Ez gelekî xemgîn dibim, lê anegorî qanûnên me em nexweşên ku 18 salên wan tamam nebûne, bêyî rêberîya dê û bava, qebûl nakin”.

Sandrayê cêribandibû şîrove bike, wekî ewê pêşda têtêfon kiribû û gotibû, wekî ewê birayê xwe bine, lê ne ku dê û bav, çimkî ew her dem nava rêwîtyêdanin. Feqet xwîşka doxtirîyê dîsa li ser gotina xwe sekinîbû û gotibû, wekî bêyî dê û bav nikare wî qebûl bike.

Sandra dikaribû gumanbir bûya: nenihêrî wê yekê, ku ew betal nîbûye, ewê ew cabdarî hildabû ser xwe, lê eyan bibû, wekî ew badîhewa ye. Bona paşdahatîna malê ew gerekê dîsa 45 deqa rê bihata û bi wê yekê dîsa wede dihate undakirinê.

Xwedê alî wê kir, ku rihetîyê û hizkirinê xweyke. Ewê bavê xwera têtêfon kir, yê ku wî çaxî çûbû li cem dayîka xwe û ewî soz dabû, ku bê û bicêribîne hal bide rastkirinê. Ewê rojê Dêyv xweda texmîn kiribû, wekî gerekê bê ofîsa me û ji kitêbên min, usa jî qeytanên guhdarkirinê tevî xwe bibe. Ewî jî nizanibû, ku bona çî gerekê wana hilde. Ewî texmîn kiribû, wekî gerekê usa bike.

Wextê ku ew hatibû klînikayê, ew jîna ku kaxezên nexweşava mijûl dibe, ji Dêyv pirsîbû, ku gelo ew qulixçiyê civîne nîne û malxwê Coys Mayêrê nîne? Dêyv gotibû, wekî usa jî heye. Eyan bibû, wekî wê jinê progiramên meye têtêvîzîyonê temaşe kiribûn û gelek cara derheqa malbeta meda bihîstibû. Bo wê yekê jî paşnavê Dêyv wêra nas bû. Dêyv wêra qise kiribû û kitêbeke min, ya derheqa texmînkirina doxtirîyêda dabû wê.

Meremê gilikirina vê serpêhatîyê ew e, ku gelo wê çi biqewimîya, eger Sandra hers biketa û sebira xwe unda bikira? Halê wî çaxî carekêra cûrekî mayîn bûya. Meyê mecala bona şedetîya derheqa xudanda unda bikira. Ew jina ku bi têlêvîzîonê ez temaşe kiribûm, wê fikira xweye derheqa malbeta minda biguharta û wê yekê dikaribû zyana ruhanî bida.

Li vê dinîyaê gelek meriv Xwedê digerin û ew çi ku em bi kirina xweva didine kifşê, diha gelekî girîng e, ne ku em bi xeberên xweva çi dibêjin. Bêfitîya (bêguman) dannasînkirina Mizgînîyêye bona meriva girîng e, lê bi kirina wê yekê û paşê bi kirina xirab înkarkirina xeberê diha xirab e, ne ku negotina t'û tiştî.

Sandrayê nava wî halîda bi sebirîkirinê cefa kişand. Xebera Xwedê dibêje, wekî em bona nîşandayîna kirina wî cûreyî û nêzîkbûna wî cûreyî hatine gazîkirinê.

SEBIRA ÛSIV NAVA ZÊRANDINÊDA

“Hingê merîk pêşîya wanda şand: Ûsiv xulamtîyêra hate firotanê.

Nigên wî qeydada şidandin: ruhê wî danîne nava hesin.

Hetanî wî wextê ku gotina wî hate sêrî [nava jîyana birayên wîye bêrehmda]: Xebera Xudan ew cêriband”.

Zebûr 105:17-19, AMP

Çawa mesela peymanê Kevin derheqa mesela Ûsivda bifikirin, yê ku jî alîyê birayên xweda bi neheqî hate zêrandinê. Wana Ûsiv xulamtîyêra firot û gotine bavê xwe, ku ew jî alîyê terewilên beyanîda hatîye kuştinê. Feqet dewletîkî bi navê Pêtaprês ew kiribû û çawa xulam biribû mala xwe. Ûsiv kuda jî çû, Xwedê kerem da wî: usa jî li mala axayê teze bû.

Navê Ûsiv li wir bilind kirin, lê paşê careke mayîn qewimandineke neheq qewimî. Jina Pêtaprês cêriband usa bike ku li Ûsiv xweş bê, lê Ûsiv merivekî helal bû û ewî ew înkâr kir. Jinê mêrê xwe xapand û got, wekî giva Ûsiv çev berdaye wê, rûyê çida wî digrin û davêjine zindanê, nenihêrî wê yekê, wekî ewî tiştêkî xirab nekiribû.

Wextê mayîna xweye li hebsê, Ûsiv cêriband alî yên mayîn bike. Ewî t'û cara neda kifşê ku ew nerazî ye, û wextê zêrandina ewî nêzîkbûna rast da kifşê, lê Xwedê jî ew azakir û bilind kir. Bi kutasî, ew li Misirê gihîşte serwêrtiya usaye mezin, wekî li tamamîya welêt xêncî firewun jî wî bilindtir meriv tunebûn.

Xwedê usa jî heleqetiyên di navbera Ûsiv û birayên wîda dane rastkirinê. Wextê ku li tamamîya welêt xelayî bû, ew bi mecbûrî çûne cem Ûsiv û xurek jî wî hîvî kirin. Ûsiv careke mayîn nêzîkbûna qenc nîşanî wan dide, jî birayên xwe heyfê hilnade, nenihêrî wê yekê ku ew layîqî wê yekê bûn. Ûsiv gote birayên xwe, wekî nêt-meremên wane xirab Xwedê kirine yên qenc û wekî ew ne ku destê wîda, lê destê Xwedêda bûn û xêncî duakirinê, îzina wî tune tiştêkî mayîn bike (binihêre Destpêbûn 39-50).

QEZÎYA NERAZÎBÛNÊ

“Û Mesîh necêribînin [sebira Wî necêribînin, bona Wî nebine cêribandin, necêribînin bi rexnekirin Wî qîmetkin û qencîya Wî bi cûrê xirab xerc nekin], çawa ku jî wan hineka cêriband û bi mera hatine lêdanê, mirin.

Û bîna xwe teng nekin, çawa jî wan hineka bîntengî kirin û bi destê milyaketê [mirinê] unda bûn.

Û ev hemû tişt çawa meselên gotî, [lê bona me, çawa mesele û eşaretî] bûn: ew hatine nivîsarê çawa şîret, rastkirin û kirinên rast, û em nava wan rojadanin, xilazîya kîjana hat [mirina wana û wedê serhevdahatinê]”.

A Korintî 10:9-11, AMP

Ji vê beşa xeberê em dikarin firqîya di navbera Ûsiv û îsarêliyada bibîn. Ûsiv t'û cara nekire nive-niv, lê karê îsarêliya tenê ew bû, ku jî hemû tiştî nerazî bin, çî ku ne bi xwestina wan bû. Încîl derheqa merivên ku dikine nive-niv zelal dibêje, derheqa dîtina şaşîya û nerazîbûnêda.

Hemû tişt gelekî zelal e. Nerazîbûnên îsarêliya derî bona dijminê wan vekirin, yê ku hat û qira wan anî. Wana gerekê qencîya Xwedê qîmet bikirana, lê nekirin, û bahê wê yekê dan.

Me got, wekî hemû zêrandin û mirinên wana çawa mesele hatine nivîsarê, ku bizanibin, ku çi dikare li me biqewime, eger em mînanî wana bikin. Ji devê me wê t'û xebereke nerazîbûnê dernekeve, hetanî ku ew nava fikira meda pêşda nehatine. Bêyî şikberî, nerazîbûn fikirdarîya çolê ye, ya ku wê îzinê bide me, ku em bikevine welatê Sozdayî.

Îsa ye mesela me û em gerekê usa bikin, çawa ku Ewî kir. Îsraêlî nerazî bûn û li qûmistanê man.

Îsa rûmet da Xwedê û ji nava mirîya rabû.

Nava vê yekêda em dikarin qewatên rûmetê, razîbûnê û nerazîbûnê bibînin. Belê, nive-niv, şikyat, mirte-mirt û gera şaşîya dîsa qewatin, lê ew yek qewata xirab e. Her car, wextê ku em nerazîne, gazina dîkin, yan jî şaşîya digerin, em îzinê didine mîrêcin ku ew me kontrol bike, nenihêrî wê yekê, wekî Xwedê serwêrtîya wî cûreyî nedaye wî.

NEKINE NIVE-NIV, NERAZÎ NEBIN, ŞAŞÎYA NEGERIN

“Her tiştî bêyî bîntengî û gera şaşîya û bêyî nerazîbûnê [miqabilî Xwedê], û bi hewaskarîyê û şikberîyê [di nava xweda] bikin, wekî hûn nava vî nisilê neheq û xalîfîda bê leke û bêqîsûr zarokên Xwedêye bêşûc bin, bona ku nava vê nisilêda [bi ruhanî xirab bûyî], nava vê dinîya [tarîda], hûn çawa ronahiyên zelal bêne kifşê”.

Fîlîpî 2:14,15, AMP.

Carna tê texmînkirî, wekî temamîya dinîyayê nerazî ye. Reqema merivên ku dikine nive-niv û mirte-mirt ji wan meriva zêdetir e, yên ku razîne û razalixîyê elam dîkin. Meriv ji xebata xwe nerazîne, gazine xwe ji serkarîyê dîkin, nenihêrî wê yekê gerekê razîbin bona xebata heyî û bona wê yekê razîbûnê bidine kifşê, wekî ew bêmal nînin û li avayîkî najîn, li kîderê bona stendina taseke şorbê bi seheta nava sirêda disekin.

Gelek meriv, yên ji wan merivên feqîr, wê bextewar bûna, eger xebata we ya wan bûya. Ewê hazir bûna wî serkarîra yole biçûna,

yê ku bi fikira we usa jî merivê kamil nîne, tenê ku ew her dem heqê xwe bistendana, li mala xwe bijîtana û xurekê bi xwestina xwe bixwerina.

Diqewime hûn hewcê wê yekêne, ku xebata weye bi miaşa (aylixa) bilind hebûya û diqewime serwêrê we bi rastî bi heqî nêzîkî we nabe. Ew yek tiştekî xirab e, lê bi nerazîbûnê hûnê rê nebînin.

NETIRSIN Û XEMGÎN NEBIN: DUA BIKIN Û RAZÎ BIN

“Bona t’u tiştî xem nekin, lê xwestina we bila bi dua-dirozga, razîbûnêva tevayî, Xwedêva eyan be”.

Filîpî 4:6

Nava vê xeberêda Pawlosê Şandî me hîn dike, ku em çawa pirsgirêka helkin. Ew şêwirê dide me, ku nava her halekîda duayê razîbûnê raberkin.

Xudan vê prînsîpê vî cûreyî ez hîn kirim: “Coys, Ez bona çi gerekê tiştekî mayîn bidime te, eger tu nikarî bona tiştên heyî razîbî? Bona çi ez mecalekê jî bidime te, ku tu gazine xwe raber bikî?”.

Eger em nikarin duayên xwe bi razîbûnêva tijî bikin, emê caba (bersiva) milahîm nestînin. Xeber nabêje, ku bi nerazîbûnê dua bike, lê dibêje, bi razîbûnê dua bike.

Gelek cara em destpê dikin bikine nive-niv, nerazî bin, şaşîya bigerin û wî çaxî nerazî bin, wextê ku tiştek, yan jî kesek usa nake, çawa ku em hîvîyêne, yan jî wextê ku em gelekî dirêj hîvîya tiştekîne, lê me usa têra nedîtîye. Xebera Xwedê me hîn dike, ku wî çaxî em gerekê bi sebir nêzîkî pirsê bin.

Min eyan kir, wekî sebir ne ku karebûna hîvîyêsekinandinê ye, lê ew wextê hîvîyêsekinandinê karebûna nişandayîna nêzîkbûna rast e.

Gelekî girîng e (ferz e), wekî gerekê bi cûrê rast nêzîkî fikirdarîya wî cûreyîye nerazî û xirab bibin. Ez, bi bêqelpî, bawar dikim, wekî Xwedê eyantîya derheqa wê yekêda daye min, ku çiqas tiştekî qezîya ye, eger “azadîyê” bidine fikir û devê xwe. Nava kitêba Qanûna

Ducarîda em dixwînin, wekî Xwedê gote îsraêlîya: “Hûn gelekî dirêj li vî çîyayî man”. Diqewime hûn îdî wedekî dirêj li ser wî çîyayîne, lê niha jî hazirin pêşda bilivin. Eger usa ye, wî çaxî wê diha baş be hûn bîr bînin, wekî nava jîyana xweda hûn nikarin bi rêyeke başva dûr herin, çimkî fikir û xeberên we tenê ji nerazîbûnane.

Ez nabêjim, wekî nişannedayîna nerazîbûnê hêsa ye, lê fikira weye Mesîh heye. Bona çî meriv gerekê wê yekê nede xebatê?

Serê
20-î

*Min nedine hîvîyêsekinandinê:
ez layîqî wê yekê me, ku hemû
tiştî carekêra bistînim.*

Fikirdarîya çolê: hejmar 5

***Min nedine hîvîyêsekinandinê:
ez layîqî wê yekê me, ku hemû
tiştî carekêra bistînim.***

Fikirdarîya çolê: hejmar 5

*Serê
20-î*

Bêsebirbûn berê kubarîyê ye. Merivê kubar naxweze hîvîya t'u tiştî bisekine. Çawa ku me serê kitêbêyî derbazbûyîda îdî gotîye, wekî sebir ne ku karebûna hîvîyêsekinandinê ye, lê nîşandayîna nêzîkbûna raste hindava hîvîyêsekinandinê ye.

Nava vê xeberêda nayê gotinê “sebirkin, eger hûn hîvîyêne”, lê tê gotinê “sebirkin... çawa ku hûn hîvîyêne”. Hîvîyêsekinandin pareke (beşeke) (jîyanê ye. Gelek meriv naxwezîna hîvîyê bisekinin, lê çawa jî hebe, em piranîya wedê xwe nava hîvîyêsekinandinêda derbaz dikin, lê ne ku nava stendina tiştêkîda.

Ez çî dixwezîm bêjim: em dua dikin û bi bawarîyê tiştêkî hîvî jî Xwedê dikin, paşê hîvîyê disekinîn, ku caba wê tewaçekirinê wê kengê bê dayînê. Wextê ku em cabê (bersivê) distînin, em bi şabûnêva tijî dibin, çimkî em wê yekê distînin, hîvîya çî bûne em awqasî dirêj.

Feqet meriv her dem berbi meremêkî divedîne, em paşda vedigerîne berbi dua-dirozga, hewcetîya, jî Xwedê hîvî dikin û dua dikin, bona tiştêkî mayîn, paşê hîvîyê disekinîn, ku gava bi sirê wê kengê bibe.

Bi fikirmîşbûna derheqa wê yekêda, min fem kir, wekî nava jîyanêda ez piranîya wedê xwe diha gelekî bi hîvîyêsekinandinê derbaz dikim, ne ku bi stendîne. Bo wê yekê jî min qirar kir ez hîn bim, ne tenê bona stendina cabê (bersivê), lê usa jî dema hîvîyêsekinandinê jî şa bim.

“Dêmek, sebirkin, birano [çawa ku hûn hîvîyêne], heta hatina Xudanê me. Dîna xwe bidinê, ku çawa cotkar hîvîya berê erdêyî bi qîmet e. [Binihêrin çawa] ew sebira xwe [hişyar] dîsa xweyî dike, heta ku baranên ewlin û xilazîyê bistîne.”

Aqûb 5:7, AMP

Em gerekê hînbin wî çaxî jî ji jîyanê lezetê bistînin, wextê ku em li ser rîya berbi meremê xwene.

KUBARÎ NAHÊLE KU BI SEBIR HÎVÎYÊ BIN

“Û niha ez bi wê kerema ku Xwedê daye min eşaretîyê didime we hemûya, wekî hûn derheqa xweda xwe bilind qîmet nekin û nefikirin, çimkî [fikira weye mezin derheqa gîrîngîya weda tunebe], lê anegorî wê bawarîya, ku Xwedê daye we, bifikirin”.

Romayî 12:3 AMP

Eger hûn nizanin bi sebir hîvîyê bisekinin, hûn nikarin ji wî wedê hîvîyêsekinandinê lezetê bistînin. Kubarî îzina bi sebir hîvîyêsekinandinê nade, çimkî merivê kubar derheqa xweda li ser fikira bilind e û difikire, wekî li cem wî t’u cara gerekê nerihetî tunebe.

Em gerekê derheqa xweda ne li ser fikira xirab, ne jî li ser fikira gelekî baş bin. Ew yek tiştêkî qezîya ye, wextê ku kesek xwe bilind dike û ji jorda meriva dinihêre. Her car em bêsebirbûnê didine kifşê, wextê ku kesek xwe usa nade kifşê, yan jî awqasî lez karê xwe nake, çawa ku meyê bixwesta.

Merivê şikestî wê t’u cara nêzîkbûna bêsebir hindva Xwedê û merivada nîşan nede.

RÊALÎST BIN

“Dinîyayêda hûnê zêrandina û telayê bibînin, lê şa bin [ser xwe bin, guman bin, qewîn bin û bêtirs bin], Min dinîya kire bin destê xwe. [Min qewata wîye bêhurmetkirinê eşkere kir û bo we Min ew alt kir]”.

Yûhenna 16:33, AMP

Mîrêcin dicêribîne fikira me zeft bike, me nava bêsebirbûnêda xweyke û mecbûr dike, ku em bibine îdêolog, ku em fikirên xweyke raste hindava jîyanêda unda bikin û xwe bidine îdêologîyayê.

Eger mejûyê meda ew îdêologîya ye, wekî nava jîyana meda hemû qewil û heleqetî gerekê yên kamil bin, t’u kêmasî tunebin, t’u dijwarî

tunebin, t'u kesekî xirab tunebe, tevî kîjanî em gerekê mecbûr bin bişuxulin, wî çaxî bi vî hemû tiştîva em hemû menîyên bona binketîne çê dikin. Wê diha rast be bêjin, wekî mîrêcin van hemû menîya çê dike, ku em binkevin.

Ez bangî we nakim, ku hûn pîsîmîst bin (xirab bifikirin), çimkî ez ji wan bawarmenda me, yên ku fikir û nêzîkbûnên baş pêşda dikişînin. Feqet ez wera dibêjim, ku hûn realist bin, bona ku wê yekê fem bikin, wekî nava vê jîyanêda tiştên kamil gelekî hindikin.

Dema salên qulixa meye pêşinda, ez û malxwê xwe, her hevtê nava rêwîtiyada bûn, diçûne bajarên cuda-cuda, ku sêminara bidine derbazkirinê. Gelek cara bona qulixa me serayên mêvanxana (hotêla), yan jî merkezên çandê (kûlûtrayê) kirê dikirin. Pêşda, ez her dem xemgîn dibûm, wextê ku li wan cîya tişteke bi xwestina min nedihate mîyaserkirinê, mesele wextê ku aparatên sarkirina hewê baş nedixebitîn (lê carina jî qet nedixebitîn), yan jî wextê ku li serayê bona şikilkîşandina ronahiya anegor tune bû, yan jî wextê ku kursiyên li wir yan qirêj bûn, yan qelişî bûn, yan jî li ser erdê wê bermayên xureka dewata rojekê pêşda belavbûyî bûn.

Ez difikirîm, wekî em bona kirêkirina wan sera êpêce pere didin bi wê gumanê, wekî ewê nava halekî başda bin. Rûyê wê yekêda jî ez hêrs diketim, wextê ku usa nedibû. Me hemû tişt dikir, ku serayên ku me kirê dikirin paqij û xweş bûna, lê 75%-ê ji wan sera gumanên me afû nedikirin.

Hebûne wede, wextê ku mêvanxaneyê (hotêlê) koma mera soz dida, ku wê lez hemûya cî-war bike, lê wextê ku em dighiştine cî, em mecbûr dibûn çend seheta hîvîyê bisekinin, hetanî ku ode aza bûna. Teşkîla mêvanxanê (hotêlê) sehetên derheqa qulixadrîyên meda, înfomasîyayên derheqa wê yekêda şaş didane meriva, nenihêrî wê yekê, wekî me gelek cara derheqa wan înfomasîyada gotibû wana, pêşda jî kopîya wê me wanra dişand, li kîderê roj û sehetên berevbûnê nivîsar bûn. Gelek cara em rastî xebatkarên mêvanxanêye (hotêlêye) hişk û xweranedîtî dihatin, gelek cara jî usa qewimîye, wekî xwerina, ku me xwestibû, ne anegorî xwestina me bûye.

Tê bîra min, wextê ku bona tevbûyên sêmînara meye jinên mesîhî, reqema kîjana dighîşte 800 merivî, dêsêrta nava romêda (alkohol) çekirî hate dayînê. Li aspêjxanê xwestina me şaş kiribûn, û ew tişt dabûn çî ku bona xurekê şahîyê têra hatibû dîtinê. Tiştêkî zêde ye bê gotinê, ku wî çaxî em çiqasî xemgîn bûn, wextê ku wan jina destpê kirin bêjin, wekî tama wê dêsêrtê tê bêjî ya îçka alkoholê be.

Ez dikarim navnîşa van qewimandina berdewam bikim, feqet fikira vî hemû tiştî ew e, wekî hindik cara mera li hev hatîye, ku serayên amin û bêyî kêmasî kirê bikin, rastî merivên kamil bên û bi cûrê kamil sêmînarên xwe derbazkin.

Bi kutasî, ez mecbûr bûm fem bikim, wekî menîke wê yekê, ku ez nava halên wî cûreyîda bêsebir bûm û xemgîn bûm, ew bû, wekî ez îdêalist bûm, lê ne rêalist.

Ez neaçixîyên xwe nadime progiramkirinê, lê xeberên Îsa bîr tînim, wekî li vê dinîyayê emê rastî zêrandina, cêribandina, telayê û dijwarîya bêm. Ev hemû tişt pareke (beşeke) jîyana li ser vê dinîyaêne, çawa bona bawarmenda, usa jî bona bêbawara. Feqet t'û neaçixîke li vê dinîyayê nikare zyanê bighîne me, eger em nava hizkirina Xwedêda bimînin, berên Ruhê Pîroz bidine kifşê.

BONA ZANEBÛNÊ: Em hela hê rêwîtîyên xweye qulixê berdewam dikin û eva îdî serê 25 sala ye, wextê ku em rastî gelek neaçixîya tîn. Wextê herdu konfêransên dawî, piştî berevbûna êvarêye li mêvanxanê, kilitên odên me derî venekirin. Min hela hê fem nekirîye, ku bona çî sîstêma mêvanxanêye (hotêlêye) kompyûtêrîyê, ya kilita, wî çaxî diguhêrin, wextê ku ode hela hê aza nebûne û ew yek gelek cara diqewime. Em sivderêda hîvîyê disekinin, hetanî ku kesek diçe cîyê rêgîstrasîyakirinê, ku kilitên nû bistîne û bêguman (bêfitîya) ew her dem bona wê yekê başxandinê dixwezî.

Niha em ji rêwîtîyên nekamil xemgîn nabin, çimkî em tiştêkî zanin, wekî ew yek pareke (beşeke) jîyana meye herroje ye. Kontrolkirina wan qewimadina ne îşê me ye, lê îşê me nîşandayîna nêzîkbûna xwedêtîyê ye hindava wandane.

SEBIR QEWATA BERXWEDANÊ DIDE

“Dêmek, çawa cimeta xwedêye bijartî [wekîlên Wîye bijartî], [yên] parzûnkirî, pîroz û gelekî hizkirîne, [nêzîkbûna wane ji Xwedê dayî heye], îsafa nerm, rehm, fikira şikestî, nazikayî, nerm [çi ku naweste û li ber cefên wededrêj teyax dike û qewat e, ku li ber wî hemû tiştê ku tê, bi şabûn teyax bike]”.

Kolosî 3:12, AMP

Ez gelek cara derheqa vê xeberêda difikirm, bona ku bînime bîra xwe, ku nava her halekîda ez gerekê nêzîkbûna çawa nîşan bidim. Ez dîsa tînime bîra xwe, wekî sebir ne ku karebûna hîvîyêsekinandinê ye, lê ew wextê hîvîyêsekinandinê karebûna nîşandayîna nêzîkbûna rast e.

SEBIR WEXTÊ CÊRIBANDINA PÊŞDA TÊ

“Birayên min, çawa şabûneke mezin hesabkin, gava hûn dikevine nava qezîya cêribandinên cûre-cûre.

Bizanibin û fem bikin, wekî cêribandin û cêribandina bawarîya we qewînbûnê û sebirê pêşda tînin.

Feqet bila qewînbûn û sebir karê kamil bikin, ku hûn bibine [merivên] kamil û bi temamî pêşda herin [bêyî t’u kêmasîya] û t’u kêmasîke we tunebe”.

Aqûb 1:2-4, AMP

Sebir berê Ruh e (binihêre Galatî 5:22), ya ku nava ruhê her merivekîda pêşda hatîye. Bona Xwedê gelekî girîng e (ferz e) ku cimeta Wî nava jîyanêda sebirê bide kifşê. Xudan dixweze, wekî meriv nava zarokên Wîda xeysetê Wî bibînin.

Nava serê Aqûb 1-da tê gotinê, wekî wextê ku em bighîjine kamilîyê, t’u kêmasîke me wê tunebe. Mîrêcin nikare merivê bi sebirêva tijîbûyî kontrol bike.

Nava wê beşêda usa jî tê dîyarkirinê, wekî em gerekê şabin, wextê ku dikevine nava halên dijwar, û em zaninin, wekî Xwedê nava meda sebirê bi wî cûreyî çê dike, kîjanê jî tercima Kîng Cêyms çawa “cêribandinên cûre-cûre” nav dike.

Min ji cêribandina xwe fem kir, wekî “cêribandinên cûre-cûre” nava minda sebir pêş xistin, lê berî her tiştî, wextê wan cêribandina tiştên xirab “derdiketine li ser avê”, yên mînanî kubarîyê, hêrsê, şorişê, nerazîbûnê û tiştên vî cûreyîye mayîn. Dihate texmînkirinê ku ez mecbûr bûm rastî van tiştên bihatama û wekî pirsên wana gerekê pêşîyê çêbûna, berê sebirê bidana zelalkirinê.

CÊRIBANDIN, YAN BÊFESALÎ?

“Ew ji çîyayê Horê livîyane berbi rîya ku dibe bera Sor, dora Êdovmêra çûn. Cimetê rûyê [cêribandinên] rêda sebira xwe unda kir [gumanbir bûn]”.

Jimar 21:4, AMP

Eger tê bîra we, tunebûna sebirê fikirdarîke çolê bû, rûyê kîjanêda îsraêlî 40 salî nava qûmistanêda gerîyan. Gelo cêribandinên ku rastî wana hatine, awqasî yên bi tirs bûn, yan ew wê yekêra yole nediçûn? Ez gumanim, wekî li cem geleka hemû tişt diha dijawr bûye, ne ku li cem yên mayîn, lê gelek cara em ji tiştên usa dikine nive-niv, wekî merivê gihîştî wê guhdarîyê nede ser tiştê usa.

Gelo meriv çawa dikaribûn biketana welatê Sozdayî, binelîyên li wan topraxa derxistana û bibûna xweyê wî welatî, eger sebira wan jî tunebû û li ber dijwarîyên biçûk jî teyax nedikirin?

Ez bang dikim, ku bi cûrê six tevî Ruhê Pîroz bixebitin, bona ku Ew nava weda berê sebirê bide pêşxistinê. Hûn çiqasî li ber Wî ber xwe bidin, awqasî şuxulkarîya weye werguhastinê, wê dirêj be. Hînî sebirê bin, wextê ku hûn cêribandinên cûre-cûrera derbaz dibin û hûnê bibînin, wekî jîyana we wî cûreyî tiştêkî nû dest tîne. Hûnê nava vê jîyanêda ne tenê teyaxkin, lê hûnê usa jî lezetê bibînin.

GIRÎNGÎYA SEBIRÊ Û QEWÎNBÛNÊ

“Çimkî hûn hewcê sebira qewîn û qewînbûnêne, bona ku hûn emirê Xwedê bînine sêrî, û bi kirina wê yekê wê bistînitn [û bi merdanî bijîn], çi ku sozdayî ye”.

Îbranî 10:36, AMP

Nava vê xeberêda tê gotinê, wekî bêyî sebirê û qewînbûnê emê nikaribin sozên Xwedê bistînin. Nava Îbranî 6:12-da tê gotinê, wekî wan soza emê bikaribin tenê bi bwarîyê û sebirê bistînin (KJV).

Merivê kubar gumana xwe dide ser karebûna xwe û dicêribîne progiramên xwe anegorî wedê xwe mîyaser bike. Merivê kubar dibêje: “Ez niha hazirim”. Merivê şikestî dibêje: “Xwedê diha baş zane û Ewê derengî nekeve”.

Merivê şikestî bi sebir hîvîyê ye. Ew bi xofa Xwedêva tijîbûyî ye, û qet nafikire jî, wekî ew dikare tiştêkî bi xwe bike. Lê merivê kubar dicêribîne peyî hev tiştêkî bike û ew hemû tişt badîhewa ye.

HER DEM NÎNE, WEKÎ RÎYA RAST DÛRAYA
HERE KURT E, YA KU DIBE BERBI MEREMÊ

“Heye rê, ya ku li ber mêriv rast e, lê dawîya wî, rêyên mirinêne”.

Gotinên Silêman 16:25

Em gerekê fem bikin, wekî nava dinîya ruhanîda her dem nîne, ku rîya rast di navbera me û cîyê sînorkirîda ya here kurt e, kuda em hazir dibin herin. Neniherî wê yekê, ew yek dikare bibe dûraya here kurte berbi tunebûnê.

Em gerekê hînî sebirkirinê bin û hîvîya Xudan bin, usa jî wî çaxî, eger tê texmînkirinê, wekî Ew me rêke usara dibe berbi meremê, ya ku dorêra dizvire.

Dinîya bi mesîhîyên bêbextva tijî ye, çimkî wana bi her cûreyî cêribandîye tiştêkî bikin, dewsa wê yekê, wekî ew gerekê bi sebir hîvîyê bûna, hetanî Xwedê ew yek bi cûrê Xwe û wedê qirarkirîda bikira.

Wextê ku hûn dicêribînin hîvîya Xwedê bin, mîrêcin wê êrîşê bîne ser fikira we û wê dewê bike ku hûn tiştêkî bikin. Ew dixweze we def bide, ku hûn anegorî xwestina bedenê bikin, çimkî ew zane, wekî beden t’u karê nade (binihêre Yûhenna 6:64, Romayî 13:14).

Çawa ku me îdî dît, bêsebirbûn nîşana kubarîyê ye û tiştê tektenêyî dijî kubarîyê şikestîbûn e.

BI XWE TA BIN Û HÎVÎYA XUDAN BIN

“Dêmek, bi xwe, bin destê Xwedêyî Zor ta bin [nava qîmetkirina xweda bi nimizkirina xwe], ku Ew wextêda we bilind bike”

A Petrûs 5:6, AMP

Gotina “bi xwe ta bin” nade kifşê, wekî em gerekê derheqa xweda xirab bifikirin. Fikira vê gotinê ew e: “Nefikirin, wekî hûn dikarin hemû pirsên xwe bi xwe helkin”.

Dewsa wê yekê, ku her tiştî bi kubarî hildine destê xwe, em gerekê hîn bin, ku bi xwe bin destê Xwedêyî zor ta bin, çimkî dema rastda Ewê me bilind bike.

Çaxê em hîvîya Xwedêne û em naxwezin anegorî xwestina bedenê bişuxulin, bi wê yekê em “ez”-ê xwe dikujin”. Em destpê dikin bona xwestinên xwe bimirin û bona qirara Xwedê em sax dibin.

Em her dem gerekê bi cûrê şikestî wê yekê bikin, çî ku Xwedê dibêje me, û bi wê yekêva tevayî li cem me gerekê xofa Xwedê hebe, ku em anegorî xwestina bedenê nekin. Bîra xweda xweykin, koka bêsebirbûnê kubarî ye. Merivê kubar dibêje: “Min nedine sekinandinê: ez layîqî wê yekê me, wekî gerekê hemû tiştî carekêra bistînim”.

Wextê ku hûn nava pirsê undakirina sebirêda cêribandinê texmîn dikin, ez şewirê didime we, ku hûn van xebera bêjin: “Xudan, ez qirara Te û wedê Te dixwezim. Ez naxwezim pêşîya Te bikevim, û ne jî dixwezim derengî bikevim. Bavo, alî min bike, wekî ez bi sebir hîvîya Te bim”.

Serê
21-ê

*Diqewime kirina min şaş e,
lê ew yek neheqîya min nîne.*

Fikirdarîya çolê hejmar:6

Diqewime kirina min şaş e, lê ew yek neheqîya min nîne.

Serê
21-ê

Fikirdarîya çolê hejmar:6

Wextê ku meriv bona kirinên xwe naxweze cabdarîyê hilde ser xwe û neheqîya hemû pirsgirêka davêje ser yekî mayîn, ew yek menîke mezine bona jîyana çolê.

Em dikarin heyîna vê pirsgirêkê nava rûpelên dîroka merivatîyêye ewlinda bibînin. Wextê ku li baxçê Êdêmê

Adem û Hêwa mecbûr bûn bona gunehên xweyê kirî cabê bidin, wana destpê kir hevdu, Xwedê û mîrêcin gunekar bikin û bi wê yekê cêribandin bona kirinên xwe ji cabdarîya xwe paşda bisekinin.

“Û Adem got: “Ew jina ku te da min, ku tevî min be, ewê ji wê dare [berê wê] da min, û min xwer...” Û jinê got: “Mer ez xapandim [fêlbazî kir, ez dame şaşkirinê], û min xwer”.

Destpêbûn 3:12,13, AMP

YÊ GUNEKAR HÛN IN

“Lê kulfeta Abram, Sarayê, wîra zarok nedianîn, û carîyeke Sarayêye misirî hebû, navê wê Hacer bû. Û Sarayê gote Abram: “Awa xudan qedexe kir, ku ez zara bînim, rabe here cem carîya min: diqewime ji wê lawekî bistînim”. Û Abram guh da Sarayê. Û jina Abram Sarayê, peyî deh salara, ku Abram emirê xwe li welatê Kenanêda derbaz kir, carîya xweyê misirî, Hacer anî kire jina mêrê xwe Abram.

Û ew çû cem Hacerê, ya ku hemle bû. Wextê ku ewê dît, ku hemle ye, xanima wê li ber çeva reş bû.

Û Sarayê gote Abram: “Ev qara min gunehkarîya te ye, min carîya xwe kire hembêza te û ewê dît ku hemle ye, ez li ber çevê wê reş bûm. Bila Xudan di navbera min û teda dîwanê bike”.

Û Abram gote Sarayê: “Va ye, carîya te destê teda ye, dilê te çawa dixweze, usa jî bike”. Û Sarayê ew tengav kir û ew ji Sarayê revî çû”.

Destpêbûn 16:1-6, NKJV

Ew qewimandina ku sala pêşda di navbera Adem û Hêwayêda qewimî bû, niha dikarin nava jîyana Abram û Sarayêda bibînin. Ew ji hîvîyêsekinandina bona Xwedê westîya bûn, wekî rojekê Ewê sozê Xwe biqedîne û wê zarokê pêşkêşî wan bike, feqet wana anegorî xwestina bedenê kirin, çawa ku wana rast hesab kir. Wextê ku ev hemû tişt îdî xirab pêşda çû û cêrge pirsgirêk pêşda anîn, wana destpê kir hevdu gunekar bikin.

Pêşda tiştên vî cûreyî nava malbeta meda qewimîne, di navbera min û malxwê minda. Dihate texmînkirinê, wekî me her dem ji helkirina pirsgirêkên nava jîyanêda pêşdahatî direvin û em naxwezin li çevê rastîyê binihêrin.

Baş tê bîra min, ku min çawa li Xwedê dua dikir, ku Dêyv bihata guhartinê. Wextê ku min Încîl dixwend, min diha zêde kêmasîyên wî didîtîn, û min didît, ku ew çiqasî hewce bû, ku ew bihata guhartinê. Wextê ku min dua dikir, Xudan minra xeberda: “Coys, pirsgirêk ne Dêyv e... lê tuyî”.

Wê yekê ez tune kirim. Ez digirîyam û digirîyam. Ez sê roja ser hev digirîyam, çimkî Xwedê nîşanî min dida, ku jîyana tevî min, ya malekêda çi dide kifşê. Ewî nîşanî min da, ku ez çawa dicêribînim hemû tiştî kontrol bikim, ez çawa nerazîme û gazina dikim, razîkirina min çiqasî dijwar e, ez çiqasî xirab difikirim û gelek tiştên mayîne wî cûreyî. Ew yek berbi kubarîya min derbeke mezin bû, lê ew usa jî destpêka dasekinandina min ya ruhanîye nava Xudanda bû.

Mînanî geleka, usa jî ez, min nava hemû tiştîda yên mayîn gunehkar dikirin. Ez difikirîm, wekî menîya kirina mine xirab xeyda min e, ya ku ji zarotîyê nava minda mabû, wextê ku ez bi bêrehmî dabûme zêrandinê. Feqet Xwedê got: “Diqewime, wekî xeyd û nuxsankirin menîya kirinên te ne, lê bila ew bona te nebîne afûkirin, wekî tu dîsa usa bimînî û neyêyî guhartinê”.

Mîrêcin cedandina nahêvşîne bona ku nava fikirên meda kela çê bike, yên ku wê dijwarîya pêşda bînin, ku em rastîyê bibînin. Lê ew zane, wekî rastî wê me aza berde.

Ez texmîn dikim, wekî tişteki gelekî bi tajan tune, wextê ku tu rû bi rû li ber xwe û rastîya derheqa kirina xweda disekinî. Ew yek usa dijwar e, wekî gelek meriv ji wê yekê direvin. Gelekî hêsa ye, wextê ku tu rastîya derheqa yekî mayînda dibhêyî, lê wextê ku ew ronahiyê davêje li ser jîyana te, tu wê yekê diha çetin dibî.

EGER...

“Û cimetê destpê kir dijî (miqabilî) Xwedê û Mûsa xeberde: “Bona çî we em ji Misirê derxistin, wekî li vê qûmistanê qir bin? Çimkî ne nan heye, ne jî av. Medê me ji vê xwerina hane pûç [nexweş, neqewîn] li hev dikeve”.

Jimar 21:5 AMP

Çawa ku tê bîra we, îsaraêlî nerazî bûn, wekî hemû pirsgerêkên wan rûyê Mûsa û Xwedêda bûn. Ew ji her cabdarîke bona wê yekê, wekî ew awqasî dirêj li qûmistanê bûn, direvîyan. Xwedê nîşan da, wekî ev yek fikirdarîke çolêye hîmlî bû, rûyê çida ew 40 sala li qûmistanê gerîyan.

Eva usa jî ji wan menîya ye, wekî ez nava jîyana xweda bi sala ser hev dora wî çiyayî dizvirim. Navnîşa xweafûkirinên min, ku bona çî kirina min awqasî xirab û gelekî dirêj bûn”:

“Eger zarotîyêda ez awqasî nuxsankirî nîbûma, ezê niha awqasî xirab nîbûma”.

“Eger zarokên min diha zêde alî min bikin, ezê diha zêde baş bim”.

“Eger Dêyv rojên şemîya neçe golfê bilîze, ezê wîra awqasî hişk nîbim”.

“Eger Dêyv diha gelekî minra qise bike, ezê awqas gelekî xwe tenê texmîn nekim”.

“Eger Dêyv bona min diha zêde pêşkêşa bikire, ezê diha zêde bextewar bim”.

“Eger ez awqas gelekî nexebitim, ezê newestim û medekirî nîbim” (bo wê yekê ez ji xebatê derketim, lê paşê...”.

“Eger ez bikaribim ji malê diha zêde derbikevim, ezê awqasî aciz nebim”.

“Eger perên me diha zêde hebûna...”.

“Eger mala meye şexsî hebûya...” (bo wê yekê me mala nû kirî, lê paşê...).

“Eger awqas heqdayîn tunebûna...”.

“Eger cînarên diha baş, yan jî gelek hevalên me hebûna...”.

Eger... Eger... Eger... Eger... Eger... Eger... Eger... Eger...

LÊ...

“Û Xudan gote Mûsa: “Mêra bişîne, ku [bona we] welatê Kenanê lêkolîn bikin, kîjanî Ez didime îsraêlîya. Ji her eşîreke wan mêrekî bişîne, ku ew nava eşîra xweda serwêr yan rêber bin”. Bi vî cûreyî, Mûsa bi emirê Xudan ji qûmistana Paranê cesûs şandin, hemû jî mêt, yên ku nava îsraêlîyada rêber bûn.

Û piştî lêkolinkirina-lênihêrandina 40 rojî ew paşda vegeîyan.

Ew li cem Mûsa û Harûn û tamamîya eskerê îsraêlîya qesidîn, yên ku li qûmistana Paranê bûn, Hadêşê, û her kesî xebera xwe got û berên wî welatî dane kifşê.

Wana gote Mûsa: “Em çûne li wî welatî, kuda te em şandin: li wî welatî, bi rastî, şîr û hingiv dikîşe. Ev in berên wê.

Feqet merivên ku li wir dijîn, qewatin, lê bajarên wan qewînin û mezinin: xêncî wê yekê me li wir kurên Enaq dîtin” [bejînbilind û qewat]”.

Jimar 13:1-3, 25-28, AMP (xeberên cudakirî yên xudana kitêbêne).

“Eger” û “lê” ew xeberên hizkirîne, bi kîjana mîrêcin nava fikira meda me dide şaşkirinê. 12 cesûsên ku şandibûne welatê Sozdayî paşda vegeîyan û tevî xwe çiqleke tirîyaye usa mezin anîn, ya ku gerekê ji aliyê du mêtada bihata anînê, lê çî jî hebe, hesabê ku wana raberî Mûsa û cimê kirin, yê nebaş bûn.

Tenê xebereke “lê” ew tune kirin. Wana gerekê çevên xwe ne ku li ser pîrsgirêkên heyî xweyî bikirana, lê li ser Xwedê.

Rûyê pirsada em bin dikevin, çimkî em difikirin, ku pîrsên me diha mezinin, ne ku Xwedê. Menî dikare ew be jî, wekî em bi dijwarî rastîyê qebûl dikin. Em guman nînin, wekî Xwedê dikare me biguhêre û bi wê yekê em diha zêde xwe ji xwe vedişêrin, lê ne ku em xwe usa dibînin, çawa ku em bi rastî hene.

Niha bona min awqasî jî dijwar nîne, li ber rastîyê rû bi rû bisekinim, bona naskirina xwe, wextê ku Xwedê nava minda xebatê dike, çimkî ez zanim, wekî Ew dikare min biguhêre. Min îdî dîtîye, ku Ewî nava minda çî kirîye, û ez bi temamî li Wî amin im. Feqet, nava jîyana minda wextê salên avîtina gavên ewline bona naskirina wî, ew yek gelekî dijwar bû. Piranîya jîyana xwe min bi xwe veşartina ji vî yan ji wî tiştî derbaz kiribû. Ez awqasî dirêj nava tarîyêda mabûm, wekî bona min dijwar bû, derketama berbi ronahiyê.

RASTÎYA MERIVÊ HUNDUR

“Min were rehmê, Xwedê, weke hizkirina Xweye qewîn, anegorî rehma Xweye nazik û dilrehmîyê, bêolîtîyê min dayne alikî.

Min bi temamî [û gelek cara] ji nehqîyên min û ji guneh bişo û min paqij bike, bi temamî ji gunehên min, min pîrozke.

Çimkî ez bêolîtîyên xwe fem dikim û wana nas dikim: gunehên min her dem li ber minin.

Li ber Te, tenê himberî Te min guneh kir û xirabî li ber çevê Te kir, usa ku Tu rast î qirara Xweda û paqij î dîwana Xweda.

Awa, ez neheqîya xwe tînim: dayîka min neheq bû, ya ku bi gunehêva ez anîme vê dinîyayê [û ez jî gunekar im].

Awa, Tu dilê mêrivda rastîyê dixwezî: dêmek usa bike, ku ez kûraya dilê xweda serwaxtîyê bizanibim”.

Zebûr 51:1-6, AMP

Nava vê beşa Zebûrada Dawidê padişa ji Xwedê rehmê û afûkirinê dixweze. Çimkî Xudan dilê wîda xebat kiribû û gunehê wî nîşanî wî dabû, yê ku ewî tevî Bêrsabê kiribû û mêrê wê jî kuştibû.

Dixwezin bawar bikin, dixwezin bawar nekin, lê Dawid ev xeber piştî saleke kirina wî gunehî nivîsîbû: nava wî wedeyîda ewî t’u cara derheqa wî gunehîda nefîkirîbû û mezinaya wî gunehî fem nekiribû. Ew li ber bawarîyê rû bi rû nesekinîbû û çiqas ew jî kirina wê yekê revî bû, awqasî jî ew nikarîbûye tobekirina rast bijî. Û çiqas wede ewî tobe nekirîye, awqas wede jî Xwedê ew afû nekirîye. Xebera Zebûraye 6-a gelekî qewat e. Ew dibêje, wekî Xwedê dixweze dilê mêrivda rastîyê bibîne, wekî eger em dixwezin ku duayên Xwedê li mebin, em gerekê tevî Wî bêqelp bin, girêdayî me û gunehên kirîra.

XWEMÏKURHATIN, PAŞÊ AFÛKIRIN

“Eger em dibêjin, ku em gunehkar nînin [naxwezî naskin, wekî em gunekarî], em xwe dixapînin, û rastî [ya ku nava Mizgînîyadane] nava meda nîne [nava dilên meda najîn].

Eger em [aza] qebûl dikin, wekî me guneh kirîye û em gunehên xwe xwe mikur tîn, Xwedê amin e û rast e [bi heyîn û sozên Xwe rast e] bona ku gunehên me afû bike [ku me ji wan yeka aza bike] û [her dem] me ji wan neheqîya paqij bike [her tişt, çi ku ne anegorî qirara Wî ye, eger ew merem be, fikir be, yan jî kirin be].

Eger em dibêjin [îzbatî], wekî t’u gunehên me tunene, usa ye em dijî (miqabilî) Xebera Wîne û Wî dikine qelp û derewîn û Xebera Wî nava meda nîne [berbirîbûna Mizgînîyêye xwedêtiye dilên meda nîne]”.

A Yûhenna 1:8-10, AMP

Xwedê hazir e carekêra me afû bike, eger em bi bêqelpî tobe dikin. Lê em nikarin bi bêqelpî tobe bikin, eger em rastîyê nanihêrin û kirinên xwe fem nakin.

Eger em qebûl dikin, ku me şaşî kirîye, lê em carekêra dicêribînî xwe afû bikin, wî çaxî ew yek ne anegorî cûrê Xwedêyî qebûlkirina rastîyê ye. Meriv usa ye, ku dixweze xwe û kirên xwe afû bike, lê Încîlêda tê gotinê, wekî afûkirina tek-tenê nava Îsa Mesîhdane (binihêre Romayî 3:20-24). Piştî gunehkirinê em li ber Xwedê dikarin afûkirî bisekinin, ne ku bi saya afûkirinên xwe, lê tenê bi saya xwîna Îsa.

Tê bîra min, wextê ku carekê cînarekî minra têtêfon kir, û hîvî kir, ku wî bighînimê bankê, hetanî bank nehatîye dadanê, çimkî avtomaşîna wî xirab bibû. Ez “bi îşên xweva” mijûl bûm û xwestina min tunebû, ku îşê xwe bihêlim û bo wê yekê jî min gelekî sert ew înkâr kir. Wextê ku min têtêfon danî, min fem kir, ku min tişteki çiqasî xirab kir, wekî ez gerekê wîra têtêfon bikim, baxşandinê bixwezim û wî bibime bankê.

Fikira min bi xweafûkirinên cûre-cûreva tijî bû, bi kîjana ez hazir dibûm, ku min caba xweye xirab şirove bikira: “Ez ne baş bûm...”, “Wî çaxî ez mijûl bûm...”, “Îro bona min ne rojeke usa açix bû...”.

Feqet dûraya dilê xweda min texmîn dikir, ku çawa Ruhê Pîroz dibêje min: “Xweafûkirinê negere, awqasî wîra têtêfon bike û bêjê, ku

tu şaş bûyî û bona kirina te afûkirin tune, baxşandinê ji wî hîvî bike û pirske, ku gelo ewê îzinê bide, ku wî bibî bankê”.

Ez tenê dikarim bêjim, wekî ew yek hêsa nîbû. Bedena min dixwest bikira qîrîn. Bi xebera gotî, min texmîn dikir, ku çawa nava fikira minda tiştêkî biçûk xwe dîwara dixwe û divedine cîhekî bibîne û li wir xwe veşêre. Feqet ew yek tiştê bûyînê nîne, ku meriv xwe ji rastîyê veşêre çimkî rastî ronahî ye.

RASTÎ RONAHI YE

“Destpêkêda [berî her tiştî] Xeber [Mesîh], û Xeber tevî Xwedê bû, û Xeber Xwexwe Xwedê bû.

Ew destpêbûna tevî Xwedê bû.

Her tişt bi Wî efrîn, û bêyî Wî t’u tişt neqewimî, çi ku qewimî.

Kanîya jîyanê Ew bû û jîyan jî ronhiya meriva bû.

Ronahî tarîstanêda şewq dide, çimkî tarîstanê t’u cara Pê nikaribûye [Ew netemirîye, nehatîye derxistinê, yan jî kişandinê, û Ew ji aliyê tarîstanêda nayê qebûlkinê].”

Yûhenna 1:1-5, AMP

Rastî sîliheke here zor e dijî (miqabilî) padişatîya tarîstanê. Rastî ronahî ye û Încîlêda tê gotinê, wekî tarîstanê t’u cara ronahî zeft nekirîye û wê t’u cara nikaribe ronahiê zeft bike.

Mîrêcin dixweze hemû tiştî nava tarîstanêda veşêre, lê Ruhê Pîroz dixweze wana bide ronahîkirinê û tevî wana usa bixebite, ku em bikaribin bi rastî azad bin.

Îsa got, wekî rastî wê me aza berde (binihêre Yûhenna 8:32), lê rastî Ruhê Rastîyê eyan dike.

RUHÊ RASTIYE

“Hê gelek tişt hene, ku Ez wera bêjim. Lê niha hûn nikarin wana bibin, yan jî hildine ser xwe, yan jî niha wana fem bikin.

Lê gava Ew, Ruhê Rastîyê [Ruhê ku Rastîyê tîne] bê, Ewê nava rastîyêda [bi temamî, rastîya xurû] rêberîyê li we bike”.

Yûhenna 16:12,13, AMP

Îsa dikaribû temamiya rastîyê şagirtên Xwera eyan bikira, lê Ewî zanibû, wekî ew hela hê hazir nînin. Ewî digot, wekî ew gerekê hîvîyê bisekinin, hetanî ku Ruhê Pîroz ji Ezmîn peyîyabe û tevî wan, dilê wanda bijî. Piştî wê yekê, wextê ku Îsa çû Ezmîn, Ruhê Pîroz hate şandinê, bona ku Ew tevî me bixebite, me bona rûmeta Xwedê hazir bike û bona ku Ew bi destî me bê kifşê.

Feqet Ruhê Pîroz çawa dikare nava jîyana meda bixebite, eger em naxwezin li ber rastîyê bisekin. Navê Wî “Ruhê Rastîyê”-ye û meremê qulixa Wî ye hîmlî ew e, ku alî me bike, ku em rastîyê qebûl bikin û berbi rastîyê rêberîyê li me bike, çimkî tenê rastî dikare me aza berde.

Diqewime, wekî berê we êşandine yan jî tiştê qewimîye, û ew yek îro bûye menîya nêzîkbûna weye şaş, lê îzinê nedin, wekî ew bona we bibe afûkirin û nehêle ku hûn bêne guhartinê.

Piranîya pirsgirêkên kirinên minva girêdayî ji wê yekê pêşda hatine, wekî ez bi bedenî hatime bêhurmetkirinê û nuxsankirinê û ji nêzîkbûna merivaye bêrehm zêriyame. Feqet tabîya min tenê rûyê wê yekêda nedihate guhartinê, çimkî min paşeroja xwe çawa afûkirin dida xebatê. Ew tişt mînanî wê yekê ye, ku tê bêjî tu dijminê xwe diparêzî û dibêjî: “Ez miqabilî vê yekê me, û hema rûyê wê yekêda jî ez vî tiştî bernadim”.

Hûn sedî sed dikarin ji her girêdanekê aza bin. Wera lazim nîne ku hûn 40 salî li qûmistanê bigerin. Yan jî eger we îdî 40 salên xwe li qûmistanê xerc kirine, çimkî we nizanibûye, wekî menîya wê yekê fikirdarîya çolê ye, wî çaxî roja îroyîn dikare bibe roja qirarkir.

Ji Xwedê hîvî bikin, ku rastîyê nîşanî we bide, ya derheqa jîyana weda. Û dema ku Ew wê yekê bike, wê yekê xweykin. Bi rastî ewê hêsa nîbe, lê bîra xweda xweykin, ku Ewî soz daye: “Ezê t’u cara we nehêlim, û t’u cara we bernedim” (binihêre Îbranî 13:5).

Hûn li ser rîya derketina ji qûmistanêne, lezetê ji welatê Sozdayî bibînin.

Serê
22-a

*Ez awqasî bêbextim:
gunê min li min tê, çimkî
ez bi jîyana feqîr dijîm.*

Fikirdarîya çolê: hejmar 7

*Ez awqasî bêbextim: gunê min li
min tê, çimkî ez bi jîyana feqîr dijîm.*

*Serê
22-a*

Fikirdariya çolê: hejmar 7

Îsraêliya gunê xwe gelekî xwe dianîn. Her dijwarîk dibû menîke nû bona xweafûkirinê û kirina şînêye bona jîyana wane xirab.

Tê bîra min, wextê ku carekê Xudan minra xeberda, dema ku min “bi xwe gunê xwe xwe dianî”. Ewî got: “Coys, tu dikarî yan feqîr bî, yan jî qewat bî, lê herdu tu nikarî bibî tiştên tevayî hildayî”.

“Û temamiya esker bi dengê bilind girîya, û [wana] wê şevê kire qîrîn. Temamiya îsraêliya bîna xwe teng kirin û li ser halê xwe şîn kirin.”

Jimar 14:1,2 AMP

Eva têmeke cuda ye, derheqa kîjanêda minê nexwesta bi sivikayî derheqa wêda xeberda. Tiştêkî girîng e fem bikin, wekî em nikarin wî gunehîra bilîzin, wextê ku gunê xwe xwe tînin, û bi wê yekêva tevayî bi qewata Xwedê pêşda herin.

DIL BIDINE BER HEV Û HEVDU QEWÎN BÏKIN

“Dêmek, dil bidine ber hev [şîretkin, dil bidine ber] û hevdu qewînkî [qewatkin û çêkin], çawa jî hûn dikin.

A Têsalonîkî 5:11, AMP

Bona min gelekî dijwar bû ji wê yekê, wextê ku gunê min li min tê, paşda bisekinim: bi salên dirêj min ew yek kiribû, bona ku wextê jîyana mine dijwar ez ber dilê xweda bihatama.

Wextê ku yek me dide xeydandinê, yan jî em aciz bûne, mîrêcin destpê dîke bin guhê meda derewa bike piste-pist, ku çiqasî bêisafî û neheqî nêzîkî me bûne.

Bona we ew yek tenê bes e ku serê weda fikirên çawa dizvirin û hûnê carekêra fem bikin, ku çawa dijmin wê yekê dide xebatê, we nava diltiyêda (hêsîryêda) xweyke.

Feqet, Încil îzinê nade, ku em azayê bidine wî gunehî. Dewsa wê yekê em gerekê nava Xudanda dil bidine ber hev û hevdu qewîn bikin.

Pêşkêşeke xwedêtiyê heye û ew yek merivhizî ye, bi alîkariya kîjanê em jîyana xwe didin ku zêrandinên yên mayîn bidine sivikkirinê. Lê wextê ku gunê meriva xwexwe li wan tê, ew jî cûrê merivhizîyêyî navhevxiştî ye.

Wextê ku em bi xwe gunê xwe li xwe tînin, em wê yekê hildidin, çî ku Xwedê bona dayîna bo meriva têra dîtibû û em wê yekê bona kara xwe didine xebatê.

Hema ew yek usa jî derheqa hubêdane. Nava xebera Romayî 5:5-da tê gotinê, wekî hizkirina Xwedê bi destî Ruhê Pîroz dilên meda hatiye raxistinê. Ewî ew yek kirîye, ku em bikaribin fem bikin, ku Xwedê çiqas gelekî me hiz dike û, wekî em jî dikarin yên mayîn hiz bikin.

Wextê ku em hizkirina ji aliyê Xwedêda têradîtî bona kara xwe didine xebatê, wî çaxî ew yek dibe xwehizî, ya ku me dide tunekirinê. Bêguman (bêfitîya) em gerekê xwe hiz bikin, efrandina Xwedê û girtina qedirê xwe qîmet bikin, lê nava wê yekêda gerekê balans hebe. Xwehizîya gelekî pirsgirêka mezin e. Wextê ku meriv gunê xwe xwe tîne, ew yek pûtparistî ye, çimkî em bi temami li ser xwe tînin merkezbûnê. Ew yek guhdariya “ez”-ê û hindava hewceyî û xemên xweda dide sertkirinê, û ew jî me mecbûr dike ku em bi jîyana sînorkirîva bijîn.

DERHEQA YÊN MAYÎNDA BIFIKIRIN

“Tenê li kara xwe negerin, lê bila her kes li kara hevalê xwe jî bigere”.

Filîpî 2:4

Van axirîya civîneke min nişkêva hate elamkirinê, ku wê derbaz nebe. Evê yekê acizîke biçûk pêşda anî. Berê tiştên wî cûreyî dilê minda tişteki usa pêşda dianîn, ku gunê min li min dihat, pêra jî rexnekirin, fikirên xirab pêşda dihatin. Niha ez hînbûme, ku wextê qewimandinên wî cûreyî ez xwe diha rihet xweykim: diha baş e t’u tiştî nebêjim, ne ku tiştên şaş bêjim.

Min rihetya xwe da kifşê, Xwedê jî destpê kir halên wî cûreyî ji alîkî mayîna bide kifşê. Ew meriv nikaribûne cîyê anegor dest bixin, bona ku berevbûn bê derbazkirinê. Xwedê nîşanî min da, ku ew çiqasî aciz bibûn. Ewana xwe hazir kiribûn û hîvîya berevbûna me bûn...

Ji wê prosêsê, ya wextê ku meriv gunê xwe xwe diîne, gelekî hêsa ye meriv derkeve, wextê ku em ne ku ji aliyê fikira xweda wê yekê dinihêrin, lê ji aliyê fikira yên mayînda. Wextê ku meriv gunê xwe li xwe tîne, meriv wî çaxî tenê derheqe xweda difikire, lê ne ku derheqa yên mayînda.

Gelek cara em cefê didine xwe û dicêribînin nava merivada sîmpatîyayê pêşda bînin. Belê, wextê ku gunê mêriv li wî tê, ew yek ji aliyê mîrêcinda tela hîmlî ye û cûrekî wîyî hizkirî ye, û bi kirina wê yekê em dîsa li qûmistanê dimînin. Eger em gelekî guhdar nîbin, wî çaxî em dikarin wê yekêva bîn girêdanê.

Xeyset yan jî girêdan rêaksîya ye, ya ku bi mîxanîkî hindava tiştekîda dişuxule, kîjan xeysetê destanî ye, yê ku paşê dibe xeysetê hertimî.

Hûn çiqas wede li ser wê prosêsê xerc dikin, wextê ku gunê we li we tê? Hûn çawa caba acizîya didin?

Şexsê mesîhî cuda ye, çimkî wextê ku ew acizbûyî ye, ew dikare wê acizîyê teslîmî Xwedê bike. Tevî Xwedê her dem jî mecala destpêkirina careke mayîn heye. Lê wextê ku gunê me li me tê, wî çaxî ew yek me bi xelegên paşerojêva xweyî dike.

T ÎŞTÊ KEVIN BERDE Û ÎZINÊ BIDE XWEDÊ, KU YÊ NÛ BIKE

“Tiştên berê bîr neynin, tiştên kevin neynine bîra xwe, çimkî Ezê yê nû bikim, yê ku wê niha eyan be, û hûn gerekê naskin: gerekê rê qûmistanêva vekim û axa neavdayîda gerekê çema bidime kişandinê”.

Îşaya 43:18,19, AMP

Salên dirêj ez nava gunexweanîna jîyame. Ew yek bibû menîya girêdana min. Ji her acizîkê rêaksîya mine ewlin gunexweanîn bû. Mîrêcin carekêra mejûyê min bi fikirên şaşva tijî dikir, min îdî

nikaribû fikirên xwe kontrol bikira, ez usa difikirîm, çi ku mejûyê minda pêşda dihat. Ez çiqasî gelekî wî cûreyî difikirîm, awqasî gelekî gunê min li min dihat.

Gelek cara ez serhatîyên ji salên zewaca meye pêşin gilî dikim. Ji wana yek ev e: her yekşem, wextê lîstikên fûtbolê Dêyv dixwest bi têtêvîzyonê hemû lîstika temaşe bike. Eger ew ne êtapa fûtbolêye wî çaxî bû, usa ye êtapeke mayîn dibû. Dêyv ji wê yekê lezetê distîne, lê hewaskarîya min ya hindava wê yekêda tune. Ew hemû lîstika hiz dike, yên ku topêva girêdayîne, û her dem jî ev cûrê sportê ewî hizkirine, hela pêşîya naskirina me.

Carekê ez li ber wî sekinîm û min vekirî gotê: “Dêyv, bi rastî ez ne başim: tê bêjî ezê niha bimirim”.

Ewî qet li min jî nenihêrî, berê wî alîyê têtêvîzyonê bû û ewî gote min: “O! baş, delala min”.

Min gelek yekşemên hêsketî û wextê kîjana gunê min li min hatîye, derbaz kirine. Min her dem destpê fikir malê paqij bikim, wextê ku ser Dêyv hêsketî bûm. Niha ez zanim, wekî bi kirina wî cûreyî min dicêriband dilê Dêyvda texmînkirina neheqîyê pêşda bianîya, wextê ku ewî wî çaxî ji jîyanê lezet didît, lê min jî xwe bêbext texmîn dikir. Bi seheta ez mînanî bagerê nava malêda diçûm-dihatim, min reqînîya derîya û pencera dianî, li wêderêra derbaz dibûm, li kîderê ewî lîstikên xweye hizkirî temaşe dikirin, bi maşîna tozhildanê deng dikirine malê û wî cûreyî min prosêsa paqijkirina malê werguhêzî ya têtatroyê dikir.

Bêguman, min dicêriband guhdarîya wî bianîya ser xwe, lê ewî çetin ez didîtîm. Ez bi bêqewat diketime oda avxwekirinê, li ser erdê wir rûdiniştîm û digirîyam. Çiqasî zêde ez digirîyam, awqasî zêde gunê min li min dihat. Paşê Xwedê li min derheqa wê yekêda eyan kir, ku bona çi jin hîmlî dikevîne oda avxwekirinê digrin. Ewî got, wekî ew cî bi wê yekêva fesal e, ku li wir neynîka mezin heye. Piştî girîyê xwe ew ji erdê radibin û wedekî dirêj xwe neynîkêda dinihêrin û tèn ser wê fikirê, ku ew çiqasî gunene.

Bi rastî, piştî girî ez gelekî xirab tême kifşê û wextê ku ez neynîkêda li xwe dinihêrim, girîyê min diha gur dibe. Peyî wî hemû tiştîra, ez tiragêdîya xweye dawîyê li oda mêvana dilîzim, li kîderê Deyv rûniştî ye, bi gavên hêdî dikevime hundur û bi nihêrandina feqîr derbaz dibim. Ew dikare nişkêva berê xwe bide alîyê min, lê tenê bêje: “Eger tu diçî aspêjxanê, hîvî dikim ku tu fîncaneke çaya sar minra bînî”.

Fikira vê serhatîyê ew bû, wekî ev mêtod naxebitin. Bi vî cûreyî cêribandina xweafûkirinê, ez nexweş dexistim, çimkî temamiya qewatên min li ser tiştên şaş xilaz dibûn.

Tenê Xwedê dikare bi qewata destê Xwe meriva aza bike û wana biguhêre. Tenê Yê herî zor karibû Dêyv bide femkirinê, ku awqasî progirmên sportê temaşe neke. Çiqasî zêde ez hîn bûm gumana xwe bidime ser Xwedê û min terka wê yekê da ku gunê xwe li xwe bînim, wextê ku tişteke bi xwestina min nîbû, awqasî zêde Dêyv nava pîrsa temaşekirna progiramên sportê balanskirî bû.

Ew hela hê hiz dike wan progirama temaşe bike, lê niha ew program hêrsa min ranakin. Wan seheta ez bi tiştên xweye hizkirîva mijûl dibim. Û eger ez hewceme ku tişteke mayîn bikim, ez ne ku bi hers, lê bi cûrê nazik ji Dêyv hîvî dikim, û gelek cara ew bi hazirî progiramên xwe diguhêre. Bêguman tiştên başqe jî diqewimin, wextê ku tişteke ne bi xwestina min dibe. Û wextê ku ez texmîn dikim, wekî tiştên berê dicêribînin serên xwe bilind bikin, ez carekêra destpê dikim, dua bikim: “Xwedê, alî min bike, ku ez vê cêribandinêra derbaz bim. Ez naxwezim careke mayîn dora vî çîyayîra bizvirim”.

Serê
23-a

Ez layîqî duayên Xwedê nînim.

Fikirdariya çolê: hejmar 8

“Xwedê tevî îsraêliya, pêşiya wê yekê ku wê rêberîya wanaye nava Êrdunêra berbi welatê Sozdayî bikira, tiştêk dikir, hetanî ewê bona zeftkirina bajarê ewlin Yêrikovê hazir bûna.

Xudan emir kir, ku hemû mêrên Îsraêlê

bêne sunetkirinê, çimkî ew yek 40 salî nehtibû kirinê, çimkî ew nava qûmistanêda digeriyan. Vê yekê ji wana dewa gurêkirinê dikir, bona wana gerekê bibûya nîşanek, wekî ew gerekê ji îşên bedenê, rêyên dinîyayê paşda vegeyîyana û bona Xwedê qirar qebûl bikirana, ku li ser rîya nû bijîn.

Piştî sunetkirinê, xudan gote Yêşû, wekî niha ew eyba Misirê ji ser cimeta xwe “hildide”.

Nava beşa 6-da, ya kitêba Yêşû, piştî çend xebera ew serhatî destpê dibe, ku çawa Xwedê rêberîyê li lawên Îsraêlê dike, ku ew altkin û bajarê Yêrikovê zeftkin. Gelo bona çî pêşda lazim bû eybê ji ser wan bide hildanê? Eyb çîye?

ŞIROVEKIRINA EYBÊ

Xebera “eyb” dide kifşê “gunehkarî... sosretî: şerm”. Wextê ku Xwedê digot, wekî wê ji ser îsraêliya eyba Misirê hilde, Ewî tiştêk dida kifşê. Misir sîmvola dinîyayê ye. Bi sala ser hev meriv li dinîyaê dijîn û piştî wê yekê em hemû hewcene, ku eyba vê dinîyayê ji ser me bê hildanê.

Rûyê wan tiştada ku nava jîyana minda hatine kirinê texmînkirina şermê dilê minda koka xwe dabû. Bona tiştên xirabe ku rastî min hatine, min xwe gunehkar dikir (nenihêrî wê yekê, wekî piraniya wan tiştê zarotîya minda qewimîne û min nikaribûye wana bidime sekinandinê).

Em dibêjin, wekî kerem qewata Xwedê ye, ya ku Xwedê çawa pêşkêş daye me. Ew alî me dike ku bi hêsanî wê yekê bikin, çî ku em nikarin bi qewata xwe bikin. Xwedê dixweze keremê bide me, lê mîrêcin dixweze ji keremê me miqûf bihêle.

Texmînkirna miqûfmayîna ji keremê Ez mecbûr dikirim, ku ez xwe çawa meriveke xirab texmînkim, ya ku layîqî hizkirin û alîkarîya Xwedê nîne. Raste-rast gotî, şermê merivê dilê minda jehrdadayî kiribû. Min ne tenê ji wî hemû tiştî şerm dikir, çî ku tevî min qewimîbû, lê min usa jî ji xwe şerm dikir. Dilê xweda min xwe hiz nedikir.

Hildana eybêye ji alîyê Xwedêda dide kifşê, wekî ji me her kesek gerekê bona gunehên berê baxşandinê bistîne.

Hûn gerekê fem bikin, wekî hûnê t'u cara nikaribin layîqî duayên Xwedê bin. Hûn tenê dikarin bi milûktî wana qebûl bikin û bi şêkirandin, bi mezinaya Wî û hizkirina bêsinorva hijmekar bin.

Hûnê dîsa nava qûmistanêda bimînin û li wir bigerin, eger hûn prînsîpa heqîtîyêye bi xwîna Îsa destxistî fem nekin û ji pirsên xwehiznekirinê, xweînkarkirinê, qebûlnekirina baxşandina Xwedê (xwe nebaxşandinê) aza nebin. Fikira we gerekê bi saya çûyîna tevî Îsa çêbe.

Bi salên dirêj ez nava qulixêda bûme û ez hatime li ser wê fikirê, wekî 85 %-ê pirsgerêka rûyê nêzîkbûna xirabe hindava meda pêşda tîn. Her kes, kîjana hûn zanin, wekî nava serkeftinêda digere, ew usa jî nava heqîtîyêda digere.

Ez zanim, wekî ez layîqî duayên Xwedê nînim, lê ez wana qebûl dikim, çimkî ez peyîhatîyê Mesîh im (binihêre Romayî 8:17). Îsa ew dua qazanc kirin, lê ez wana bi rîya bawarkirina Wî dest tînim.

PEYHATÎ YAN XULAM?

“Bi vî awayî îdî tu ne xulam î [xulamê girêdayî], lê law î: û eger law î, usa ye [dide kifşê ku tu] bi alîkarîya Xwedê bi saya Mesîh war î”.

Galatî 4:7, AMP

Hûn kîn e, law, yan xulam, yan war, yan xulamê girêdayî? War ew e, yê ku tiştêkî ne ku layîqî xwe distîne, lê wextê ku tiştêk ji destê

yekî derbaz dibe destê yekî mayîn, bi xwestina yê ewlin. Xulam yan jî pale, anegorî Încîlê ew e, yê ku cefê dikişîne û dicêribîne peyî Qanûnê here. Nava vê fikirêda xebata giran û nerihetî heye.

Bi sala ser hev ez li qûmistanê çawa xulam gerîyame û min cêribandîye bi xebata kel û ced layîqî wî tiştê baş bim, yê ku Xwedê dixweze bi saya kerema Xwe û bêyî t'û tiştî bide min. Menî fikirdarîya mine şaş bû. Ez pêşda difikirîm, wekî hemû tişt lazime bê qazanckirinê, yan jî lazime tu layîqî wê yekê bibî: “t’û kes t’û tiştî hema usa wê bona we neke”. Salên dirêj ez bi wê prînsîpêva dihatime raberkirinê. Gelek cara bi guhdarkirina wê gotinê ez mezin dibim. Minra digotin, wekî her merivek, yê ku dixweze tiştêkî baş bona min bike, derewa dike û ewê xilazîyê min bide xebatê.

Cêribandina vê dinîyayê me hîn dike, wekî bona stendina tiştêkî, em pêşda gerekê layîqî wê yekê bin. Mera digotin, wekî eger hûn dixwezin, ku hevalên we hebin, wî çaxî hûn gerekê her dem wana bidine şakirinê, lê eger usa nebe, ewê rojekê ji we dûrkevin. Eger li cîyê xebatê hûn dixwezin qulixa we bilindbe, hûn gerekê meriva rast nas bikin, wana “baş binihêrin” û diqewime rojekê jî mecal hebe pêşda herin. Nava wededa em ji dinîyayê û hemû mêtodên wê diwestin. Şerm mînanî barekî giran dikeve ser me û em destpê dikin texmîn bikin, wekî hewcetîya azabûna ji wê heye.

FIKIRA WEYE DERHEQA WEDA ÇI CÛREYÎ YE?

“Û li wir me esave dîtî, lawên Enaqîya, wekî pareke ji esava bûn û em li ber çevên xwe mîna kûlîya bûn, usa jî li ber çevên wan bûn”.

Jimar 13:34

Îsraêlîya ew eyb li ser xwe dibirin. Ev xeber zelal dide kifşê wekî fikira wana derheqa wanda çiqas xirab bû. Pêşîya wê yekê, wextê ku cimeta Îsraêlê ji çemê Ûrdunê derbaz nebibû, ji 12 cesûsên ku çûbûne welatê Sozdayî, deh paşda vegeerîyan û gotin, wekî li wî welatî esave dijîn, yê ku li ber çevên xwe ew çawa kûlî dîtine, û himberî esava ew jî li ber çevê xwe wî cûreyî xwe dîtine.

Ev yek zelal dide kifşê, ku ev meriv çî cûreyî derheqa xweda fikirîne.

Ez hîvî dikim, ku hûn bizanibin, wekî mîrêcin wê fikira we, bi her cûreyî, fikirên xirabva tijî bike (eger hûn îzinê bidinê). Pêşda ew destpê dike nava fikira weda kela çê bike, kijana gelek fikirên xirabe derheqa wedanin û merivên mayîn çî cûreyî nêzîkî we dibin. Ew her dem halên usa çê dike, kijanada hûn destpê dikin xwe înkarbûyî texmînkî, bona ku her car, wextê ku hûn bicêribînin pêşda herin û qewimandina berbi başîyê biguhêrin, ew bikaribe careke mayîn derheqa êşa weda bîr bîne.

Tirsa neaçixîyê û înkarbûnê gelek meriva qûmistanêda xweyî dike. Xulamîya îsraêlîyaye bi salaye li Misirê û nêzîkbûna xirabe hindava wanda eyb anîbû li ser îsraêlîya. Tiştêkî hewaskar e bidine kifşê, wekî ji nisileta bi serkarîya Mûsa ji Misirê derket, lê bawar bikî t'û kes nekete welatê Sozdayî. Ew welat gihîşte lawên wan. Feqet çawa ku Xwedê gotibû, lazim bû ku wê eybê usa jî ji ser zaroka bide hildanê.

Ji wana gelek li qûmistanê hatibûne dinîyayê, piştî derketina dê û bavên wane ji Misirê. Gelo çawa lawên wana dikaribûn eyba Misirê li ser xwe bibirana, eger ew li Misirê nemabûn?

Ji dê û bava gelek tişt derbazî zaroka dibin. Nêzîkbûn, fikir û tabîya kirina dikarin derbazî peyhatîya bin. Hûn dikarin fikirdarîya dê û bavaye şaş bistînin. Fikira weye derheqa tiştêkîda derbazî we bûye, lê hûn t'û cara nefikirîne ku bona çî hûn li ser wê fikirîne.

Fikirdarîya dê yan jî bavêye nimize derheqa xweda, wekî ew nelayîqî hizkirina Xwedê û duayên Wî ye, gelek cara dikarin derbazî cem zaroka bin.

Û nenihêrî wê yekê, wekî min îdî derheqa wê yekêda xeberdaye, ez dixwezim carekê jî biwekilînim, çimkî ew yek gelekî girîng e. Hûn gerekê bizanibin mejûyê weda çî diqewime, fikira weye derheqa weda çî cûreyî ye. Xwedê rehmê dixweze bide bona binketinên we, eger hûn bixwezin bona binketinên xwe hûn bibaxşînine xwe, û eger hûn bixwezin baxşandina Wî qebûl bikin. Ew ne ku yê kamil rewa dike, yê ku bêkêmasî ye û bêşaşî ye, lê wana rewa dike, yê ku bawar dikin û li Wî aminin.

BAWARÎYA WEYE HINDAVA XWEDÊDA LI WÎ XWEŞ TÊ

“Û bê bawerî t’u car nabe ku însan li Xwedê xweş bê, çimkî ewê ku nêzîkî Xwedê dibe, gerekê bawar bike ku Xwedê heye, û wê wana xelatke, yên ku bi kel û ced Wî digerin”.

Îbranî 11:6, AMP

Minê hîvî bikira, wekî we hesab hilda, wekî bêyî bawarîyê hûn nikarin Xwedê razî bikin: bo wê yekê jî firqî tune, ku we çiqas “karên qenc” kirine. Eger we bona “qazanckirina” razîbûna Wî ew kar kirine, wî çaxî ew yek wê Wî razî neke.

Qewata meye hîmlî, ya bona kirina tiştêkî bo Xwedê, gerekê hizkirina meye hindava Wîda be, lê ne ku ew yek be, ku em çî dikarin ji Wî bistînin.

Nava vê xeberêda tê gotinê, wekî Xwedê wan meriva xelat dike, yên ku bi kel û ced Wî digerin. Ez awqasî bextewar bûm, wextê ku min ev yek fem kir! Ez zanim, wekî pêşda min gelek şaşî kirine, lê min usa jî zanibû, wekî niha min bi temamiya dil berbi Xwedê divedand. Ev jî dide kifşê, wekî eva mafê stendina heq nîşan dide. Min îdî zûva qirar kirîye, wekî ezê wan hemû dua bistînim, kîjana Xwedê dixweze bide min.

Xwedê xwest îsraêlîya berbi welatê Sozdayî bibe, û wana bi dua-dirozgên usa dua bike, derheqa kîjanada wana nikaribûn bianîyana ber çevên xwe, lê berî her tiştî Ewî gerekê ew ji eyba wana xilaz bikira. Ewê nikaribûna ji Xwedê awqas wede tiştêk bistendana, çimkî hela hê bin barê şermê, guneh û sosretîyêda bûn.

JI EYBÊ JORTIR

“Çawa ku [nava hizkirina Wîda] Ewî em bijartin [bi texmîn, me çawa yên Xwe bijartin] nava Mesîhda, pêşîya efrandina dinîyayê, ku em pîrozbin [bona Wî rûnkirî û başqebûyî] û bêyî gunehkarkirina ji aliyê Wîda, usa jî ji eybê jortir û nava hizkirinêda, li ber Wî sekinî”.

Efesî 1:4, AMP

Eva xebereke gelekî baş e. Bi vê yekê Xwedê dixweze bêje, wekî em yên Wîne, û dixweze, wekî em fem bikin, ku Ew me hiz dike,

ku em başqene, bona Wî bihane û dixweze, wekî em pîroz, paqij û ji hemû eyba jortir bin.

Em gerekê hemû tiştî bikin bona jîyana bi jîyana Pîroz. Feqet şikir ji Xwedê, wekî wextê ku em şaşîya dikin, em dikarin baxşandinê bistînin, nava pîrozîyê û paqijîyêda bêne dasekinandinê û ji eybê bilindtir bin... û ev hemû tişt bi saya Wî.

BÊYÎ GERA ŞERMÊ YAN JÎ ŞAŞÎYA

“Eger serwaxtîya ji yekî we têra wî nake, bila hîvî ji Xwedê bike [Yê ku dide] hemûya bi merdanî û bêyî gera şermê, hêrsketîne û şaşîya û bo wî wê bê dayîne”

Aqûb 1:5, AMP

Eva jî xebereke gelekî baş e, ya ku me hîn dike, ku em bêyî eybê duayê Xwedê bistînin.

Aqûb vê berbirîbûnê dide wan meriva, yên ku cêribandinên cûre-cûrera derbaz bûne û niha dibêje wan, ku eger ew hewcê serwaxtîyêna bona halên xwe, wî çaxî ew gerekê hîvî ji Xwedê bikin. Ew dide bawarkirinê, wekî Xwedê wê ser wanda hêrs nekeve û nava wanda şaşîya negere, wê awqasî alî wan bike.

Wê wera t’u cara li hev neyê bêyî alîkarîya Xwedê ji qûmistanê derkevin. Lê eger fikira weye derheqa weda ya xirab e, wî çaxî eger Ew bixweze alî we bike, hûnê wê yekê nikaribin qebûlkin.

Eger hûn dixwezin bi jîyana serkeftî, qewat û başva bijîn, hûn nikarin derheqa xweda xirab bifikirin. Li wê para rê tenê nenihêrin, kîjanêra hûn gerekê derbazbin, lê usa jî paşda binihêrin û bibînin, ku hûn çiqasî derbaz bûne. Derheqa pêşdaçûyîna xweda bifikirin û xebera Filîpî 1:6-ê bîr bînin: “Û ez vê yekêda gumanim, Ewê ku dilê weda destbi şuxulê xweyî qenc kirîye, wê heta roja hatina Îsa Mesîh jî [hetanî wedê paşdahatîna Wî], bi pêşxistîna [ew şuxulê qenc] nava weda bighîne sêrî”) AMP).

Derheqa xweda bifikirin û tenê xeberên baş bêjin.

BONA ZANEBÛNÊ: Neniherî wê yekê, wekî ev kitêb çend sal pêşda hatîye nivîsarê, lê ez guman im, wekî nêzîkbûna meye hindava meda hukumê xwe nava hemû govekên jîyana meda dihê. Ez bangî we dikim, ku hûn peyman aştîyê tevî xwe morkin. Diqewime ew tiştê ku hûn dikin li we xweş nayê, lê hûn dikarin û borcedarin xwe hiz bikin. Min qirar kir, wekî eger Îsa weke mirinê ez hiz kirim, wî çaxî tiştê herî hindik, ku ez dikarim bikim, hizkirina min e. Bona çi hûn nikarin niha xwe hembêz bikin û nebêjin?: “Bo qurbana ku Îsa kirîye, ez xwe hiz dikim û qebûl dikim. Ewî tişteki nû daye min, û ez niha hazirim bi jîyana nûva bijîm, bi kîjanê Ew dixweze, ku ez bijîm”.

Serê
24-a

*Bo çi ez nikarim kumreşîyê
bikim, yan jî hevsûdîyê, wextê
ku li cem hemûya hemû tişt diha
baş e, ne ku li cem min?*

Fikirdarîya çolê hejmar 9

*Bo çi ez nikarim kumreşîyê bikim, Serê
yan jî hevsûdîyê, wextê ku li cem 24-a
hemûya hemû tişt diha baş e,
ne ku li cem min?*

Fikirdarîya çolê hejmar 9

Nava serê 21-da, yê Mizgîniya Yûhenna, Îsa Petrûsra derheqa wan dijwarîyada qise dikir, yên ku Petrûs gerekê wextê qulixkirina bo Îsa bikişandana û Ew rûmet bikira. Hema ku Îsa ev hemû tişt gotine Petrûs, ew zivirî û Yûhenna dît, û carekêra derheqa qirara Wîye bona Yûhenna pirsî. Petrûs dixwest bizanibûya, ku eger ewê nava cêribandinên dijwarra derbz bûya, usa ye bona Yûhenna jî gerekê usa bûya. Îsa jî bi cûrê maqûlî gote Petrûs, wekî ew yek ne îşê wî ye.

“Petrûs ew [Yûhenna] dît, gote Îsa: “Xudan, lê îjar evê çawa be?”

Îsa gote wî: “Eger Ez bixwezim, ku ew bimîne [sax bimîne, bijî], heta Ez bê, çi tera ye? Tu peyî Min were””

Yûhenna 21:21,22, AMP

Fikirmîşbûna derheqa îşên merivên başqeda wê me li qûmistanê xweyî bike. Kumreşî, hevsûdî û himberîhevkirina xweye tevî merivên mayîn encamên fikirdarîya çolêne.

JI KUMREŞÎYÊ Û HEVSÛDÎYÊ FESAL BIN

“Fikir û dilê rihet û edil bona bedenê jîyan û saxlemîne, lê hevsûdî, kumreşî û hêrs mînanî hestûyên rizîne”.

Gotinên Silêman 14:30, AMP

Hevsûdî dikare mêriv werguhêzî merivekî hişk û bêdil bike, lê carina jî bighîne dereceke usa, ku meriv mînanî heywana be. Hevsûdîyê birayên Ûsiv mecbûr kirin, ku wî xulamtîyêra bifroşin. Wana Ûsiv rûyê wê yekêda hiz nedikirin, wekî bavê wana Ûsiv gelekî hiz dikir.

Eger malbeta weda kesek heye, yê ku diha zêde tê hizkirinê, yan jî qedirgirtinê, ne ku hûn, usa nekin ku wî merivî hiz nekin. Li Xwedê amin bin. Wê yekê bikin, çî ku Ew jî we hîvî dike: bawarîya xwe li Wî bînin, û hûnê milahîmîyê bibînin, û axirîya we wê bi merdanî mînanî dawîya jîyana Ûsiv duakirî be.

“Ferhenga şirovekirina xeberên peymanên Kevin û Nû”, ya V. Y. Wayn, xebera “hevsûdî” jî zimanê yûnanî tercime dike û vî cûreyî şirove dike: “texmînkirina nerazîbûnê, ya ku wî çaxî pêşda tê, wextê ku nava jîyana merivên mayînda gulvedanê dibîne”. Ferhenga Wêbstêrda xebera “kumreşî” vî cûreyî tê şirovekironê: “texmînkirina hevsûdîyê, tirsê, êşê”. Ez vêya vî cûreyî şirove dikim, çawa tirsê bona undakirina tiştên heyî, rûyê açixîya kesekî mayînda pêşdahatina nerazîbûnê, ya ku jî texmînkirina hevsûdîyê pêşda tê.

XWE HIMBERÎ HEV NEKIN Û NEKEVINE LEHCÊ

“Û nava wanda dew pêşda hat, ku jî nav wanda kîjan wê yê herî mezin bê hesabê.

Û Ewî wanra got: “Padişatîyên mileta cimeta xwe bindest dikin û ewên ser wan hukum dikin, xêrxwezên wan têne gotinê.

Lê hûn usa nebin, yê nav wedayî herî mezin, bila bibe mîna yê herî biçûk û bila yê serwêrtîyê dike jî, bila bibe mîna yê ku xulamîyê dike”.

Lûqa 22:24-26

Nava salên mine pêşinda min şerkarîke gur dijî wê yekê mîyaser dikir, yên ku xwe himberî yên mayîn dikin, usa jî dijî hevsûdîyê û kumreşîyê. Cudatîyên vî cûreyî yên wan merivane, yên ku xwe çareserkirî texmîn nakin. Eger em li ser qedir û qîmetê xwe guman nînin çawa şexsên cuda, wî çaxî emê xwe li ser wê fikirê bidine zordarkirinê, wekî em xwe himberî wan meriva dikin, açixîyên kîjana hene.

Bi femkirina şexsîtiya xwe (wekî Xwedê bona jîyana min progirameke cuda û şexsî başqe kirîye), min azayîke mezin û giranbiha dît, ya ku jî alîyê Xudanda minra hate dayînê. Ez niha zanim, wekî hewcetîya min îdî tune, ku ez xwe (yan jî qulixa xwe) himberî yekî mayîn bikim.

Ez her dem ber dilê xweda têm, wekî bona min hela hê guman heye, wextê ku her car li şagirtên Îsa dinihêrim û fem dikim, wekî wana jî dijî (miqabilî) wan tiştê şerkarî dikirin, dijî kîjana ez jî şerkarîyê dikim. Nava serê 22-da, yê Mizgînîya Lûqa, em dibînin, wekî şagirt bona wê yekê ketibûne dewê, ku ji wana kî ye yê herî mezin. Îsa caba wî dide û dibêje, wekî yê herî mezin ew e, yê ku hazir e Xwe çawa yê herî biçûk hesab bike, yan jî qulixî yên mayîn bike. Xudanê me piranîya wedê Xwe derbaz kir, cêriband şagirtên Xwe hîn bike, wekî jîyana nava padişatîya Xwedêda himberî jîyana li vê dinîyayê, yan jî ya fizîkî, rast wekî mayîn e.

Îsa ev tişt gotine wana: “Gelek merivên ewlin wê bibine yên dawî (xilazîyê) û yên dawî wê bibine yên ewlin” (binihêre Marqos 10:31), “Tevî wana şa bin, yên ku duakirîne” (binihêre Lûqa 15:6,9), “Dijminên xwe hiz bikin, ewên ku nifira li we dikin, bona wan dua bikin” (binihêre Metta 5:44). Dinîya dikare bêje, wekî ev yek ne nêzîkî aqila ye, lê Îsa dibêje, wekî ev e qewata rast.

JI LECA DINÎYAYÊ DÛR BIMÎNIN

“Werin em kubar û xwehiz nebin, nekevîne nava lehcê, hêrs nebin, agirê hev gur nekin, hevşûdîyê û kumreşîyê hevdu nekin”.

Galatî 5:26, AMP

Anegorî dîtînen dinîyayê, nava jîyanêda cîyê herî baş “li jorê”-ye. Ew fikirdarîya belabûyî ye, wekî em gerekê berbi jorê bicedînin û hesab hilnedin, ku li ser wê rê em kê diêşînin. Feqet Încil me hîn dike, wekî edîlaya rast meriv nikare bibîne, hetanî jî xwestina lehca tevî yên mayîn aza nebin.

Hetanî wextê listikên eşq jî em dikarin bibînin, wekî carina leca nava listikêda ji balansa xwe usa derdikeve, wekî listik bi hevraqayîlnebûna û hiznekirina hindava hevda ser hevda tê, dewsa wê yekê, wekî dikarin wedê hêsa û baş tevayî baş derbaz bikin. Bi tomerî hildayî, xeysetê mêriv usa ye, wekî her kes bona serkevtinê dilîze, lê ne ku bona binketinê. Feqet, eger meriv tenê wî çaxî bextewar e, wextê ku ew ser dikeve, wî çaxî

pirsgirêka wî heye, ew jî diqewime pirsgrêka usa mezin bibe, ya ku sirîya xweda nava govekên jîyana wîye mayînda pirsgrêkên başqe pêşda tîne.

Wextê ku em dixebitin, em gerekê hemû cedandinên xwe bidine xebatê. T'û tiştêkî şaş nava wê yekêda tune, eger em dixwezin hemû tiştî baş bikin û dicêribînin nava pêşê xweyî bijartîda pêşda herin. Feqet ez bangî we dikim, ku hûn bîra xweda xweykin, wekî bona bawarmend piştgirî gerekê ji Xwedê bê, lê ne ku ji mêriv. Em gerekê lîstikên dinîyayê bona “pêşdaçûyînê” nelîzin. Xwedê wê razîbûna xwe bide me û emê li ber meriva keremê bibînin, eger em hemû tiştî bi rêyên wî bikin (binihêre Gotinên Silêman 3:3,4).

Kumreşî û hevsûdî cefên ji dojêne û ji wir hatîne. Min bi sala wedê xwe unda kirîye, wextê ku min kumreşî û hevsûdî li her kesî kirîye, yê ku ji min bedewtir bûye, yan jî diha zane bûye, ne ku ez. Bi cûrê xewile ez nava qulixa xweda jî diketime nava lehcê. Bona min diha gelekî girîng bû, wekî qulixa min diha mezin bibe, pêş bikeve, ne ku ya yekî mayîn, meriv zêde bibin û tiştên mayîn. Eger qulixa yekî mayîn nava tiştêkîda ji qulixa min zêdetir dibû, min dixwest ez şa bûma bona wî merivî tenê bi wê menîyê, çimkî min zanibû, wekî ew yek Xwestina Xwedê ye, lê ruhê mînda tiştêkî îzin nedida ku ez usa bikim.

Min çiqasî zêde fem fikir, ku nava Mesîhda ez kîme, ez awqasî ji hewcetîya himberîhevkirina tevî merivên mayîn aza dibûm. Çiqasî zêde ez hîn dibûm, ku aminaya xwe li Xwedê bînim, awqasî zêde nava van govekada min azayî didît. Min fem kir, wekî Bavê minî ezmana min hiz dike û wê bona min tiştên here baş bike.

Û ew çî ku Xwedê dikare nava jîyana we û mînda bike, dikare jîyana yekî mayînda neke, lê em gerekê bîr bînin ku Îsa çî digote Petrûs: “Nefikire, ku ezê nava jîyana yekî mayînda çî bikim: peyî Min were”.

Rojekê hevala min ji Xudan ew pêşkêş stend, bona kîjanê min zûva dua dikir û dixwest. Min ew hevala xwe awqasî jî çawa yeke “ruhanî” hesab nedikir û min destpê kir kumreşîyê û hevsûdîyê li wê bikim, wextê ku ew bi şabûn revî mala me ku minra gilî bike, ku Xwedê nava jîyana wêda çî kiribû. Bêguman, wextê ku ew li cem min bû, ez mecbûr bûm bidime kifşê, wekî bona wê ez şa me, lê “ji dilê min xwîn diniqtî”.

Gava ew çû, nêzîkbûna mine hindava wêda usa derket, wekî ezê t'u cara nefikirîyama, ku ew yek dilê minda hebû. Min fem nedikir, ku Xwedê çawa dikaribû awqasî bi merdanî li wê dua bikira, çimkî ez nedifikirîm, wekî ew hêjayî wê yekê bû. Peyî awqas tiştîra, ez li malê mam, min dua dikir û awqas wext rojî girtin, wextê ku ew ji cem hevaleyê direvîya cem ya mayîn û bi wê yekêva şa dibû. Hûn dibînin ku ez “fêrisîke” çawa bûm û min bi xwe jî ew yek fem nedikir.

Carina Xwedê usa dike, wextê ku em nikarin t'u tiştî biguhêrin, çimkî Ew derheqa hewcetîyên meda zane. Hewcetîya mine diha zêde ew bû, ku ez ji nêzîkbûna xweye şaş aza bûma, lê ne ku ew dua, bona çî min awqasî dua dikir. Bona Xwedê ew yek girîng e, ku qewimndina usa pêşda bibe, wekî em mecbûr bibin rû bi rû li ber xwe bisekinin. Eger usa nebe azaya me wê tunebe.

Hetanî ku dijmin bikaribe bikeve nava jîyana me, ewê her dem bicêribîne me kontrol bike. Ew e meremê wîyî tek-tenê. Feqet Xwedê dikare wî bide eşkerekirinê û azayê bide me, eger em teslîmî Xwedê bikin û îzinê bidine Wî ku ew wê xebatê destpê bike, ya ku Ew dixweze nava meda bike.

Bi gilîkî, Xwedê îdî zûva qirar kiribû, wekî ew qulixa ku Ewî bida min, wê gelekî berfireh bûya û Xebera Wî wê bighîştî milîyona meriva, bi rîya radîoyê, têlêvîzîyonê, întêrnê, sêminara, kitêba û vîdêoya. Feqet Ewî nikaribû ez bi temamî nava wê qulixêda bilind bikirama, çimkî ez hela hê nava Wîda nava şuxulkarîya “gihîştinêda” bûm.

FIKIRDARÎYA NÛ DEST BÎNIN

“Delalo, ez usa dua dikim, ku hemû alfyava çerxa te usa rast bibe û sehet-qewat bî, çawa minva eyan e, ku ruhê te silametîyêda ye”.

3 Yûhenna 2

Bi guhdarî dora vê xeberê bifikirin. Xwedê diha gelekî dixweze dua bike, ne ku em dixwezîn duakirîbin. Feqet ew usa jî awqasî me hiz dike, wekî duayên Wî ji wî hemû tiştî zêdetir nabin bona ku em

bikaribin karebûnên xweye nava jîyanêda kontrol bikin, bona ku him niha û him jî paşê temamiya şikirdariyê tenê bidine Wî.

Kumreşî, hevsûdî, himberîhevbûna tevî merivên mayîn û tiştên mayîne vî cûreyî didine kifşê, wekî meriv nava ruhanîyêda hela hê zarok e. Ev hemû tişt jî anegorî bedenêne û t'u cûreyî ruhanîyêva girêdayî nînin. Feqet menîke hîmlî, ya gera li qûmistanê, hevsûdî ye.

Destpê bikin nava vê govekêda fikrên xwe kontrol bikin. Westê ku hûn dibînin, wekî fikireke şaş dixweze bikeve nava mejûyê we, wî çaxî xwera bêjin: “Çi feyda ji wê yekê heye, eger destpê bikim hevsûdîyê li yên mayîn bikim. Bi kirina wê yekê ezê duakirî nînim. Bona me her kesî progirama Xwedêye cuda heye. Ezê aminaya xwe li wî Wî bînim, bona ku jîyana min jî bi tiştên Xwedêye başva tijî bibe. Ew yek îşê min nîne, ku Ewî nava jîyana yên mayînda çî qirar kirîye”. Lê paşê, bi femdarî û bi zanebûn, bona wan meriva dua bikin, hevsûdîya kîjana we dikir, bona ku ew jî duakirî bin.

Ji zelalbûna tevî Xwedê netirsîn û ji xeberdana derheqa xweda venekişîn. Ew zane, ku hûn dilê xweda çî texmîn dikin, bona wê yekê jî wê diha baş bibe ku hûn Wîra derheqa wê yekêda xeberdin:

Min vî cûreyî li Xudan dua dikir: “Xwedêyê min, ez bona..... .. dua dikim, wekî ew bi merdanî duakirî be, gulvedanê bide wî û nava hemû govekên jîyana wîda li wî dua bike. Xudan, ez vî duayî bi bawariyê dikim, ruhê xweda ez hevsûdîyê li wî dikim, û ez diha zêde xwe ji wî nimiztir texmîn dikim, lê ez nenihêrî texmînkirinên xwe vî cûreyî dibêjim”.

Van axirîya yekî awa got, wekî firqî tune ku em bi çiqasîva baş dikarin qencîyê nava govekekêda bikin, çimkî her dem jî yekî mayîn wê hebe, yê ku wê ewê qencîyê diha baştir bike. Ev gotin kete serê min, çimkî ev yek bi rastî usa ye. Û eger usa ye, wî çaxî bona çî em nava temamiya jîyana xweda dicêribînin ji yekî derbazzir bin? Çaxê nava govekekêda em dibine yê ewlin, zû yan dereng yekî mayîn pêşda tê, yê ku diha baştir serederîyê wê yekê dike, çî ku em dikin.

Ez sportê çawa mesele bînim, sportsmên dighîjine rêkordên çawa jî paşê dîsa sportsmênên başqe pêşda tên, rêkordên kîjana ji yên berê

bilindtir dibin. Gelo derheqa şou-bîznêsêda hûnê çi bêjin? Steyrk hinek wede steyrk e, heta wî çaxî, heta ku steyrkeke başqe pêşda nehatîye, ya ku şewqa ya pêşin ditemirîne. Eva xapandineke çawa ye: em difikirin, wekî gerekê her dem şerkarîyê bikin, ku yên mayîn derbaztir bin, lê paşê şerkarîyê bikin, ku cîyê li ser xeta pêşin destanî xweyî bikin. Qîmetê me ew nîne, ku em çi dikin, lê ew e, wekî Xwedê me hiz dike û Kurê Xweyî tek-tenê şand ku bona me bimire.

Gelek sal pêşda Xwedê minra gotibû, wekî “steyrkên birqok” ezmînda nişkêva pêşda tên û guhdarîya mezin dikişînine li ser xwe, lê ew yek dirêj nakişîne. Piraîya wana usa lez dikeve, çawa ku ew lez pêşda hatibûn. Ewî got, wekî diha baş e ku meriv merkeza guhdarîyêda nîbin, lê bi wedê dirêj bişuxulin û bi temamîya karebûna xwe wê yekê bikin, çawa ku Ewî temî daye. Ewî ez dame bawarkirinê, wekî Ewê bi xwe derheqa qedirê minda bifikire. Min jî sirîya xweda qirar kir, wekî ezê her xebatekê bikim, kîjanê Ewê bide min û hemû tiştê nava jîyana minda baş be. Bo çi? Çimkî tenê Ew zane, ku ez dikarim çi bikim, wextê ku ez tiştê xweyî baş bidime xebitandinê.

Diqewime nava fikira weda, girêdayî vê govekêra qewînbûn hene. Her car, wextê ku hûn rastî kesekî tên, yê ku nava pîrsekêda jî we zêdetir e, hûn texmîn dikin, ku çawa hevsûdî, kumreşî, yan jî xwestina lehcê nava weda serî bilind dikin. Eger ew yek bi rastî usa ye, wî çaxî ez bangî we dikim, ku hûn fikirdarîya nû dest bînin.

Bikaribin bona merivên mayîn şa bin, lê pirsên xwe biavêjine ser Xwedê. Ew yek wê wede û cedandina bixweze, lê eger hûn wan qewînbûnên kevîne nava fikira xweda tune bikin û dewsa wana Xebera Xwedê bidine sekinandinê, hûnê li ser rîya ku jî qûmistanê derdixe û berbi welatê Sozdayî dibe, bisekinin.

Serê
25-a

*“Ezê wê yekê yan bi cûrê xwe
bikim, yan jî ezê qet nekim”.*

Fikirdarîya çolê: hejmar 10

“Ezê wê yekê yan bi cûrê xwe bikim, yan jî ezê qet nekim”.

**Serê
25-a**

Fikirdarîya çolê: hejmar 10

Îsarêlîya nava salên xweda, yên ku wana li qûmistanê derbaz kirin, serhişkî û miqabilderketin dane kifşê. Û hema ew bû menîya mirina wane li wir. Wana bi serhişkî ew tişt nekirin, çi ku Xwedê gotibû wan. Ew digirîyan û gazî Xwedê dikirin, hîvî dikirin, ku ji dijarîya wana xilaz bike. Serbara serda, wana bi gurêkirin guhdarîya xwe didane li ser teslîmkirinên Wî, lê ew yek awqas wede dikişand, heta ku hal berbi başîyê dihate guhartinê. Paşê ew paşda vedigerîyane li ser mêtodên berê û miqabilderketinê.

“Wekî ew gumana xwe bidine ser Xwedê, kirên Xwedê bir nekin û temîyên Wî ew xweykin.

Lê bila rîya kal-bavada ew neçin, miletê serhişk û miqabil ew nebin, ku dilê wan neşidîyayî be û ruhê xweda Xwedêra amin nibe”.

Zebûr 78:7,8

Nava peymanê Kevinda hûn dikarin bibînin, wekî ev hal gelek cara diwekilin. Û eger em hela hê bi serwaxî nakin, wî çaxî emê jîyana xwe unda bikin, eger dîsa wan şaşîya biwekilînin.

Meriv cudane û diqewime ji wana hinek diha serhişk bin, lê ne ku yên mayîn. Û paşê em gerekê koka xweda û gavên xweye ewlinda bifikirin, çimkî paşê ewê nava jîyana meda hukumê xwe bihêlin.

Ez bi xeysetê xwe şexseke qewatim û salên dirêj min wedê xwe unda kirîye, wextê ku min cêribandîye hemû tiştî “bi cûrê xwe” bikim. Feqet salên mine undakirî ew sal bûne, wextê ku “bi saya” wan merivên qewat û gihîştî, kîjana ez şuhurandime, wedê min unda bûye, rûyê kîjanada serê minda ew fikirdarî çê bûye, wekî t’u kes gerekê nebêje min, ku ez gerekê çi bikim û çawa bikim.

Bêguman, Xwedê wê bikaribûya ez tenê wî çaxî bidama xebatê, wextê ku ez ji wê nêzîkbûna şaş aza bikirama.

Xudan dixweze ku em ji rêyên xwe paşda bisekinin û xwe bi rezedilî teslîmî destên Wî bikin. Ewê nikaribe me bide xebatê, eger em serhişk û bêfem bin.

Xebera “serhişk”, bi xeberên mayîn gotî ez bêjim, wekî tê şirovekirinê çawa serhişk, merivê ku tenê li ser gotina xwe disekine û tevî kîjanî dijwar e bişuxulî. Lê xebera “miqabilderketin” tê şirovekirinê çawa merivê ku dijî (miqabilî) kontrolê, gotina, qanûnên tomerî derdikeve. Ev her du şirovekirin jî derheqa minda bûn, wextê ku ez berê usa bûme.

Salên jîyana mine ewlinda ez bi destê zorê hatime şuhurandinê, rûyê çida ez gelekî zêrîyame û hema ev yek bûye menî, ku ez hindava qedirê xweda bi nêzîkbûna bi qedir pêşda nehatime. Lê çawa ku min îdî destpêka kitêbêda gotibû, min nikaribû îzin bida paşeroja xwe ku ew yek bona min bibûya afûkirin û bi wê yekê ez nava miqabilderketinêda, yan jî nava şaşîkêda bimama.

Jîyana serkeffî ji me dixweze, ku em gura Xudanda bin. Em gerekê nava karebûn û xwestina xweda bighîjin, bona ku bikaribin xwestina xwe usa bikin, ku ew li ber xwestina Xwedê ta be. Nava vê govekêda gelekî girîng e, ku meriv berdewam bike pêşda here.

Ew yek bes nîne, ku bighîjine derecekê û bifikirin: “Ez awqasî derbaz bûm, çiqasî karibûm”. Nava jîyana xweda em gerekê nava hemû tiştîda milûk bin, bêyî veşartina tiştêkî ji Xudan, yan jî bêyî girtina derîkî li ber Wî. Li cem me hemûya jî ev “hinek” govek hene, kîjana em dicêribînin êmekê xweykin. Feqet ez bang dikim, ku hûn bîra xweda xweykin, wekî hevîrtirşkê biçûk temamiya hevîr dide tirşkirinê (binihêre A Korintî 5:6).

XWEDÊ GURÊDABÛNÊ DIXWEZE, LÊ NE KU QURBANÊ

“Û Samûêl gote [Şaûlê padişa]: “Gelo Xudan diha gelekî yên saxe-sax şewitandî û qurbana begem dike: yan gurêkirina dengê Xudan? Gurêdabûn ji qurbanê baştir e û guhdarkirin ji donê berana baştir e.

Çimkî miqabilderketin mînanî gunehê sêrbazîyê ye û gurênekirin pûtperestî ye mînanî [şikilên ku açixîya malê xweyî dikin], çimkî te Xebera Xwedê înkâr kir, Ewî jî tu înkâr kirî ku tu nebî padişa”.

A Padişatî 15:22,23, AMP

Lênihêrandina jîyana Şaûl zelal îzinê dide, ku em bibînîn, wekî mecal bona wî hatibû dayînê, ku ew bibûya padişa. Feqet ew li ser wê tabîyê, rûyê serhişkîya xwe û miqabilderketinêda, dirêj nema. Fikirên wîye şexsî hindava jîyana wîda hebû.

Carekê, wextê ku Samûêlê pêxember li ber gilîyê Şaûlda dihat bona wê yekê, wekî ewî ew yek usa nekiribû, çawa ku bona wî hatibû gotinê, Şaûl destpê kir fikirên xwe raber bike, ku çi gerekê çawa bihata kirinê (binihêre A Padişatî 10:6-8, 13:8-14). Feqet Samûêlê pêxember caba (bersiva) Şaûlê padişa dide û dibêje, wekî Xwedê milûlktîyê dixweze, lê ne ku qurbanê. Wextê ku ji çapê zêdetir “difikirin” em dikarin rêyên xwe ji qirara Xwedê bidine xalifandinê.

Gelek cara em naxwezin wê yekê bikin, çi ku Xwedê dibêje, lê paşê hinek gava diavêjin bona ku dewsa gurênedabûnê em paşda bizvirînin.

Ji lawên Xwedê çend meriv “ji bûyîna padişa” miqûf man, hema rûyê serhişkî û miqabilderketina xweda (binihêre Romayî 5:17, Eyantî 1:6)?

Nava “Tercima Încîlêye Berfirehda” pêşgotina kitêba Zanebûnêda tê gotinê: “Meremê vê kitêbê ew e, ku jîyanê bi tomerî hildayî gotûbêj bikin û meriva hîn bikin, wekî bi lêkolînkirina dawîyê (xilazîyê) jîyan bêfikir e, eger meriv wê jîyanê bêyî qedirgirtina kamile hindava Xwedêda dijî”.

Em gerekê fem bikin, wekî bêyî gurêdabûnê qedirgirtina kamil nikare hebe. Ruhê ku miqabil derdikeve, yê ku îro nava gelek zarokada heye, rûyê wê yekêdane, wekî ew qedirê dê û bavên xwe nagirin. Gelek cara ev yek usa jî rûyê gunekarîya dê û bavadane, çimkî ew li ber zarokên xwe jîyana xwe usa najîn, ku nava wanda qedir û hurmetê pêşda bîne.

Gelek zane wê fikirêra qayîl in, wekî kitêba Zanebûn ji aliyê Silêmanê padişada hatîye nivîsarê, serwaxtîya kîjanî ji aliyê Xwedêda hatibû dayînê. Eger Silêman şexsekî usa zane bû, wî çaxî ewî nava jîyana xweda awqas şaşî kiribûn. Caba vê pirsê zelal e: li cem mêriv

dikare ew yek hebe, lê meriv dikare wê yekê nede xebatê. Li cem me fikira Mesîh heye, lê gelo em wê yekê her dem didine xebatê? Îsa nava meda bû serwaxtîya Xwedê, lê gelo em wê serwextîyê her dem didine xebatê?

Silêman dixwest bi rîya xwe here û bi cûrê xwe bike. Ewî jîyana xwe cêriband pêşîyê bi tiştêkî unda bike, lê paşê bi tiştêkî mayîn. Hemû tiştên wî hebûn, hemû tiştên li dinîyayê, çî ku meriv dikaribû bi pera dest bianîya, lê dawîya (xilazîya) kitêba wîda ew gotina dawî heye:

“Dawîya hemû xebera bibihên: ji Xwedê bitirsîn [Xwedê bihebînin û pesinê Wî bidin, bizanibin wekî Ew e] û temîyên Wî xweykin, çimkî ev e ev tomerîbûna bona mêriv [armanca orîgînal, koka binyatê, hîmê tamamîya xweşbextîyê, koordînasîyakirina wî hemû tiştî û qewilên ku bin royêdanin] û [deynê] bona her merivekî”. Zanebûn 12:13, AMP

Îzinê bidin, ku ez vê xeberê bi xeberên xweva raber bikim: “Meremê çêkirina mêriv ew e, ku ew Xwedê bihebîne û pesinê Wî bide, gura Wîda be. Hemû alîyên xeysete baş ji gurêdabûnê pêşda tîn: ew e hîmê xweşbextîyê. T’u kes nikare bi rastî bextewarbe, eger gura Xwedêda nîbe. Ew hemû tişt, çî ku nava jîyana meda şaş e, wê wî çaxî bê dasekinandinê, wextê gura Xwedêda bin. Gurêdabûn borcdarîya her merivekî ye. Bi fikira min eva xebereke ecêb e û ez bangî we dikim, ku hûn xwe hînî wê bikin û bi xwe lêkolîn bikin.

GURÊKIRIN Û GURÊNEKIRIN: ENCAMÊN HERDÛYA JÎ HENE

“Çimkî, çawa ku bi ne guhdarîya yekî gelek bûne gunehkar, usa jî bi guhdarîya Yekî gelek wê rast bêne hesabê”.

Romayî 5:19, KJV

Bijartina meye gurêkirinê, yan jî gurênekirinê, hukumê xwe ne tenê nava jîyana meda, lê usa jî nava jîyana gelekada dihêle. Qasekê bifikirin: eger Îsraêl bi cûrê kamil gura Xwedê bikira, wî çaxî

jîyana wana wê çiqas baş bûya. Ji wana û zarokên wana gelek nava qûmistanêda mirin, çimkî nexwestin peyî rêyên Xwedê herin. Qirara wana hukumî li ser zarokên wan kir, û hema ew yek nava rojên meda jî dibe.

Van axirîya kurê minî mezin got: “Dayê, ez dixwezim tiştekî tera gilî bikim, wextê kîjanê diqewime ez destpê bikim bigrîm, lê tu hetanî dawîyê (xilazîyê) guhdarîya min bike”. Û ewî xebardana xwe berdewam kir: “Ez derheqa te û bavoda difikirîm, ku çiqas sal we emek kirîye nava vê qulixê, çiqas cara we qirar kirîye gura Xwedêda bin û çiqas cara ew yek bona we dijwar bûye. Ez fem dikim, wekî tu û bavo nava tiştên usara derbaz bûne, wekî gelek meriv derheqa wê yekêda nizanin, lê ez dixwezim ku hûn bizanibin, wekî vê şebeqê Xwedê ez dame femkirinê, ku rûyê gurêdabûna weda kara min çiqas mezin e. Bona wê yekê ez ji we razî me”.

Xeberên wî bona min tiştekî mezin bû û ew gotin xebera Romayî 5:19 anîne bîra min.

Qirara weye derheqa bûyîna nava gurêdabûnêda hukumê xwe nava jîyana yên mayînda dihêle, û eger hûn gurênekirinê dibijêrin, wî çaxî ew yek dîsa hukumê xwe nava jîyana merivada dihêle. Hûn dikarin cûrê duda bibijêrin û nava qûmistanêda bimînin, lê ez hîvî dikim, bîra xweda xweykin, ku eger niha zarokên we hene, yan jî pêşerojêda wê hebin, wî çaxî qirara we wê zarokên we tevî we li qûmistanê xweyke. Diqewime, wextê ku ew mezinbin, ew bicêrbînin xwe ji wêderê derxin, lê ez dikarim we bdime bawarkirinê, wekî ewê mecbûr bin bahê gurênekirina we bidin.

Jîyana me roja îroyîn dikaribû diha baş bûya, eger kesek paşeroja weda hindava Xwedêda gurêdabûn bida kifşê.

Gurêdabûn bi masştaba mezin e: ew usa jî dikare dergehên dojê bigre û pencerên ezmîn veke.

Ez dikarim kitêbeke tam derheqa gurêdabûnêda binivîsim, lê ez niha dixwezim wê yekê bidime femkirinê, wekî jîyana gurênedabûnê encmê fikirdarîya şaş e, yê ku berbi bijartinên şaş dibe.

HEMÛ FIKIRA DÎL HILDIN, KU EW GURA MESÎHDA BIN

“Çimkî çekên eskerîya me ne yên merivayî ne [çekên bedenê û xwînê], lê yên qewate ji Xwedê ne, bona wêrankirin û niquyîkirina kelane, [çimkî] em wan rastîya û dirava û ewlehîya, û her tiştekî kubar, yê ku xwe hindava ulmê Xwedê [rast] bilind digire, betal dikin: û em rêberîya her fikirekê dikin û her meremekî dîl digrin ku gura Mesîhda be”.

B Korintî 10:4,5, AMP

Gelek cara menîyên pirsgirêkên me hema fikrên mene.

Îşaya 55:8-da Xudan dibêje: “Fikirên Min ne fikirên wene û rêyên we ne rêyên Minin” (AMP). Ew yek girîng nîne ku em çi difikirin. Xwedê fikirên Xwe kitêba Xweda nivîsîne, ya ku çawa Încîl tê navkirinê. Em gerekê qîrar bikin fikirên xwe nava ronahîya Xebera Xwedêda hîn bikin û her dem bixwezin fikirên xwe bibine berbi fikirên Wî, bizanibin, wekî ew yên here başin.

Hema derheqa vê yekêda nava berbirîbûna Korntîyaye dudada, xeberên 10:4,5-da tê gotinê. Fikira xwe gotûbêj bikin. Eger ew ne anegorî fikirên Xwedê (Încîlê) ne, usa ye fikirên xweye şexsî tune bikin û fikirên Wî qebûl bikin.

Ewên ku nava karebûna fikirên xweda dijîn, ne tenê xwe tune dikin, lê gelek cara ew hukumê tunekirî nava jîyana merivên dorberên xweda dihêlin.

Fikir deşta şêr e.

Li vê deşte yan hûnê ser bikevin, yan jî nava wî şerîda bin bikevin, yê ku mîrêcin dijî we dike. Duayên min ew e, wekî ev kitêb alî we bike, ku wan hemû fikir û qewînbûna niqo bike, yên ku dijî (miqbilî) serwaxtîya Xwedê bilind bûne û alî bike ku hûn hemû fikira dîl hildin, bona ku gura Îsa Mesîhda bin.

Derheqa xudana kitêbêda

Coys Mayêr li dinîyayê dersdareke Încîlêye pêşin e, ya ku ji sala 1976-da Xebera Xwedê hîn dike û ji sala 1980-yêda nava qulixêda ye. Ew xudana kitêba “New York Times”-ye hejmara 1-ye, ya ku ji hemû kitêba baştir tê frotanê. Ewê ji 80-yê zêdetir kitêbên ruhdarkirinê nivîsîne, nava wanda kitêbên “Sura bextewarîya rast”, “Sed gavên ku jîyanê didine zelalkirinê”, xebata wêye bedewetîyê ewlin “Pênî” û yên mayîn. Bi hezara dersên wêye aûdiyo, usa jî berevoka vîdêoya hene. Progiramên Coys Mayêrêye bi sernavê “Jiyîna jiyana herroje” bi radîo û tîlêvîzîonê, li parçên dinîyayêye cuda-cuda, tên weşandinê.

Çar zarokên Coysê û mêrê wê Dêyv hene û ew li Sênt Lûîsê (Mîsûrî, ŞAY) dijîn.

ŞERKARÎ GUR DIBE

Fikira we deşta şêr e

Nerihetî, şikberî, şaşbûn, dêprêşîya, hêrs û texmînkirina gunehkar-kirinê... ev hemû êrîşin, yên ku miqabilî (dijî) fikirê ne. Eger hûn ji fikirên xirab dizêrin, bînê bidine ber xwe. Coys Mayêr alî mîlîyona meriva kirîye, ku ew nava vî şerê girîngda ser bikevin, û ew dikare alî we jî bike.

Xudana kitêbê û mamosta hizkirî nava kitêba xweda, ya ku ya here zêdetir tê firotanê, û usa jî bi cûrê careke mayîn rêdaksîyakirî niha tê raberkirinê, dide kifşê ku çawa hûn dikarin bi guhartina fikirên xwe jîyana xwe biguhêrin. Ew hîn dike, ku çawa gerekê hûn nêzîkî bi hezara fikirên serê xweda bin, û çawa gerekê fikira bidine merkezkirinê û usa bifikirin, çawa ku Xwedê difikire. Ew usa jî bi cêribandinê, dijwarîyê, serkeftinên dawîva, yên nava zewaca wê, malbetê, qulixêda qewimî wera pareve dike, yên ku rêberîya wê kirine berbi rastîya baş û ya ku jîyanê diguhêre.

Bi alîkarîya wana Coysê usa jî eşkere kirîye, ku dilê wêda fikirên çawa û nêzîkbûnên çawa hindava her pîrsekêda pêşda tîn.

Niha sirîya we ye:

- kontrola li ser fikira xwe dest bînin û azayê, aşîtîyê bibînin,
- fikirên zyandar naskin û hukumê wane nava jîyana xweda bidine qedexekirinê,
- hindava xweda sebirkin, eger hûn şaş dibin jî,
- xwe bi Xebera Xwedê, bi şikirdarîyê, bi dua û sîlihê ruhanîye mayîn bidine sîlihkirinê,
- “fikirdarîya çolê” alt bikin, ji nêzîkbûna xirab û xweafûkirinê paşda bisekinn, yên ku wê we ji Xwedê dûr xweykin, û bi kutasî, bextewrîya ku nayê gilîkirinê, bibînin.

Teslîm nebin, eger rojeke weye bêbext jî hebe. Îro bidine zelalkirinê, ku çawa garantîya serkeftinê li DEŞTA FIKIRÊYE ŞÊR dest bînin.